# Vejîna Li Welatê Rojê

## (Pirtûka Heftemîn)

# TOFANA AZADIYÊ

## Cîlda Duyemîn

**Fehîma Deştan**

**Weşanên Dibistana Wêjeyê ya Şehîd Şîlan Baqî**

# BEŞA ÇAREMÎN

Li Zahîra ku bi tenahiya xwe bi şev weke gundekî bêdeng û bêkes bû, Apo li ber pencereyê li peşkên baranê temaşe dikir. Çavên xwe li ber camê çikandibûn, destên xwe li pişt xwe danîbûn ser hev. Baranê jî hêdî hêdî lê dikir. Carna jê bapeşkê li camê dixist. Rûyê wî melûl xuya dikir. Şevê bêdengiya xwe berdabû ser dilê wî. Selman jî li kêlekê sekinîbû. Nû ji zindana Sûriyê derketibû. Hê xemgînî û bêdengiya zindanê ji ser çavên wî ranebûbûn. Ji qermîçekên eniya wî diyar dibû ku rojên zor û zehmet derbas kirine. Çend avde li pora wî ya spî zêde bûbûn. Derbarê rewşa zindanê de agahiyên pêwîst tev dabûnê. Ji ber wê careke din zindanên dewleta Tirk hatin bîrê. Wêneyê Mezlum Dogan hatibû ber çavên wî. Qederekî xweş wisa di nava wan xeyalan de ma. Li pişt xwe ve vegeriya, berê xwe da derî hêdîka meşiya. Selman bilez kefiya dar ve deleqandî anî raber kir.

-Serokê min, dinya sar e, vê bide serê xwe.

Kefî ji destê wî girt li serê xwe pêça, qumçeyên parkeyê xwe jî dadan:

-Te ev kefiye aniye da ti kes min nas neke, yan ji ber sermayê?

-Serokê min, ji bo her duyan jî. Yên zindanê jî hemû we nas dikin. Teqez yên li derve ji wan pirtir we nas dikin.

-Berê jî min gotibû, ez hundirê we dixwînim, dizanim ka hûn li ser çi dihizirin. Were em bi hev re li ber vê baranê hinekî bimeşin!

Selman û Siwar bilez ketin tevgerê, dan pey. Selman hêdîka xwe nêzîkî Siwar kir:

-Serokatiyê ji te re got emê biçin kû?

-Na, tiştek ji min re negot.

Di ser milê xwe re li nêrî:

-De lez bikin, qaşo hûn min diparêzin, yan ez we diparêzim?

Siwar destê xwe avêt pişt xwe, demanceya çardexwer girt, bilez meşiya. Çavên Selman jî li derdor bûn. Baran êdî sekinîbû. Piştî saetekê berê xwe dan malê. Derbasî odeya xwe bû. Siwar nefeseke kûr kişand hundirê xwe:

-Welah ez rastî bêjim, dema em derdikevin derve, ez qet ne rehet im. Berî demekê em çûbûn xwaringehekê, çend kesan silav da Serokatiyê. Yekî wênekêş hema li wir li ser sîniyekê wênyê Serokatiyê çêkir da me.

Selman jî serê xwe hejand:

-Ji xelkê weye em Serokatiyê diparêzin, di rastiyê de ew xwe diparêze.

Apo li odeya xwe hê li ser piyan bû. Li ser rewşa heyî dihizirî û geşedanên bûyîn yek bi yek dianîn ber çavên xwe. Êrîşên li Kurdistanê dibin, agirbest, mirina Ozal û dîroka Tirkan hemû di hişê xwe de rêz dikirin. Bi wan hizran serê xwe danî ser balîvê xwe. Saet çarê sibê ji nava nivînan rabû, berê xwe da eywanê. Selman hê di xew de bû, Siwar jî li eywanê li ser kursiyekî rûniştibû. Bi dengekî nizim gazî kir:

-Heval, hûn amade ne em bi rê bikevin?

-Serokê min, di nava çend deqîqeyan de emê amade bin.

Hinekî li bêdengiyê guhdarî kir. Xwe ji bo karekî zor û

zehmet amade kiribû. Bilez ji hundir derketin. Selman li paş rûnişt, ew li pêşiyê rûnişt li kasêtan Koma Berxwedan venêrî. Kaseta herî dawiyê danî ser, hinekî dengê wê vekir. Stirana destpêkê baş guhê xwe dayê. Çavên xwe danîn ser hev, gotinên stiranê di hişê xwe dubare kirin: "Yadê roka me hilatî ji aliyê çiya, şewqê avêtî nav bax, bostan û kaniyan, xortên Kurdan rabin, roja we hatiye, pîr, kal û qîz rabin em herin serê van çiya... Bi gotina çiya re kaniya, çavên wî xwe berda nava xem û xeyalên bedewiya çiyayên Kurdistanê. Şefeqên xweşik yên welat hemû anîn bîra xwe. Li ser perdeya çavên xwe wêneyê veger û dîtina welat çêdikir. Piştî vê stiranê, zembîlfiroş dest pê kir. Wî jî bi dengekî hêdîka pê re digot. Bi wî awayî gihîştin qata dehan.

Piştî qasekî ji odeya xwe derbasî eywanê bû, gazî Siwar kir:

-We xeber da Selah ku bê vir?

-Serokê min, nîv saeteke din wê bê.

Rahişt rojnameya li ser mase, pelên wê wergerandin. Tv jî li ser nûçeyan bû. Di wê navê re Selah hêdîka ket hûndir. Hê li ber devê dêrî gazî kirê:

-Kerem bike were rûne, rewşa we çawa ye?

Selah bilez xwe nêzîk kir:

-Em baş in serokê min.

Qqasekî lê nêrî:

-Tu dibêjî em baş in, lê em nebaş in. Welat û mafê me nînin, çi yê me baş e?! Em li welatê xerîbiyê ne. Hûn têr radizin, hevalê me li çiyayan birçî dimînin, emê çawa baş bin, em ne baş in.

Bê ku bersivê bide serê xwe da ber xwe, li ser gotinên wî

fikirî.

-Divê em pir şiyar bin. Van rojan gelek sîxûr li van derdoran belav bûne. Divê hûn van tiştan bizanin. Çi tişta hûn li erdê bibînin, divê hûn lê şiyar bin. Divê hûn nehêlin ti kes kêmayiyan bike û rewşê bi wan bidin fêmkirin.

-Rast e serokê min, berî niha istixbaratê jî ji me re gotibû, li derdora cihên perwerdeya we cihazên deng hatine dîtin.

Awirên çavên wî kûr bûbûn:

-Divê em bixwe derbarê vê mijarê de gelek şiyar bin. Demeke hesas e, ji ber wê divê em li gorî rewşê tevbigerin. Weke din çi heye?

-Serokê min, nivîskar Nebîl Mulhim dixwaze bi we re roportajê bike û bike pirtûk.

-Bila bê, lê bi şertekî!

Peyva “şert” bala Selah kişand. Cara yekê tişteke wisa dibihîst.

-Lê bila xortekî Kurd jî bê. Xweşnav dikare bê. Eger Kurdek neyê nabe. Bila bi hev re hazir bibin. Bila pirtûk bi navê Nebîl be, lê bila bibe wesîqeyeke li ser jiyan û hedefên me. Bila ne li gorî kêfa wan be. Bila nivîskarên Kurd jî hazir bin da ji bo dema pêş ji nivîsê re amade bin. Tu wergera wê amade bike, bila Xweşnav jî li vir be. Hûnê bi hev re bixebitin. Jimara nû ya Dengê Kurdistanê we li her derî belav kir?

-Rast e serokê min, ev jimar li ser Agirbestê bû.

-Heval, divê hûn Dengê Kurdistanê ji kilasîkbûnê derxin. Bigihînin cîhanê, yekî xeta partiyê nas dike, dikare sererast bike.

-Serokê min, dema em ji bo çapê rêdikin derve û ji bo belavkirinê jî heta ji me tê em nahêlin bê girtin.

-Naveroka wê çawa tê dîtin, fikrê me digihîje her kesî?

-Rast e serokê min, heta hin rojnemevanên Sûriyê gotibûn ev kovara wan ji yên me pirtir tê xwendin.

-Sibê gazî wan bike, bila bên em dest pê bikin. Siwar, tu û Rihan jî biçin, bila welatparêzên ji bo dîtina me hatîn îşev bên vir. Yên ji derveyî welat hatîn bila niha werin. Mayîna me ya li vir bixeter e, lê emê karê xwe nedin sekinandin.

Piştî gotina xwe berê xwe da pirtûkxaneyê. Selah jî ber bi peykerê teyrê baz ve çû. Li çavên wî, li nikulên wî dinêrî. Ji ber ku gelek caran Apo ji teyrê baz mînak didan, dixwest li her dera wî binêre. Wisa sekinîbû, lê temaşe dikir, dîsa Apo derbasî eywanê bû:

-Ha, Selah, kovarên Ereban ji bo me çi dibêjin?

-Serokê min li ser şerê gerîla pir dinivîsin. Kovara El Heyat roprtaja bi we re kirî, tev daye. Bi taybetî federaliya Rojhilata Navî, hebûna Kurdan ji dîrokê ve û şerê li Tirkiyê diqewime.

-Temam, dema hûn peyvên min werdigerînin neguherînin, tişta bala we kişand we jê fêm nekir ji min bipirsin! Tu gotinên min werdigerînî, lê şiyar be! Weke din çi yê me bala wan dikişîne.

-Serokê min, piranî fikir û felsefeya partiyê ji bo Kurdan hişmendiyeke nû dibînin. Roportaja nûçegihana BBC Selwa Îstiwanî jî ya bi we re kirî baş dane. Gelek ji wan ji me dipirsin, dibêjin felsefeya Ocalan ji kû hatiye, fikrekî di navbera yê Marks û Mao de ye, yan tişteke din e?

-Wê bipirsin, lê divê em berê wan bidin fikrê PKK'ê. Navê Kurdistanê ne pir girîng e, bêjin, nebêjin, ya girîng azadiya Mezopotamya ye. Divê ev peyam bigihîje Rojhilata Navî.

-Serokê min, dema nûçegihanê El Heyat, Cîhad El Xezam hatî vir, digot, navê partiya we bi terorîstî û mafya derxistibûn, lê dema min serokê we dît, min dît ku tam serok e. Elman jî gelek bandor dibin, bi taybetî dema jiyana we dibînin.

-Agirbesta par tam firsendek bû; me xwest pirsgirêkê çareser bikin. Gelek kesan jî dixwest, lê nêrîna faşîst nehişt pêvajo pêş bikeve. Çalakiya li Amadê (Çewlik rast e) ya bi navê me hatî kirin emê baş lêkolîn bikin. Zekî jî niha li vir e, emê hesab jê bixwazin. Me dest bi pêngava Agirbestê kir lê desthilatiya Tirkiyê bi awayekî hovane êrîş dike. Bala dinyayê li ser vê rewşê ye, wê gelek bixwazin bên bi me re hevdîtinan bikin. Xwe li gorî wê plan bikin. Tu dikarî niha biçî karê xwe.

-Temam serokê min!

-Sibê amade be, wê planên me hebin.

Selah bilez ji hundir derket, berê xwe da taxa Ruknedîn. Wî jî li eywanê bi gevên bilez dest bi meşê kir. Bi dengê zengil re ber bi derî ve çû. Diya Haşim û Yadê Nûfa ketin hundir. Bi kêfxweşî bixêrhatin da wan û destê wan maç kir. Bi hev re derbasî eywanê bûn. Piştî qasekî Siwar bi komekê ve ketin hundir. Ji Rojava û derveyî welat hatibûn. Tev li eywanê rûniştin. Çend kêlî bi pirsa hal û ehwal derbas bûn. Dayîk pir rehet diaxivîn û vala jî nehatibûn. Notên bi xwe re veşartîn, derxistin dan destê wî.

Di wê navê re careke din dengê derî hat. Çavên wî li deriyê eywanê bûn. Dizanî wê hê mêvan werin. Dengê zarok û jinan hatiyê. Komek dayîk, zarok, kal û ciwan bi hev re ketin hundir, berê xwe dan eywanê. Dayîkeke bitemen li pêşiya wan bû. Ne kin ne dirêj bû. Xwe di nava cilûbergên reş de hiştibû. Kefiya li

serê wê jî reş bû, lê pora wê spî bû. Biskên wê di ber kefiyê re derketibûn. Bi wê rewşa xwe ve weke zanyareke zemanan xuya dikir. Her ku gavek diavêt çawa ku tiştekî jê bixwaze. Awirên çavên wê bala Apo kişandibûn, bi rêzdarî ber bi wan ve meşiya. Li ber dayîkê sekinî, bi germî destê wê girt. Dayîkê hinekî li rûyê wî nêrî û bikel himbêz kir. Ji cilûbergên wê yên reş û rengê li ser rûyê wê diyar dibû ku êşa wê hê nû ye, lê bi sekna xwe ya keseke jixwebawer nîşan dida ku berdêla tiştekî mezin daye. Ji ber wê bê ku rondik ji çavên wê werin xwarê çavên xwe kirin nava çavên wî. Çavên wî jî li ser xetên rûyê wê bûn. Xemgîniya di nava wan de kûr bûyî didît. Bi rêzdarî li benda xeberdana wê bû. Dayê destekî xwe danî ser milê wî û careke din li nava çavên wî nêrî. Yên din jî yek bi yek destê wan girt, pirsa rewşa wan kir. Weke xelekekê li dorê kom bûbûn. Di çavên wan de hem heskirinê, hem daxwaziyan diyar dikir. Di dilê xwe de got, daxwaziyên we ji bo min ferman in. Ji ber ku li cem pir biste bûn, kêfa wî pir hatibû.

Dayîkên li eywanê jî hemû rabûbûn ser xwe. Çawa ku birînên wan weke hev bin û ji hev fêm bikin, li dayîka bitemen dinêriyan. Apo dîsa vegeriya cem. Bi destê wê girt li cem xwe da rûniştandin. Yên din jî tev rûniştin. Dixwest dayê destpêkê biaxive, lê dayê dengê xwe nekir, li benda axaftin wî bû. Ji rengê rûyî wî xuya dibû ku bi hatina wê pir dilşa bûye:

-Me ji zû ve dixwest tu werî. Piştî şehîdbûna hevalê Sebrî, min pir dixwest tu werî vir.

Dayîk li benda van gotinan bû. Ji ber ku dizaniya kurê wê li wir maye, li resmên bi dîwaran ve daleqandî dinêriya. Dayîk bû; resim jî bûya, wê pêjnek bihata guhên dilê wê. Wêneyê kurê wê

yê li vê malê hatî kişandin, anîn ber çavên xwe.

Çavên wî li ser cilûbergên wê yên reş rawestiyabûn. Xemgîniya li ser rûyê wê jî ji ber çavên wî nediçû. Di dilê xwe de got, divê ez vê xemgîniyê li ser rûyê dayîkan nehêlim. Weke kelehekê dayîkan derdora wî girtibû. Tev jî xwediyên kedê bûn û bi şehîdbûna zaroyên xwe bedelên giran dabûn. Ji ber koçberî, weltparêzî û fedekariyê, Dayê Nûfa bûbû sembola dayîkên Bakur. Dayîka Haşim bi xebata xwe dixwest li Kurdistanê bibe mînaka weltparêzî û sembola rêxistina dayîkan. Dayîka Sebrî sembola dayîkên Elewî bû û sekneke hêjayî zarokên xwe nîşan dida. Dayîka Ciwan bi fedekariyeke mezin bi zarokên xwe re dest bi meşa şoreşê kiribû. Dayîka Fîdan sembola têkoşîn û tevlîbûna xurt bû. Dayîkan hev nas dikir, lê dayîka Sebrî nas nedikirin. Xwest bi wan bide naskirin:

-Ev dayîka hevriyê me Şixo Dirlik e, me jê re digot Sebrî. Ji navçeya Gurgum Pazacikê ne. Berê xwe da dayîka Sebrî:

-Ez bawer dikim navê gundê we Kuruşan e.

Dayê bi hejandina serê xwe erê kir.

-Berî 1980î tevlî têkoşînê bûye. Mixabin 30ê Temûza 1993an tevlî karwanê şehîdan bû. Lê nemiriye e, bi me re ber bi şoreşê ve dimeşe. Niha li Kurdistana di riya wê de şehîd bûyî, firtûneya şoreşê dijwartir bûye; dijmin dihejîne, diperçiqîne û mizgîniya serkeftina mezin dide.

Rabû ser xwe, bilez ber bi pirtûkxaneyê ve çû. Piştî çend kêliyan bi kefiyeke kesk, sor û zer vegeriya. Li pêşberî dayîka Sebrî sekinî:

-Ez naxwazim dayîkên me xemgîn bibin û cilên reş li xwe bikin. Divê dayîkên me bi ewladên xwe serbilind bin, rengên me

li ser milên wan bin.

Dayîka Sebrî rabû ser xwe, kefiye avêt ser milên xwe:

-Serokê min, em jî ji reş hes nakin. Lê zarokên min şehîd ketin, bi xiyaneta hatî kirin ez pir êşiyam. Ji ber wê min reş li xwe kir.

Apo serê xwe hejand:

-Li Kurdisanê êdî xiyanet û qehremanî ji hev hatine cudakirin. Êdî xiyanet nikare pêşiya têkoşînê bigire. Emê heta dawiyê li berxwedana şehîdan xwedî derkevin.

Bi baldarî û rêzdarî li rûyê dayîkan nêrî, xemgîniya li ser rûyê wan kûr bûyî didît:

-Şehîd zarokên we ne, lê milkên şoreşê ne. Her yek ji wan dema şehîd dibe parçeyek ji laşê min dikeve.

Çû li ber dayîka Ciwan Hesekê sekinî:

-Eger Ciwan şehîd nebûya wê Stalînê didoyan bûya, lê dijmin nehişt. Xwe neqeherînin. Heta ji min bê ezê nehêlim êdî wisa bibe. Şehîd milkên şoreşê ne, yên Kurdistanê ne.

Hinekî lê temaşe kir:

-Dayê, em dixwazin tu biaxivî. Dayîkên li vir hêja ne biaxivin û em guhdarî bikin.

Diya Ciwan hirbiyek reşgulî, hemokeke bineqiş li ser girêdabû, baş li dora serê xwe pêçabû. Kirasekî bi lewendî lê bû û qutikek jî bi ser de li xwe kiribû. Lewendiyên xwe jî ji paş ve girê dabûn. Bi kêfxweşî rabû ser xwe:

-Serokê min, dema em çav bi te dikevin, em nizanin çi bêjin.

Apo ji axaftina dayîkan ya xwezayî û bistebûna wan pir hes dikir. Berken bû:

-Dengê xwe bilind bikin, biaxivin! Bêjin, hûn ji vir diçin, çawa kar dikin? Zarokên we çi karî dikin? Çawa hûn nikarin biaxivin?

-Zarokên me bi şev û roj kar dikin, serokê min. Em diçin Salihiyê, barek tişt datînin ser milê xwe tînin malê. Heval jî bi şev û roj li cem me ne, em ji wan hes dikin.

Ku dayîkan rastiya jiyana xwe ya rojane digot, kêfa wî dihat û bi baldarî guhdarî dikir:

-Gelek baş e. Dûrî hevalan nekevin, lê doza xwe bi şehîdan ve girê bidin. Da hûn xurt bibin. Timî bi şehîdên xwe re bin!

Berê xwe da dayîkên din:

-Li bal min dayîk û bavên şehîdan pir girîng in. Eger ew razî bin besî min e. Ez jî pir ji wan razî me.

Diya Ciwan xwest biaxive:

-Serokê min, esil em ji te razî ne. Ne hewce ye tu ji me razî bî!

-Hûn hemû dayîkên min in. Esil hûn in. Ez timî dixwazim we bibînim û hûn li cem min bin. Hûnê di demeke nêz de welatekî serbixwe û azad bibînin. Ez naxwazim hûn êdî biwestin, dixwazim xizmeta we bikim. Wê rojek bê, hûnê rahêjin çek di milê hevalan de şer bikin! (Îfade kêm e.)

Hinekî meşiya, careke din berê xwe da diya Ciwan:

-Ji bo tevlîbûna her du zarokên xwe Rênas û Ciwan tu ji me nexeyidî?

-Serokê min, em bi tevlîbûna zarokên xwe kêfxweş bûn.

-Tu ne aciz î?

-Na ez ne aciz im, di riya şeref û namûsê de ne.

Gotinên dayîkan yên bi vî awayî pir bandor lê dikirin:

-Rê li pêşiya zarokên xwe negirin. Biçin malan, fikrê me belav bikin, bila me nas bikin.

-Em diçin serokê min, lê bera me didin.

-Dema di derî re bera we dan, di pencereyê re biçin cem wan. Carek, du, sê wê fikrê me bikeve serê wan. Wê gel li we kom bibe.

Vê carê berê xwe da bavê Ciwan:

-Tu û Bêrîvana li Cizîrê şehîd ketî bi hev re li nava gel digeriyan! Hûn diçûn gundên Êzîdiyan. Cara yekê tu bi Hasan Bîndal re hatî me hev dît. Wê demê jî em li ser rewşa Hesekê axivîbûn. Tê bîra te ne?

Bavê ciwan rabû ser xwe:

-Serokê min, hingê dema tu diaxivî ji bo min weke xewn û xeyalan bû. Destpêkê hevalê Beşîr yê birayê Ehmed Turk dihat cem me. Piştî 12ê Îlonê heval hatin herêma Cizîrê, me wisa partî nas kir. Em bi hevalan re mal bi mal digeriyan. Digot ku derî venekin emê di pençereyê re bikevin hundir. Wê demê em komonîst bûn, ji ber wê me partî zû qebûl kir. Mixabin ew jî şehîd bû.

Kêfa Apo ji bîranînên hatina PKK'ê yên destpêkê re dihat:

-Herî zêde bandora çi li we dikir?

-Sosyalîst bûn û navê rêxistinê jî Partiya Karkerên Kurdistanê bû. Min wê demê du sed wereqe alîkarî dabûn wan. Hevalê Beşîr got, ev cara yekê ye yek alîkariyê dide me û dibêje, karê we rast e. Min jê re got timî werin cem me. Pişt re fikrê partiyê li Hesekê belav bû. Pirtûkên partiyê pir dihatin xwendin. Xebatkarên me yên eniyê pir bûn.

Bi baldarî guhdarî dikir:

-Gelek kes tên vir, dixwazin pirsgirêkên di nava xebatê de ji min re bêjin. Hûn bixwe dikarin pirsgirêkan çareser bikin. Lê hin dixwazin axatiyê bikin.

Yên rûniştî pir kêfxweş dibûn ku behsa kêmayiyan dike. Wî jî yek bi yek di ber çavên xwe re derbas dikirin:

-Ez dixwazim, her kes li kar xwe xwedî derkeve. Hûn bixwe kar bi rê ve bibin! Divê hûn bi hevalan re alîkariyê bikin. Gazindan nekin! Çareseriyê bixwe bibînin! Hêzê bi xwe re bibînin! Em dixwazin zilmê rakin. Emê serê xwe ji ti kesî re netewînin û îdeolojiya partiyê jî diyar e. Li xwe xwedî derkevin! Alîkariyê bi hevalan re jî bikin!

Di wê navê re keçiçeke piçûk çû cem cem, ser xwe re lê dinêriya. Wî jî rahiştiyê maç kir. Destê xwe jî bi ser serê wê ve bir:

-Ev zarok jî ji azadiyê hes dikin û tên cem min!

Bavê Ciwan hê sekinîbû, dixwest biaxive:

-Serokê min, cara yekê we 1986'an li Helebê biryara pîrozkirina Newrozê dabû. Ew cara yekê bû me Newroza xwe li çiyayê Kewkebê pîroz kir.

-Astengî ji bo Newrozê hene?

-Serokê min, yên pêşkêş dikin û diaxivin tên girtin.

-Ji ber wê ez dixwazim hûn xwe birêxistin bikin. Îsal jî emê tevlî hilbijartinên Sûriyê bibin. Xwe amade bike! Emê çend endamên xwe weke sala 1990î bişînin meclisê. Wê demê we baş deng girtibûn, lê gelek lîstik hebûn. Îsal hûnê derkevin. Divê dengê Kurdan li meclisa Sûriyê hebe.

-Serokê min, sala 1990î me ser 27 hezarî re deng girtibûn. Lê mijara Şener bandor kir. Ji ber wê em bi ser neketin.

-Rast e, lê em bi ser ketibûn. Niha jî xwe ji bo Tebaxê amade bikin û baş bixebitin! Bila Kurd dengê xwe bidin we. Emê bi partiyên Kurdî re bikevin hilbijartinê. Bi wî awayî emê hem yekîtîya xwe çêkin, hem dengê Kurdan di fermiyetê de bilind bikin.

Dîsa berê xwe da dayîkan:

-Fedakariya dayîkên Kurdistanî niha dikin gelek biwate ye. Heta ji me bê emê jî layîqî vê fedakariya we bin.

Piştî suhbeteke dirêj civîn qediya. Ew çû pirtûkxaneyê, yên din jî li eywanê suhbeta xwe domandin.

Li pirtûkxaneyê notyên dayîkan anîn dixwendin. Bavê Serbest jî cara yekê bû hatibû. Ew û dayîka Haşim li eywanê diaxivîn:

-Diya Haşim, min partî bi hevalên jin nas kir. Min digot belkû partî ji bo xemlê wan dide pêş. Lê îro min ji gotinên Serok fêm kir ku şoreş teslîmî wan kiriye!

-Ev çend car in em tên cem Serok, lê hê jî gelek ji me re divê. Xwedê emrê serokê me dirêj bike, her tiştî nîşanî me dide.

-Welah bavo her tiştî nîşanî we dide. Bi ya min Kurdistan daye we. Va ez zilamek im, lê nikarim weke berê tevbigerim.

Rihan jî li nêzî wan rûniştibû, guhdarî wan dikir. Wê jî xwest tevlî nîqaşên wan bibe:

-Mamo, serokatî dixwaze jin jî, mêr jî vegerin cewherê xwe yê xwazayî.

Serê xwe hejand:

-Erê qîza min, divê em weke berê nemînin. Pir baş bû ez hatim vir. Min gelek tişt girtin. Piştî niha tişta ji min bê xwestin

ezê bikim.

Albûmeke piçûk di destê Apo de bû ji aliyê pirtûkxaneyê ve dihat. Li cem dayîka Sebrî rûnişt, albûm vekir. Bi navê xwe tiştin nivîsîn û albûm da destê wê:

-Min ev albûm ji wêneyên hevalê Sebrî amade kiriye. Hêvî dikim tu diyariya min qebûl bikî.

Bi girtina wêneyên kurê xwe, hem hestiyar, hem kêfxweş bûbû. Ji aliyekî ve jî serbilind bû ku wêneyên kurê wê û yên Apo bi hev re ne:

-Serokê min, dîtina te û şopandina dozê, ji her tiştî girîngtir e. Divê tola zarokên me ji xayînên weke Terzî bê standin.

Ka çawa li ser şêwazê Terzî rawestiyane wî jî hemû jê re got. Herî dawiyê gazî mêvanan tevan kir:

-Hemû werin! Em yek bi yek bi hev re wêneyan bikişînin!

Piştî kişandina wêneyan xwarin kişandin ser mase. Di nîvê wan de rûniştibû:

-Ev xwarin bi dilê we ye?

Dayîkan bi hev re bersiv da:

-Ji serê me jî zêde ye serokê min!

Çavên wan li ser bûn, radihişt çi dixwar wan jî ew dixwar. Xwarina wî ya bizewq bala her kesî dikişand. Adetê wî bû, nanê tisî jî bûya bikêf dixwar. Bi destê xwe jî xwarin li wan belav dikir.

Piştî xwarinê ku her kes rabû, diya Ciwan çavên xwe lê gerandin. Nedixwest jê dûr bikeve, da her tevgera wî bibîne. Ber bi metbexê ve çû. Hêdîka meyze kir. Qedeha çaya xwe dişûşt. Di dilê xwe de got, çiqas xweşik jî dişû. Wî jî ferq kir ku lê temaşe dike:

-Dayê, dema metbex ne pak be, wê xwarin jî ne pak be.

-Serokê min, hema tu milyaketek î, Xwedê tu ji me re şandî.

-Dayê, hûn mêvanên min in. Hûnê du rojan li vir bin. Bêjin, hûn çi xwarinê bixwazin ezê ji we re çêkim. Îro hevalan xwarineke sivik çêkiribû. Hûn jê qayilî bûn?

-Serokê min, her tişta nêzîkî te be, em jê qayîl in.

Careke din derbasî pirtûkxaneyê bû, name û notyên bên xwendin li ser mase kom bûbûn. Diya Ciwan, li eywanê li cem Sara rûnişt:

-Hevala Sara, cara yekê li akademiyê em bi Serokatiyê re hatin pêşwaziya te. Komeke mezin bû, li milekî Serok, li milê dîn gel, li derdora Serok jinên milîtan, em ber bi deriyê akademiyê ve meşiyan, me pêşwaziya te kir.

Sara hestiyar bûbû. Ew kêliyên pêşwaziyê anîn ber çavên xwe; di dilê xwe de got, rojeke dîrokî bû.

Êdî dema razanê bû. Apo ji odeya xwe derket gazî Rihanê kir:

-Heval, odeya min jî bidin mêvanan, bila tê de razin.

-Temam serokê min!

-Ezê li eywanê razim, bila tiştek ji mêvanan kêm nebe.

Rihan ber bi mêvanan ve çû, çend kes derbasî odeya wî kirin.

Piştî ku her kes bi cih bû, li eywanê li ser qenape xwe dirêj kir. Çavên xwe danîn ser hev, li ser xwestek û hêviya di çavên kesên hatîn de hizirî. Lê li aliyekî jî dilxweş bû. Xwe zivirand ser milê rastê. Xeweke sivik ket çavên wî.

Roja din piştî taştê amadekariya çûna mêvanan hat kirin. Mêvanan li eywanê yek bi yek xatir ji Apo xwest, derketin.

***

Dawiya meha yekê bû. Bi ser Sûriyê de xemgîniya mirinê venabû. Welatekî di şînê de bû. Ew deh roj bûn kurê Hafiz Esed, Basil miribû. Mirina wî bandor li Kurdan jî kiribû, lewre bi dostayiya Kurdan dihat naskirin. Apo di seyareya xwe de li ser riya qeta dehan bû. Li nava bajêr, li kolanan li her derê ji ber mirina Basil hê cawên reş daleqandî bûn. Dem bi dem di pencereya seyareyê re li wêneyê wî dinêriya. Wêneyê wî yê li ser pişta hesp ket ber çavên wî, baş lê temaşe kir: “Ev xortekî nestêle bû, pir heyf bû. Ji bo Sûriyê wendayiyeke mezin e. Di nava wan hizran de gihîştin ber devê deriyê malê. Piştî ku çûn jorê derbasî pirtûkxaneyê bû. Raporên ji qadan hatîn hemû li ser mase bûn. Dest bi xwendina wan kir. Li gorî raporan pêwîstî bi haziriya gavên girîng didît. Ji ber wê geh radibû, di hundir de diçû, dihat, geh rûdinişt raporên mayîn dixwendin.

Di wê navê re dengê derî hat. Bi lêxistina derî re Siwar ket hundir:

-Serokê min, Xweşnav û Selah hatin!

-Temam, bila bên!

Siwar bilez derket. Piştî qederekî her du ketin hundir. Pirsa halê wan kir:

-Çi heye çi nîne? We gotiye hin name ji derve  hatine.

Selah bersiv da:

-Hin xwendevanên Ereb name rêkirine, dixwazin hûn li ser Rojhilata Navî nêrînên xwe ferehtir bidin.

-Dixwazin em li ser kijan mijarê rawestin?

-Serokê min mijareke taybet nîne, dixwazin bi awayekî firehtir fikirê we yê derbarê Rojhilata Navî de bizanin.

Hinekî hizirî:

-Gelek girîng e Ereb bizanin ka em kî ne û heqîqeta doza me çi ye? Divê em bikarin, xîtabeke li gorî aqilê wan bikin. Ji bo rizgarkirina wan ji têgihîştina şaş ya ser Kurdistanê ev girîng e. Divê bizanin Kurd ne dijminên Ereban in. Ji ber wê pêwîstî bi kovareke xîtabê wan bike, heye. Divê projeyeke bi çanda kurdî, lê bi zimanê erebî be. Emê doza Kurdan bigihînin wan. Ji vir heta Iraq, Misir û Lîbya bê belavkirin. Eger nêrînên me bigihîjin wan wê bên vir. Ku me bibînin wê bizanin ku ev doz ne dozeke feodal e, yan jî kevneperest e. Emê heqîqeta dîroka Kurdî, ji nû ve nîşan bidin. Wan nameyan yek bi yek ji min re bixwînin! Haziriyê bikin û bi hevalan re jî baş nîqaş bikin! Haziriya kovarê jî bilez bikin. Ezê dest bi nivîsê bikim.

Li Xweşnav nêrî:

-Tu jî bi wergera wan ve mijûl bibe. Selah, tu jî ji bo çapê biçe cihên pêwîst peyda bike! Nivîsan jî kom bikin!

-Temam serokê min.

-Bila Xweşnav nameyan ji min re bixwîne, emê dest nivîsa li ser Rojhilata Navî jî bikin. Tu jî wergerîne!

-Temam serokê min.

Selah ji hundir derket, Xweşnav jî dest bi xwendina nameyan kir. Bala wî li ser Xweşnav bû, xwest destpêkê pê bide fêmkirin, wisa dest bi gotina xwe bike:

-Ez li ser herêmê lêkolînê dikim; dihizirim ka wê deh salên li pêşiya me li Rojhilata Navî çi biqewime?

-Serokê min, hûn behsa mijarên zor dikin.

-Ez behsa niha nakim, behsa deh salên bên dikim.

Xweşnav bala xwe da pirtûkên li pirtûkxaneyê. Di hundirê xwe de got, bi rastî jî ev gelek in! Bala Apo lê bû, bi destê xwe pirtûk nîşan dan:

-Ev hemû ji bo lêkolînê ne. Ev herêm, zûbizû rast nabe. Ji bo wê pêwîstî bi sîstemên federal heye.

Xweşnav hem deng tomar dikir, hem mijarên fêm nedikirin, not digirtin. Carna jê ji xwe re digot, gelek zor e wê çawa ev herêm wisa bibe?

Di nava axaftina xwe de carna pirs jî jê dikirin:

-Tu çi dibêjî, ma ne wisa ye?

Xweşnav sîstema behsê dikir zor didît, lê diviya bersivekê jî bide:

-Serokatî baştir dizane.

Em bidomînin û nivîsê zû rêkin.

-Temam serokê min.

Xebata wan wê rojê heta êvarê dewam kir. Piştî nivîsê, li eywanê tevî milîtanên jin xwarin xwarin. Piştî xwarinê li eywanê guhdarî nûçeyan kir. Pişt re li ser qenalan gerand. Di qenalekê de çav bi rêzefîlmê Zenûbya ket. Bala wî kişandibû, li ser wî qenalî sekinand, gazî Dîcle kir:

-Ka were wergerîne, ev çi dibêjin? Zenûbya dîl girtine wê çi jê bikin?

Dîcle şaş mabû, lê baş bala xwe dayê:

-Serokê min, qiralê Roma Aurelian dibêje, min sond xwaribû ku ji zêrên Tedmurê zincîrekê çêkim, bikim qeyd û bend û Zenûbya pê girê bidim bînim Romayê. Va min soza xwe pêk anî!

Apo li rengê qiral temaşe dikir, bersiva Zenûbya mereq dikir:

-Êê, Zenûbya çi bersiva wî dide?

Çavên wî li ser Zenûbya bûn. Bi awayekî serbilind, li hemberî Qiralê Romayê sekinîbû. Wêrekî, esalet, xîtab û teslîmnebûna wê bala wî pir dikişand. Li benda wergera Dîcle bû:

-Serokê min, Zenûbya dibêjiyê, kiryarên te kesayeta te nîşan didin. Cilên te yên siwarî û zilamtiyê, tirsonekî û piçûkbûna te venaşêrin. Eger taybetiyên qiraltiyê bi te re hebûna, teyê tavilê ez bikuştam. Tu enceq bikarî zarok û kesên bêçare.

Vê bersiva wê mereqa Apo pirtir kiribû:

-Eê!

-Serokê min, qiral dibêjiyê, tu dixwazî min hêrs bikî, lê qet vê neke! Dijminê mirov mirinê jî bixwaze, divê mirov nediyê. Ha, tu behsa kurê xwe Wehbilah dikî? Min ew nekuştiye. Lê vê mereq dikim, li şûna resmê min, çawa te cesaret kir resmê wî daynî ser pereyên xwe yên zêr? Zenûbya jî dibêje, ez jî nizanim bi çi mafî hûn dixwazin em resmên we daynin ser pereyên xwe? Em ji sembolên we ne razî ne. Oryan hêrs dibe, dibêje, mafê kesên di binê serweriya me de nîne biecibnîne, yan neecibîne. Zenûbya dibêje, em bi we ve ne girêdayî ne û pêdiviya me bi tişteke we jî nîne. Erd erdê me ye, ziman zimanê me ye û şaristaniya me jî heye. Oryan dibêje, şeristaniyek tenê heye ew jî şaristaniya Romayê ye. Zenûbya dibêje, tu behsa kîjan şaristaniyê dikî? Şaristaniya şerê talan li ser talan zêde dike, yan şaristaniya li ser roxandin û terman xwe bilind dike? Şaristaniya we hêza we ye. Lê li vir di navbera şaristaniya hêzê û hêza

şaristaniyê de ferqeke mezin heye. Li ser şaristaniyan jî li ser kesan jî wê dîrok biryarê bide, ne tu. Oryan dibêje, wê dîrok li ser qiralê, dîla xwe bi zincîrên zêr girê dayî û li pey xwe gerandî gelek çîrok û çîvanokan bêje. Çavên wî li dîmen bûn, lê li benda bersiva Zenûbya bû. Serokê min, Zenûbya, dibêjiyê wê dîrok peykerên min û te di mûzeyekê de bîbîne, lê wê ti carî zilma Romayê û berxwedana Palmîra ji bîr neke…

***

Pêncê Adarê bû. Ji her alî ve tevgerê dest pê kiribû. Hatina milîtanan ya wê mehê pir bûbû. Kî dihat berê wan diket dibistanê. Piştî lidarxistina konferansên li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê, wê

Konferansa PKK'ê ya 3. ya Neteweyê wê rojê bihata lidarxistin. Apo li Milîhe, di odeya xwe ya xebatê de bû. Li ser mase gelek rapor hatîn vekirin hebûn, gelek jî hê devê wan nehatibû vekirin. Amadekariya konferansê hatibû kirin, cewherê axaftina xwe jî di serê xwe de amade kiribû. Êdî li benda çûnê bû. Rapor tev xistin cihên wan, derket derve. Li hewşê di nava darên sêv û xoxan de dest bi meşê kir. Kulîlkên wan xemleke pir xweşik dabûn hewşê. Qederekî meşiya, dîsa vegeriya odeya xwe. Li ber neynikê li cilên xwe nêrî. Gumelekekî keskê zeytî û pantolonekî risasiyê tarî li xwe kiribûn. Cilên wî pir lê hatibûn. Jixwe her tim cilên xwe li hev dianîn. Lê bi taybetî wê rojê konferans bû, diviya di her warî de biserûber be. Derbasî eywanê bû. Her kes li bendê bû ku tiştekî bêje. Di heman demê de di nava kelecana konferansê de bûn. Hinekî meşiya.

Konferans, pêvajo û planên ji bo paşrojê di hişê xwe de dibirin dianîn. Pêvajoyeke germ û tijî li pêşiyê bû, di dilê xwe de got, divê em dest bi pêngaveke wisa bikin ku ji yên heta niha bibandortir be. Li wêneyên pêşengên destpêkê yên bi dîwêr ve daleqandî temaşe kir. Di rûyê wan de jî hesasiyet û pêşbîniya lê dihizirîn didît. Berê xwe da milîtanan:

-Hûn hazir in? Wê îro ji bo me dîrokî be. Me her civîna xwe ya mezin li cihekî çêkir, konferansa me ya îro wê li vir be. Divê naveroka wê dagirtî be û bi biryarên xurt derkevin, dijmin tengav bikin. Me saleke giran li pey xwe hişt. Li Kurdistanê şer di asteke bilind de ye. Her roj agahiyên şehîdbûnê ji me re tên. Divê hûn li gorî wê xwe amade bikin. Hedefa me ji îro xwegihandina avakirina bingehê kongreya pêncan e.

Piştî vê axaftinê, berê xwe da cihê destşoyê, kulmek av avêt rûyê xwe. Ser çavên xwe ziwa kir, dîsa çû eywanê. Li hemberî milîtanên jin sekinî. Tev ji bo konferansê amade bûn. Çend kêliyan bi baldarî li wan temaşe kir:

-Dema avakirina artêşa jinê hatiye. Hûnê li gorî wê xwe amade bikin. Hûnê îro di van kêliyên hesas yên konferansê de bi me re bin. Lê bila hedefa we jî kongreya jinê be. Lêhûrbûnên xwe ji bo wê bikin û wisa tevlî bibin.

Piştî wê berê xwe da odeya xwe. Rahişt rapora herêma Botanê ya êvarê xwendî. Paragrafa dawiyê ya li ser şerê çekdarî dubare xwend.

Saet ber bi heşt û nîvê ve diçû, diviya êdî ber bi dibistana Şeba ve biçin. Li seyareyên xwe  siwar bûn, ketin ser rê. Piştî qasekî gihîştin ber deriyê dibistanê. Memed li ber nizamiyê li pêşberî wan sekinîbû. Apo jê daket, silav dayê:

-Tu êdî li vir î, neçe ti cihan. Tu tenê bi zimanê erebî dizanî divê tu li vir bî. Anîna erzaqê hevalan, pêwîstiyên perwerdeyê li ser milê te ne. Çi pêwîst be bîne. Hevalên biçin bijîşk jî tuyê wan bibî. Ev dewreya me ya yekê ye. Me gelek milîtan ji qadên piratîkê anîne. Bi vê dewreyê mabe, emê Kurdistanê rizgar bikin! Berî vê gelek kelem derketin pêşiya me. Te rapora xwe ya tevlîbûnê nivîsîbû. Va tu tevlî bûyî û me erk jî da te. Me erka parastinê emanetî te kiriye.

-Tiştên we gotîn ezê hemûyan pêk bînim serokê min.

-Binêre, rêveberiya dibistanê jî di nav de, tiştên ti kesî tuyê nekî! Ya ji te tê xwestin yên komînê ne. Dema hina şexsî jî tiştek xwest bi serê xwe derkevin derve, tuyê min agahdar bikî.

-Serokê min, ezê tenezûla tiştên piçûk nekim. Soza min wê ev be, heta ji min bê wê karê min rast û durist be.

-Ji bo me jî ev girîn in.

Jê derbas bû, berê xwe da dibistanê. Berê xwe zîvirand, li gulpikên daran, kulîkên wan temaşe kir. Li wan deran geriya, di nava giyê de çend pelçimên li erdê rakirin, kaxizek li erdê dît ew jî rakir. Memed hê li kêlekê bû:

-Tu dibînî hê jî hin kêmayî hene. Van deran baş paqij bikin. Li ber hin daran we baş nekolaye. Li sê çar kursiyên li qadê nêrî. Parêzvan çûn rakirin. Tiştek ji ber çavên wî nediçû, berê xwe da metbexê. Hinekî li wan deran, pergala firaxan nêrî. Ji wir derket, berê xwe da dibistanê.

Her kesî cihê xwe girtibû. Di hundir de her milekî dibistanê rêzeke kursiyan hatibû danîn. Her kes wisa bêdeng di cihê xwe de rûniştibû. Lê kelecan pir bû. Milîtanên li Şamê tev hatibûn. Di rêza pêşiyê de milîtanên jin bûn. Rihanê devê xwe bir ber

guhê Rûkenê:

-Em çiqas bişans in. Em tevlî konferasa partiyê jî bûn. Dema min danezanên kongre û konferansan dixwendin, min xweziya xwe bi yên tevlî bûyîn dianî.

Rûken di nava diranên xwe de axivî:

-Hişş, dengê xwe kêm bike, kamera dikişîne wê dengê te bikeviyê.

Rûkenê nedixwest dîmenê wan ne birêkûpêk derkeve. Ji ber wê hem cilên xwe li xwe anîbûn, hem bi awayekî fermî rûniştibû. Di hundirê xwe de got, wê dîrok şahida vê rojê be ku ez di konferansa partiyê de bi Serokatiyê re me. Hinekî din jî xwe vena û serê xwe bilind kir. Pora xwe ya nû qusandî, bi şûn ve dabû. Li ala partiyê û ya artêşê yên li pêşberî xwe temaşe kir. Li ser qumaşekî sor jî bi xetên stûr “Konferansa 3. ya PKKê ya Neteweyî” nivîsîbû. Li raserî wê jî wêneyên şehîdên pêşeng hatibûn daleqandin. Li ser dîwêr jî nav bi nav wêneyên şehîdan hatibûn bicihkirin. Li ser maseyê dîwanê jî mîkrofonek û du alên ERNKê hatibûn danîn. Li piştê jî sê kursî hebûn.

Apo û çend milîtanên pê re ketin hundir. Bi ketina hundir re her kes rabû ser xwe. Dinya êdî xweş bû, pencereyên dibistanê vekirî bûn. Apo derbasî pişta meseyê dîwanê bû. Ji bilî dengê çîweçîwa çûkûn li ser darên hewşê, deng ji cihekî nedihat. Çavên xwe danîn ser hev. Her kes li benda axaftinê bû. Piştî rêzgirtin û pîrozkirnê dest bi axaftinê kir:

-Xebata me bi Konferansa 3. ya Neteweyî ber bi encamê ve diçe. Xebata me zivistanê kirî, di çarçoveyeke wisa teng de derbas nebûye. Hem pêvajo hat nirxandin, hem li ber ronahiya tecrûbeyên me yên borî, ji bo gihîştina armancê, me xebata xwe

kûrtir û berfirehtir kir. Kesayetên wisa di nava me de derketin, xebitîn ka wê çawa xebatê bin bixin. Eger serkeftin çêbe jî, ka wê çawa ji hev bixin. Ev kesayet ji mêtîngeriyê jî xirabtir e. Eger sebra me tinebûya, ev kes ne yên guhdarîkirinê ne jî.

Xebata sala borî hem erênî, hem neyînî ji her alî ve dihat nirxandin. Ew cara yekê bû wê konferans li wir çêbûya. Dibistanê rengê zanîngehekê û cihê şîroveyên felsefeyê dida. Yan jî gengê bajarekî piçûk. Qedera şoreşê dihat nîqaşkirin:

-Di dîroka partiya me de sala borî belkû mirov bi ti deman re qiyas neke. Di vê demê de em xebitîn ku rastiya xwe û aliyên wê yên xef mayîn derxin meydanê. Lewre kesên di nava şerekî wiha bêmerhemet de, bi awayekî bêmerhemet nêzîkî rastiya xwe dibin û mafê wê didinê.

Bi her gotina xwe re diçû demên borî û kêlî bi kêlî dianîn ber çavên xwe:

-Me derxist meydanê ku em ketina kûr û xurt, wendabûn, bêrûmetbûn û bêserûberbûnê qebûl nakin. Me pir diqet kir ku ti carî di xebata xwe de, bi peyvekê jî zorê nedin insanê xwe. Lê ev bû sedema sistbûna hina. Kesên hatîn nava me, me ti carî weke çawa hatîn qebûl nekirin. Yên hatîn dibe ku ji kolanan jî hatibin komkirin. Lê me bawer kir ku wê bikarin xwe biguherînin.

Li derve erkdarê rojê li nêzî derî, guhdarî dikir. Dema kontrola dora malê bû. Çû ser banê avayiyê, li derdor temaşe kir. Derdor aram û bêdeng bû. Lê di nava zeviyên li pişta dibistanê de çend kes dixebitîn. Carna jê li aliyê dibistanê dinêriyan. Lê dema çavên wan bi erkdar diketin, tavilê berê xwe dizîvirandin. Vê rewşa wan bala erkdar kişandibû. Hinekî li wan nêrî pişt re

daket çû cihê xwe. Dengê Apo bilind bû:

-Rewşa insan tê de û derbasbûyiyê wî çi dibe bila bibe, em natirsin ku binirxînin. Enceq bi wî awayî em bikarin mezinbûn û piçûkbûna wî derxin meydanê û fêm bikin. Lihevkirina bi insan re, herdem yek ji hunerên herî bingehî ye.

Erkdar li milê derî temaşe kir, komek milîtan nû derbasî dibistanê bûn. Siwar bilez ber bi wî ve çû:

-Ji zû ve dest pê kiriye?

-Rast e, lê ev heval ji kû hatine?

-Ji şevê din ve hatine, lê mixabin li cihekî mabûn, derng xeber gihîşt me.

-Serok nû dest bi xeberdanê kiriye.

Yên nû hatîn çar jin, deh xort bûn, di deriyê piştê re bê ku deng derkeve ketin hundir, li ser kursiyên ji wan re hatîn veqetandin rûniştin.

-Leşkerî, şer bi serê xwe ne tiştek in. Eger di emrê pêşketinekê de be, leşkerî bûyereke mezin e. Eger tu leşkerê şoreşeke nû bî, leşkerekî mezin î. Eger tu ji jiyaneke nû re rê vedikî, tu mezin î. Lê eger tu leşkerê pergaleke qediyayî bî, tu leşkerê herî xirab î.

Mijara leşkerê baş û xirab bala milîtanan tevan dikişand. Her kesî ji xwe re digot, gelo ez ji kîjan leşkeran im.

Xwest bala wan bikişîne ser kêmayiyên derketîn:

-Di nava partiya me de tiştên wisa gemar tên sepandin, ewqas xirabî kirin ku ne qabil e bên qebûlkirin. Ya rast hûn çîroka azadbûnê nizanin. Hina ji we hêviya xwe bi azadbûnê ve girê jî daye, lê rêbaza pêkanîna we pir xirab e. Gelê me avêtine derveyî dîrokê. Zanebûna wî nîne, ka ji bo çi û ji bo kê dijî

nizane. Ka dixwaze çawa bijî, di wir de jî hirs û armanca wî nîne. Ez tehemûla berpirsiyariya xwe dikim. Bi qasî aliyê wê yê baweriyê, dixebitim di aliyê zanebûnê de jî berpirsiyariya xwe pêk bînim.

Navbera nîvro bû. Her kes li derve bû, dingeding ji derdoran dihat. Yên negihatîn axaftina Apo ya destpêkê, agahî ji yên din digirtin. Ji bo ku xwarinê tev de bixwin, Apo gazî yên nû hatîn kir. Li dora mase rûniştin. Hem xwarin dixwarin, hem pirsa qadên jê hatîn ji wan dikir:

-Hûn gihîştine konferansa PKK'ê ev ji bo we şanseke mezin e. Ne hewce ye em niha dirêj biaxivin, me dixwest hûn di dema wê de werin, lê hûn dikarin agahiyan ji hevalan bigirin. Xwe ji bo piratîkeke serkeftî amade bikin.

Şervîn jî di nava komê de bû, rûyê wê qemer bûbû. Çavên wê ji dema hatî ve li ser Apo bûn. Dixwest guherînên di wê dema kin de çêbûyîn bibîne. Çawa ku nû hatibe dibistanê her tişt li ber çavên wê hatibû guhertin. Dibistanê bi awayekî fermî dest pê kiribû. Xebata qadê di navbera wan du salan de pir berfireh bûbû. Ji kêliya hatî ve ew ketibû ber çavên wê. Gelek fermandarên şer li qadê bûn. Berê Apo ket serê:

-Ev demek bû tu çûyî, niha tecrûbeya te çêbûye. Te dît, çawa ji min dûr dikevin, her kes li gorî xwe tevdigere. Te dît em çawa van kadroyan ava dikin, li wir çawa nêzîk dibin?

Şervînê bi kurtayî hem behs pratîka xwe, hem ya giştî kir.

Xwarin hatibû xwarin, çay hatibû vexwarin, êdî dema derbasbûna hundir bû. Piştî ku her kes ket hundir, Apo bi gavên hêdîka ber bi dibistanê ve çû. Li pêşiya wî gumgumokekê serê

xwe bilind kiribû, li derdora xwe dinêrî. Çend kêliyan lê nêrî. Gumgumok hêdî hêdî ber bi aliyê hewz ve çû.  Çawa nêzîkî avê bû, rengê xwe guhert. Gumgumoka berê gewr êdî şîn bû. Hinekî din lê temaşe kir. Ji ber avê nêzî giya bû. Bi ketina nava giyê re rengê xwe kesk kir. Nêzî çi dibû li gorî rengê wir wê jî rengê xwe diguhert. Bala wî hê li ser tevgerên wê bû. Hinekî berken bû: "Wê demê tu jî weke yên di nava me de, her cihê diçiyê li gorî wê rengê xwe diguherînî! Piştî ku wenda bû wî jî berê xwe da dibistanê, ket hundir. Silav da û bilez dest bi axaftina xwe kir:

-Eger gotinên siyasî û leşkerî bên gotin û pêwîstiyên wan pêk neyên, tişta hatî serê Sosyalîzma pêkhatî, -çawa ku piştî 70 salan roxiya- wê were serê me jî. Ihtimaleke mezin wê sedsala 21ê, bibe sedsala serrastkirina xirabiya emperyalîzmê di serî, ruh û çanda insan de afirandî.

Hinekî li derdora xwe nêrî dîsa axaftina xwe domand:

-Di nava şerê germ de belkû ji sedî 51 pirsgirêk dijmin be, lê dijminê esasî rewşa nava me û rastiya civakê ye. Şkandina dijmin têrê nake, armanca me afirandina hişmendiya dinyayeke nû ye. PKK bi qasî ku karê xirabkirinê ye, ewqas jî karê çêkirinê ye. Ji bo zindanê jî ev wisa ye. Madem te li zindanê li ber xwe daye, tiştên tu li serê ava bikî pir girîng in.

Hinekî pêş ve çû, xwest mijarê berfirehtir bike:

-Ji bo Sosyalîzmê pêvajoyeke nû ya teorîk vedibe. Em nikarin bi nirxandina sedsala 19an, nêzîkî Sosyalîzmê bibin. Bi jiberkirina nirxandin û teoriya Sosyalîzma sedsala 19an jî em nikarin tevbigerin.

Ji ber roxîna Yekîtiya Sovyetan weke her kesî, di serê milîtanên PKKê de jî fikar û nakokî çêbûbûn. Dixwest bi

hişmendiyeke nû nêzîk bibe:

-Emerîka dixebite dewleta Tirk rizgar bike. Almanya jî dixwaze rizgar bike. Em hewldana her duyan jî fêm dikin. Emerîka hê jî împeretoriya stratejiya navneteweyî ye. Tirkiye jî di nava vê împeretoriyê de cihekî girîng digire. Bi kurtayî divê em Emerîka -ku hêza herî mezin ya împeretoriya demê ye-, li ber çavan bigirin. Jixwe inkara wê qet nabe. Em pê re di nava têkiliyan de jî bin, emê bibînin, têkilî tinebin jî emê bibînin.

Ji ber ku mijar pir giran bû, hina bi baldarî guhdarî dikir, hina jê not digirtin.

-Bi şerê Kendavê re statûko ket tengayiyê. Kurdistan ket pêvajoyeke ku bikare ji vê rewşê sûdê bigire. Hema hema weke şerê cîhanê yê 3. e. Çawa ku di şerê cîhanê yê yekê de Şoreşa Mijdarê çêbû (şoreşa Cotmehê rastir e), çawa ku di şerê cîhanê yê 2. de, gelek şoreşên rizgariya neteweyî pêk hatin, Şerê Kendavê jî ji bo Kurdan derfeteke wisa da. Eger ne ji kêmayiyên me yên rêbaz û taktîk bûya di nava van çar salan de, derfetên şoreşa Kurdistanê derketibûn.

Rojhilata Navî li nava hev ketibû. Dixwest mijrê bi berfirehî veke. Berê xwe da milîtanan:

-Divê êdî hevalên me yên têkoşînê, ji gotinê, ji emir fêm bikin hebin. Kesên şer dikin li kû devera dinyayê evqas axatî, evqas xetayên taktîkî kirine. Fermandaran li kû evqas tenezûla tiştên wiha piçûk kiriye? Hûn dikarin mînakeke wê bidin?

Li saeta xwe nêrî. Xuya bû dema navberê ye. Bi gavên bilez ji dibistanê dereket, berê xwe da odeya jor.

Piştî ewqas axaftin û westan pêwîstî bi lîstina topê hebû. Qada lîstinê jî nû hatibû çêkirin. Piştî deh deqîqeyekî bi cilên

sporê yên şînê tarî di derî de xuya kir. Li qadê taximên voleybolê hatibûn amadekirin. Piştî ku taxima wî jê re hat gotin, di nîvê wan de sekinî. Lîstikê bikelecan dest pê kir. Topa jê re dihat, bi awayekî pir nerm dida hevalê xwe. Carna jê li lîstikavanan temaşe dikir. Milîtanên ciwan jî, yên bitemen jî di lîstikê de hebûn.

Yên ne di lîstikê de hê baştir tevgerên lîstikê dişopandin. Her kes çawa ku li fîlmekî temaşe bike wisa berê wan li qada topê bû. Bi serkeftina taxima Apo timî li çepikan dixistin. Şervîn li teniştê li qadê temaş dikir. Çavên wê li ser Apo bûn. Çawa ku bi dehê salan jê dûr ketibe wisa temaşe dikir. Hinekî li ser rojên borî hizirî. Di wê navê re Rûkenê silav dayê:

-Hevala Şervîn tu bi xêr hatî, me dîsa hev dît.

-Spas dikim, ez jî gelek kêfxweş im ku min hûn li vir dîtin.

Şervînê bi baldarî li tevgerên wê dinêrî. Di dilê xwe de got, vê hevalê li cem Serokatî xwe pêş xistiye. Êê, hatiye guhertin jî. Rûken diaxivî, wê jî guhdarî dikir. Pir kêfxweş dibû ku jin di aliyê teorî de xwe pêş bixin. Rûkenê hinekî şerm kir ku pir axiviye. Bi rûgeşî li çavên hevala xwe nêrî:

-Êê, hevala Şerîvn te çi kir çi ne kir?

Şervîn hinekî hizirî, di dilê xwe de got, jixwe çavkaniya pêşketina vir e. Xwe hinekî vegerand berê xwe da lîstikê, li Apo temaşe kir:

-Hevala min, em çi jî bikin talî wê li vir biencam bibe. Emê paşê pir biaxivin.

Dengê çepikan ji qada lîstikê bilind bû. Ji dengê çepikan û kêfxweşiya milîtanan, diyar bû ku taxima Apo bi ser ketiye. Şervînê li Apo û kêfxweşiya wî ya ji bo serkeftinê temaşe dikir.

Di nava xwêdanê de mabû, berê xwe da odeya xwe, yên din jî li derdorê belav bûn.

***

Li Elmanya heftê Adara 1994an, Doza PKKê ya li Dûsseldorfê biencam bûbû. Ji kadroyên PKKê Selahattin Erdem û Ali Haydar Kaytan beraet bûbûn, Hasan Hayrî Guler û Ali Aktaş jî bi cezayê Mûebedê hatibûn cezakirin. Ji sala 1989an ve di zindana Elmanya de bûn. Piştî berdanê bi deh rojan Selahattin Erdem û Ali Haydar Kaytan derbasî Sûriyê bûn.

Nozdehê meha Adarê saet pêncê sibê bû. Apo li hewşê spor dikir. Milîtanên jin û xort bi xwe re tevlî sporê kiribûn. Şêxo xwe dabû aliyekî. Car bi car di bin çavan re li wan dinêrî. Çavên Apo ketin serê:

-Were tevlî bibe, nabe tu li derve bimînî! Tu li cem min dimînî, dizanî divê ti kes li derve nemîne.

Çû ket rêza taliyê. Ew jî li gorî xwe dibeziya, lê şerm dikir ku bi ciwanan re dibeze. Bala Apo li ser bû:

-Şêxo, tu nikarî bibezî!

Şêxo di kelecanê de bû, bi gotina wî re hinekî din gavên xwe bilind kirin. Di dilê xwe de got, barê min wiha giran dibe. Lê kêfxweş im ku li cem Serok im.

Apo tevgerên sporê nîşanî milîtanan dikir. Wê sibê gelek kêfxweş bû. Piştî sporê xwe şûşt. Kemal li kêlekê bû:

-Kemal, ez kîjan gumlekî li xwe bikim? Wê îro du mêvanên me yên hêja bên.

Kemal berê xwe da gumlekan:

-Serokê min, hemû jî li te tên. Lê yên şîn pirtir li te tê.

-Temam, ezê îro yê şîn li xwe bikim.

Li eywanê taştê hatibû amadekirin. Her kes li dora mase rûnişt. Sêniya humisê li ber Apo bû, leymûnek kir qet guvaşt serê. Mast nêzî xwe kir. Li rêçala sêvan nêrî:

-Kemal, kê ev ji me re rêkiriye, pir xweş çêkirine.

-Serokê min, welatparêzan ji Cizîrê rêkiriye.

-Hûn dizanin, dema destpêkê em hatîn, roja înê bû, ez û Ethem hatin Şamê, em çûn mala Emer Eloş. Serê sibê zû gelek xwarin danîbûn ser sifreyê, zeyt û zehter, fol, humis, mekdos, lebnê, zeytûn, penîr, hêk û rêçala hêjîran rêz kiribûn. Min hemû rakirin rêçala hejîran tenê hişt. Min ji wan re got, ev besî me ye, yên din emê nîvro bixwin.

Hêdîka xwarin dixwar. Li yên li ser sifreyê tevan temaşe kir:

-Rihan tu çima naxwî, xwarina xwe rehet bixwe.

Piştî xwarinê ketin ser riya dibistanê. Kemal stiraneke kurdî danîbû ser. Apo di ber re dihizirî. Piştî qasekî gihîştin dibistanê, her kes di nava tevgerê de bû. Ji seyareyê daket, berê xwe da hewşê. Li nava hewşê temaşe kir. Lê dem bi dem li derî dinêriya. Li qada sporê milîtanan amadekariya merasimê dikir. Car bi car li saeta xwe dinêrî. Piştî çend kêliyan deriyê hewşê vebû, seyare ket hundir. Bilez ber bi seyareyê ve çû. Kesên li benda wan bilez ji seyareyê daketin. Biken û bi rûyekî xweş ber bi wan ve çû:

-Hûn bi xêr hatine. Hevalên min hatin, hûn bi xêr hatine! Çirûsk, Bager, taliyê hûn hatin.

Çirûsk, bi rûyê xwe yê gewr û çavên xwe yên kesper lê

dinêrî. Ji kêfa gotin ji devê wî dernediketin. Bikelecan hem himbêz kirin. Qederekî wisa man. Çavên xwe girtin, rojên xwe yên borî hemû di wê kêliyê de anîn bîra xwe. Piştî Çirûsk, wî û Bager hev himbêz kirin. Di rûyê her duyan de jî kêliyên xeyal dikirin, pêk hatibûn. Destê xwe danî ser milê her duyan ber bi qadê ve çûn. Her kesî bi rûyekî xweş li wan temaşe dikir. Li pêşberî merasimê sekinîn silav dan. Li kêleka wan meşiya heta yek bi yek silav dan hemûyan. Pişt re li pêşberî wan sekinîn. Apo careke din li her duyan nêrî:

-Em ji zû ve li benda vê kêliyê bûn.

Her ku diaxivî kêliyên destpêka tevgerê dianîn bîra xwe. Pora Bager ji aliyê pêş ve hem pirtir weşiyabû, hem tayên spî ketibûnê. Ji zeîfbûn difna wî dirêjtir xuya dikir. Her du jî bêdeng bûn. Çavên Bager ketin ser wêneyê Mezlum. Rojên li Amedê, ku bername û rêziknameya partiyê amade dikirin anîn bîra xwe. Berê xwe da dibistanê. Di hundirê xwe de got, xwezî hevalên me hemûyan ev roj bidîtan.

Axaftina di merasimê de qediyabû (çi axaftin buye, qet behsa wê nekiriye) . Li ser banê dibistanê konê kêfxweşiyê hatibû vedan. Bager û Çirûsk jî bi milîtanan re suhbet dikirin. Derketina wan ji zindana Elmanya û hatina wan ya dibistanê kêfxweşiyeke mezin li dibistanê belav kiribû. Apo di pencereyê re li şahiya li dibistanê temaşe dikir. Rojên girîng bûn. Hem Konferansa PKKê pêk hatibû, hem du pêşengên destpêkê ji zindanê rizgar bûbûn. Piştî kêfxweşî û suhebetê, her du çûn jorê cem Apo tev de rûniştin. Apo çend kêliyan li wan temaşe kir:

-Ha Çirûsk, we pêngavên me dişopandin?

-Serokê min, carna wisa dibû, min digot li şûna wiha

derkevim pêşberî Serok, bikevim binê erdê baştir e.

-Ew asteke giştî ya gel e. Ez nikarim destûra jiyaneke wisa bidim. Weke din hûn dikarin çi bêjin?

-Serokê min, me Mihri Belli dît. Hê wê demê ji me re digot, hûn Serok fêm nakin. Mînak, di mijara jinê de nêrînên wî pir kûr in, lê hûn tênagihîjin.

-Rast e, bêguman taybetiyên egîdî û qehremaniyê hene. Mijarên wiha em pêş dixin, lê naxwazin bibînin. Yalçin Kuçuk jî ji bo rêbaza me digot, serdema qehremaniya Yunanan tîne bîra min.

-Serokê min, eger serdem cuda bûna wê ev çalakî weke bûyereke îlahî nîşan bidan.

Apo bi tevgerên xwe gotinên wî erê kirin:

-Rast e. Berê wek pêxemberiyê dinirxandin, bêguman rewşa pêxemberan pir baş fêm dikim.

Çirûsk dixwest rewşê bi gotineke kurt û cewher pênase bike:

-Mînak rewşa Îsa.

-Bêguman rêbaza me rêbaza pêxemberan e. Ji rewşên Rojhilata Navî yên wiha re tê gotin, serdemên pêxemberiyê. Ya me jî bûyereke wisa ye.

Car bi car li wan temaşe dikir:

-Me nexwest we zêde biwestînin, lê hûn pir westiyan. We PKK nas kir. Em çi bikin, ev kar pêwîstiyên hevaltiyê ne. Eger hûn tengav bibin ezê xemgîn bibim. Nizanim ji bo ku we zêdetir nexim tengiyê em dikarin çi bikin? Bêguman azadiya me ya navxweyî bisînor e. Ev jî ne bi xwesteka me çûbûye. Ango her tiştî ji me nexwazin.

Bager di wê ferqê de bû ku tevger pir berfireh bûye, ji ber wê Apo dixwaze her kes wezifeya xwe bi awayekî baş bi cih bîne.

-Bager, gelo, hin çavdêriyên te çêbûn? Pêwîst e hûn min çawa nas bikin? Tu ji berê ve min nas dikî û mirovekî biaqil î. Ez çi me, kî me, gelo çima vî miletî evqas mijûl dikim?

-Serokê min, jixwe her kes li ser vê mijarê dihizire.

Bersiva Bager bala wî kişand:

-Gelo wisa ye, mereq dikin?

-Rast e serokê min.

Apo dixwest nêrînên derve baş fêm bike:

-Kesên biyanî jî ne wisa? Hema hema weke bûyereke xwezayî. Jixwe em bûyereke xwezayî ne. Dibêjin bûyereke civakî, fenomen ne wisa? Tu dibêjî ez vê rewşa xwe bidomînim? Em rêbazê hinekî din jî tevlîhev bikin, li nava hev bidin û pêş bixin?

-Serokê min, biyanî herî zêde serê xwe li ser aliyê wê yê siyasî diêşînin.

Apo rabû çû ber pencereyê, hinekî li derve nêrî dîsa hat li cihê xwe rûnişt:

-Rast e. Ez texmîn dikim her ku biçe wê serê xwe pirtir biêşînin. Em dixwazin rewşeke wisa biafirînin ku hesab ji wan bixwazin. Wisa xuya dike vê his dikin. Bi taybetî Elman, ne wisa?

Ma li benda bersiva wan. Lê axaftina xwe domand:

-Gelo hûn jî hinekî rolê Hesbê Truva lîstin? (ifade wateyê tam nade, lewaz e) Ango we di keleha Elmanan de çi kir? Her bijîn. Ew zindana Elmanan, yan jî keleha wan, ma ne rastiya

Elmanya ye? We hinekî nas kirin? Ez jî mereq dikim, eger hûn hê weke berê bin, hûn fêrî tiştekî nebûne. Çi ne ev Elman? Gelo dixwazin çi ji mirovan bikin, we ruhê vê mijarê zetim kir?

Bager xwe ji vê pirsê re amade kiribû, bi awayekî rehet bersiv da:

-Sîstema Elmanya sîstemeke cuda ye.

-Marks, Engels wan jî hê wê demê dixwest derbarê ruhê Elmanan de tiştna bêjin. Sîstem li aliyekî, bi rastî hin ruhên wan yên harbûnê hene.

-Serokê min, ji ber sîstema wan e.

-Li gorî min ruhekî weke yê Elmanya ku dixwazin dinyayê daqurtînin pir kêm tê dîtin.

Tesbîtên wî bala wan pir dikişandin, her duyan jî xwe ji van pirsan re amade kiribû û bi salan bû dixwestin wê sîstemê binasin. Bager bi bisteyî bersiv da:

-Ji ber ku di her du şerên cîhanê de şkestine, niha hestê xwepiçûkbûnê jî çêbûye. Ew ruhê kevin dişibihe rewşa li Tirkiyê.

-Rast e, dibe ku wisa be.

-Ruhekî êrîşkar e, weke din kesayeta wan pir tewş e.

-Çirûsk, te ji gelek aliyan ve karî hin meylên wan bibînî?

-Serokê min, neteweyeke pir çavbirçî û xwere ye.

-Çavbirçî û xwere ye ne wisa? Wê rewşa wan bala min jî kişandibû. Dema hatîn vir min ji wan re gotibû cenawirên xwarinê.

-Hema hema di her milî de wisa ne. Dema ji wan tê kêmkirin, har dibin. Neteweyeke wisa ye.

-Rast e, wisa ne.

***

Ew demek bû navber dabûn nîqaşên xwe. Ji dibistanê ber bi malê ve çûn. Bîna epraxan bi ser metbexê ketibû. Şêxo rahişt beroşê da vala bike. Apo li pişt sekinîbû:

-Bîne ser sifreyê emê li wir vala bikin. Rahişt şûşeya avê bi xwe re bir ser sifreyê. Germiya bacanan jî hatibû çêkirin. Îsot, tirûzî, kelem û xiyarê kesidandî, li ber hatibûn danîn. Ji bo venêrînê Kemal xwest devê beroşê veke, lê berî wî Apo devê wê vekir. Bêhna wê li xweşê wî çûbû:

-Şêxo, ev xwarin e ha!

Destpêkê sêniya Çirûsk û Bager dagirtin. Her yekî şûşeya dew jî danî berê. Firîk jî xist sêniyan.

Piştî xwarinê çay ji wan re anîn. Lê suhbeta wan jî dewam dikir. Li saeta xwe nêrî:

-Em biçin bi hevalan re basketbol bilîzin. Tev de derkin çûn qada lîstikê. Ew demeke dirêj bû Çirûsk û Bager bi hevalan re nelîstibûn. Bager bilez tevdigeriya. Çirûsk dema digihîşt cem Apo di cihê xwe de disekinî. Nedixwest topê jê bistîne.

Piştî lîstikê Apo çû pirtîkxaneyê, Çirûsk û Bager jî li eywanê rûniştin. Çirûsk kûr kûr dihizirî. Ev taybetiyeke wî bû, lê dema diaxivî jî mirov digot qey feylesofeke e. Bager jî bi zanyarî, şîrovekarî, tesbît û nêrînên xwe yên xurt û radîkal dihat nasîn. Van taybetiyên wan hev temam dikirin. Çavên Bager weke yên kesekî westiyayî xuya dikirin:

-Hevalê Çirûsk, tu Serok dibînî, jiyana xwe hemû kiriye perwerde.

Çirûsk hinekî sekinî:

-Ev e, ya jê re dibêjin atmosfera perwerdeyê. Cihê lê xuliqkar e.

-Nêzîkbûna Serokatiyê weke ya me ne li gorî hestan e. Pir bi zanistî tevdigere.

-Bi rengê jinê jiyaneke têkûz ava kiriye. Te dît çiqas tevlîbûn çêbûye. Her tiştê Serok bi hevalan re ye. Bi her tiştê wan re eleqedar dibe.

Piştî çend kêliyan, Çirûsk bi awirên kûr li Bager nêrî:

-Serok qet ranaweste. Em îro hatine me hê vala nedîtiye û berê jî wisa bû, lê niha kar berfireh bûye.

Bager ji germeke hindik jî hes nedikir, rabû ser xwe:

-Derve xweş e, rabe em hinekî bimeşin.

Roja din piştî taştê, bi Apo re çûn dibistanê. Kêfa wan ji kombûn û tevgera milîtanan ya li qadê re pir dihat. Saeta dersê bû, her kes derbasî hundir dibû. Erkdarê rojê jî tekmîl dida. Piştî tekmîlê Apo ket hundir, ew jî çûn li rêza pêşî rûniştin. Carna li wêneyên şehîdan yên bi dîwêr ve daleqandî dinêrîn. Apo geh li wann dinêriya, geh li milîtanên din:

-Me xwe daniye meydanê. Hûn ji me çi dixwazin? Me xwest ruhekî afrîneriyê yê herî xurt bidin. Me xwest hirsa serkeftinê bidin we û mirovên berpirs derxin meydanê. Gelo we çiqas girt?

Hinekî ma bêdeng. Bêguman ne li benda bersivê bû:

-Afirandina hêzê, afirandina bedewiyê, pêşxistina jiyanê û hirsa we ya azadiyê pir lewaz e. Tiştên ez dixwazim bidim kirin, hişmendî û têgihîştina azadiyê ye. Bê fetlûfît, bê derew ka em çi ne, ez dixwazim ew derkeve medanê.

Her kesî ji xwe re digot, Serok çawa ku ji min re bêje. Çavên xwe girtin, axaftina xwe domand:

-Lewre yên derveyî me ewqas em kirine derewker û durû ku, ji bo min rizgariya ji wê rewşê bi serê xwe şoreş e. Çîroka me wiha diajo diçe. Gelo li derve çawa tê fêmkirin?

Ev gotin ji her duyan re hatibû gotin:

-Me hûn jî xistin zorê. Em nebêjin zor, em we bi gelek rewşan re tînin hemberî hev. Rêbaza me jî wisa ye. Gelo ka em çawa û bi çi ve mijûl in, mereq dikin, yan jî çawa dibînin? Derfetên heval li ser bihizirin çêbûn? Di rewşeke wisa de hinekî zehmet e, lê hûn bi salan bi serê xwe di zindanê de mane, gelo hin fikrên we pêş ketine? Ez her roj ji her kesî re behsa jiyana xwe dikim, pêwîst bû heta niha hûn min nas bikin.

Berê xwe da Çirûsk û Bager. Bi nêrîna wî re rabûn ser xwe. Lê çavên wî li ser Çirûsk bûn:

Weke din li ser sîstema Elmanan hûn çi dibêjin?

-Pir dewletperst in, serokê min.

-Pir dewletperstin ha?

-Heman demê bi awayekî neteweyî bi dewleta xwe ve pir girêdayî ne.

-Gelo Tirkan ji Elmanan gelek tişt girtine, yan Elmanan ji Tirkan girtine?

Bager dixwest hê baştir sîstem bê vekirin:

-Ozal ji bo wan digot, bûne miletekî tirsonek. Ev tê wateya ku pir nêzîkî hev in.

-Ji min ve wisa xuya dike ku Elman çawa ku gefan li nesla mirovan bixwin. Min ji wan ev xeter dît. Bêguman hûn ketin tengayiyê. Lê di fêmkirinê de min hêza xwe pir pêş xistiye, ne

wisa?

Bager bi gotinên xwe re pratîka jiyane dianî ber çavên xwe:

-Rast e serokê min. Hêzên navneteweyî, bi taybetî sîstema Elmanya dixwaze pêşketina li Kurdistanê asteng bike.

Çirûsk dixwest li ser nêrîna Bager temam bike:

-Serokê min, dema li hemberî cewherê sîstema xwe tevgerekê bibînin, pir êrîşkar dibin. Bi cezayekî pir giran wan ceza dikin. Di nêrînên we de xeterên pir mezin dibînin û nirxandinên we ji nêz ve dişopînin.

Li pêşberî wan diçû dihat. Piştî çend kêliyan di cihê xwe de sekinî:

-Li ser nêrînên min lêkolînê dikin?

Çirûsk dixwest mijarê berfireh bike:

-Serokê min, rojnameya Serxwebûn ji destê dozgeran dernakeve.

-Werdigerînin?

-Serokê min, ez vê ji bo dozgeran tenê nabêjim.

-Ango sîstema Elmanan bi awayekî birêkûpêk em xistine binê lêkolînê. Rast e, ez jî di wê baweriyê de me. Elmanan di vê mijarê de bi aqilê Tirkiyê hereket kir, yan jî li hev kirin. Min ew xistin davikên xwe. Ez texmîn dikim ferq kirin ku lîstika Apo ye.

Vê carê berê xwe da Bager:

-Serokê min, dereng ferq kirin. Min ji wan re got, hûn xwe dixapînin.

Apo li çirûsk temaşe kir

-Mînak plan kiribûn ka wê çawa Çirûsk bixin.

-Rast e serokê min. Lê rêbazên wan pir bêbandor bûn. Ez bi

wan rêbazên wan neketim. Weke din ji partiyê ditirsin. Bi taybetî ji Serokatiyê pir ditirsin. Dibêjin, gelo wê bi ser me de werin.

-Me Elman her tim di nava wê psîkolojiyê de girtin. Me ev bi zanebûn kir. Tu çi dibêjî Çirûsk, li hemberî min tu qet hêrs nebûyî, ne wisa?

Piştî diyalogeke dirêj navbera nîvro hat dayîn.

Memed û du milîtan ketin hewşa dibistanê, ji cem bijîşk dihatin. Tekmîla xwe dan erkdarê rojê. Bager û Çirûsk çûn nava koma milîtanan. Apo ber bi Memed wan ve hat. Silav da wan pirsa rewşa wan û çûna wan ya bijîşk kir:

-Hûn min dibînin, ez karê dinyayê dikim. Di heman demê de bi we re mijûl dibim. Ji sibê ve em dersê didin. Lê ferqa min û we ez xwe birêxistin dikim. Ji ber wê yekî weke min ti carî nakeve.

Hinekî pêş ve çû, berê xwe da odeya xwe. Çend mêvan ketin hewşê. Erkdarê rojê ew birin. Piştî mêvan çûn, Apo gazî Memed kir:

-Memed, vê seyareya me ya xirabûyî, çêke, wê lazim bibe.

-Temam serokê min îro ezê bibim.

Memed bilez haziriya birina seyareyê kir. Gazî Çirûsk û Bager kir çûn jorê. Çend saet derbas bûn, hê diaxivîn. Çend rapor dan destê her duyan. Wan dest bi xwendina raporan kir, ew jî derket hewşê. Memed jî seyare anî li hundir bi cih kir. Kêfa wî bi dîtina seyareya çêbûyî re hat:

-Memed nehêle ti kes vê seyareyê derxe, wê lazim bibe. Bila timî hazir be.

Careke din vegeriya çû eywanê. Notyên jê re hatîn

derxistin, dest bi xwendina wan kir.

Memed ji wir dûr ket. Derê hewşê girt, dîsa vegeriya qada dibistanê. Di dilê xwe de got, Serok çi bixwaze divê bibe. Çû ber darekê sekinî. Bala xwe da tevgerên milîtanan. Dîmenê pêşwaziya Apo ji her du hevalên xwe re kirî, bi wê kelecana li dibistanê belav kirî hizirî. Hinek derbas bû, erkdar bi lez hat cem:

-Serokatî gazî te dike.

Bilez çû hewşa din. Apo, Bager û Çirûsk li ber cihê kevokan sekinîbûn. Kevok nîşanî wan dikirin, berê xwe da Memed:

-Biçe wê seyareyêê hazir bike emê biçin malê.

Di nava çend kêliyan de seyare amade bûbû. Ew li pêşiyê de rûnişt, Çirûsk û Bager jî li ser kursiyên paş. Ber bi malê ve çûn. Bi gihîştina malê re çend tiştên ji bo çapemeniyê dan destê Memed:

-Van bide hevalên çapemeniyê ew dizanin ka wê çi bikin.

Wî jî bilez berê xwe da dibistanê.

***

Saet heft û nîvê sibê bû. Li her deverê Newroz dihat pîrozkirin. Apo pantolonekî leşkerî û kenzeyekî rîsê leşkerî li xwe kiribû, gumlekê di bin kenze de jî, sola di piyê wî de jî leşkerî bûn. Berê wî li dibistana Kurdî ya li Sehnayê bû. Di seyareyê de li ser peyama wê rojê dihizirî. Siwar seyare diajot. Kemal jî bi wan re bû. Hem zêhnê wî hem çavên wî li ser Apo bûn. Pir kêfxweş xuya dikir. Ew demek bû hatibû wir. Carekê bi seyareyê Apo heta malê biribû, lê hê jî nizanî ka wê biçe kîjan

xebatê. Kûr dihizirî, di dilê xwe de got, min bawer nedikir evqas nêzî Serokatiyê bibim.

Zû gihîştin dibistanê. Nobedaran hê ji dûr ve seyare nas kir. Bilez derî vekirin. Seyare ket hewşê. Riya di nîvê hewşê re derbas dibû her du aliyên wê dar bûn. Şaxên her du aliyan diketin nava hev. Avayiyeke duqat di nîvê wê de bû. Xaniyekî pir bedew bû; hem serên penceryên qata jêrê, hem yên jorê bi awayê kevanan hatibûn lêkirin. Li qata jêrê jî du aliyên xanî bi stûnûn serên wan weke kevanan hatibûn çêkirin.

Piştî ku ji seyareyê daketin, li Kemal nêrî:

-Kemal, te perwerdeya xwe jî qedand, êdî emê bi hev re bin. Tuyê bibînî jiyana me tev perwerde ye. Riyan baş nas bike, jixwe tu li welatê Ereban mayî, tu bi zimanê Erebî jî baş dizanî.

Ew demek bû Kemal û hemsera xwe tevlî rêxistinê bûbûn. Dîtina perwerdeya siyasî û leşerî, çûna cem Apo û mayîna li cem ji bo wî, tev weke xewnekê bûn. Digel ku pê re diaxivî jî ji ber kelecanê tenê gotinên wî erê dikirin. Çawa ku di xewnekê de be. Lê zû bi xwe ve hat:

-Partî çawa guncaw bibîne, ez amade me serokê min.

Li milekî hewşê jî cihê kevokan hetibû çêkirin. Ber bi wir ve çûn.

Li qada topê bi dehan milîtanên jin û mêr di merasimê de bûn. Li pêşberî wan sekinî, silav da. Li pişt kursiyê axaftinê her sê al û wêneyên sembolên Newrozê Mezlum, Rahşan û Zekiye hatibûn daleqandin. Piştî ku hinekî li yên di merasimê de nêrî, dest biaxaftinê kir:

-Newroz rengînî û ronahiya jiyanê ye. Roja biryara jiyan û hebûnê ye. Rabûna gelê me ye. Cejneke berî tevayiya cejnan e.

Bi hezarê salan e mirov pîroz dikin û cejneke xwezayê ye. Vê cejna azadiyê ku li Kurdistanê dest pê kiriye û gav bi gav agirê wê li Mezopotamya belav bûye, li gelê me û gelên Rojhilata Navî pîroz dikim.

Yên li dibistanê gelekan ji wan sembola Newrozê kesk, sor û zer bi xwe ve kiribû. Dema çavê wî bi wan rengan diket kêfa wî xweştir dibû:

-Cejneke li hemberî zordariyê ye. Kawayê Hesinkar yê li hemberî Dehak serî rakirî, sembola jiyana nû û azadiyê ye. Gelê me jiyana xwe bi agirê Newrozê watedar dike.

Bi şûn xwe ve li wêneyên sembolên Newrozê nêrî:

-Ev newroza Zekiya Alkan e, digot, agirê newrozê bi canê insanan geştir dibe. Ev serhildaneke mezin e. Mezlum jî li zindana Amedê xwe kir qurban. Ew jî berxwedaneke pir mezin e. Ev şehadet pir mezin û bi armanc in. Van şehîdan tirsa mirinê şkand. Min jê cesaret girt. Di serhildanên îsal de jî me şehîd dan,

Bi ser xwe re li asîman nêrî, geh dibû ewr, geh sahî. Lê rojeke xweş bû:

-Sala 1993'yan Ozal dixwest gavekê biavêje. Ez nabêjim mir, hat kuştin. Ji bo gelek gavan, me xwe hazir kiribû. Lê nexwestin gaveke aştiyê biavêj. Riya me ya 1993yan ya herî rast bû. Di ti felsefe û îdeolojiyan de jiyaneke bê azadî nabe.

Li pişta mase hinekî çû hat, pişt re li yên pêşberî xwe nêrî:

-Divê Kurdistaniyên li derveyî welat jî biryara azadiyê bidin. Divê em ji bo axa xwe bijîn, gelê Kurd biryara azadiyê bide. Biryara herî zêde me bihêz bike ev e. Careke din Newrozê li we hemûyan piroz dikim.

Di nava çepikan de ji cihê axaftinê dûr ket. Heta ku çû

hewşa din hê jî milîtanan li çepikan dida. Yekser berê xwe da cihê kevokan yê bi qermîtên sor hatî çêkirin. Li nobedar vegeriya:

-We zadik nedaye wan, ne?

-Na serokê min, me nedaye.

-Baş e.

Çû di nava wan de sekinî. Ji her rengî kevok hebûn. Bala xwe da hêlînên wan. Kevokên wî yên li gund hatin bîrê. Hin zadik xist destê xwe ber bi wan ve bir. Pişt re li dora xwe reşand. Kevok tev li zadikê reşandî kom bûn. Yek bi yek li wan nerî, xwest tevan nas bike. Careke din zadik kir kefa destê xwe. Kevokeke spî û gelek xweşik li ser milê wî danî. Hêdîka berê xwe vegerand, lê temaşe kir. Kêfa wî gelek ji wan re dihat. Sembola bedewî û aştiyê didîtin. Kevokê zadikê di destê wî de nexwar, ji ser milê wî firiya. Li bedewiya kevokan nêrî, rojê jî xwe ji asîman tîrêjên xwe berdabûn ser erdê. Ew roj ji bo wî gelek biwate bû. Dîmenên serhildanên Newrozê hemû dihatin ber çavên wî. Dizanî ku Kurd tev wê rojê li her derî pîrozbayiya newrozê dikin. Berê xwe da nobedar:

-Bêje hevalan bila dest bi moralê xwe bikin.

Dîsa yek bi yek li hêlînên wan temaşe kir. Hin hêlîn bi destê xwe rast kirin. Di wê navê re kevokeke reş danî ser destê wî. Qasekî lê temaşe kir. Di dilê xwe de got, gelo wê xeberek ji me re bê? Îro roja Kurdan e, divê gelek xeber bên. Ji bo ku nefirin, bi gavên hêdîka ji wan dûr ket, çû odeya xwe ya li qata duduyan.

Li ber pencereyê li qada dibistanê nêrî, li tevgera milîtanan temaşe kir. Ji serekî heta serê din milîtanan destên hev girtibûn direqisîn. Govendeke pir xweş gerandibûn. Carna qurmilo, carna

bablekan, carna jî ez Xelef im digotin. Pir bikêf li wan temaşe dikir.

Di wê navê re denêg zengilê telefonê hat. Bilez rakir. Bê ku tişekî bêje guhdarî dikir. Carna jê bi gotina “erê” bersiv dida. Telefon girt, dîsa çû ber pencereyê.

Li dibistanê ew roj bi şahiyê derbas bû. Carna jê ji bo Newrozê li tv'yan temaşe dikir. Lewre her sal şehîdên Newrozê çêdibûn. Di dîmenan de wêneyên Mezlum, Zekiya û Rahşan li ba dibûn. Navê Apo û PKKê, li her derê di destê gel de bûn. Newrozên salên borî anîn ber çavên xwe. Durişmên “PKK Gel e, Gel Em In” di guhên wî de olan didan. Biryara azadiyê hatibû dayîn. Êdî gel mirin qebûl nedikir. Di tv'yan de ji her deverê dîmen didan. Bi taybetî Botan bûbû qada biryar û serhildanê.

Carna jê ji Ewropa dîmen didan. Du keçên Kurd li bajarekî Elmanya li ber çemê Renê bi hev re agir berdabûn bedenên xwe. Wêneyên her du qehremanên bûyîn Newroz ji ser ekranên tv'yan nediçûn. Di cihê xwe de sekinîbû, her du destên xwe xitibûn teniştên xwe û bê ku xwe bilivîne li wêneyan temaşe dikir. Di hişê wî de hevok li dû hev dihatin: “Ev doz fireh û mezin dibe. Ev doz xwe li deriyê cîhanê dixe. Li hemberî siyaseta çewsandin û tinekirnê Kurdan dengê xwe bilind kiriye.

Heta derengê şevê ji ber tv ranebû. Piştî ku nûçe neman, derbasî odeya xwe bû rûnişt. Durişmên wê rojê di guhên wî de dubare dibûn. Lê xala herî zêde dihizirand çalakiya her du keçên Kurd bû. Serê xwe bi jêr û jor ve dibir dianî: “Mezlum li hemberî hovîtiyê, Zekiye li hemberî koletiyê, Rahşan li hemberî ketxwariyê bûn Newroz. Bêrîvan û Ronahî jî dengê şoreşê gihandin cîhanê.

Bêrîvan û Ronahî berî ku xwe bişewitînin her yekê li ser çalakiya ku wê bike nameyek nivîsîbû. Bi hev re biryar dabûn û bi hev re çalakî kiribûn. Lê hê name neketibûn destê wî. Serê sibê bû. Ji arşîvê raporeke Ronahî ya berê nivîsî derxist. Heta dawiyê xwend. Raporê pir bandor lê kiribû. Rabû ser xwe berê xwe da dibistanê. Milîtan tev di hundir de bûn. Dema dîwan nediçû, dizaniyan ku wê Apo wê rojê dersê bide. Destpêkê çû cem kevokan. Qederekî li wan meyze kir. Erkdarê rojê jî li nêz sekinîbû. Ji cem wan çû li cem erkdar sekinî:

-Heval hemû hatine?

-Rast e serokê min.

-Divê ti kes li derve nemîne.

Bilez ber bi derî ve çû ket hundir. Pêvajoya konferansê derbas bûbû, ya Newrozê dest pê kiribû. Her kesî ferq dikir ku di nava hizrekî kûr de ye. Wî jî kêliyek ji dema xwe vala derbas nedikir; yan di dersan de bû, yan roportaj bûn, yan xwendina raporan bû, yan axaftina bi milîtanan re bû. Li pişta mase hinekî sekinî. Weke her car çavên xwe danîn ser hev:

-Ev der firsendeke mezin e. Divê mirov xwe piçûk nebîne, ji rastiyê dûr nekeve û xwe nexapîne. Bi jiyana partiyê mirov dikare mezin bibe, bi ser bikeve. Em niha di cîhanê de deng vedidin.

Çavên wî ketin ser milîtanên jin. Hemû di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Ez ecêb dimînim, çima hûn me fêm nakin? Bi taybetî keçên ciwan yên weke we çima ji me fêm nakin?

Her kesî ew pirs dianî ser xwe. Li çavên wan temaşe kir. Di hundirê xwe de got, ez her roj hêza jinê pirtir nas dikim. Çawa

ku xwe noqî zemanekî din bike, dixwest yên rûniştî jî pê re xwe berdin nava zeman:

-Di newroza îsal de jî hevriyên me Ronahî û Bêrîvanê qehremaniyeke mezin kirin. Bi taybetî Ronahî em baş fêm kiribûn. Jixwe me ev di rapora wê de jî dît. Di raporeke xwe de wiha dibêje: *"Civîna çapemeniyê ya 2. ya li ser agirbestê pir bandor li min kir. Tevî ku hûn vaqas derfetan diafirînin û ji bo pêşketina jinan destekê didin, di nava me de hê jî yeka di wê astê de nîne. Her ku partiyê nas dikim pirtir pê ve têm girêdan."*

Xalên girîng yên di raporê de tev xwendin, rapor xist berîka xwe:

-Riya jiyandina bîranîna wê, di gihîştina hêza têgihîştinê û disiplîna jiyaneke saxlem re derbas dibe. Dibe ku hin ji we bixwazin bibin layîqî wê.

Destê xwe ber bi wêneyên daleqandî ve dirêj kir:

-Li van binêrin, fêr bibin û rêzdar bin. Lewre ev nirxên mezin in. Eger azadî hêsan bûya, wan ev rê nediceriband.

Hin hevokên di raporê de jî ji ber kiribûn:

-Hevrê Ronahî, di rapora xwe de dibêje, *"Serokatî giyan û can dide, lê ya girîng pêkanîna wê di jiyanê de ye.* Vê bi çalakiya xw pêk tînin. Ev bûyereke mezin e. Eger hûn jî hinekî durist bin,  hûnê wêrekî û fedakariya hûn dibêjin bibînin û fêm bikin.

Hinekî sekinî:

-Eger ev çalakî li ser navê me tên kirin, em jî neçar in rêzdar bin. Hûn çiqas hatibin xistin,  çiqas xafil bin, bibin, jiyana wan ji bo we fermana herî mezin e. Eger hûn endamên artêşa egîdan bin, hûnê li gorî wê bijîn. Hûn dibêjin em dixwazin werin

ARGK'ê.

Destê xwe ber bi wêneyên şehîdan yên daleqandî ve kir:

-Ev serleşkerên vê rê ne.

Heta nîvro axaftina wî dewam kir.

Piştî dersê derket qata duduyan. Wextê xwarinê bû, lê hê hazir nebûbû. Ber bi pencereyê ve çû. Li tevgera milîtanan temaşe kir. Lê hê di hişê wî de şehîdbûna her du jinên ciwan hebû. Xwe di lêpirsînê re derbas dikir. Di dilê xwe de got, divê em bibin layîqî van şehîdan.

Di wê navê re nobedar ket hundir:

-Serokê min, dostekî ji Şamê dixwaze we bibîne. Dibêje Serokatiyê gotiye tu kengê bixwazî dikarî bêyî vir.

-Temam bila bê.

Piştî çend kêliyan yekî bi bedlekî şînê tarî di dêrî de xuya kir. Yekî çil salî û zirav û dirêj bû. pora xwe jî di milekî de şeh kiribû. Berçavkek jî li ber çavên wî bû. Bi bisteyî ket hundir. Apo nas kir, ber ve çû. Hev himbêz kirin. Çawa ku dilê wî şkestibe, rengê mêvan wisa xuya dikir:

-Serokê min, milîtanan nehişt ez demanceya xwe derbasî hundir bikim.

Apo keniya, berê xwe da nobedaran:

-Ev cîranê me ye, Bavê Rêzan e. Kengê bixwaze divê hûn derbas bikin.

Kêfa Bavê Rêzan hatibû. Bi awayekî jixwebawer rûnişt:

-Serokê min, Newroz gelek xweş derbas bû. Li Şamê jî tevlîbûn pir bû. Bername jî baş bû. Hin astengî hebûn, lê ne girîng e. Keçên me yên qehereman xwe li Ewropoa dişewitînin. Bila em jî di rojeke wiha de bên girtin, heta bên kuştin. Ma em ji

wan çêtir in?

-Tu rast dibêjî, keçên ciwan li ber çemê avê agir bi canê xwe dixin, îradeya xwe nîşanî cîhanê dikin. Ez bi xwe jî di xizmeta wan de me. Gelê me êdî li her derê rabûye. Dibe ku li pêşiya me şerekî giran jî hebe, dibe ku firsendên çareseriyê jî derkevin! Ev sala man û nemanê ye. Niha hukumeteke faşîst li ser hukum e. Demirel, Çiler û Dogan Gurêş. Divê em dijminê xwe piçûk nebînin. Dibêjin emê biharê wan biqedînin. Derveyî berxwedanê tiştek nîne. Jê re aqil, ruh û zanebûn pêwîst in.

Bavê Rêzan, di serê wî de hin pirsên din hebûn:

-Serokê min, ma we nikariya Ferhad di destê xwe de bigirin?

Qermîçek ketin eniya Apo:

-Destpêkê jî Ferhad şivan bû. Min dixwest şiyar bikim, lê diyar e ku naxwaze xwe ji şivantiyê rizgar bike. Vegeriya şivantiya xwe û heta xiyanetê çû.

Bavê Rêzan dixwest mijarên gel di nava xwe de diaxive bipirse:

-Serokê min ma te gelek zilim li Fatma kiriye?

Apo hinekî hizirî, berken bû. Di dilê xwe de got, diyar e ku li derve mijar wisa tê fêmkirin:

-Berê derbarê wê de hin gumanên min hebûn, dixwest Serokatiya PKKê bike. Lê ez baş nizanim ka xiyanetê dike yan nake. Ku min bixwesta min dikarî her tiştî jî pê bikim. Lê min nekir. Min ji hevalan re got bişînin, wan jî şand.

Hinekî sekinî, xwest mijarê berfireh bike. Rabû ser xwe çû ber pencereyê:

-Bi hezaran milîtan tevlî bûn. Li vir ji bo serkeftinê çi

pêwîst be em dikin. Dengê şerê welat digihîje we. Tecrûbe çêbûye, lê ne bes e. Kêmayiyên hevalên me dewam dikin. Bi navê partiyê tiştên ne baş dikin. Berê ne mal hebû, ne pere. Me çend insan bi zorê dianîn cihekî. Niha bi hezaran cih hene. Bi sedan heval di civîn û konferansan de ne. Bi hezaran di qadên şer de ne. Pirbûn û mezinbûn heye, lê hê lewazî jî hene.

Her duyan jî di pencereyê re li tevgera milîtanan dinêriya. Di wê navê re çay ji wan re hat. Apo çaya xwe girt, axaftina xwe domand:

-Yên şaşîtiyan bikin wê bikevin. Partiya me partiyeke sosyalîst e. Di kesayeta milîtanên baş de taybetmendiyên xwe nîşan dide.

Pirsên Bavê Rêzan nemabûn:

-Serokê min, ku destûra we hebe, ezê biçim. Emanetê we li cem me bûn min anîn.

-Neçe em bi hev re xwarinê bixwin.

-Serokê min, we çi çêkiriye?

-Me meqerne çêkirine. Îro meqerneyan bixwe, careke din emê goşt çêkin bi hev re bixwin.

Bavê Rêzan, bi milê wî girt, keniya:

-Ez meqerneyan naxwim. Lê eger hûn dixwin, ezê jî bixwim.

Di wê navê re meqerne hatin ser mase.

Piştî xwarinê Bavê Rêzan xatirê xwe xwest, çû.

Piştî guhdarîkirina nûçeyan, ew jî derket berê xwe da dibistanê. Dersa wê rojê hê neqediyabû.

***

Serê sibê bû, Apo ji metbexê qedeha avê dagirt ber bi pencereyê ve çû li derve temaşe kir. Di pencereya mala li hember ya li aliyê rastê de, kamerayek ket ber çavê wî. Xwe hinekî paş ve da. Di hişê xwe de agirekî mezin afiranad, ji nava lêvên wî hevoka "Em di nava agir de ne, divê li gorî wê em tevbigerin" derket. Dîsa çû eywanê. Siwar, Rihan û Rozerîn  rabûn ser xwe. Li hemberî wan sekinî, her du destên xwe di nava pora xwe re birin:

-Wê niha Selah û mêvan bên vir, alavên tomarê tevan amade bikin!

Hê diaxivîn, dengê derî hat. Rihan bilez çû ber derî. Di çavik re li aliyê derve nerî. Ku Selah dît derî vekir. Selah û xortekî porxelek, çavşîn, bejinzirav û esmer ketin hundir. Bi rûyekî xweş pêşwazî kirin:

-Kerem bikin, Serokatî li benda we ye.

Wî jî mêvan li pêşiya eywanê pêşwazî kirin. Çavên Nebîl Mûlhim li ser Apo rawestiyabûn.           Bi zimanekî xweş û rêzdarî pirsa Apo kir:

-Serokê min, rewşa we çawa ye? Dîtina we ji bo min rûmeteke mezin e.

-Em jî bi hatina we kêfxweş in, kerem bikin rûnin.

Vê carê çavên Mûlhim li ser cilûbergên wî rawestiyabûn. Pişt re berê xwe da Selah:

-Birayê Selah, ez bi gelek kesan re rûniştime, lê kelecanê xwe avêtiye dilê min. Ji ber qebûlkirina pêşniyara min hurmet û spasiya min ji Serok re bêje.

Berî ku Selah gotinên wî wergerîne, Apo bi rûgeşî berê xwe

dayê:

-Tu bi xêr hatî. Ev xwesteka we ji bo me jî binirx û biwate ye.

Nefspiçûkbûna wî bala Mûlhim pir dikişand. Kesayeta berê di hişê xwe de li ser hizirî baştir nas dikir. Kelecana wî bûbû kêfxweşî. Wî jî bi rûyekî xweş dest bi pirsan kir:

-Van rojan Tirkiye ji ber we gefan li Sûriyê dixwe. Dibe ku êrîşî Sûriyê bike?

-Wê di şerekî wisa de cihekî Kurdan yê stratekîj hebe. Eger Sûriye Kurdan nede pişta xwe nikare pêşiya êrîşa Tirkiyê bigire. Eger Sûriye bixwaze sînorên xwe biparêze divê nêrîneke wê ya taybet ji bo Kurdan hebe. Kurd sînorê Sûriyê diparêzin.

-Eger helwesta Sûriyê bê guhertin wê rewşa we çawa be?

Apo ji destpêka hatina xwe ya Suriyê heta wê kêliyê anîn ber çavên xwe:

-Wê demê wê Sûriye vegere rewşa xwe ya berê. Wê rewşa wê xirab bibe.

-Nêrîna te derbarê Kurdên li Sûriyê de çi ye?

-Divê mafê çandî ji wan re bê dayîn. Ev ne parçekirina Sûriyê ye.

-Partiya we ji bo Sûriyê dibe serêş. Pêwîstiya Sûriyê nîne pirsgirêkên xwe bi Tirkiyê re zêde bike. Ji bo vê hûn çi dibêjin?

-Dixwazin Sûriyê bikin hedef. Ji bo wê me dikin behane.

-Dibêjin sala 1982yan PKKê li Lubnanê li dijî Israîlê şer kir, ma rast e?

Şerê Keleha Şiqêf anî bîra xwe:

-Rast e. Li hemberî Israîlê berxwedana herî mezin PKKê kir. Hêzên Erefat vekişiyan, em tenê man. Menahîm Begîn wê

demê dibêje, em dixwazin bizanin ew kî bûn şerê me kirin.

-Çi hêza te heye tu li hemberî NATO, Israîl û masonan şer dikî?

Berken bû, lê baş temaşe kir:

-Em hêza xwe ji civaka xwe digirin.

-Tu her tim li serê zinaran, li cihên bixeter î. Tu naxwazî xwe ji vê xeterê dûr bixî?

-Gelek caran min di xew de xwe li serê zinaran dîtiye, min xwe avêvtiye, ez ji xew şiyar bûme.

-Tu xwe weke pêxemberan hesab dikî?

-Divê rêbazên serokên Rojhilata Navî weke yên pêxemberan bin. Ez rêbaza wan dişopînim.

-Tu difikirî ber bi dîn ve biçî, nêrîna te li ser dîn çi ye?

-Min di teoriya xwe de felsefe, dîn û Sosyalîzim kirine yek. Min ji wan sentezek çêkiriye.

-Dixwazim pirseke din bikim; çima meseleya Kurd dibe meseleya tehdîdê?

-Yên bi navê Kurdan tevdigerin ne nûnerên Kurdan in. Xwediyên fikrên eşîrtiyê, klasîk û feodal in. Bi hêzên derve ve digêrdayî ne. Emperyalîzim ji vê rewşê sûdê dibîne û her du aliyan jî bi kar tîne. Eger pirsgirêk çareser nebe wê di destê emperyalîstan de bibe lîstik û li hemberî her kesî bi kar bînin.

Bala Mûlhim li ser bersivan bû, dixwest pirseke din ji wan cudatir bike. Hinekî li lênûsa xwe nêrî:

-Wê piştî te bûrokrasî çênebe?

Berî ku bersivê bide, di dilê xwe de got, em jî bi vê meseleyê re gelek mijûl dibin:

-Di piraniya şoreşan de ev çêbûye. Ji ber wê me ji xwe dest

pê kir. Em hewl didin pêşiyê bigirin.

-Tu dibêjî Îbrahîm Xelîl ji Rihayê rabûye, lê Nemrûd jî ji wir rabûye.

-Ez Apo me, ne Nemrûd im, kesên din jî nînim. Ez li ser şopa pêxemberan hereket dikim.

Mûlhim bi vê bersivê hê baştir di serê xwe de zelal kir ku Apo hê ji kesayeta nas kirî kûrtir e. Lê pirsên xwe hê xelas nekiribûn:

-Ez dixwazim vegerim ser mijareke din; hûn dibêjin me komploya 92-93 pûç kir, lê birayê te?

Apo dixwest di bersivên xwe de ne mijara biratiyê, ya xetê baştir were fêmkirin:

-Em bisebir nêzîk bûn. Behsa lîberalîzmê dikir. Telebanî zemînê wê rewşê amade kir. Me karî wê xeterê berteref bikin.

-Birayê te çi jê hat? Niha çi dike?

Hinekî sekinî û çawa bersiva gel dida, ya wî jî da:

-Niha şivantiyê dike.

-Dibêjin Ocalan nahêle di nava partiyê de dengê ti kesî derkeve, her tişt ew e. Heta dibêjin weke Stalîn e, ev rast e?

-Ez xwe bi Stalîn re qiyas nakim. Stalîn dixwest her tiştî bi zorê çareser bike, ez dixwazim bi nermî çareser bikim.

Navber hatibû dayîn. Apo bi telefonê bi qadên xebatê re diaxivî, Mûlhim jî jiyan û tevgerên wî hemû di ber çavên xwe re derbas dikirin û dixwest cudatiya wî ji kesayetê dîtîn, bihîstîn hê zêdetir binase. Di ber xwe de got, Apo kî ye, wê hê pir bê lêkolînkirin. Piştî axaftina telefonê derbasî eywanê bû, li cihê xwe rûnişt. Nebîl Mûlhim di wê navê re pirsa xwe ya herî zêde serê wî dikir nav gerê amade kiribû:

-Apoyê serok û Apoyê insan hene. Kîjan encama navbera wan diyar dike. Apoyê serok li dijî Apoyê insan e?

Ew jî bi dehê caran bi van her du kesayetan re ketibû diyaloqê û ka wê di navbera wan de dengeyeke çawa çêke, di nava lêgerînê de bû. Lê encama gihîştiyê jî hebû.

-Du Apo hene. Apoyê serok û Apoyê sade, zehmetkêş û têkoşer. Apoyê insan Apoyê serok çêkir û heta niha jî xizmeta wî dike. Apoyek di hedefa hêzên emperyal de ye û lê digerin, Apoyek şefaf û eşkere ye. Ez ji hevalan re dibêjim, hûn karekî dikin, ez du karan dikim. We ji xwe re serokek dîtiye, lê we çênekiriye, lê min çêkiriye. Yê min çêkirî ji min bihêztir e.

-Tu çima ji şaşîtiyan ditirsî? Şaşîtî taybetiyên me insanan in.

-Eger baweriya te bi Xwedê tê, divê tu şaşîtiyan qebûl nekî.

-Ma tu dixwazî bibî Xweda?

-Na ez mirovek im û baweriya min bi Xwedê tê.

-Tu dixwazî em werin ser meseleya jin û malbatê. Engels digot, malbat kakilê dewletê ye, Islam jî nêrîna wê ya taybet heye, Hindu jî wisa. Malbata tu lê digerî û ya tu red dikî kîjan in?

-Di dîrokê de di malbatê de gelek guhertin çêbûne. Carna zilamek çend jinên wî hebûne, carna jinek çend mêrên wê hebûne. Carna yekjinî jî heye. Şêwazê ku jinek û mêrek bi hev re bin niha maqûl tê dîtin. Eger eşq û heskirin tinebe, zewaca bi jinekê re dibe wesîleya tinekirina rûmeta insan. Ez ji van zewacan tirsiyam, ji ber wê min xwe nexistiyê û ezê xwe neximê. Eger ez di çil û heşt saliya xwe de xwediyê dilekî ciwan û seriyekî zana me sedem ew e ku ez weke serokê dewletekî tevnagerim.

-Em dîsa vegerin Tirkiyê. Dibêjin Mustafa Kemal Yahûdî ye, tu çi dibêjî?

-Bavî wî Yahûdî ye. Dema hemserê Zubeyde dimire bi yekî Yahûdî re dizewice. Mustafa Kemal ji heşt salî pêve li Selanîkê di nava masonan de cih digire. Rutbeya wî 33 ye. Heta niha jî kontrola masonan li ser Tirkiyê heye.

Ew şeş roj bûn Nebîl Mûlhim bi Apo re roportaj dikir. Saet 12'ê şevê bû. Êdî dema razanê bû. Xweşnav bi baldariyeke pir mezin ji her bersiva Apo not girtibûn. Piştî ku Apo çû odeya xwe Xweşnav li eywanê careke din notyên girtîn yek bi yek di ber çavan re derbas kirin.

Bala Nebîl Mûlhim li ser nava malê û liv û tevgerên milîtanan bû. Rabû ser xwe ber bi Selah ve çû:

-Birayê Selah, em çi pirsê ji Serok dikin çawa ku berê xwe ji bo bersivê amade kiribe, tavilê bersiva me dide.

-Rast e, lê ne ji bo we tenê, ji bo her kesî wisa hazir e.

-Me gelek pirs jê kirin û gelek zeman lê çû, lê hê gelek pirsên min hene, gelo wê çiqas din bikare demê bide me?

Selah berken bû:

-Birêz Mûlhim, heft rojên heftiyê hene. Îro şeş rojên we qediyan, dibe ku sibê biqede.

-Wê demê ezê pirsên xwe yên girîng sibê jê bikim. Ji bo min pir girîng bû, ji ber wê min jî evqas zemanê xwe da roportajê.

Roja din piştî taştê dîsa roportajê dest pê kir. Li gorî xwe pirsên zehmet hiştibûn wê rojê:

-Birêz Ocalan, ez dixwazim em vegerin herêma me. Derbarê Rojhilata Navî de di navbera nêrînên te û yên Şîmon

Peres de çi ferq heye?

-Projeya Şîmon Peres Israîl bibe navend, yên din pê ve girêdayî bin. Em cuda difikirin.

Her tişt ji Rojhilata Navî belav bûye. Şerê li vir tê wateya şerê li seranserê dinyayê. Çareseriya li vir jî çareseriya li cîhanê ye.

-Projeya we û Melik Huseyin nêzîkî hev in? Ew jî behsa federalîzmê dike.

-Eger federalîzim li gorî azadiya gelan be, wê bi ser bikeve. Lê ya Urdinê ya emîrtî û seletenetê ye.

-Ji bo Ermeniyan tu çi dibêjî?

-Nêrînên Ermeniyan yên taybet hene. Kurdistanê bi Ermenistanê bi nav dikin. Me got bila Ermenistan be, ne Kurdistanê be. Bi riya Emerîka bi Alpaslan Turkeş re têkilî danîn. Siyasetperestiya kevin e ku bû sedemê qirkirina wan. Em dixwazin Ermeniyan bikin dostên xwe. Lê Serokên wan bi Emerîka ve girêdayî ne.

-Ji bo Yunanan hûn çi dibêjin?

-Yunan Tirkan ji bo xwe xetera herî mezin dibînin. Parçebûna wan bi destê Tirkan bandor li ruhê wan kiriye. Emê xewna Yunaniyan pêk bînin.

-Ji bo Îranê hûn çi dibêjin?

-Emê ji bo dostayiya bi Îranê re gavan biavêjin.

-Tu nîzama dinyaya nû tevlîhev dikî.

-Bêguman dijminên min ji min ditirsin.

-Çima te heta niha çîroka jiyana xwe nenivîsiye?

-Wa ye tu dixwazî binivîsî!

-Tu guhdarî mûzîkê dikî?

-Jiyan bixwe mûzîk e.

Roportajê heft rojan li ser hev dewam kir. Ji rûyê Mûlhim xuya dikir ku tişta dixwest bi dest xistiye. Lê Apo jî pir kêfxweş bû. Mûlhim bi rêzdariyeke mezin xatirê xwe jê xwest.

***

Dengê vizêniya bayê ji pencereyê dihat. Apo û Agir li qata dehan li odeyê rûniştibûn bi şetrencê dilîstin. Çavên wî li ser hemleya Agir rawestiyabûn. Bi rakirina hesp re, dît ku hespê wî dikeve xeterê. Hinekî ji dengê bayê li pencereyê dixist aciz bû. Agir berken bû, dizanî ka çawa hemle kiriye. Apo dixwest hespê xwe biparêze û xelas bie:

-Agir te çawa kir, wisa nabe. Te pir zû ev hemle kir.

-Serokê min, rê hinekî vekirî bû, ji bo min firsend bû.

Di wê navê re derî vebû. Rozerînê meywe anîn, danîn ser mase. Di bin çavên xwe re hinekî li wan temaşe kir. Ti caran nedîtibû ku Apo bi şetrencê dilîze. Apo serê xwe bilind kir:

-Rozerîn were binêre, divê em hespê xwe biparêzin, nehêlin tiştek pê bê.

Di wê navê re Siwar jî ket hundir. Apo li aliyê dêrî nêrî:

-Were Siwar çi heye?

-Serokê min, hevalan agahî dane ku komek heval rêkirine Şamê. Ez çûm min dîtin. Zekî  bi sih hevalî ve hatine, gotin me bibe cem Serokatiyê.

Apo li Agir temaşe kir:

-Çawa hatine, xeberê we ji hatina wan hebû?

-Serokê min, bi serê xwe hatine. Çawa me bihîst ku hin

hatine, min ji Siwar re got biçe bizane ka kî ne.

Apo sala borî û bûyerên li Amedê anîn bîra xwe. Li Siwar nêrî:

-Temam, biçe wan bibe dibistanê.

Siwar derket, bilez berê xwe da Ruknedîn.

Apo rabû berê xwe, berê xwe da eywanê. Agir jî çû li tenişta wî sekinî. Hê dihizirî ka wê çi bêje. Apo dihizirî. Ji qermîçekên eniya wî diyar bû ku aciz bûye:

-Çetecîtiya wî ji sala 1987an dest pê dike. Li gel Kor Cemal û Hogir, sala 1988an me anîn vir. Heta sala 1988-1989'an min li vir li gel xwe hişt. Piştî darizandinê soz da. Lê di kongreya 4an de dîsa ket lêpirsînê. Me şans dayê û rêkir Amedê.

Hinekî meşiya, ji hêrsa kulma xwe şidand:

-Lê şansê me dayiyê qet li ser nefikirî. Li Amedê, jinên milîtan yên ji bo fikrê azadiyê tevlî dibûn dişandin mala bavê wan. Li Erziromê jî ev kir. Çi tişta nedihat xwestin kir. Hin bi navê xebata eniyê rêdikirin. Tev ketin zindanan.

Serê xwe hejand, bi her du destên xwe pora xwe paş ve da:

-Ev pratîk li dijî xeta Serokatiyê ye, li dijî min e. Naxwaze civaka me azad bibe, ji ber wê milîtanên jin belav kirin. Her tişta min dike ya xwe, dibêje yên min in!

Agir kûr difikirî, Rozerîn jî rojên li Amedê derbas kirîn dianîn bîra xwe. Dixwest tiştên li wir kirîn baştir bîne ber çavên xwe. Berê Agir li Apo bû:

-Serokê min, dema pirtûk nivîsî, gelek tiştên ne yên wî dizîbûn, dikirin yên xwe. Kesên ew rexne dikirin rêdikirin şerên giran û şehîd diketin. Hin agahî hene dibêjin, gelek zerer daye kesên sîvîl û kuştine. Em hê lêkolîn dikin.

Apo çavên xwe girtibûn. Weke kesekî di hundirê xwe de biêşe xuya dikir:

-Ev li dijî me siyasetê dike. Derfetên partiyê ji bo xwe bi kar tîne.

Bi vê gotinê re bêdeng ma. Li Agir vegeriya. Agir hê agahiyên di serê xwe de kom dikirin:

-Serokê min, dewelet jî dixwaze yên wiha hebin. Lewre her tiştî dike. Ji bo dîtina Ferhard dixwest xwe bigihîne Zelê, lê me qebûl nekir. Wê demê we jî gotibû, ti karê wî li Zelê nîne, bila neyê wir.

Apo sekinî, li ser kesayeta wî hizirî. Rojên borî û encama gihîştiyê anîn bîra xwe:

-Ji serê sala 1992yan ve hişmendiya xwe bihêz dike. Di dema agirbestê de, leşkerên bêsîleh kuştin. Ew û Yeşîl kontratiyê bi hev re dikin. Yeşîl nûnertiya aliyê Tirkiyê, ew jî nûnertiya nava me dike. Dema me dixwest stratejiyê biguherînin, wî ew leşker kuştin. Min cihê leşker lê hatîn kuştin pir baş pirsî, çawa ku dibêje ne nêzîkî rê bû, dûrî rê bû.

Berê xwe da yên li wir:

-Hûn dizanin, dema ez bi Turgut Ozal re axivîm, wî ew çalakî kir. Wê Tirkiye qanûn biguhertan, lê wî ew çalakî kir. Ev xirabkirina teoriya me ye, projeya wî ya şexsî ye.

Hinekî sekinî, di hundirê xwe de got, ev dixwaze her tiştê me tine bike?

-Wê demê Telebanî jî dizanî ku çalakî ne normal e, ji ber wê bi we re axivîbû.

-Belê serokê min, got, min agahiya çalakiyê ji Tirkan girtiye. Hûn jî bi daxuyaniyekê vê çalakiyê şermezar bikin.

Lewre şer li wir derneketiye û ew leşker jî ne di şer de bûn. Li vê bûyerê xwedî dernekevin. Wê pêvajoyê xirab bike. Heta wiha jî got: Nehêlin ev çalakî li ser we bimîne. Me jî bi daxuyaniyekê çalakî şermezar kir. Dema min ji Zekî pirsî, got, operasyon derket, me jî li wan xist.

Apo hêrstir bû:

-Vê kesayetê nehişt ew pêvajo pêş bikeve. Qeydên wê bûyerê hemû hene ne?

-Rast e serokê min. Rola wî di vê mijarê de esas e.

***

Zekî tevî sih kesî li Şamê li malekê bûn. Di nîvê komê de rûniştibû, her kêlî li saeta xwe dinêrî. Rûyekî cidî dabû xwe û weke kesekî jixwebawer, otorîter geh li banî dinêrî, geh li jêrê. Çavên xwe carna jê digirtin. Di dilê xwe de gotinên xwe zelal kiribûn: “Me li çiya erka xwe temam kir, niha jî em li vir in.” Li milîtanên pê re hatîn temaşe kir: “Ev ji min baş fêm dikin. Emê bi hev re bin.” Li Rizga nêrî, wî jî êdî bi çavê şervanê berê li xwe nedinêrî. Hatibû guhertin, di rabûn û rûniştina xwe de jî bal dikişand ser xwe. Çavên wî li tevgerên milîtanan bû. Ji ber ku li tenişta Zekî rûniştibû xwe baş venabû. Xwe hinekî din nêzîk kir:

-Min bawer nedikir em wiha zû bigihîjin vir. Piştî wê zehmetiya me kişandî em dikarin li vir bi her awayî cihê xwe bigirin.

Zekî li dora xwe nêrî:

-Em li cem hev bin baştir e. Teqez Serokatiyê niha gelek derfet çêkirine.

Di wê navê re çay hat ber wan. Lê hê çaya xwe venexwarîn, dengê derî hat. Bi vebûna derî re Siwar ket hundir. Bixêrhatin da wan û yek bi yek himbêz kirin. Li pêşberî Zekî rûnişt. Rûyê wî yê sar bala wî dikişand:

-Hûn amade ne em biçin?

Zekî bêsebir bû, jixwe li benda vê xeberê bû:

-Em amade ne heval. Serokatî ji hatina me agahdar e?

Siwar di dilê xwe de got, Serokatî çawa agahdar nebe:

-Belê heval agahdar e.

Dilê wî rehet bûbû. Rabû ser xwe êlekê xwe li xwe kir. Kom bi kom ji hundir derketin ber bi Şeba ve çûn. Zekî di seyareya Siwar de bû. Di rê de çavên wî li derdor bûn. Gotinên wê ji Apo re bêje hemû di serê xwe de hazir dikirin. Di nava wan xeyalan de gihîştin ber deriyê dibistanê. Memed deriyê hewşê ji wan re vekir. Çawa ket hewşê, li derdora xwe û kesên li dibistanê temaşe kir. Weke generalekî serkeftî, ber bi odeya rêveberiyê ve çû. Bala wî çû ser koma pê re hatî, li derve bûn. Ew jî çû û li hewşê rûnişt heta yên din jî hatin.

Apo û Agir jî li odeya wî rûniştibûn. Raporên li ser pratîka Amedê li ber bûn. Ya herî dawiyê pêça, bi awayekî bêdeng ber bi hewşa dibistanê ve çû. Piştî bixêrhatinê yek bi yek li rûyê wan temaşe kir:

-Hûn hemû bi hev re hatine?

Serê Zekî di ber de bû û her du destên xwe jî di ber xwe de berdabûn. Lê hewl dida xwe wek leşkerekî bidisiplîn nîşan bide:

-Rast e serokê min.

Baş lê temaşe kir; sekna wî, rengê dayî xwe û pratîka wî anîn ber hev. Çawa ku ji bo pêngavekê hatibin, rengekî wisa

didan xwe. Bi dîtina wan re ev ferq kiribû. Dixwest wan ji hev belav bike:

-Emê îro cihê we diyar bikin. Cihên nû baş in, hûnê bikarin gelek hevalan bibînin û ji pratîka qadên din jî agahdar bibin. Her hinek ji we biçin cihekî wê baştir be.

Ev gotina dawiyê li xweşê wî neçûbû, lê li xwe dernetanî. Careke din li wan temaşe kir û ji wir çû. Piştî çûna wî komê berê xwe da Zekî. Lê tiştek ji wan re negot. Weke kesekî gelek tiştên xwe wenda kirîn dihizirî. Tenê berê xwe da qadê. Serê wî wisa di ber de diçû dihat. Rizgar du qedehên çayê dagirtin ber ve çû. Hem çaya xwe vedixwarin, hem diaxivîn. Rizgar ji wî pirtir mereq dikir:

-Êê, koma me belav bû. Em li cem hev bûna wê baştir bûya.

Zekî hê di hişê xwe de li ser helwesta Apo dihizirî û dixwest li gorî wê xwe hazir bike. Memed, ket hewşê. Çavên wî bi Zekî ketin, ewqas xweş dimeşiya li ber çavên wî pir biheybet xuya kir. Di dilê xwe de got, ya baş ez qet xwe nêzîkî vî hevalî nekim. Berê xwe ji wan guhert, meşiya. Gelek kes di dewreyê de bûn, wî jî bi baldarî li liv û tevgerên wan dinêrî. Hem mereq dikir, hem kêfa wî dihat. Di dilê xwe de got, li dibistanê tiştên pir xweşik hene, lê yên şexsî û ne li gorî giştî jî hene. Careke din berê xwe ber bi aliyê Zekî ve vegerand. Yên li dorê hemû li pêşiyê bi awayekî leşkerî rawestiyabûn. Di dilê xwe de got, ev heval rêveber e, lê berî wî jî gelek rêveber hatine, çima ev kom li pêşberî wî rawestiyaye?

Apo û Agir bi hev re derketin. Apo li ser tevgera koma nû hatî dihizirî, di mejiyê xwe de gihatibû encamê, li Agir nêrî:

-Her hinekan rêke cihekî. Ev bi plan hatine. Divê li cem hev

nemînin. Divê em nehêlin di vê pêvajoyê de li gorî xwe tevbigerin. Bila Zekî li vir be, emê kesayeta wî ji nêz ve bişopînin. Divê ev kesayet bê mehkûmkirin. Bi serê xwe plan kiriye û hatiye. Wê demê plana wî jî heye. Niha civîn û hevdîtinên bi nûnerên kovaran re hene, ezê biçim, tu li vir wî karî bike.

-Temam serokê min.

Ew ji hewşê derket, Agir vegeriya cem koma nû hatî. Rûyê Zekî yê nexweş bala wî dikişand. Bala wî jî li ser tevgerên wî bû. Zekî ji dabeşkirina komê nerehet bû. Di dilê xwe de got, divê hin ji van hevalan li vir bimînin, lê nikarim ji Agir re bêjim, ew tiştên wisa qet qebûl nake.

Agir hem li wan dinêrî, hem weke Apo gotî dixwest bi awayekî hêsan wan bi cih bike...

***

Her der bi kulîlkan xemilîbû, derdora dibistanê bi zeviyên genim yên kesk, li hewşê jî pelên daran êdî keskaya xwe dabû derdorê. Milîtanên li dibistanê tev ketibûn hundir, li cihê xwe rûniştibûn. Çavên wan li derî bû. 27ê Adarê bû. Bayekî nerm û xweş li dibistana Şeba dixist. Di ser hatina komê re demek derbas bûbû û li çend cihan hatibûn dabeşkirin. Apo ber bi dibistanê ve dihat. Gihîşt ber dara behîvê. Kulîlkên wê bîn kirin. Hinekî li nava baxçe nêrî, pişt re ket hundir. Piştî agahdarkirina geşedanên dawî derbasî mijara perwerdeyê bû. Mijar kesayet bû. Zekî di rêza pêşî de rûniştibû. Piştî axaftineke dirêj, berê xwe dayê. Dixwest di kesayeta wî de balê bikişîne ser kesayeta ku ji

koletiyê venaqete û derfetên heyî dike xizmeta kesayeta xwe. Hinekî meşiya. Careke din vegeriya, berê xwe da Zekî:

-Zekî ka rabe, malbata te çima tu avêtibûyî derve? Ma tu bi kêr nedihatî?

Bilez rabû ser xwe:

-Bavê min sê jin anîbûn.

-Wisa xuya dike ku tam Feodal bûye.

-Serokê min, em sê zarokên dayîkekê bûn. Bavê min em tev avêtin derve.

-Ji bo wê kîna te li hember çêbû?

-Min çek peyda kir ez û xwîşka xwe li hemberî wan derketin. Min du gule berdan bavê xwe. Lê tiştek pê nehat. Yek ji partiyê jî bi me re bû.

-Hê wê demê we partî tevlî karê malbatê kiriye. Pişt re we çi kir?

-Em derketin çiyê.

-Kîjan salan bû?

-1980-1981-Em salekê li çiyayê Mûşê man. Pişt re me bi partiyê re têkilî danî. Jinên gundan li me xwedî derdiketin.

-Çima li we xwedî derdiketin?

-Ji ber zulma bavê min. Fikrê wî li ser jinan bû.

Xwest bala wî bikişîne ser kiryarên wî:

-Em werin ser salên pişt re. 1991ê, jin pir tevlî dibûn ne wisa?

-Rast e serokê min, pir tevlî dibûn.

-Wê demê têkiliya fermandar û jinan jî pêş ket. Gelek fermandaran ji ber wê dev ji xwe berda.

-Rast e serokê min, ji ber wê tev qediyan. Hişê wan

belawela bû.

-Wê demê çiqas wendabûnên me çêbûn? Li derora pêncsed kesî reviyan.

-Rast e serokê min.

-Tu hinekî ji gundîtiya xizan rizgar bûyî. Derfet ketin destê te, ev jî bû destpêka burjuwatiyê. Weke rewşa Ferhad ya li Başûr.

-Rast e serokê min, derfetan çavên me tarî kiribûn.

-Min bizaniya hûnê wisa xwe wenda bikin, minê tedbîrên taybet bisandan. Te tam xiyanet nekir ne wisa?

-Na serokê min.

-Tu qet nefikirî ku xiyanetê bikî?

-Ez li ser xiyanetê nefikirîm, lê ez ketim tengayiyê.

-Tu li ser hevalên li vir çi difikirî?

Hinekî li derdora xwe tameşe kir:

-Serokê min, di aliyê zanebûnê de her heval bi qasî Mao dizane. Lê pirsgirêk di pêkanîna wê de derdikeve.

Apo dizanî ku ji kesayeta xwe direve û dixwaze kiryarên xwe bike malê giştî:

-Ev taybetiyên tu dibêjî herî zêde di karê te de derketine. We çawa cesaret kir hûn wisa bijîn? Gelo, ne ji ber wî qasî ye ku taybetiyên dijmin bi we re ne? Ne ji ber wî qasî ye ku li ber çavên we ewqas nirx heder bûne û bi awayekî erzan hûn li ser nirxan rûniştine?

-Têkiliya wan bi hev re heye, serokê min.

-Ango hinekî jî hûn bixwe wisa ne.

-Kesê hişê wî tev li ser şer be di dinyaya wî de tiştên wisa nînin.

-Meqam, rutbe, jiyana rehet, axatiya şer, rûniştina li ser nirxan ya bêbedel, min behsa wan kir.

-Rast e serokê min.

Li nava çavên wî nêrî, awirên wî awirên hesabxwetin û mehkumkirina wê kesayetê bûn:

-Baş e li Amedê bi sedan kes çawa ji cem te reviyan?

-Heqê wê nehat dayîn serokê min.

-Min ew bi navê PKKê şandin wir. Eger niyeta te ya avakirina arêşê hebûya teyê bigota ev nimetek e. Teyê bigota, piştî tîbûna erdê ya bi sedê salan ev baran e û ji bo zikê birçî nan e. Teyê wisa himbêz bikira.

-Rast e serokê min, em ewqas bi kûrayî nafikirin.

-Ev kimayiyên te ne. Hûn bi rehetî dinivîsin, dibêjin sala 1993yan, sê sed şervan reviyan. Lê hê tu dibêjî, ez bibiryar im, ez heme.

-Rast e serokê min, ez bibiryar im.

-Tu nafikirî ku birevî?

-Na serokê min.

Milîtanên li wir her yek li ser kesayet û kiryarên xwe dihizirî. Piştî axaftineke dirêj navber hat dayîn, Apo ji dibistanê derket. Hinekî li nava dibistanê û hewşê geriya. Gazî Kemal kir û ji wir derket çû malê. Zekî jî li qadê bû, li hewşê sekinîbû. Piştî ku Apo çû rabû ser xwe ber bi derî ve meşiya. Memed jî piştî çûna Apo derî girt, nêzî wî bû:

-Memed te rojekê ez dewat nekirim.

Memed lê nêrî, hinekî sekinî:

-Li vir her tişt yê rêxistinê ye, xwarin û vexwarina me hemû yek in.

Hinekî meşiya, dixwest kesên bi wan re diaxivî, jê sehwê bigirin:

-Tuyê li cihê xwe xwarinê çêkî, gazî min bikî.

Di wê navê re rrkdarê rojê hat cem wan:

-Hevalê Memed hevalek nexweş e, divê niha em bibin bijîşk.

Piştî du saetan vegeriyan. Memed dît ku derveyî nobedaran jî hin li cihê wî ne. Bilez ket hundir. Sifreyek hatibû raxistin. Zekî rûniştibû, rizgar û du kesên din jî li wir bûn. Çavên Zekî lê bûn:

-Hevalê Memed, te xwarinek ji me re çênekir. Binêre me bi xwe çêkir. Lê tiştek nabe wiha jî qebûl e.

-Dîsa min çênekiriye, ez xwarinên teybet ji ti kesî re çênakim. Ezê biçim dibistanê şîvê bixwim. Afiyet be ji we re.

Rizgar jî li wir bû, ber ve çû:

-Hevalê Memed, hin pêwîstiyên min hene, ez pereyan bidim te ji min re bîne.

Memed jixwe ji wan tevgerên wî hêrs bûbû:

-Heval, derveyî tiştên giştî ez tiştekî ji ti kesî re naynim. Ez erkdarê giştî me, bi serê xwe ez jî nikarim tiştekî derbasî vê dibistanê bikim…

Bê ku pereyan ji destê wî bigire, derbasî dibistanê bû. Di dilê xwe de got, ev ne uslûbê rêxistinê ye…

***

Odeya Apo, Bager û Çirûsk lê rûniştîn, pencereyên wê ji her du milan ve vekirî bûn. Carna dengê wan diçû nobedaran, carna

deng qet dernediket, mirov digot qey ti kes li hundir nîne. Genimê erdên derdora xênî hinekî din jî bilind bûbû, serê simbilên wan weke pêlan li ber bayê diketin. Dengê qumrî û kevokan bi hev re bilind dibû. Li ser balkonê carna çend kevok bi hev re difiriyan datanîn ser dîwarê wê. Li ser masê meyve hatibûn danîn. Apo pirs dikirin, wan bersiv didan. Çirûsk, çavên xwe ji ser nedibirin. Apo serê xwe hejand, li Bager nêrî:

-Hûn bihara 1983yan çûn welat?

-Serokê min, bihara 1982yan em çûbûn.

-Hûn bihara 1983yan li Lolanê bûn, ne wisa? Bihara 1984, 1985, sê bihar. Ne wisa?

-Sê bihar serokê min.

-Bihara 1986an, hûn ne li wir bûn?

-Em dîsa li wir bûn.

-Li ser bihara 1984an pir bifikire û wateyê bide bihara 1994an.

-Serokê min, me bi hevalan re jî nîqaş kir, ev sal dişibihe destpêka Partiyê û bihara 1984an.

-Em di asteke pir bilind de, dest bi pêngavan dikin. Dema destpêkê ez hatîm Rojhilata Navî min navê xwe kiribû Elî. Ev ji dîrokê tê. Hingê min ji dostekî re got Elî ji pişt ve hat xencerkirin. Ezê nehêlim weke wî li min bê. Dibêjin, di nava PKKê de bibin xweser, di xweseriyê de jî azadî heye, jiyan haye. Derew e, jiyaneke wisa nîne. Di salên dawî de, ev bi ser PKKê de sepandin.

Bi vê gotina wî re rêbaza Elmanan hat bîra Bager:

-Dozgerên Elman jî ew dixwestin.

-Ji we ew dixwestin?

-Serokê min, bingehê gilînameyê li ser wê hatibû danîn.

-Ango xweser bibin, wê xweserî we bibe azadiyê û hûnê li cem Elmanan bibin xwediyê jiyaneke xweş.

-Eger te derfetên wê nedabin, ji bo wan tu dîktaror î.

-Dibêjin hûn leyzokên dîktatorekî ne. Eger dozger ewqas ji Kurdan hes dike, bila azadiyê bide wan, ezê dozger derînim asîmanan.

Bi vê gotina xwe re berken bû:

-Tu dixwazî li Ewropa ji xwe re gorekê amade bikî? Binaxbûna li wir ji bo me êş e, ne wisa?

Çirûsk bersiva wî da:

-Çawa ku mirov biavêjin bîreke kûr û tarî.

Apo serê xwe hejand:

-Pir xirab e. Min vê carê jî hûn gihandin welat. Dema hûn destpêkê jî çûyîn welat, min got ew der qible ye. Dema hûn gihîştin wir pênc caran xwe bitewînin. Çawa ku hûn nimêj bikin, wisa îbadet bikin.

-Dema mirov diçe Kurdistanê bi hêsanî tê dîtin ku qible ye serokê min.

-Tu dibînî, ciyê bê perestin ew der e. Eger ew der hinekî derfetên azadiyê didin, ciyê perestinê ye. Ciyê ku mirov berê xwe bidiyê.

Nava xwe kişand, li her duyan baş temaşe kir:

-Çima we fêm nekir, welatê me qibleya me ye. Ti kes we qebûl nake. Eger em bimirin jî bila em li wir bimirin. Li devereke din wê bîn bi termê me bikeve.

Piştî vê gotina wî ya dawiyê her sê jî bêdeng man. Li saeta xwe nêrî, pişt re berê xwe da Çirûsk:

Bila Bager biçe dersê, ez û tu jî biçin Qasyon, ezê cihê xweş nîşanî te bikim.

Rojê perên xwe kutabûn. Apo û Çirûsk di seyareyê de, ber bi navsera çiyayê Qasyon ve diçûn. Di pencereya seyareyê de bayekî honik li rûyê Apo dixist. Bin xwe re li bajarê Şamê yê ketî nava xelaka çiyayên bilind dinêrî. Êvaran bajêr xweş xuya dikir. Ji dilê wî dihat li ser heybeta wan çiyayan helbestekê bêje. Berê xwe ber bi Çirûsk ve kir:

-Te berê bi çavê helbestvanan li jiyanê dinêrî, hê tu wisa dibînî? Tu dibêjî wê PKK bike. Lê ez jî rastiyê ji te re dibêjim, min behsa xeteran ji te re kir. Tu dixebitî, dilxweş bî, xweşbîn bî.

Kêfa Çirûsk gelek hatibû, dixwest di dil û ruhê xwe de wê kêliya li bilindiya çiyê tomar bike:

-Serokê min, xweşbîniya min pir pêş ketiye, lê ez rehetiyê jî his nakim. Ez naxwazim bibim dîlê destê tiştekî.

-Bi te re kêfxweşî û xweşbîniya zarokan jî heye û dibî weke çinareke pir pîr bûyî ku bi hêsanî ji ber bayekî bikevî. Tu tevlî gotinên min yên derbarê jiyan û rêzdayînê de dibî?

-Bi tevayî tevlî dibim serokê min. Lê li ser partiyê ez bûm bar.

-Em nebêjin bar, lê xeteke balkêş e. Dema tu weke barekî bûyî jî, min karî nîşan bidim ku dikarim te hilgirim daynim ciyekî. Dema em te didin jiyandin, divê em bizanin ka em çi didin jiyandin.

-Pir girîng e serokê min.

-Divê tu ne ji bo xwe bijî. Çi dibe bila bibe, divê tu bizanî ji

bo hin tişt bijî. Eger tu nikaribî li ber xwe bidî, ji bo te şerm e.

-Pir rast e, wê şerm be serokê min.

-Ezê wê demê nebêjim tu çima nayî xeta îdeolojîk, siyasî û leşkerî, bi yek gotinê ezê bêjim tişta tu dikî şerma hevrêtiyê ye.

Di wê navê re gihîştin navsera çiyê. Peya bûn bin xwe re li Şamê temaşe kirin. Lê hê suhbeta wan jî dewam dikir:

-Hûn jî zarokekî gel bûn. Hûn çima bi vî awayê me pêş neketin? Eger Kemal Pîr bûya, belkû pirtir pêş biketa. Hûn dizanin, elaqeya wî, baldariya wî pir xurt bû.

-Yê herî zêda Rêbertî dişopand ew bû, serokê min.

-Li gorî te, weke din kê ez baş dişopandim?

-Serokê min, Mazlum.

-Ez dişopandim, ne wisa? Yek ji hevalên baş dişopandim jî Haki bû. Ez texmîn dikim tu van pirsan pir ji xwe dikî; "Ez çi me, çawa tevlî dibim?"

Li ser kevirekî rûnişt, destê xwe avêt şaxekî darê:

-Li hemberî demên borî tu hêrs dibî?

Çirûsk car bi car li derdora xwe temaşe dikir:

-Bawer dikim, pir zêde serokê min.

-Xuya dike tu ji vê hêrs dibî; çima nabim şopdarekî baş. Halbiku tu ewqas fedakar î, ne wisa? Di hin mijaran de, tu deh caran ji min fedakartir î.

Çirûsk çawa ku gotinên wî qedyabin wisa bêdeng lê guhdarî dikir. Kêfa wan ji bilindiya çiyê re pir hatibû. Her li dora xwe dinêrîn. Lê diviya berê xwe bidin derya jiyanê û melevaniya fikir û ramanên nû bikin.

***

Apo li eywana malê rûniştibû. Ji rengê rûyê wî diyar dibû ku westiyaye. Vê rewşa wî bala milîtanên li wir dikişand. Her kes bêdeng bû. Li ser maseyê li pêşiyê hinek fistiq û dendik hebûn. Ji bo ku wensa xwe pê bîne, çend lib avêtin devê xwe. Bi ser milê xwe re li Rihanê nêrî:

-Rihan, ev tiştên li ser masê doh pirtir bûn?

Bi gotina xwe re jî berken bû.

Rihan li fistiq û dendikên li ser mase nêrî, nizanî çi bêje:

-Serokê min pisîka me carê dixwe.

Pişt re ferq kir ku bersiveke şaş daye.

Apo keniya. Di wê navê re Şêxo ket eywanê. Ku dît Apo kêfxweş e, kêfa wî hat, ew jî keniya. Apo berê xwe dayê:

-Mamê Şêxo, were ezê pirsekê ji te bikim. Ma pisîk dendik û fistiqan dixwin?

-Serokê min, ma wê pisîk çawa dendikan bixwe?

Apo pirtir keniya.

-Serokê min, pisîkeke me ya duling heye, ew dixwe.

-Tu rast dibêjî, yên duling dixwin.

Hemû bi hev re keniyan. Li dora wî kom bûn. Apo berê xwe da Şêxo:

-Xwe hazir bike biçe Endîwerê, mala Hecî Ehmed Bavê Zinar û Sozdar. Jê re bêje çi mesela te û hevalan heye.

-Temam serokê min.

Roja din êvarê gihîşt mala Bavê Zinar. Li eywanê civat xweş bûbû. Bavê Zinar di nîvê civatê de rûniştibû. Çawa Şêxo dît, bi îşaretan pê da fêmkirin ku neaxive. Piştî ku civat belav bû, berê xwe da Şêxo:

-Kerem bike, ez dizanim tu ji bo çi hatî. Hevalan li ser min ji Serokatiyê re rapor şandiye.

-Rast e, Serokatiyê ez şandim. Got jê bipirse ka çi mesle ye.

-Ez dirêj nakim, hevalan seyare ji min xwest. Min jî got hinekî bisekinin. Ji ber wê xwe hêrs kirin. Ji min re gotin tu bavê Zinar û Sozdarê yî, eyb e tu wiha dibêjî.

-Êê, te çi got wan?

-Tu rastiyê dixwazî, ez jî qehirîm. Min got eger partî weke we be, ez ne bi vê partiyê re me.

Bi gotina xwe ya dawiyê re serê xwe nizim kir:

-Ez xelet axivîme, ezê xwe bidim efûkirin. Diviya min wisa negota. Ji Serokatiyê re bêje, ezê rexnedana xwe bidim. Eger Serokatî bixwe li rastiyê geriyaye, ev besî min e. Rastiya patiyê jî ev bixwe ye.

Roja din bişev Şêxo gihîşt malê. Apo li eywanê li bendê bû. Şêxo silav da û mesele hemû jê re got. Apo serê xwe hejand:

-Hevalên me ne layîqî vî miletî ne. Ez bawer nakim Bavê Zinar wisa bike. Hin bi zanebûn dixwazin gel ji me bidin revandin. Ji bo sûcdarkirina gel li behaneyan digerin.

***

Li derdora malê kevok li baniyan difirîn. Ji nava baxçe jî dengê qebeqeba kewekî dihat. Dengê kewekî tenê bala Şêxo kişand. Lewre her tim her du kewên wî bi hev re dixwendin. Bêra di destê xwe de danî, berê xwe da cihê wan. Bi vekirina rikehê re, rengê wî qulibî. Kewê nêr miribû, ya mê li ber serê wî dixwend. Ji ber ku dizanî ka çiqas Apo ji wan hes dike, pir li ber ketibû.

Kewê mirî di nava destê xwe de dibir dianî: “Gelo ez erdê bikulim, bikimê, yan biavêjim cihekî dûr? Lê ez navêjim, ezê ji hevavlan bipirsim ka ew çi dibêjin.” Berê xwe da eywanê. Çavê yên li eywanê bi kewê mirî ket. Siwar xwe nêzîk kir:

-Şêxo, ev miriye tuyê çi jê bikî?

-Ez jî hatime ji we bipirsim. Ma hûn nabînin çiqas xweşik e.

Siwar destê xwe bi eniya xwe ve bir anî:

-Ji bo ku xirab nebin li Bab Toma nava wan dadigirin û wan derman dikin. Qet nebe bila dîmenê wî li ber çavê me bimîne.

Kewê xwe girt berê xwe da cihê Siwar gotî.

Apo li nava baxçeyê dibistanê di nava daran re hêdî hêdî dimeşiya. Carna li rengê xwezayê yê bedew dinêrî. Milîtan jî hemû li derve bûn. Hin dimeşiyan, hin rûniştibûn suhbet dikirin. Tev li benda dersê bûn. Zekî jî li aliyekî dibistanê rûniştibû tevgerên Apo dişopandin. Li derdora wî jî çend milîtan rûniştibûn. Li ser rojên destpêkê yên hatina Şamê dihizirî. Di wê ferqê de bû ku wê di lêpirsîneke giran re derbas bibe. Di wê navê re Rizgar ber ve hat:

-Rojabaş, ez îro erkdar im.

Zekî hinekî lê temaşe kir:

-Em çawa hatin, Serokatiyê her tiştê me dizanî û wisa nêzîkî me bû. Ez li vir jî bimînim dibe, çawa be ezê her vegerim welat.

Her kes bi bihîstina dengê anûnsê derbasî dibistanê bû. Ew jî bilez çû li rêza pêşî rûnişt. Piştî ku her kes rûnişt, Apo ket hundir. Qederekî li pişta mase çû hat. Piştî ku her kes di ber çavê xwe re derbas kir, çavên xwe li ser Zekî rawewstandin.

-Tu hêza guhertina kesayetê bi xwe re dibînî?

Zekî rabû ser xwe:

-Baweriya min bi min tê serokê min.

-Lê heta doh kêmayiyên te derdiketin.

-Dibe ku dîsa kêmayî derkevin.

-Lê li xwe haydar be, tu tedbîrên xwe nestînî tuyê biqedî.

-Rast e serokê min.

-Tu dibêjî ez ji bo her qadê, her erkî amade me. Ji bo wê ji sozdayîna te re rêzdariya me heye. Lê gelo tuyê pêwîstiyên wê pêk bînî? Tuyê hinekî bibî xwediyê soza xwe? Eger ne ji piştgiriya me bûya, teyê nikaribûya li ser piyan bimînî.

-Rast e serokê min, niha jî dema em dibêjin baweriya me bi me tê, em bi piştgiriya partiyê dibêjin. Em bi serê xwe nikarin vî karî bikin.

-Tu min pir didî fikirandin. Heta carna dibêjim gelo emê bikarin rêbaza wî çareser bikin.

-Baweriya min bi çareserkirinê heye.

-Hûn Yeşîl nas dikin. Dibe ku hûn xapandibin, lê haya we ji we tinebe. Min li ser te siya wî dît. Dijmin dixwaze bi riya wî te, bi riya te jî partiyê bixe zorê.

Dixwest bide fêmkirin ku kiryarên her duyan weke hev in. Hinekî li kesên rûniştî nêrî, pişt re dîsa berê xwe dayê:

-Çawa wisa li te hat? Çima te ewqas xwe xapand? Çima te PKK inkar kir? Ev gumanan bi me re çêdike. Ez bêjim malbatî, li wir jî tu bin ketî. Nan nîne tu bixwî. Digel ku te her tişta xwe ji PKKê girtiye, tu li xwe nagirî spasiya wê jî bikî. Lê em dîsa dixwazin te qezenc bikin. Eger em te di vê rewşê de bihêlin, ne tu tiştekî ji ti kesî re dihêlî, ne ti kes ji te re dihêle. Eger em dev ji te berdin, dibe ku tu di cih de bibî kontra.

Vê gotina dawiyê Zekî di nava xwêdanê de hiştibû:

-Serokê min, rast e li ser rêbaza min siya dijmin hebû.

-Te bixwe di rapora xwe de gotiye, ez naxwazim li Botan bimînim, divê biçim Mûşê. Li Mûşê jî divê biçim Zengok. Xêr e tuyê çima biçî Zengok. Te PKK tev daye pişta xwe tuyê ji bo xwe bi kar bînî.

-Serokê min, hizrê berî niha pazdeh salan e.

-Ango tu ewqas î. Weke din tu û ti kesî bi hev nakin, lê yê bi gotinekê jî weke te nehizire, tu kînê li hemberî wî digirî. Ez dubare bêjim, tu bi wê rêbaza xwe dikarî bibî eşqiyayekî baş jî, tu nabî PKKyî.

-Fêm dikim serokê min.

-Bi rastî tu fêm dikî?

-Di fêmkirinê de pirsgirêka min nîne.

Çû ber derî li derve, li asîmanan nêrî. Hin ewran xwe komî ser hev kiribû. Careke din vegeriya lê nêrî. Li ser gotina wî ya dawiyê dihizirî:

-Tu fêm dikî, lê dîsa tu weke xwe dikî.

-Serokê min ez nikarim ruhê xwe biqedînim.

-Ruhê te çi ruh e? Bila ew ruh yê te be, lê ne yê PKKê ye. Mûtewazî be. Tu bi hevalên navendê re jî tiştekî par ve nakî. Hemîdoyê eşqiya hebû herî dawî çû bû cerdevan.

-Rast e serokê min.

-Hêza te heye tu bi partiyê ve girêdayî bimînî? Di wî alî de gumanên te hene?

-Qet nînin serokê min.

-Baş e. Ji sedî sed tuyê bi çavekî nirxê Rêbertiyê li xwe binêrî û wisa biçî.

-Serokê min, ji her demê pirtir baweriya min bi min heye.

-Êdî tu bi her awayî xwe tevlî PKKê dikî. Ez PKKê û xwe jî daynim aliyekî, ev soza te ye. Tuyê bikarî xwe bidî efûkirin.

Li saeta xwe nêrî. Dema navberê bû. Derket derve. Hê li ser kesayeta Zekî dihizirî: “Ev çi kesayet e? Li vir tiştekî dibêje, lê di her gotineke wî de amadekariyeke wî ya cuda diyar dibe. Lê wê piratîk van hemûyan zelal bike. Gazî Kemal kir:

-We hevalên gazî yên hatîn hemû birin cihên wan?

-Rast e serokê min, me hemû birin.

-Temam em biçin.

Şêxo ji nava bajêr dihat. Kewê hatî heşandin û dermankirin di destê wî de bû. Bir odeya Apo danî ser maseyê wî. Piştî qasekî Apo çû odeya xwe. Çav bi kewê mirî ket. Gazî Şêxo kir:

-Şêxo, ka were vir.

Şêxo bi bazdan çû:

-Kerem bike serokê min.

-Te kewê min kuştiye û daniye ber çavê min. Mir, mir. Insan jî dimirin, ev halê dinyayê ye, lê te çima daniye ber serê min?

-Serokê min, min dil neda biavêjim, ji ber ku tu ji wan hes dikî min danî wir.

-Tiştek nabe, lê ji wir bibe. Seyara me hazir be, ez û tu biçin dibistana kurdî, mêvan hatine.

Şêxo bilez daket xwarê, ne Kemal dît, ne jî siwar, her yek bi karekî ve çûbû. Dîsa vegeriya cem:

-Serokê min heval derketine derve.

-Ma seyareya me ne hazir e? Eger ne hazir be, seyareyekê kirê bike em biçin.

Ji bo girtina seyareyekê bilez çû ser rê. Di dilê xwe de got, ez naxwazim taksiyê bibim dibistanê. Serok li wir neyê dîtin baştir

e. Bê ku seyareyekê bigire vegeriya. Apo li hewşê li bendê bû:

-Tu çima bê seyare hatî? Tu tirsiyayî?

Şêxo dîsa bi bayê bezê çû ser rê. Lê nedixwest her seyareyê jî bîne. Herî dawî yekî kal li ber sekinî. Apo jî ber wan ve çû. Siwar bûn çûn. Piştî qasekî nêzî deriyê dibistanê bûn. Nobedarên dibistanê dora taksiyê girtin. Şêxo di cihê xwe de cemidî. Xwest dakeve, lê baweriya wî bi xwediyê taksiyê jî nedihat. Lê dît ku ew jî ditirse. Di wê navê re Apo derî vekir daket. Piştî ku Şêxo jî daket teksî ji wir bilez dûr ket. Berê Apo li taksiyê bû:

-Wî pereyên xwe jî nebirin. Berê jî min gotibû pereyên wan bide. Sibê biçe pereyên wî bidiyê. Guneh e; tirsiya û zarokên wî jî hene.

-Serokê min, ezê sibê biçim, ez bibînim ezê bidimê.

-Ma tu nas dikî?

-Na serokê min.

-Sibê biçe ser rê, ew mala me nas dike. Dibe ku were wir. Feqîr bû.

Cara duduyan bû Şêxo wisa dikir. Dizanî dilê Apo bi kesên kedkar ve dimîne. Lê di dilê xwe de got, vê Şama mezin ezê ji kû bibînim. Bi hev re derbasî dibistanê bûn. Li cem mêvanan rûniştin.

***

Meha Tebaxê nîvî bûbû. Her çenda li gorî hesabê kurdî dema wergera bayê nû bû, lê hê germa rojê neşkestibû. Tîrêjên rojê yên germ li dibistana kurdî ya li Sehna dixistin. Dema taştê bû.

Apo li qata duduyan bû. Gumlekekî gewrê milkin, pantolonekî risasî li xwe kiribûn. Li destşoyê piştî ku dest û rûyê xwe şûştin, li ber neyînikê pora xwe û simbêlên xwe rast kirin. Rûyê xwe ziwa kir derbasî eywanê bû. Tizbiyên xwe yên kehrîbarê zerê zerdelî ji berîka xwe derxistin xistin nava kefa destê xwe. Ji ber nexweşiya sînozîtê bi zorê bêhna xwe dida distand. Di nava eywanê de hinekî çû hat. Di pencereyê re li kevokan temaşe kir. Hewşa dibistanê bêdeng bû, her kes ketibû hundir li benda hatina wî bûn. Daket berê xwe da deriyê dibistanê.

Piştî silavdayînê dest bi axaftina xwe ya derbarê pêvajoyê de kir.

Heta nîvro dersê dewam ki. Piştî nîvro çû cihê xwe yê li qata duduyan. Bi rûniştinê re tv vekir. Tişteke bi dilê wî tê de tinebû. Derê wê girt, destê xwe avêt teybê, nêzîkî xwe kir. Kaseta Derwêşê Evdê û Edûlê danî ser û pala xwe da kursiyê xwe. Kêfa wî pir ji destanê re dihat. Serhatiya wan ji serî heta binî guhdarî kiribû, lê tama stiranê cuda bû. Destaneke kurdî ya kevnar û biwate bû. Bûyerên wê demê qewimîn, pir bala wî dikişnadin.

Di wê navê re nobedar destê xwe li derî xist, ket hundir:

-Serokê min, hevalê Xweşnav hat.

Hê bala wî li ser stiranê bû:

-Bila bê.

Xweşnav ket hundir. Guhdarîkirina Apo ya stiranê ya bi baldarî bala wî kişandibû: “Her ku ez dibînim bi kar ve mijûl e, min heta niha nizaniya evqas mereqdarê stranên kurdî ye.”

Xwe ji bîr kiribû ka bi çi ve hatiye, wî jî guhdarî stiranê dikir. Serê xwe jî di ber re dihejand.

Rewşa wî bala Apo kişand, hinekî lê temaşe kir:

-Kerem bike rûne!

Xweşnav li ser kursiyê li hember rûnişt.

Hê guhên Apo li ser gotinên Edûlê bûn:

-Xweşnav, tu dibînî stiran çi xweş gotiye!

-Rast e serokê min.

Apo serê xwe hejand:

-Şoreş huner e. Xebata min jî, xebateke hunerî ye. Şoreş jî weke hunerê senfoniyê ye. Pêşketina hunerê senfoniyê ji bo Kurdan pêngaveke pir mezin e. Eger ez mûzîsiyen bûma, minê jiyana gelê Kurd bikira senfonî. Minê stiranên Kurdan hemû tomar bikirin û bidan gotin!

Bi xelasbûna stiranê re derê teybê girt.

Xweşnav li ser gotinên wî yên li ser huner dihizirî. Di dilê xwe de got, her ku guhdarî dikim tiştin nû dibêje.

Gotinên stiranê di guhên Apo de olan didan:

-Ez dubare li vê çîrokê guhdarî dikim. Jixwe timî dipirsim; çima bûyerên wiha her tim li cem Kurdan çêdibin? Çima Kurd ji vê tirajediyê xelas nabin? Ji xapandinê xelas nabin?

Rabû ser xwe, di nava eywanê de hinekî çû hat:

-Heta civak neyê guhertin nabe. Zilam çawa li xwîşkê, li dayîkê dinêre. Heta jin azad nebe azadiya me nagihîje serî. Ji ber wê pêwîstiya me bi şoreşeke civakî heye!

Awirên çavên xwe birin ser Xweşnav:

-Ez dixwazim malbateke fêmbar ava bikim. Di serê min de ji mêj ve zelal bûye; serkeftina jinê serkeftina civakê ye. Timî li dîroka Kurdistanê difikirim. Çima Kurdistan ketiye vê rewşê. Emê çawa vê felsefeyê biguherînin?

Hinekî ber bi pencereyê ve çû. Li milîtanên di hewşa dibistanê de temaşe kir. Di hundirê xwe de got, divê ev dîrok ji nû ve û bi destê Kurdan bê nivîsîn.

Dîsa li Xweşnav vegeriya:

-Ev rewş, dijmin li ser me pêk aniye.

Hê gotina wî di devê wî de, Şervîn, Siwar û Selah ketin hundir. Ji rengê rûyên wan têgihîşt ku dixwazin tiştna bêjin:

-Kerem bikin, rûnin!

Her sê li ser kursiyên li hember rûniştin.

Çavên wî li ser Siwar bûn:

-Siwar, bêje li cem te çi heye?

-Serokê min, we gotibû ji şêxê Durziyan civanekê bigire. Me ji bo îro girtiye.

-Navê herêma wan çi bû?

-Serokê min, Siwêda ye, nêzîkî Dera ye.

-Haa, min nas kir. Pirtûk (Roportaja bi Nebîl Mûlhim re hatî kirin) gihîştibû wan?

Siwar hinekî sekinî, Selah bersiv da:

-Rast e serokê min. Xwendine, me çend caran dîtin jî. Pirtûk gelek tê nîqaşkirin. Ji aliyê Ereban ve baş tê pêşwazîkirin. Gelek nivîskar dixwazin we bibînin. Herî zêde mijara têkiliya Ereb û Kurdan û biratiya gelên Rojhilata Navî bala wan dikişîne.

-Weke din çi heye?

-Serokê min, ji bo hevalên di rê de hatîn girtin em bi berpirsan re axivîn, wê van rojan berdin. Weke din dixwazin bizanin ka yên li dibistanan hemû birîndar in ya na. Dîsa ji me re gotin, dibistanên we di binê çavdêriya ajanên derve de ne.

Hişê wî hê li ser pirtûkê bû:

-Hin dixwazin gotinên me yên di pirtûkê de çewt nîşan bidin. Li hemberî dijmin fişekek neteqandine, dibêjin, em xwediyên gelê Kurd in. Hûn bi xwe jî pirtûkê baş fêm bikin û bi gel jî bidin fêmkirin. Ev jî karê we ye.

-Çavên wî ketin ser Şervînê:

-Ha, Şervîn, we civîn çêkirin? Li ser naveroka pirtûkê gel çi dibêje?

-Serokê min, di pirtûkê de ku hûn dibêjin; *"Gelê Rojava piranî ji Bakurê Kurdistanê koçber bûne."* mijara sereke ya gel e. Weke din dibêjin, Serokatî têkiliyên xwe pir eşkere dane diyarkirin.

-Divê hûn bidin fêmkirin. Min xwe çareser kiriye. Ji ber wê bêfikar karê xwe yê dîplomatîk eşker dibêjim. Mijara koçberiyê jî wiha ye; Bi hezarê salan e gelê Kurd ji ber zilma dijmin koçber bûye. Divê berê me li Kurdistana Mezin be. Em girêdayî wir in. Efrîn jî, Cizîr jî û Kobanê jî girêdayî Bakur in.  Ez dixwazim tengbûna fikrê Kurdan rabe.

Hinekî çû hat. Ji qermîçekên eniya wî diyar dibû ku aciz bûye:

-Kurd di kuna derziyê re li dinyayê dinêrin. Em dixwazin Kurd bibin xwediyê fikrekî mezin. Mijara me azadiya gelê Kurd e, ne mijara erd e. Em dikarin erd bi hev biguherînin jî, ev ne mijareke girîng e. Gelek ji erdê sûriyê jî di destê Tirkan de ye. Niha Kurdistanê bidin jî ku Kurd ev Kurd bin em azad nabin. Ji her qadê dikarin werin vir, emê civînan bi wan re çêkin.

Ji rûyê wan fêm kiribû ku wan jî hê baş fêm nekiriye:

-Hûn dizanin; gel jî ji vir re dibêje Binxet. Ev mil Binxet, ew mil Serxet e. Ji vê jî diyar dibe ku her du yek in. Bi Peymana

Saykes-Pickot ya sala 1916an, ev der ji Bakur cuda bûye. Gelê me yê li vir piranî ji ber zilmê heta vir hatiye. Em ferqê nakin navbera parçeyên Kurdistanê. Lê divê bizanin, eger Kurdistana Mezin neyê rizgarkirin ya din emîrtiyek jî jê nayê çêkirin û nayê parastin.

Her du destên xwe kirin newqa xwe:

-Divê gelê me bi perwerdeyê ji lewaziyên xwe rizgar bibe. Pirtûkên me nivîsîn têra çareseriyê dikin. Lê Kurd timî dixwazin hin wan bimeşînin. Hê nîzameke wan çênebûye û hevalên me jî di vê mijarê de lewaz in. Hûn dikarin ji axaftin û daxuyaniyên me jî gelek tiştan derxin. Yên biaqil dikarin ji tecrûbeyên partiyê encamê derxin.

Hinekî sekinî li yên hemberî xwe nêrî:

-Divê Kurd hem dijminê xwe nas bikin, hem şerê xwe yê mezin bibînin. Kurdîtiyeke nû, jiyaneke nû wisa dibe. Wisa xuya dike wê ev dema me bi civînan derbas bibe. Ji bo civînekê em niha diçin Siwêda. Ji bo civînên li vir jî bila heval amadekariyê bikin, ezê tevlî bibim.

Piştî qasekî ketin ser riya Siwêda.

Kevirên li keviya rê tev reş bûn. Di pencereya seyareyê re li wan temaşe dikir. Pişt re çiyayek ket pêşiya wan. Silsileyeke dirêj û hinekî jî rût bû. Mereqa navê wî kir:

-Siwar, navê vî çiyayî çi ye?

-Serokê min, sê navên wî hene; Çiyayê Ereban, Çiyayê Horan û Çiyayê Durziyan. Li herêma Quneytre, Colan, li herêma Dera jî Çiyayê Horan binavûdeng in.

Di ketina Siwêda de, cihekî dîrokî yê ji dema Roma ve mayî ket ber çavên wî. Çawa eywana meclisa bajêr be; bi keviran cihê

rûniştinê hatibû çêkirin. Ji jêrê ve cihê rûniştinê hindik bû, rêzên din yek ji ya din hem pirtir hem bilindtir bû. Çavên wî ji ser nediçûn.

Hê li ser wan berhemên dîrokî dihizirî, seyare li ber derê xaniyekî duqatê mezin sekinî. Ew jî tev bi kevirên reş hatibû çêkirin. Her qatek ji çar ode û eywaneke mezin pêk hatibû. Ji bo pêşwaziya wî, 15 şêx li eywanê li ser piyan sekinîbûn. Rihên tevan dirêj û spî bûn. Simbêlên wan jî ketibûn devên wan. Şaşikên serên wan jî spî û bilind bûn. Li ser şalwalên xwe piştik girê dabûn û her yekî xiftanekî kurt jî li xwe kiribû. Ji rewşa wan diyar dibû ku hem mirovin olî, hem berdevkên civaka Durzî ne. Li tenişkete eywanê jî çend jinên bi kofî rûniştibûn. Di ser kofiyên xwe de jî desmaleke tenik berdabûn. Hina jê desmal li dora stûyên xwe jî pêçabûn. Kofiyên hina jê reş bûn. Pora li ser eniyên wan weke lûleyên zêr xuya dikirin. Di ser kirasên xwe yên dirêj de jî her yekê çoxikeke bi rengê keskê genimî û derdor bi qesebên ji zêr neqişkirî li xwe kiribû.

Bi kelecaneke mezin ket eywanê. Yên li eywanê jî pir bikelecan xuya dikirin. Bi rûyekî geş silav da wan û yek bi yek himbêz kirin. Xwediyê malê, bi destê wî girt, ji bo rûniştinê li serê odeyê cih nîşan da. Bi rûniştinê re hem wî pirsa wan kir, hem wan yek bi yek pirsa wî kir û kêfxweşî li hev dan. Selah pir bilez werger dikir. Lê wî ji gelek gotinên wan fêm dikir. Ji çiyayê Horan yê volkanîk bayekî xweş li hundirê eywanê dixist. Bi rûniştina di nava vê civata balkêş de pir kêfxweş xuya dikir. Çawa ku dostên hev yên salan bin. Suhbet dikirin, henek dikirin, dikeniyan. Pir zû li hev germ bûbûn. Bi qasî ku wan qîmet didayê û jê hes dikirin, ew jî li hemberî wan ewqas rêzdar bû.

Şêxê ji tevan mezintir ji cihê xwe rabû ber ve çû:

-Birayê Ebdullah, divê tu werî li cihê min rûnî.

Apo bi destê xwe rêzdarî nîşan da:

-Na divê tu li cihê xwe bî!

Şêx bê wergera Selah jê fêm kiribû:

-Temam, wê demê em li cem hev rûnin.

Apo cih jê re vekir, şêx li tenişta wî rûnişt.

-Birayê Ebdulah, em ji tevgera te pir razî ne. Hesreta me dîtina te bû.

Apo bi rûyekî pir xweş lê dinêrî:

-Em jî bi dîtina we pir kêfxweş in. Li hemberî her gel û her dînî em rêzdar in.

-Bi dîtina te, me dît ku çawa me xeyal dikir, tu jê mezintir î.

-Ka çi dibêjim dixwazim di jiyana xwe de jî pêk bînim.

Her ku diaxivî, kêfa şêx pirtir jê re dihat:

-Birayê Ebdulah, em te weke şêxekî xwe dibînin. Çawa hêviya Kurdan tu yî, hêviya me Durziyan jî tu yî. Li gorî nêrîna Durziyekî, buhişt tê wateya ku mirov bigihe mertebeya dîtina Xwedê. Wê jî bes nabîne, divê nêzîkî Xwedê bibe, pê re bibe yek û tevlî wî bibe.

-Belê, baweriya min jî ew e.

Berê xwe da civatê:

-Em ji bo xizmeta gel siyasetê dikin. Divê em dev ji şerîet û terîqeta sexte berdin, xwe bigihînin ya rast. Têkoşîna ez dikim ne ji bo gelê Kurd tenê ye. Ji bo gelên Rojhilata Navî ye. Tekoşîna me berî her tiştî insanî ye.

Şêxekî bi şala spî ya li serê xwe, di nîva wê de deqeke sor heyî. Bi dildarî berê xwe da Apo:

-Berê me kurd weke feqîran, bê cih û war didîtin, niha tu hatî û van tişan dibêjî. Em di rastiyê de bi xwe jî kurd in û ji Diyar Bekirê ne. Ji binemala me re dibêjin Canpolat.

Gotinên xwe qedandin, berê Apo lê bû:

-Tu xwedî li welatê xwe û gelê xwe derdikevî.

-Erê, ez heta dawiyê xwedî li gelê xwe û axa xwe derkevim. Ezê jî li ser vê soza xwe bim.

Çend kesên din jî hê civat digeriya ketin hundir. Silav dan û çûn rûyê Apo. Hemû jî bi rih û sibêlên ser wan badayî bûn. Bi Apo re ketibûn suhbetê û li ser çiyan û girêdana xwe ya bi bilindiya çiyan re digotin. Di heman demê de behsa Kurd û Kurdistanê dikirin. Şêxê wan berê xwe dabû Apo:

-Serok Abdulah, çiya me diparêzin, parastina gelê Durzî bê çiya nabe. Em jî weke we ne.

Civatê pir bi baldarî guhdarî dikir.

Piştî axaftin û suhbeteke germ û dirêj, amadekariya firavînê hat kirin. Cifniyên goşt û birincê hatin ber wan. Berxekî sax hatibû biraştin. Tevan bi hev re xwarin xwar. Germayiya derve û kelecana hundir bûbûn yek. Apo çawa ku sedê salan ji wan deran be ewqas li wan biste bû. Pirsên di dilê xwe de hemû jê kiribûn, wî jî bi baldarî hem bersiv dabû hem bala wî li ser çanda wan bû…

***

Li qata dehan Apo bi milîtanan re taştê dixwar. Berî hingê di hişê xwe de çûna Palmîra plan kiribû. Pirî caran li ser riya xwe jî dîtibû, lê diviya bi hûrgulî bibîne. Siwar li benda wî bû ku

bikevin tevgerê. Yên li malê jî li ber guhê wan ketibû ku planeke wî ya derketina derve heye. Gazî Siwar kir:

-Bila heval hemû xwe hazir bikin! Bangî seyareya me ya din jî bike, em hemû bi hev re îro diçin cihekî.

Piştî amadekariyê li seyareyên xwe siwar bûn ketin ser rê. Ew di seyareya pêş de bû:

-Siwar, me bibe Palmîra! Çiqas dûrî Şamê ye?

-Serokê min, 215 km. ji vir dûr e, nêzîkî Humsê ye.

Seyare ket ser riya welatê Melîke Zenûbya welatê dilê wî ji qomê û sînorê wî ji peravan. Berê wan ketibû, cih û warê perestgehên herî mezin yên wê demê Baal, LaaT û Bayît, Agora cihê civîn û biryaran. Du sed peykerên melikan û yên leşkeran yên nûnertiya wî çaxî dikirin, li wir bûn. Çemê Firatê ku dibe sînorê navabera Pers û Roma, wê demê di binê venêrîna Palmîra de bû. Her du şaristaniyan jî dişopand. Piştî Mîladê 237an pereyên xwe çêdike. Sala 250yan digihe asteke pir bilind, ji pêşketinên siyasî û çandî. Tevî ku 60 xwedayên wan hebûn jî, lê di nava xwe de bi aramî dijiyan. Melikê wê Ozeyna bi xiyanet tê kuştin. Ji ber ku kurê wî Wehbillah piçûk e, dayîka wî Zenûbya dibe melîke. Dayîka wê ji malabata Kleopetra ye. Pirtûkên Homeros û Eflatûn xwendibûn. Haya wê ji çanda helenîst heye. Di felsefe, xîtab û zanistê tê de pêş ketiye. Zenûbya ku navê bedewiyê lê hatiye kirin, şervan û nêçîrvaneke baş e. Serxwebûna xwe radigihîne û ji Nîlê heta Firatê di binê desthilatdariya wê de ye. Li ser van biryaran qiralê Roma Oryanûs li dijî wê şer radigihîne û Palmîra dixe çemperê.

Piştî sê saetan gihîştin çola Palmîra. Seyare sekinî. Apo peya bû. Kefiya xwe ya spî û xetên qehweyî li serê, li ser eniya

xwe baş girê da. Serê xwe bilind kir, li rojê temaşe kir. Tîrêjên wê yên dijwar li qomê dixistin. Qom bûbû weke agir. Piştî ku hinekî hewaya çolê kişandin hundirê xwe, careke din siwar bûn, ketin ser riya xwe. Bîst deqîqe derbas nebûn gihîştin keviya bajarê dîrokî. Di pencereya seyareyê re li deverên xirabbûyî temaşe dikir. Di ber re jî serê xwe dihejand: “Nirxekî dîrokî nehiştine.” Hêdî hêdî diketin nava bajêr. Berê xwe da stûnên berî çend hezar salan hatîn danîn. Seyare li ber deriyê wê yê bi navê, Deriyê Azadiyê, sekinî. Peya bû, ber bi dîwarê kelehê ve çû. Destê xwe avêt kevirên dîwêr bi jorê ve hilkişiya. Dîwar pir sist bûbû, li ber xirabbûnê bû. Çavên Rihan û Siwar li ser bûn, ji ketina dêwîr ditirsiyan. Ketibûn nava kelecanê. Rihan bilez berê xwe da Siwar:

-Li wî milê din çi heye, Serokatî nekeve!

-Milê din çaleke kûr e, em çawa jê re bêjin?

Rihanê xwe negirt:

-Serokê min, mirov dibêje qey dîwar dilepite! Milê din jî pir kûr e.

Biken berê xwe da wan:

-Ez dizanim, dev ji min berdin.

Berê xwe da newalê. Destê xwe da ber çavên xwe. Ji reşikên çavên xwe re sêwanek ji sihê çêkir. Li Palmîra qedîm ya di nîvê deştê de temaşe kir. Çawa ku çeperên parastinê bin, bajar bi çend girên bilind hatibû pêçan. Bayekî honik li rûyê wî xist. Destê xwe bi ser kevirên dîwêr yên neqişkirî ve bir:

-Ev der cihê dîrok û çanda gelan e. Zenûbya bajarekî ji berxwedanê ava kiriye. Qiralê Roma jê xwestiye teslîm bibe, lê wê gotiye kengê xatûnan stûyê xwe xwar kiriye? Ev bajar

xwediyê şaristaniyeke dewlemend e. Li hemberî dagîrkeriya Roma serî hildaye. Zilm qebûl nekiriye. Eşqa wê ji axa wê re ye. Ji bo azadiyê mirina bi qehremanî hilbijartiye. Bi gelek zimanan baş zaniye. Çanda Rojava û Rojhilat bi hev ve dane girêdan. Felsefe şopandiye. Ji Nîl heta Firatê hukumranî kiriye. Hûn li ser çi dizanin?

Her kesî wisa bêdeng lê guhdarî dikir. Rihanê bersiva wî da:

-Serokê min, dibêjin, Piştî Mîladê sala 271'ê Roma gelek caran êrîş kiriye. Zenûbya li peravên Firatê dîl hatiye girtin. Sala 272'yan birine Roma. Gotina wê ya meşhûr heye, dibêje, ez bi qederê namirim.

Rihanê bi destê xwe kevanê li pêşiya deriyê kelehê nîşan da:

-Ji vir re dibêjin, Kevanê Serkeftinê. Ev jî perestgeha Baal e.

Siwar hinekî xwe nêzîkî wî kir:

-Serokê min, riya hevrîşim di vir re derbas dibû. Di aliyê olî de jî hem kilîse, hem perestgehên Yahudiyan, hem baweriya bi agir û rojê di nava xwe de hewandine.

Berê xwe da peykerên xweda û xwedawendan. Li peykerê Îştarê, yê xwedayê şerabê, xwedayê xêrê, yê parêzvanê bajêr temaşe kir. Endezyarî û hosteyiya hatî kirin bala wî pir dikişand. Destê xwe da stûnekê û çavên xwe danîn ser hev. Ruhê xwe berda bîra wê demê. Çavê xwe vekir, li aliyê din nirî. Ji nişka ve xwe ji ser dîwêr avêt ser dîwarê li hember. Rozerîn, Rihan û Siwar bi bayê bezê di pêlekanan re ber ve çûn. Rihanê xwe nêzîkî Rozerîn û Siwar kir:

-Ez pir ditirsim tiştek bê serê wî!

Berê xwe da wan:

-Divê hûn bizanin Serokatî ne hêsan e. Ji zor û zehmetiyê natirse. Êrîşî zorê dike. Destpêkê li derdora wê re diçe tê, paşê êrîş dike û diroxîne, dişewîtîne! Tişta bide ber xwe dike!

Berê xwe da xirabeyên bajêr, meşiya. Li ber dîwarekî sekinî, gelek şahîk bû. Meşa li serê zehmet bû. Lê dixwest biçe serê. Xwe bi çalikên tê de girt da hilkişe serê. Kêliyên zarokatiyê anîn ber çavên xwe û ber bi jor ve hilkişiya. Li ser wî dîwarî jî li aliyê perestgeha Baal temaşe kir. Ji ser dîwar xwe avêt xwarê. Li ber piyê xwe darikek dît, rahiştiyê. Li erdê wêneyê stûnên kelehê çêkir. Siwar xwe nêzîk kir:

-Serokê min, em avê bînin?

-Bîne, niha heval jî tî bûne.

Berê xwe da Rozerîn û Rihanê:

-Divê mirov qedrê dîrokê bizane. Ez ji cihên wiha bayê azadiyê hes dikim, pê dihesim û pê re dijîm. Zenûbya helwesta jinê û insanê azad nîşan daye. Hûn jorê dibînin, insanên berê gorên xwe çawa li cihên bilind çêkirine. Heybeta wê demê û qîmetê dayîn gorên xwe bibînin.

Çend şûşeyên avê di destê Siwar de bûn, bilez dihat. Çavên wî li pişt Apo bi tiştekî reş ket. Dilepitiya. Marekî reş bû, xwe kirbû kofendîl. Tiştek jî di devê wî de bû. Ji rûyê Siwar fêm kir ku tiştek dîtiye.

-Serokê min, mar!

Çawa ku tu çavê xwe bigirî vekî cihê xwe guhert. Ber bi mar ve çû:

-Kevirekî bidin min!

Siwar ku dît li derdor kevir nînin, demanceya xwe derxist berê wê dayê. Mar jî ber bi wan ve dihat. Bi teqandina guleyê re,

Apo bi milê wî girt:

-Te çima wisa kir! Kê ji te re gotiye lê bixe?

Lê gule lê neketibû. Mar serê xwe bilind kir, lê ji ber ku nêçîra wî hê di devê wî de bû, nikarî tiştekî bi wan bike. Berê xwe da newalê. Tev bi hev re bi kêstekan ketin pey. Ew jî ji bo şer amade bû.

Apo gazî wan kir:

-Li xwe miqate bin wê êrîşî me bike. Lê bixin bila neçe!

Lê bê ku derbê bixe xwe berda nava xirbeyan. Tev bi hev re dikeniyan. Ku dît hê lê digerin, gazî wan kir:

-Werin lê ngerin! Ku birîndar bûbe wê bi we ve bide. Eger me lê nexistibûya wê êrîşî me bikira.

Dîsa berê xwe da Siwar:

-Ka were, te çima wisa bilez demance derxist? Baş e ti kes li van deran nîne! Me dikarî bi dest bigirin lê te nehişt!

Bersiveke ku bide tinebû.

Hinekî li dora xwe nêrî. Ji dûr ve çend kesan xuya dikir. Dixwest zû ji wir biçin:

-Em biçin, dibe ku hina dengê demanceyê bihîstibe. Hevalên keç bila biçin cihê xwe, ez û tu jî  em bi hev re biçin.

Sekinî heta ku Rihan û Rozerîn li seyareya xwe siwar bûn çûn. Ew û Siwar jî li seyara xwe siwar bûn. Siwar fêmkiribû ku divê bilez ji wan deran dûr bikevin. Lê hê jî nizanî ka wê biçin kû. Apo di pencereyê re li bermayiyên bajêr yên dîrokî, wêneyên li ser keviran hatîn verûtin û darên xurmeyan yên li wê çolê hatîn çandin dinêrî. Çavên xwe ji ser wan nedibirin, ew dem û tevgera mirovên berê di xeyalên xwe de çêdikirin. Di wan kêliyan de çav û hişê xwe berdabûn wan xarên dûr û dirêj…

***

Pazdehê Tebaxê bû. Sîpan, du xortên din û du milîtanên jin li eywana qata dehan rûniştibûn. Her ku dengê derî dihat, Sîpan radibû diçû korîdorê da bizane ka Apo ye yan na. Her du milîtanên din, hê nizanîn ka wê bi kû ve biçin, yan jî li kû ne. Sîpan ji wan pirtir ew der nas dikir. Ketibû çardesaliya xwe, bejna wî jî bilind bûbû. Êdî xwe bi milîtanan re qiyas dikir. Lê hê jî dêmên wî yên zarokan bûn û ji pakbûna ser rûyê wî tiştek kêm nebûbû. Rûyê wî hinekî jî gewr bûbû. Milîtanên din wisa bêdeng rûniştûbûn. Sîpan berê xwe da Şervînê:

-Heval, navê te Şervîn bû, ne?

Şervînê hinekî lê temaşe kir. Biken bersiva wî da:

-Rast e, navê min Şervîn e. Tu jî Sîpan bûyî ne?

-Erê, me hev dîtiye.

Milîtanan wisa bêdeng li wan guhdarî dikir.

Ji ber ku Sîpan bê xebera Apo û malbatê hatibû wir, ne rehet bû. Ji bo sivikkirina nerehetiya xwe dixwest biaxive:

-Îro 15'ê Tebaxê ye, karê Serokatiyê pir e.

Berê her çaran jî lê bû, guhdarî dikirin. Ji gotina wî fêm kirin ku wê Apo li wir bibînin. Ji ber wê kêfa wan hatibû.

Sîpan li saeta bi dîwar ve nêrî, ber bi yekê ve diçû. Dema xwarinê bû, dizaniya Apo li kû be wê nîvro xwe bigihîne wir, bi xêrhatina mêvanan bike û bi wan re firavînê bixwe. Pir bêsebir bû, di cihê xwe de nedisekinî, di nava çend kêliyan de çend caran rabû û rûnişt. Xortekî xweşik jê çêbûbû. Kêfa milîtanên din jê re hatibû; hem zindî bû, hem weke mezinan tevdigeriya. Çavên Şervînê ji ser nediçûn. Xwest tiştekî jê bipirse:

-Ne cara yekê ye tu Serokatiyê dibînî, rehet rûne.

Di cihê xwe de rûnişt. Di hundirê xwe de li bersiva pirsan digeriya: “Ezê çawa ji Serokatiyê re bêjim ez bi serê xwe hatime vir.” Di wê navê re dengê derî hat. Sîpan bikelecan rabû, çû ber derî. Siwar tenê bû. Sîpan di hundirê xwe de got, wê demê Serokatî ne li vir e. Dîsa vegeriya eywanê. Ciwan bû, germ bû û hinekî jî dixwest yên li wir bizanin ku ne cara yekê ye tê wir:

-Hevala Şervîn akademî çiqas xweş bû, ne wisa? Ew rojên li wir qet ji bîra min naçin.

Kêfa yên li wir pirtir jê re hatibû. Çawa ku bêjin vî ciwanî jî perwerdeya Serokatiyê dîtiye.

Şervînê ji metbexê çay anî, careke din li cem Sîpan rûnişt:

-Êê, dibistan çawa diçe, pîrika te çawa ye?

-Baş e. Serokatiyê bangî min nekir, min jî lê da ez hatim.

-Tu hinekî din mabûyayî wê bangî te bikira!

Hê diaxivîn, dengê derî hat. Bi vebûna derî re Apo ket hundir. Hemû rabûn ser xwe.

Bi derbasbûna eywanê re çavê wî bi Sîpan ket:

-Hoo, tu hatî, tu bi xêr hatî. Tu çawa hatî hê dema soza me mabû?

Sîpan dest bi axaftinê kir:

-Serokê min, li akademiyê we got tu hinekî din mezin bibî tuyê tevlî koma min bibî. Ez pir li benda we mam, lê we bangî min nekir, min lêda ez hatim.

Apo ew himbêz kir, pişt re berê xwe da milîtanên din. Li ser kursiyê di nîvî de rûnişt, pirsa rewşa wan kir. Careke din berê xwe da Sîpan:

-Êê, tu çawa hatî? Xwendina te çawa ye?

-Serokê min, baş e. Niha betlane ye.

-Hê min rênekiribû pey te, tu zû hatî.

-Serokê min, rojên akademiyê di dilê min de bûbûn hesret! Ew rojên xweş ji dilê min dernediketin.

Şervînê bi baldarî lê temaşe dikir. Gotina di dilê min de bûbû hesret bala wê kişandibû. Lê kêfa wê pir jê re hatibû. Milîtanên din li suhbeta wan temaşe dikirin. Apo berken bû, çavên wî li ser Sîpan rawestiyabûn:

-Tu hê ciwan î ne dema te û hesretê ye?

-Serokê min, gotinên we ji bo min bûbûn hesret.

Hinekî li bejna wî ya bilind û bedew nêrî:

-Ya mezinbûnê tu mezin bûyî. Lê divê tu xwendina xwe jî biqedînî. Mirovên xwendevan ji bo me pêwîst in!

Xeyalên Sîpan ketibûn avê, fêm kir ku divê demeke dirêj bixwîne:

-Serokê min ev sal jî va wê biqede.

Hinekî lê temaşe kir, fêm kir ku naxwaze ji cem biçe:

-Divê tu li cem pirîka xwe bî. Ew bi tenê dimîne, min ji te re got, ji bo me kesên xwendevan ji paşrojê re pêwîst in. Ji ber wû teqez divê tu bixwînî û xwe zane bikî.

-Serokê min ez li cem im, xwendina min jî baş e, lê hişê min li vir e.

Fêm kir ku bi serê xwe hatiye. Li bendê ma ku ew bixwe bêje. Wî jî fêm kir ku sûc kiriye:

-Serokê min, min tiştekî din jî kiriye?

-Te çi kiriye?

-Ez bê pîrika xwe hatim mala apê xwe yê li vir. Min wisa xwe gihand vir.

Rûyê xwe lê tirş kir:

-Te çima wisa kir? Kê tu anî vir?

-Xebatkarên Şamê ez anîm cem Siwar, wî jî ez anîm vir.

Rabû ser xwe, berê xwe da milîtanên din:

-Hûn dibînin, yê carekê tê vir êdî ji me qut nabe.

Sîpan li aliyekî jî kêfxweş bûbû: "Min digot qey Serok ez ji bîr kirime."

Apo careke din lê nêrî:

-Baş e. Emê bi hev re xwarinê bixwin pişt re biçin dibistanê. Ezê xeberê rêkim ji malê re jî ku tu niha li cem me yî. Îro pazdehê Tebaxê ye. Em niha ji civînekê hatin, dema çûna dibistanê ye.

Ji bo firavînê birinc û selete hatibû hazirkirin. Bi her çar milîtanên nû hatîn re diaxivî. Bi hev re çûn ser sifreyê. Çawa ku bi çaveke taybet li xwe binêre, Sîpan li hemberî Apo rûnişt. Piştî xwarinê çûn dibistanê. Ji bo pîrozbayiyê merasimeke taybet hatibû amadekirin. Bi sedan milîtan di merasimê de bûn. Dibistan bi her sê alan hatibû xemilandin. Tabloyeke mezin jî ji bo Mahsum Korkmaz hatibû çêkirin. Li pişt wêneyê wî yê bi çekên gerîla, ala ARGKê hatibû çêkirin. Li serî jî, bi xetên stûr, "SALVEGERA 15ê TEBAXÊ YA 10. ME ŞER KIR Û EM BÛN ARTÊŞ" nivîsîbû. Li her du aliyan jî wêneyên şehîdan hatibûn bicihkirin. Hema hema li her bostek ji dîwar wêneyek, yan durişmek hatibû bicihkirin. Pirbûna durişm û wêneyên şehîdan dîmenê dibistanê guhertibûn. Dema mirov diket hundir, her tiştî bala mirov dikişand. Li pişta maseyê axaftinê jî li ser cawekî sor bi xetên stûr, "DEWREYA SERKEFTINÊ YA SALVEGERA 10." hatibû nivîsîn. Li her du teniştên durişmê û

li nîvî milîtaneke jin, dudu xort her yek aleke mezin di dest de bû li ser piyan sekinîbûn.

Bilez derbasî pişta mase bû. Gumlekekî milqut yê keskê henê û pantolonekî risasî lê bûn. Pora xwe weke her car paş ve şeh kiribû. Mase jî bi alên ERNKê hatibû xemilandin. Li nîvê mase mîkrofon, li her du seriyan jî gul hatibûn danîn. Perwane jî vekirî bû. Piştî silavdayînê her kes li cihê xwe rûnişt. Hinekî li nava dibistanê temaşe kir. Pişt re li destegulên li ser mase temaşe kir. Çavên wî li ser ala ERNKê ya li ser mase sekinîn. Çavên xwe digerandin. Vê carê çavên wî li durişma li taliya dibistanê “BIJÎ SEROK APO ket. Dused milîtanên rûniştî di ber çavên xwe re derbas kirin. Milîtanên jin li aliyê çepê, yên xort li aliyê rastê rûniştibûn. Piştî ku her tişt di ber çavên xwe re derbas kir dest bi axavtina xwe kir:

-Salvegera 10. ya 15'ê Tebaxê, li gelê Kurdistanê pîroz be. We hemûyan silav dikim. Ev şer û serkeftina deh salan ya we bû. Artêşa gel 15'ê Tebaxê çêbû û roj bi roj şer gur bû. 20 salên partiyê û 10 salên ARGK'ê ji bo we bûn. Berî niha yê ji dijminê xwe re leşkerî dikir, ji bo dijminê xwe welat terk dikir, dijminê xwe mezin dikir û xwe dixapand, gelê Kurd bû. Rewşa wan ji ya xayînan xirabtir bû. Li seranserê dinyayê her gel xwedîwelat e, lê tişteke me nîne. Kurdan nedigot, çima ez di vî halî de me. Berî her tiştî hûnê jiyana xwe ya berî deh salan bînin bîra xwe.

Çend kêliyan sekinî, bala xwe dîsa da milîtanên li hundir. Di dilê xwe de got, ev dibistan ji bo guhertin û veguhertinê ye. Komkirina encamên şoreşê ye:

-Dema we dijminê xwe nas kir, hûnê riya Kurd û Kurdistan û insaniyetê jî nas bikin. Di şerê 10 salan de jiyaneke we çêbû.

Dijmin welat dişewitîne û insanên me dikuje. Nebêjin çima dijmin me dikuje wê zêdetir bikuje. Yên jiyanê dixwazin hûn in û hûnê têbikoşin. Nebêjin em nikarin tiştekî bikin. Wê durişma we ev be: “Yan intîqam yan intîqam, yan şer yan şer, yan serkeftin yan serkftin” Çareyeke me ya din nîne.

Çawa ku anonsek li her çar dîwarên dibistanê bikeve, vê gotina wî û dengê wê di dilê milîtanan de vedida. Bi vê gotina xwe re salên serkeftinê di dilê xwe de çêkiribû, dixwest her kesê li wir jî bibîne:

-Kurdistan welatekî cenet e û gelê Kurd gelekî birûmet e. Min got divê em bibin gelê insaniyetê û bibin welatê herî xweş. Hûn dibînin serhildanên Kurdistanê bi ser dikevin. Careke din em soza mezin li ser serkeftinê didin û ji we hemûyan re serkeftinê dixwazin.

Bi vê axaftinê re mirên bi dibistanê ket û dengê durişm û çepikan bilind bû. Milîtanan hêzeke mezin ji axaftinê girtibû, her kes li hemeberî yê din rûken bû. Kom bi kom derketin derve.

Sîpan jî li hewşa dibistanê sekinîbû, çavên xwe li Apo digerandin. Li tenişteke hewşê Apo bi milîtanên nû hatîn re diaxivî. Siwar çû cem Sîpan, destê xwe danî ser milê wî:

-Xorto, tu baş î? Tu çima wisa sekinî?

Sîpan hê li derdora xwe temaşe dikir. Siwar careke din destê xwe li milê wî da:

-Tu çima hinde bi balkêşî li derdor dimeyzînî?

-Ez pir ji zimanê tirkî fêm nakim ji ber wê meyze dikim. Ez baş guhdarî dikim da bizanim ka çi dibêjin.

Di wê navê re Apo ber bi derî ve çû. Her kes di cihê xwe de sekinîbû. Bangî Sîpan kir. Tev de ketin seyareyê çûn. Li

dibistana kurdî jî amadekarî hatibû kirin, li benda Apo bûn…

***

13ê Cotmehê bû, cotyaran di nava erdan de serî hildabû. Beytik û reşêle li baniyan difiriyan, bi xwe re mizgîniya cotkirinê dianîn. Êdî bayekî bi toz û ecac radibû. Pelên daran rengûreng bûbûn. Bayekî cemidî li wan deran dixist. Saet dehê sibê bû. Dinya ewr bû. Berê Apo li Helebê bû. Kemal seyare diajot. Şervîn û Mezlum jî li ser kursiyên paş rûniştibûn. Apo bi awayekî bêdeng li derdor temaşe dikir.

Li nêzîkî Palmîra seyare sekinî. Bê ku pirsa sedema seknê bike, Apo rahişt şûşya avê ji seyareyê daket. Li darên xurmeyan yên li her du aliyên rê temaşe kir. Nefeseke kûr kişand. Ji ber rûniştina dirêj pişta wî êşiyabû. Pişta xwe hinekî ferikand, pişt re jî xwe ba da, qurpênî jê anî. Şûşeya avê vekir, kulmek avêt ser çavên xwe, dîsa siwar bû.

Kemal qepaxa pêşiya seyareyê vekiribû lê dixebitî. Dikir nedikir seyare nedixebitî.

Xwêdanê di eniya wî re avêtibû. Rengê wî yê esmer reşheşîn bûbû. Êdî nizanî çi bike. Her du destên xwe xistibûn teniştên xwe.

Apo careke din ji seyareyê peya bû. Kemal bi awayekî melûl lê nêrî:

-Serokê min seyareya me naxebite.

Mezlum û Şervîn jî daketin. Ew jî ketibûn kelecanê.

Apo pir aram bû:

-Fêm bû, ev seyare me nabe. Em dikarin seyareyekê kirê

bikin? Lê divê tiştek bi ya me neyê.

-Belê serokê min, em dikarin yekê kirê bikin.

Cihekî tamîrê li nêzîk hebû, Kemal û Mezlum bilez berê xwe dan wir. Seyareyek li wir kirê kirin, vegeriyan cem seyareya xwe. Ya xwe jî bi dehfan birin cihê tamîrê. Li xwaringeha li tenişta tamîrxaneyê xwarina xwe jî xwarin, ketin ser riya xwe.

Piştî nîvro gihîştin Helebê. Li nava bajêr sekinîn. Xortekî bîst salî li wir li benda wan bû. Hê di seyareyê de Apo ew nas kir. Ew û yên din peya bûn, Kemal jî xwest cihê seyareya xwe xweştir bike.

Apo destê xwe danî ser milê xortê hatî pêşiya wan:

-Alan, tu hatî tu çawa yî?

Alan bi dîtina wî pir kêfxweş bûbû:

-Em baş in serokê min.

-Bavê te çawa ye?

-Bavê min jî baş e.

Apo li dora xwe nêrî. Hewa xweş bû, ket dilê wî ku hinekî bimeşe:

-Mezlum, hê em li sûkê ne, ka em biçin kelhê.

Gazî Alan kir:

-Alan, tu li vir mezin bûyî, bikeve pêşiya me, emê li kelhê bigerin.

Alan ket pêşiyê berê xwe dan kelhê. Keleh li navenda bajêr bû. Ji bo bajêr weke taceke ji kevirên spî xuya dikir. Gelek caran dest guhertibû. Şaristaniyên weke Grek, Bîzans, Memalîk û Eyûbiyan tê de bûbûn hukumdar. Berî wan jî, Berî Mîladê Aşûrî, Babîlî û Pers lê bûne desthilatdar. Piştî wan jî Îskenderê Mekdonî dest datîne ser. Gelek şopên wê demê hê lê hebûn. Piştî

Mîladê sala 636an bi serkêşiya Xalid Bin Welîd Heleb dikeve destê artêşa Ereban. Pişt re sala 944an dikeve destê Seyfud-dewle yê Selçoqî. Di sedsala 12an de bi serkêşiya Tîmur Lenk, keleh careke din bi destê Moxolan tê roxandin. Pişt re jî dikeve destê Osmaniyan. Di nava kelhê de bermayiyên aşên bayê û hemam tên dîtin.

Li ber dîwarê kelhê Apo berçavkên xwe yên rojê dan ber çavên xwe. Çavên wî li ser dîwar sekinîbûn:

-Alan, tu vî dîwarî dibînî, ev çi ye?

-Kevir in serokê min.

-Ez jî dizanim kevir in, lê ne kevir tenê ne. Hûn pir seresere nêzîkî berhemên dîrokî dibin. Her cara diçim cihekî dîrokî fêrî tiştekî nû dibim. Her kevirê hûn bibînin, divê hûn bizanin ku ne kevr tenê ye. Fêrî girîngiya wê bibin.

Destpêkê li hawîrdorê kelhê geriyan, pişt re berê xwe dan derî. Nivîsa li ser derî bala wî kişand:

-Şervîn, ka were bixwîne ev çi nivîsiye?

-Serokê min, dibêje di serdema Selçoqiyan de ev keleh hatiye avakirin. Mizgefta Îbrahîm Xelîl ya di nava wê de jî di dema Selahedînê Eyûbî de hatiye çêkirin. Ji wê demê ve navê wê bûye Keleha Heleb Eş-Şehba.

Çavên wî li ser her du şêrên li ser derî sekinîn. Yek ji wan dikeniya, yê din digiriya. Di navbera wan de jî wêneyê dara xurmeyan hebû. Derbasî hundir bûn. Ji ber şeran gelek caran keleh hatibû xirabkirin û çêkirin. Li cihê herî bilind li bajêr temaşe kir. Pişt re daket. Nivîsan pir bala wî dikişand. Şervînê jî her nivîsa didît jê re werdigerand:

-Serokê min, ev nivîs jî dibêje, di navbera sedsala 13-16an

de hatiye avakirin. Ew deriyê em tê re ketînê yê siyemîn bû. Navê wî Deriyê Maran e. Ev sarincên avê jî sedsala 12an, di dema Nuredîn Zengî de hatine çêkirin.

Berê xwe da Mezlum û Kemal:

-Binêrin, insanên berê bi kedeke mezin ev cih ava kirine. Ji bo avê cih çêkirine. Cihê parastina şervanên xwe çêkirine. Niha ti kes qîmetê wê nizane û her derê qirêj dikin. Hevalên me jî li welat hê di binê naylonan de ne.

Bi mereqeke mezin û bi baldarî li her derê temaşe dikir.

Piştî ku li deverên girîng tevan geriyan, daketin berê xwe dan bazara bajêr. Çavên xwe li seyareya xwe gerandin, lê xuya nedikir. Apo bi wî dîmenê wan yê bêçaretiyê keniya:

-We em di Helebê de wenda kirin. Mezlum, em hinekî bigerin ka em nabînin.

-Serokê min, xelk we nas dikin, ji bo ewlekariyê ne baş e.

-We nehişt em li kelhê jî bigerin, vir jî hûn dibêjin nabe! Xem nake em carekê li derdora bazarê bizivirin.

Mezlum ket pêşiyê, yên din xwe dan dorê meşiyan. Ji bo kişandina resman Kemal kameraya xwe derxist çû pêşiya wan. Geh pirs ji wan dikirin, geh ji wan re behsa bajêr dikir. Li Şervînê vegeriya:

-Divê em dora kelhê jî baş bibînin. Dora wê jî weke hundirê wê xweş hatiye avakirin. Weke bajarê Amedê ye. Taxên wê, kolanên wê weke yên wê teng in. Kalekî bi destê keçikeke piçûk girtibû di ber wan re derbas bû. Mezlum lê ketibû gumanan, lê zû ji ber çavên wî wenda bû. Di dilê xwe de got, ev weke Kurdan bû, dibe ku Serok nas kiribe. Çend gav avêtin dît ku kalo sekiniye li wan temaşe dike. Her du tiliyên xwe jî bilind

kiribûn. Ji wir derbas bûn, ketin kolaneke teng. Sê kesan bi kêran şer dikir. Mezlum çû cem Kemal:

-Dibe ku ev provokasyonek be.

Şervînê jî xwe gihand wan:

-Em riya xwe biguherînin.

Hê ew diaxivîn Apo ket kolaneke din. Çavên wî li ser sûrha kelhê bûn:

-Bi dîtina van cihan re ez rojên borî û niha tînim hemberî hev.

Berçavka xwe danî, çavên xwe ferikandin, dîsa da ber çavên xwe. Kesên li derdor bi baldarî lê dinêriyan. Şervînê xwe nêzîkî Mezlum kir:

-Em ji Serokatiyê re bêjin em biçin malê baştir e.

Mezlum xwe bilez nêzîk kir:

-Serokê min, vir ji bo ewlekariyê ne baş e, em biçin malê baştir e.

-Madem hûn wisa dibêjin em biçin.

Di wê navê re Alan jî seyare dîtibû, li pêşiya wan sekinîbû.

Ku Apo çav pê ket keniya:

-Wey Alan tu li Helebê mezin bûyî, te em wenda kirin! Emê bi meşê biçin malê nabe? Piştî ku ti kesî dengê xwe nekir, dest bi meşê kir. Mezlum li kêlekê bû:

-Serokê min milet li we dinêre, we nas dikin.

Apo keniya:

-Ti kes min nas nake. Hûn li vir di nava gel de ne, gel we nas dike.

Cihê tê re derbas dibûn taxa Suryana Nûbû. Piştî qasekî gihîştin devê deriyê mala ku biçinê. Bi pêlekanan re hilkişiyan

heta gihîştin qata çaran. Bêhna wî çikiyabû. Bi lêxistina derî re Dînê derî vekir:

-Wey tu bi xêr hatî serokê min!

Ji kelecanê dengê wê bilind derketibû. Wisa di derî de xwe avêt stûyê stûyê himbêz kir.

Bixêrhatin da yên din jî û ketin hundir.

-Apo li Dînê vegeriya:

-Divê tu vê malê biguherînî, hilkişîna di van pêlekanan re zor e.

-Serokê min soz, ezê îsal biguherînim.

-Cara din jî dema ez hatîm te got ezê biguherînim, te ev kirî. Ew jî qata çaran bû ev jî ya çaran e.

-Serokê min odeyên vê pir in.

-Tu naguherînî da mêvan di pêlekanan de bikevin.

Bi hev re keniyan. Apo li hundirê malê temaşe kir:

-Ka zarok li kû ne?

-Serokê min, di odeya xwe de dixwînin, ezê gazî wan bikim.

Piştî çend kêliyan Dînê her çar zarokên xwe anîn.

Apo yek bi yek bi wan re elaqedar bû:

-Navê te Melsa bû? Dema min tu dîtî tu piçûk bûyî. Min got navê wê xweş e. Ev nav hê li Bakur min bihîstibû.

Berê xwe da birayê wan:

-Ezîz merheba. Ka were min maç bike. Xwîşkên te li te dixin?

Ezîz şerm dikir, di ber xwe de got na.

Gazî her du keçikên din jî kir:

-Ka werin, merheba. Spî di serê we de hene? Biçin

defterekê bînin, ezê ji her sê keçikan re biranînekê binivîsim.

Melsa bilez çû û defter anî. Her çar li dora wî rûnşitin. Apo bi xetên xweş ji wan re dinivîsî. Di wê navê re Elî û Emer ketin hundir. Dengê xwe nekirin heta nivîsa xwe qedand. Pişt re bixêrhatin danê.

Ji dilxweşî çavên Dînê ji ser Apo nediçûn. Cara yekê didît ku Apo henekan dike. Cilên wî yên paqij û lihevhatî bala wê dikişandin. Di dilê xwe de got, hê ji rengên berê li xwe dike. Bala xwe da pora wî, çend avêdeyên spî zêde bûbûn. Ciwantiya wî anî ber çavên xwe. Kêfa wî jî ji welatparêziya wê re pir hatibû:

-Heval çi dikin, tên vir?

-Belê serokê min tên, civînên xwe jî li vir çêdikin.

-Çima li mala te çêdikin, bila malên nû vekin, ma heta niha ti mal venekirine? Dibe ku li vir rehet bin, lê divê giraniyê li ser vir çênekin. Dema tên vir alîkariya te dikin?

-Serokê min, karê hevalan pir e. Ez naxwazim alîkariya min bikin.

-Na, ev zilm e. Divê ew karê xwe bikin, ne hûn karê wan bikin. Tuyê ji wan re bêjî kerem bikin karê xwe bikin.

Berê xwe da Emer:

-Ha Emer, tu li Şamê yî, em li vir hev dibînin. Tu nayî cem min, nabêjî ka çi dike. Carê were em bi hev re bimeşin. Tu Şamê baş nas dikî. Em biçin bigerin, sporê bikin. Tu min dibînî ji bêtevgeriyê min kîlo girtine.

-Serokê min, ji bo ewlekariyê baş nabe ji ber wê ez nayêm.

-Tê bîra te, dema ez hatîm Şamê cih tinebû em lê razin. Tam bû şazdeh sal tu hatî Şamê. Dema ez çûyîm Helebê jî cihê me

tinebû, heta serê sibê em li derve man. Niha me ji bo xwe cihên tewra mezin çêkirine. Ji bo Kurdan ne ji bo şexsê xwe. Şazdeh salên din wê Kurd li Rojhilata Navî bibin pêşengên vê herêmê ez vê sozê didim.

Emer pir bikêf bû:

-Berî şazdeh salan dema tu li cem me, me sibê sê çar nifşên xwarinê danîbûn. Te ji hevalê Ethem re got, çima evqas xwarinê datînin.

Serê xwe hejand:

-Erê, Ethem hevalê min yê destpêkê bû. Divê neyê jibîrkirin. Bi ruh û can kar dikir.

Emer axaftina xwe domand:

-Ethem ji min re got, xwarinekê tenê bihêle, yên din rake.

-Rast e, ez niha jî wisa dibêjim, ez dibêjim nan û pîvazek, germiyek û dewek bes in.

Berê xwe da Mezlum wan:

-Ev hevalên me yên kevin in. Emer hê 78'an hatibû Surucê li wir Edhm dîtibû. Piştî wê em hatin cem wan. Gotinek tenê jê re gotibû; gotbû em partiyek in, dixwazin kurdistanê tevê xelas bikin, ne wisa bû Emer?

-Belê serokê min, got, karê me welatparêzî ye, em haziriya xwe dikin. Wê demê ez şandim Enqere da hevalekî bibînim. Ez çûm cihê xwendevanan. Wê rojê polîsan bi ser wir de girt. Ez vegeriyam cem, got min te nikarî bibînî. Lê eger em bên Sûriyê hûn dikarin bi me re alîkariyê bikin? Min got erê.

-Em hefteyekê li cem te man. Ethem gelek fedekar bû.

Li saeta xwe nêrî:

-Mezlum dema civînê ye, çima ti kes nehatiye? Ma we

agahdar nekirine?

-Serokê min, wê niha werin. Seyareya me ya li Palmîra mayî jî wê îro bigihe vir.

-Divê nirxên şoreşê bên parastin.

Di wê navê re dengê derî hat. Çirûsk bikelecan ket hundir. Wî û Apo hev himbêz kirin, rûnşitin. Piştî çend kêliyan jî yên ji bo civînê jî kom bi kom hatin.

-Apo li Çirûsk temaşe kir:

-Gel li benda me ye. Piştî civînê emê biaxivin.

Rabûn bi hev re çûn eywanê. Ji bo civînê cih hatibû amadekirin. Piştî silavdayînê Apo derbasî pişta mase bû. Ala ERNEKê li ser hatibû danîn. Çirûsk jî li nêzî mase di nava gel de li ser kursiyekî rûnişt. Rojên wî yên destpêka rêxistinê hatin bîrê. Mirov digot qey ne li vê dinyayê ye, wisa bêdeng rûniştibû. Çavên Apo çûn serê. Hinekî zeîf bûbû. Pora wî jî siviktir bûbû. Lê spîbûna porê lê hatibû. Xetên temen li ser dêmên wî xuya dikirin. Apo jî ew rojên berê anîn ber çavên xwe. Di dilê xwe de got, me bi ciwantî dest pê kir, niha jî hevalên me pora wan spî bûye. Vê rewşê hinekî xemgînî pê re çêkir. Berê xwe vegerand ser civatê:

-Li welat her ku diçe şer gurrtir dibe. Ji bo tinekirinê dijmin bi tevayiya hêza xwe bi ser Kurdan de tê. Li hemberî vî dijminê xedar êdî sebra me nemaye. Yê bêje ez dikarim tiştekî bikim nîne. Zarokên we yên tên gel me jî bêçare ne. Nikarin tiştekî bikin. Hûn durist in, fedekar in lê nizanin çawa derbê li dijmin bixin. Hûn her tiştî ji min dixwazin. Min gelek tişt dane lê hûn ruh û mejiyê xwe nadin ser. Ez jî weke we karker im, gundî me. Hûn şaşîtiyan dibînin. Hûn dibêjin bila partî rast bike. Partî kî

ye? Ez im, tu yî, hûn in.

Dixwest êdî ji wê rewşa gel di navê de pirtir nêzîkî kesayet û rastiya wî bike:

-Gelê xwe zana neke iflah nabe. Hûn dema xwe çawa derbas dikin? Hûn dibînin heta qirikê ez di nava şer de me. Niha ev şervan li serê min bûne bela, nizanin xwe mezin bikin. We zarokên xwe fêr nekirine. Ji axatiyê pêve ji we fêrî tiştekî nebûne. Ezê çawa wan li hemberî dijmin bidim meşandin.

Dayîkan di civînê de li hev dinêrî, bi hejandina serê xwe gotinên wî hemû erê dikirin:

-Çima hûn mezin nabin? Divê dema we ji bo karê şoreşê hebe. Şoreş şoreşa gel e, ne ya min tenê ye. Ez jî ji bo insaniyetê li ser kar im. Divê hûn şoreşeke zêhnî, fikirî û ruhî çêkin. Em di hundirê partiyê de çêdikin, hûn jî di hundirê xwe de çêkin. Bila her yek ji we bibe bombeya atomê. Miroj ji insanê Kurd ditirse; radibe û dikeve. Divê hûn bibin sazî, weke eşîran nemînin. Eşîrtî dibêje bila reîs bike, bila mezinê malê bike. Ev ne rast e, hûnê bixwe bikin. Ji min serkeftineke wisa erzan nexwazin, xewn û xeylan nexwazin. Rastiyê bixwazin, xeyala mezin û xewna mezin jî min pêk anîn.

Hinekî dîsa li wan nêrî, dixwest bizane ka baş guhdarî dikin yan na:

-Divê hûn nefsa xwe terbiye bikin. Dev ji xwe bernedin. Ez jî insanek im û ji tinebûnê van tiştan çêdikim. Eger hûn dixwazin rastiya Serokatiyê fêm bikin ev e. Hevalên şehîd êşeke mezin didin min jî û dêbavên xwe jî. Weke perperokan xwe diavêjin nava agir. Hêza xwe û dijmin nas nakin. Ji destê kê çi tê bila bike. Niyeta dijmin xirab e. Yên dibêjin em dost in jî pir ne

bi me re ne. Ez bixwe li ser erka xwe me û wê şer xurttir bibe. Lê divê gel jî xwe amade bike.

Piştî axaftineke dirêj bi gotina “Serkeftinê ji we re dixwazim” pişta xwe du kursî.

Dengê durişim û çepikan ji ewyanê bilind bû.

Piştî bêdengiyekê, bi destê xwe Çirûsk nîşan da. Bi nîşandanê re rabû ser xwe:

-Hûn vî hevalî nas dikin? Hevalê herî kevin e, ji Dêrsimê ye. Berî niha 22 salan me hev nas kir. Şeş salan di zindana Elmanya de ma. Dikare behsa dîroka partiyê û şer ji we re bike.

Yek ji nava gel rabû ser xwe:

-Navê min Kamîran e. Hin pirsgirêkên siriyetê hene, bi taybetî di derbaskirina hevalan de.

-Tu behsa karê li ser avê dikî. Rast e siriyet zeîf e. Rêzan di karê xwe de lewaziyê dikin.

-Serokê min, di malan de bi cîhaz diaxivin û zarok jî li derve weke wan dikin.

Yekî bitemen rabû serxwe:

-Serokê min, li ser hilbijartina li Bakur û Tirkiyê hûn çi dibêjin?

-Hilbijartin nîne, lîstika dijmin e. Dixwaze pêngava me bêbandor bike.

-Ewropa çiqas bi me re dost e?

-Ewropa piranî bi berjewendiyên xwe re ye; dixwazin hem ji Kurdan, hem ji Tirkan sûdê bigirin. Bi giraniya me Tirkan bikin lîstikên xwe, bi giraniya Tirkan jî me mecbûrî xwe bikin. Emperyalîst in, lê neçar in têkiliyan jî daynin. Rusya jî Emerîka jî wisa ne. Wê bixwazin ji têkiliya bi me re sûdê bigirin. Em jî

dixwazin ji nakokiyên navbera wan sûdê bigirin.

-Serokê min, Emerîka û Tirkiye hevdîtinan pir dikin, wê ev bandoreke çawa li me bike?

-Emerîka dixwaze li Rojhilata Navî li gorî xwe aştiyekê çêke. Dixwaze şerê Ereb û Îsraîlê çareser bike. Ev ji bo me ne xirab e. Weke din dixwaze bi riya partiyên Başûr Kurdan bi xwe ve girê bide. Heta dixwaze me jî bi xwe ve girê bide. Dixwaze siyaseta serxwebûn û azadiyê rake, wan serokên sexte dayne ser serê me. Lê em derfetê nadinê. Lê divê em ji nakokiyên heyîn sûdê bigirin. Dibe ku sibê xwe dost jî nîşan bidin. Têkilî jî çêdibin lê bi temamî tektîkî ye. Xeta me heta dawiyê ya serxwebûn û azadiyê ye.

Yekî din rabû ser xwe:

-Navê min Ehmed Mihemed Hiso. Serokê min xebata partiyê li Kurdistana Sor çawa ye?

-Li Botanê em nikarin cihekî ji xwe re çêkin, Kurdistana Sor li kû ma?

Yekî din rabû ser xwe:

-Ez Bavê Ciwan. Ji Hesekê me. Serokê min, hûn dizanin meha Tebaxê hilbijartina Meclisa Sûriyê çêbû. Di hilbijartina berî niha de ser 27 hezaran re me deng girtibûn. Di vê hilbijartinê de me 60 hezar deng girtin. Dengên me ji yên pariyên Kurdan tevan pirtir bûn. Di rastiyê de em derketibûn, lê dîsa kursî nedan me.

Serê xwe hejand:

-Armanca me du tişt bûn, ya yekê, Kurd li Sûriyê xwe birêxistin bikin, ya din, me dixwest dengên Kurdan bi awayekî fermî diyar bibin. Dengên me girtîn baş bûn.

Axaftin û suhbetê du saetan dewam kir. Piştî gotina wî ya dawiyê yek ji nava gel rabû helbestek xwend. Bi durişim û çepikan civîn qediya.

Êdî dema xewê bû, Apo yekser çû odeya jê re hatî amadekirin, Mezlum û Kemal jî ji bo nobetê derbasî metbexê bûn. Geh behsa civînê dikirin, geh bîranînên xwe digotin û dikeniyan.

Apo di ser milê xwe re bi keviyeke betaniyê girtibû, aliyê din li erdê bû û balîvê wî jî di binê çengê wî de bû. Bi wî awayî ber bi metbexê ve dihat. Ji şerma nizaniyan ka çawa dîtine û çawa rabûne ser xwe. Diyar bû ku ji ber dengê wan yê bilind şiyar bûye:

-Hûn nahêlin mirov saetekê çavê xwe dayne serhev!

Her du di cihê xwe de cemidîbûn. Hê bersiv nedayîn, -jixwe bersiveke bidin jî tinebû- berê xwe da odeyeke ji metbexê dûr. Haya wî jê hebû ku ew jî vala ye.

Kemal û Mezlum li hev dinêriyan; pir xemgîn bûbûn ku bûne sedemê şiyarbûna wî.

-Hevalê Kemal, ez dibêjim bi dengê nizim biaxive, tu weke li ser çiyê bî diaxivî. Xewa Serokatiyê pir sivik e.

-Min fêm kir, vê carê tobe be.

Qederekî wisa bêdeng man. Mezlum destê xwe danî ser milê wî:

-Bi qasî ez dizanim li wê odeyê cihnivîn tinebûn.

Rabûn ser xwe ber bi odeyê ve çûn. Li ser tiliyên piyên xwe dimeşiyan. Deriyê odeyê hinekî vekirî mabû. Xwe di erdê re dirêj kiribû, betanî bi xwe de kiribû. Bi xew ve çûbû. Tiştekî ku bikin tinebû, careke din vegeriyan cihê xwe.

Weke her car saet pêncan ji xew rabû. Betaniya xwe pêça, dest bi sporê kir.

Kemal û Şervîn li metbexê taştê amade dikirin. Şervînê çeydan ji destê Dînê derxist:

-Min nizaniya tu, Elî û Emer şevê din ranezane.

-Heval, em jî bi qasî we li Serokê xwe miqate ne.

Di wê navê re Apo ket hundir, rojbaş da wan:

-Ka ez çi bikim?

Dînê bi rûyekî pir xweş bersiva rojbaşa wî da:

-Serokê min, her tişt amade ye.

Li ser mase hêkên kelandî, mekdos, penîr, zeytûn, zeyt û zehter û mast hatibûn danîn. Ji ber ku dizaniyan kêfa wî jê re tê, reşad jî ji bîr nekiribûn.

Tev de li dora mase rûniştin, dest bi xwarinê kirin.

Di vê navê re Elî ket hundir. Du sêniyên tijî danîn ser mase.

Apo li Elî nêrî. Rûyê xwe jî hinekî tirş kiribû:

-Ev pir bûn, ew çi ye te anîn?

-Serokê min, ev memûniyê ye, ya din jî falafil in. Pir xweş in.

Vê carê li Dînê nêrî:

-Te hêk çawa çêkirine?

-Serokê min dilmê ne.

-Te çima ev qas tişt danîne?

Dînê keniya:

-Serokê min, ev tiştên meşhûr yên Helebê ne.

Her yek pariyek li wan da. Diyar bû ku kêfa wî jê re nehatiye. Dest avêt hêkekê qeşart. Yên din jî her yek hêkek di dest de bû diqeşartin. Apo hêka xwe ya qeşartî bilind kir:

-Min berî we ya xwe qeşart.

Tev bi hev re keniyan.

Apo li Elî û Dînê nêrî, paşê berê xwe da Emer:

-Hûn malbatên me yên kevin in. Ez bi mana li cem malbatên weke we pir kêfxweş dibim.

Piştî taştê xatirê xwe xwestin, derketin

***

Kemal seyare diajot, Mezlum rê nîşan dikir. Ji navenda Helebê derketin ber bi keviya wê ve diçûn.

Erdê rûtê beyar bala apo dikişand. Di dilê xwe de got, xebîneta vî erdî, dewlet çawa lê xwedî derneketiye. Kurdistan çêbe ezê bikim buhişt. Ezê weke van bajaran nehêlim, ezê hemûyî bi daristanan bixemilînim. Li ber deriyê avayiyeke sêqat sekinîn. Bi sekna seyareyê re derî vebû, seyare ket hewşê. Çavên Kemal li ser avayiyê bûn, xaniyekî pir xweş xuya dikir. Hewş jî gelek mezin bû, hawîrdorê wê hemû gul û dar bûn. Apo ji seyarê peya bû, çû nava gulan. Li daran temaşe kir. Çend gul bîn kirin. Berê xwe da hewzê avê. Ji bo pêşwaziyê li ber deriyê malê heft milîtanên jin sekinîbûn. Silav da wan û himbêz kirin.

Di wê navê re seyareya Siwar diajot ew jî ket hewşê. Siwar, Çirûsk û du milîtanên jin peya bûn. Yek bejna wê narîn, pordirêj û esmer bû. Çavên wê yên bedew jî ketibûn nava birhên weke kevanan. Ya din jî kej û çavkesper bû. Ew jî çûn cem Apo silav dan hev, hev himbêz kirin.

Apo berê xwe da Çirûsk:

-Heval hemû hatine?

-Tev amade ne, serokê min.

Yek bi yek pirsa milîtanan û malbatên wan kir. Dîsa li Çirûsk vegeriya:

-Malbatên wan nêzîkî me ne?

-Serokê min, hin ji wan welatparêz in. Hin jê ji ber tevlîbûna zarokên xwe ne rehet in.

-Divê di serî de em malbatê qezenc bikin.

Dîsa yek bi yek li wan temaşe kir:

-Hûn ji bo perwerdeyê hatine vir. Ev mal yên lêhûrbûnê ne. Li vî baxçeyî binêrin. Hûnê bi riya wî bi kedê û axê re mijûl bibin. Malê pak bikin, nirxê soreşê ye. Zibil bînin bikin binê daran.

Qedereke xweş bi wan re suhbet kir. Navê hemûyan pirsî. Li ber ya herî dawiyê ya pordirêj sekinî. Destê xwe jî dirêjî wêşiyekî tirî yê çênebûyê ve kir:

-Avesta, berî ku tirî bigihîje, navê wî çi ye?

-Serokê min, em jê re dibêjin qorix, hin jî dibêjin harsim.

-Harsim na, navê wî qorix e. Hûn vî hewzî dibînin? Beqek di navê de ye, biçin bigirin.

Avesta berê xwe da hewz. Apo li tevgerên wê yên bilez dinêrî:

-Divê di serî de tu bizanî ka di nava wê de çi heye, paşê bizanî ew çi deng e. Berî her tiştî, divê hûn hedefa xwe nas bikin, paşê bi ser de biçin.

Berê, xwe da milîtanek din:

-Hûn vê hevalê dibînin, ji Amanosan ji nava agir filitiye. Li wir hevalên me ne şiyar in, saf in. Divê kadro pir şiyar bin,

bizanin li xeta rêxistinê xwedî derkevin, xwe jî di heman demê de biparêzin. Ez li we dinêrim hûn hemû jî saf in. Li vir jî nobeta xwe baş bigirin. Nebêjin ev mala Serokatiyê ye. Herî zêde mala Serokatiyê hedef e.

Hinekî meşiya, çû binê dara tûyê:

-Hûn dibînin, wa hêlînek e! Gelo çêlikên wê çiqas piçûk in? We carna çûk girtine? Girtina çûkan ne karê her kesî ye. Jê re hesasiyet divê. Yeke qelew xwe keysxweş kir da biçe serê darê.

Apo lê temaşe kir:

-Mîhan, tu qelew î, divê tu sporê bikî paşê biçî ser darê.

Avesta jî li darê dinêriya, di dilê xwe de got, divê ez çûkê bigirim.

Apo ket pêşiyê yên din dan dû, derbasî eywanê bûn. Apo û Çirûsk li cem hev rûniştin.

Di wê navê re Avesta bi çûka di destê xwede ber bi eywanê ve hat. Apo gazî kirê:

-Ka bîne, destê xwe zêde nediyê hê piçûk e.

Avesta çûk xist destê wî:

Apo lê temaşe dikir:

-Ev jî weke we taze ye, hêza wê ya xweparastinê nîne.

Hê lê dinêrî, çûkê xwe ji destê wî filitand, ket bin kursî. Avesta dîsa girt anî:

-Ewqas bêhêz e nikare bireve jî. Bibe dayne cihê wê.

Avesta hê di devê derî de bû, dengê Apo hatiye:

-Ev qîzeke yeman e.

Kêfa wê ji gotina yeman re hatibû. Çûk bir ser darê, xist hêlîna wê.

Apo û Çirûsk hê diaxiviyan. Çavên wî li ser milîtanan

rawestiya:

-Tu dibînî em çawa perwerdeyê didin, lê hê hin qîmetê wê nizanin û xwe bşa nadinê.

-Serokatî bi awayekî mirov nikare pênase bike dixebite.

-Rast e, hê jî ez dibêjim ez çawa pirtir kar bikim û mafê şehîdan bidim.

Dema firavînê hatibû. Mîhan li metbexê amadekarî dikir. Dengê Apo ji nêz ve hatiyê:

-Heval tiştekî sivik çêkin.

-Temam serokê min.

Piştî qasekî çû metbexê. Tirşik û savar çêkiribûn. Qepaxa beroşa savarê rakir.

-Ma savar wiha çêdibe, te pir av kiriyê.

Hin savar danî ser qetek nan ber bi balkonê ve çû. Çavên xwe li derdor gerandin. Mîhan devê xwe bir ber guhê Kemal:

-Ez bawer dikim Serokatî li pîvazan digere.

Hê gotina wê di devê wê de, dengê wî hat:

-Mîhan, çima hûn pîvazan nadin min, ka li kû ne?

Mîhan bi bazdan pîvazek ji kîs derxist bir dayê. Apo li ser mase bi kefa destê xwe şkand danî ser savara xwe. Gazî yên din jî kir:

-Çima hûn nayên naxwin, werin. Lê van îsotan rakin divê ez nexwim, min kîlo girtine. Divê xwarinê jî kêm bixwim. Ez parêz digirim lê hûn jî êdî tiştekî nadin min. Tê bîra we Şêxo digot li Şamê îsot nemane. Divê hûn jî li xwarina xwe diqet bikin. Lê ji we re bêjim, ev ne ti savar e, we çêkirî. Ti kes weke dayîka min savarê xweş çênake.

Piştî xwarinê ew û Çirûsk ji bo guhdarîkirina nûçeyan

derbasî eywanê bûn.

Çend rojan li wir ma. Ew qasek bû derketibû nava baxçe rûniştibû. Li gul û darên li derdora xwe temaşe dikir.

Mezlum, Kemal û Şervîn jî ber bi aliyê wî ve çûn. Gazî wan kir:

-Xwe amade bikin em tev bi hev re biçin cihekî dîrokî.

Mezlum dengê xwe nekir. Apo edetê wî dizanî; dema dudilî dibû, di rûyê wî de xuya dikir:

-Çima tu bêdeng mayî, ma tiştek heye?

-Serokê min, gel dibêje hin dixwazin cihê Serokatiyê nas bikin.

Birhên wî ketin nava hev:

-Heta niha te çima nedigot? Divê hûn nêrînên gel pir cidî bigirin. Ne di vê mijarê tenê de, di her mijarê de hûnê cidî nêzîk bibin. Eger rast bin hûnê li ser bisekinin, eger şaş bin hûnê rast bikin.

-Serokê min, me di nava xwe de nîqaş kiriye; ji bo ewlekariyê em derketina Serokatiyê ya nava bajêr bixeter dibînin.

Çend kêliyan hizirî:

-Madem hûn wisa dibêjin bila weke we be.

Rabû ser xwe hinekî meşiya:

-Wê demê tu, Şervîn û Kelam bi seyareya me bi koma Amanosan re biçin Efrînê. Li wir agahiyan ji qasidan bigirin ka çi heye çi nîne. Hema niha derkevin, dereng nemînin.

Piştî çend deqîqeyan li seyareya xwe siwar bûn, ketin ser riya Efrînê.

***

Piştî çar rojan Mezlum, Kemal û Şervîn ji Efrînê vegeriyan. Li eywana malê rûniştibûn çay vedixwarin. Milîtanên din tev li wan kom bûbûn pirsa xwezaya wir ji wan dikirin. Mezlum dixwest behsê bike, lê Şervînê rê nedayê, pir dixwest xwezaya Efrînê bide naskirin. Pir jî bikelecan digot:

-Ma ezê çi ji we re bêjim, çi nebêjim, hingî xweş e, mirov naxwaze ji wir were.

Herêmeke nêzî deryayê ye. Ne sar e ne germ e. Her der daristan û şîntayî ye. Deşt û çiya di nava hev de ne. Sînorê Bakur jî hemû çiya ne. Cindirês jî pir xweş e; aliyekî wê deşt e, yek çiyay ye. Hemû darên merxê ne. Hemû gelî û newal in, çiyayê Qazqilî li bi hemû rengên daran hatiye xemilandin. Bi darên merxê xwe pêçaye. Aliyekî wê ta Mabeta diçe. Dema mirov ji vir ve diçe çiyayê Leylûnê yê bi zozan, zinar, cihên dîrokî bi nav û deng dît. Ji Helebê ta Afrînê bi mirov re diçe ta Şehbayê ji wir ta Efrînê, weke rêzanekî kevnar û bêziman, dikeve pêşiya mirov û heta bi Dartizê diçe. Rexeke wê jî hemû deşt e. Jixwe deşta Hemamê, weke bihuştê ye. Jixwe Basotê nayê gotin, çiqasî xweş e. Ew jî tev dar in. Gundên wê tev jî ji hev xweştir in û dîrokî ne. Gelek berhemên dîrokî tên dîtin. Cihê ger û geştê ne.

Vê carê Mezlum ket navberê:

-Gora Marmaron jî li Şêrewa gundê Beradê hatiye dîtin. Yê Eserên Romayiyan jî li wir pir in.

Şervînê Mezlum da sekinandin:

-Tu bisekine, ez ji te baştir nas dikim.

Hinekî jî keniya. Apo hatibû li pişt wan gudarî dikir. Haya wan jê tinebû:

-Efrîn bixwe bajarekî piçûk e û di kurtê de ye. Derdora wê hemû çiya ne. Dibêjin salên 1920î ava bûye. Dema mirov ji çiyayê Leylûn tê milê Kefircenê çiyayê Qitmê û Dêrsiwanê dest pê dikin. Rê di pişta Şeran re diçe. Ji wir mirov diçe milê Bilbilê. Li wir jî Nebî Horî heye. Ew jî keleheke kevin e, ji dema Horiyan ve maye.

Mezlum xwe negirt, dîsa ket navberê:

-Te tiştek ji bîr kir. Di navbera çiyayê Leylûn û Bilbilê de herêma Şêran heye. Bilbil jî hema hema tev çiya ye. Çiyayên wir jî silsile ne. Li pişta Bilbilê jî cihekî bi navê Zoyê Gir heye. Ew jî du gir in. Li hemberî hev in. Li dawiya sînor e û heta aliyê Reco diçe. Yê dikeve navbera Nebî Horî û Bilbilê jî çiyayê Şêxorzê ye. Cihekî bilind û asê ye.

Şervînê xwest erka xwe temam bike:

-Reco jî bajarokekî pir xweş e û gundê wê jî pir in. Ew jî tev çiyayî ne. Çiyayên wê heta milê Şiyê diçin. Çiyayê Şêx Berekat heye, warê êzîdiyane, navbera Dartizê û Keleha Sem'an de ye. Weke bazinekî ye. Dikeve navbera Ereb û Kurdan. Çiyayê Hewarê yê dikeve navbera Şeran, Bilbilê û Recoyê. Sêkoşeyeke di nav herêmê de serê xwe hildaye. Li Reco jî, cihê herî bilind gundê Derwêş ku çavdêriya deştê û bajarê Helebê dike, êvaran ronahiyên wê jê re dibin weke stêrkên deştê. Em çûn bin dara çinarê ya li ser bîra Hecîka. Gelek rê û rêbarên kerwanên kevin di wir re derbas dibin. Me Geliyê Tîran yên gelek çîrok li ser bihîstin dît. Ew gelî gundê Derwêş û Çiyayê Hewarê ji hev qut dike.

Vê carê Kemal ket navberê:

-Nebêjin we çawa di çar rojan de evqas der dîtin. Bi rastî me dîtin. Di gelî de deriyek û Kevirê Bûkê hene. Çawa ku gundiyan digot, bûk û yên pê re dema di wir re derbas dibin nifir li wan tên kirin. Bûka li ser hesp û xêlî bi heywanên xwe ve tev dibin kevir.

Apo pir bi kêfxweşî guhdarî dikir. Hê haya wan jê tinebû. Kêfa tevan ji wê çîrokê re hatibû.

-Hevala Şervîn vêca tu dikarî ya mayî bêjî, min dixwest behsa çîrokê bikim.

Şervîn bêsebir bûbû:

-Çemê Efrînê heye. Ji aliyê bakur di binê Keleha Nebî Horî re tê, di nava bajêr re derbas dibe. Sûlavên Meydanka jixwe binavûdeng in, em çûn wir jî. Weke din Ava Reş jî heye. Ew jî dikeve navbera Efrîn û Bakur. Ji ti kesî re nebêjin, lê me li wir masî jî xwarin. Çemê Sabûnsiyê jî heye. Kevirên wê pir şahîk in. Ew jî digihe ser çemê Efrînê. Ava Gumrikê heye. Sûlavên wê jî hene. Ew der jî cihê geştê ye.

Hinekî sekinî:

-Hûn çayekê ji min re bînin, ezê yên mayîn jî ji we re bêjim.

Lê ti kesî xwe nelivand, dixwestin guhdarî bikin. Wê jî danasîna Efrînê domand:

-Di navbera Reco û Şiyê de Kaniya Batmanê jî heye. Li ser sînor, ji binê zinarekî derdikeve. Efrîn piranî Kurd in, lê hin Ereb ji bo pezê xwe hatine li wir bi cih bûne. Gelek gundên Kurdên Êzîdî jî hene. Nêzîkî bîst gundan hene. Nêzîkî Şêrawa ne. Hin Kurdên Elewî jî li Mabeta hene.

Piştî ku gotina xwe qedand, nû ferq kirin ku Apo guhdarî wan

dike. Tev jî mabûn şaş. Bi taybetî rûyê Şervînê sor bûbû. Apo bixêrhatin da yên ji Efrînê hatîn:

-Ka werin rûnin werin! Weke din we çi kir, we çi dît?

Her sê jî pir bikelecan bûn. Şervînê ji bo agahiyan xwe amade kiribû:

-Serokê min, destpêkê me qasid dîtin, me yên her du milan jî dîtin. Pişt re em çûn cihên li ser sînor yên li aliyê Reco, Mabeta û Şiyê. Nêrînên me jî li ser wan deran çêbûn. Di vegerê de em çûn gundê Kurzêlê yê nêzîkî çiyayê Endarê. Serokê min, ew der pir xweş in, weke buhiştê ne. Me li wir got, xwezî niha Serokatî jî li vir bûya ev der bidîtan.

-Weke din hûn çûn kû?

-Serokê min, em çûn Keleha Sem'anê jî.

-Erê, Erê. We ez li malê hiştim, hûn çûn ji xwe re geriyan!

Şervînê notyên bi xwe re anîn dan destê wî. Rarbû ser xwe çû qata jorê. Şervîn hê li ser gotinên wî dihizirî. Xemgîn bûbû:

-Serokatî dixwaze bêje ez weke we nikarim rehet bigerim.

Di wê navê re Rûken bi çenteyê xwe ve ket hundir. Şervîn rabû ser xwe hev himbêz kirin. Şervîn pir kêfxweş bûbû:

-Tu hatî li vir bimînî?

-Na. Serokatiyê gazî min kir, got çenteyê xwe bigire were. Serokatî li vir e?

-Rast e. Ka were niha tu westiyayî.

Tev de derbasî odeyê bûn.

Piştî nîv saetê Apo ji jor hat xwarê. Çavên wî li eywanê bi Rûkenê ketin. Bixêrhaatin dayê.

Rûken bikelecan ber ve çû û himbêz kir. Tev de rûniştin. Pir mereq dikir ka ji bo çi gazî kiriyê. Di dilê xwe de got, xwezî ji

min re bigota biçe çiyê. Wî jî li temtêla wê temaşe dikir:

-Ev demek e tu li cem me xwe perwerde dikî. Tecrûbeya te jî çêbûye. Emê te rêkin cihekî herî xweş. Heval jî nû ji wir hatine, behsa xweşikbkûna xwezaya wê û welatparêziya gelê wê dikin. Nêzîkî herêma te ye jî. Ez behsa Efrînê dikim, tu xwe amede dibînî?

Xeyalên wê yên çiyê ketibûn avê, ji ber wê hinekî sekinî:

-Serokatiyê çawa guncaw dîtibe ji bo min jî guncaw e.

-Berê xwe da Mezlum û Şervîn:

-Rûkenê bibin cihê wê û li ser navê min biçin serdana wan malên wê rojê min ji we re gotîn.          Destê xwe danî ser milê Rûkenê:

-Rabe em hinekî biçin nava bexçe.

Hinekî li nava baxçe geriyan. Li ber guleke spî sekinî:

-Tu vê gulê dibînî, çiqas xweşik e.

-Rast e serokê min.

Di wê navê re Şervînê şûşeyek av anî. Apo bi destê xwe îşaret kir ku neçe:

-Şervîn jî demeke dirêj e hem li çiyê maye, hem li cem me. Rêbaza me ya jiyan û perwerdeyê baş dizane. Malbatê çi daye we?

Rûkenê nizanî çi bersivê bide. Apo gotina xwe domand:

-Gelo tiştên dayîn we têra jiyan û xweparastina we dikin? Ji pora serê we heta tiliyên piyên we, ji kenê we heta ruhê we, dixwazim we fêr bikim.

Hinekî meşiya:

-Divê keçên Rêber Apo, xwedî fikir, ziman û bedenên saxlem bin. Dev ji xwe bernedin û cazib bin. Li nava civakê divê hûn bi

fikir, tendurûstî, xweşekibûn û zimanê xwe mukemel bin. Lewre hûn yên şoreşê ne. Divê hûn li xwe baş meyze bikin û li xwe miqate bin. Bila her kes bibîne û bizane ka em milîtanên jin çawa digihînin.

Bi destê Rûkenê girt vegeriya cem gula spî, destê xwe li pelçima wê da:

-Tu dibînî, ev gul pir narîn e. Lê parastina wê heye, xwe bi stiryên xwe diparêze. Divê stiryên we jî yên parastinê hebin. Gel nas bike û bibe jineke gelêrî. Tu dûrî welat mayî, divê tu welat û jiyana Kurdan nas bikî. Em li benda we û serkeftinê ne.

Ji wir dîsa berê xwe da odeya xwe.

Rûkenê berê xwe da Şervînê:

-Ezê destpêkê biçim didanên xwe bişûm. Vê sibê em bilez derketin, pê re negihatim. Piştî van axavtinên Serokatiyê ezê qet tiştekî xwe ihmal nekim. Ez hatibûm bêjim Serokatiyê ez dixwazim biçim qadên şer. Lê min fêm kir ku Serokatiyê baştir zaniye ka pêdiviya min bi çi heye.

Şervîn bi wê kelecana wê pir kêfxweş bûbû:

-Her ku Serokatî bi mirov re diaxive, çawa mirov nû hatibe dinyayê. Berê mirov bikeve kû ew der ji bo mirov dibe qada fethê.

Bilez çûn hundir da amadekariya xwe ya çûnê bikin. Piştî amadekariyê Şervîn, Siwar û Rûkenê xwe berdan jêrê. Apo jî daket heta ber deriyê hewşê çû. Li ber derî ma heta seyare ji wir dûr ket.

Piştî ku Rûken danîn cihê wê, Şervîn û Mezlum, çûn cihên Apo ji wan re gotî. Karê xwe qedandin, careke din berê xwe dan Helebê. Şervînê li saeta xwe nêrî:

-Saet 11 û nîv e, niha Serokatî li benda me ye.

Mezlum jî li saeta xwe nêrî:

-Ewqas israr kirin me li ti deran xwarin jî nexwar, dîsa em dereng man.

Ji ber ku rê vala bû zû gihîştin malê. Kemal li benda wan bû. Şervîn bilez ber ve çû:

-Serokatî li kû ye?

-Pir li benda we ma, li odeya xwe ye. Saet 12 şevê ye. We şîv nexwaribe amade ye.

Tev de çûn metbexê. Lê hê pariyek nexwarîn, Apo ket hundir, berê wî li Mezlum bû:

-Ma we şîv nexwariye?

-Na serokê min.

-Dema derfet hebin xwarina xwe di dema wê de bixwin. Vê nîvê şevê xwarin ji faydê zêdetir zerera wê heye. Diyar e ku karê we jî wisa ye!

Şervînê notyên li cem xwe danê. Not girtin, derbasî eywanê bû. Piştî xwarineke bilez, ew jî çûn eywanê rûniştin. Not tev xwendibûn:

-Ez dixwazim ji gel re civînekê çêkim. Bila ji Kobanê û Efrînê jî werin. Plana xwe li gorî wê çêkin.

Roja din her kes ji aliyê xwe ve ketibû nava amadekariya civînê. Wê civîn li taxa Şêx Meqsûd çêbûya. Ji bo parastina malê cih ji ti kesî re nedihat gotin. Li mala civîn lê bê çêkirin, amadekarî dihat kirin. Yên ji bo civînê hatîn agahdarkirin jî hêdî hêdî dihatin. Siwar û Mezlum wê bi seyareyê biçûna Apo bianiyan. Dema civînê hatibû û hê di rê de bûn. Ji ber tijîbûna rê derfetên wan yên lezê jî tinebûn. Kufekuf bi wan ketibû.

Mezlum di nava xwêdanê de mabû:

-Hevalê Siwar, çiqas maye em bigihîjin malê?

-Nêzîkî 10 kîlmetereyekî heye.

-Wê demê emê dereng bimînin.

Piştî qasekî gihîştin ber derê malê. Mezlum bikelecan peya bû. Hingî lez dikir berçavka wî ket cama wê şkest. Bê ku lê xwedî derkeve bezî hundir. Ti kes nedît. Bi dengekî bilind gazî kir:

-Serok ne li vir e, em xwe zû bigihînin cihê civînê.

Di vegerê de berçavka xwe rakir siwar bû. Hê ji malê dûr neketîn seyareya Kemal diajot li ber derî sekinî. Mezlum di pencereya seyareyê re gazî kirê:

-Hevalê Kemal, Serokatî li kû ye?

-Hûn derng man Serokatî çû.

-Bi kê re çû?

-Bi ciwanekî re çû, Serokatiyê nas dikir.

Ji bo ku xwe zû bigihînin cihê xwe li riyên kurt digeriyan. Li ber deriyê malê seyareyeke mazda ket ber çavên wan. Dilê Mezlum rehet bûbû:

-Wa serokatî ji wê seyareyê peya dibe, baş bû em bi hev re gihîştin cihê xwe.

Apo li rûyên wan nêrî. Ferq kir ku di rewşeke pir xirab de ne. Di kêlekên wî de wisa bêdeng meşiyan. Berî ku bikevin hundir li wan vegeriya:

-Hûn dereng man. Gel dizane wê Serokatî were, çênedibû ez gel li benda xwe bihêlim.

Her kes li hundir amade bû. Ket hundir, derbasî pişta mase bû. Piştî silavdayînê çend kêliyan sekinî:

-Ez dixwazim em bi pirs û bersivan dest bi vê civîna xwe bikin. Pirsên kê hene?

Kalekî destê xwe rakir:

-Serokê min, rexneyên min ji bo we hene.

Bi rûyekî xweş bersiva wî da:

-Kerem bike rexneyên xwe bêje.

-Zarokên me li malê çigareyê nakişînin, piştî ku tevlî rêxistinê dibin dest pê dikin.

-Hûn jî zarokên xwe baş perwerde nakin. Serê min bi wan re gelek dikeve belayê. Tu çi karî dikî?

-Ez xebata nava gel dikim, serokê min.

-Baş e te rexneyên xwe gotin, bila gel jî li ser te û karê te nêrînên xwe û rexneyên xwe bêje.

Hê gotina xwe neqedandî, ji bo rexnekirina wî dest bilind bûn. Gelek rexne lê hatin kirin.

Apo ji rewşê kêfxweş bûbû:

-Te rexneya xwe kir, va ye gel jî gelek kêmayiyên te dibêje. Temenê te ji yê kadroyan mezintir e. Zarokên we ne tên gel we û tecrûbeya wan nîne. Hûn çiqas bi wan re dibin alîkar?

Xwediyê rexneyê li ser kêmayiyên xwe hizirî.

-Va hûn dibînin, hukmê giran li Ferhad birîne û berê jî mînaka Fatma hebû. Di nava rêxistinê de gelek pirsgirêk derxistine. Eger me cezayekî cuda bida wan weyê bigota, binêrin çawa nêzîkî hevala xwe û birayê xwe dibe. Em dixwazin tiştên dibin ji aliyê her kesî ve bên zanîn û ders ji wan bên derxistin.

Civînê bi pirs û bersivan demeke dirêj dewam kir. Piştî civînê vegeriya malê. Siwar, Kemal, Şerîvn û milîtanên jin yên li malê

tev li hundir bûn. Hinekî li wan nêrî, berê xwe da Siwar:

-Me heval rêkiribûn qadên din yên Rojava, niha hin not hene wan îro bibe biçe aliyê Kobanê. Qasidan bibîne û ji rewşa wir baş agahdar bibe. Hevala Mîhan jî dikare bi te re were.

Mîhanê hê jî bawer nedikir ku navê wê hatiye gotin, gelek kêfxweş bûbû.

***

Siwar û Mîhan li Kobanê bûn. Civînên xwe qedandibûn, berê wan li navenda bajêr bû. Li kêleka wan yekî esmer, bejin kin û rûken jî hebû. Mîhanê lê nêrî:

-Heval, çima ji te re dibêjin Çelo?

Çelo bi wê bejna xwe ya kin, serê xwe bilind kiribû, bê ku berê xwe bidiyê bersiv da:

-Carekê me komên hevalan di cihên zor re derbas kirin. Ez çûm cem Serokatiyê. Ji min re got, tu çelik î, divê tiştek bi te neyê. Ji wê demê ve her kes dibêje min Çelo.

Bi axaftina xwe re silav jî dida kesên nas dikirin. Her destê wî li hewa bû. Bala Mîhanê ew jî kişandibû:

-Hevalê Çelo, tu her kesî nas dikî?

-Rast e, kesên xerîb di herêma me de nînin. Em bi çandiniyê re mijûl in, xerazan vir jî binav ûdeng in. Tu carekê li Baqî Xido guhdarî bikî, tuyê vir tevê nas bikî.

Mîhanê li derdora xwe dinêrî, cara yekê bû ew der didît. Di wê navê re gihîştin ber çemê Firatê. Firat jî Firat bû, bi qasî navê xwe bedew, zelal û delal bû. Ava wê weke rondikên çavan xuya dikir. Siwar xwe tewand, hinek jê li ser rûyê xwe kir. Diyar bû

ku gelek bîriya wan deran kiriye. Çavên wan li ser dar û zeviyên peravên çem bûn. Siwar berê xwe da rexê din yê çem, li aliyê Cerablûsê nêrî:

-Hevala Mîhan, li vir di navbera çemê Firatê û kaniyên Xabûr de du gund hebûn. Her gundek kaniyeke wî hebû. Li gorî navên wan kaniyan dihatin binavkirin. Yek Kaniya Murşidê, ya din jî Kaniya Ereban bû. Kaniya Ereban wê demê li ser navê Erebên koçber, yên pezê xwe li wir av didan, hatibû binavkirin. Ew jî Kurdan lê kiribû.

Çelo destê xwe hejand:

-Hêê, di binê vê erdê de dîrok veşartî ye.

Siwar axaftina xwe domand:

-Sala 1911an Almanya dixwaze di navbera Berlîn û Bexdayê de riya tirênê çêke. Alav, amûr, karker û leşkeran di navbera her du gundan de bi cih dikin û dest bi xebatê dikin. Almanan ji wir re digot "Deutsche Kompany" ango şirketa Almanî. Welatî li derdora wê kargehê kom dibin. Bajarekî piçûk tê avakirin û jê re dibêjin Kobanê.

Hem suhbet dikirin, hem li ber avê dimeşiyan:

-Di serdema Baasê de navê Kaniya Ereban kirin Eyn El Ereb.

Li ber dara tûyê sekinîn. Kêfa Çelo ji mijarê re hatibû, ew jî ket navberê:

-Eşîrên Kobanê, Şêxan, Kîtkan, Denan, Qeregêçan, Şedadan, Mêran, Bêşan, Zerwarî, Oxî, Mehfan, Elîdînan û hin din jî, ji ber ku timî rastî êrîşên Êla Milan tên, di nava xwe de Konfedrasyonekê ava dikin, navê wê jî dikin Berazan. Gelek taybetmendiyên wan hene, lê ya sereke mêrxasî û serhişkiya

wan e.

Bi hevoka xwe ya dawiyê re jî keniya. Vê carê Mîhan ket navberê:

-Jixwe Kurd bi serhişkiya xwe tên naskirin. Ez bawer dikim ev herêm jî sala 1916an, weke gelek deverên Rojava, bi têlên sînor dibe du perçe, yek li Serxetê dimîne, yek li Binxetê. Vir deşta Surûcê ye. Ji vir heta Cizîrê zinara (Kember rastir e) Erebî tê çêkirin. Bi gundên Erebên Xemir herêma Cizîr û Kobanê ji hev tên qutkirin.

Siwar berê xwe da gundên li ber çem:

-Şêxler, Sirîn, Eyn Bet, Şêran û Kobanê bi fermî girêdayî Helebê ne.

Li saeta xwe nêrî:

-Hevalno, êdî dema çûnê ye, divê em bi hevalên Şamê re bi telefonê biaxivin. Divê em heta Girêspî û Serê Kaniyê jî biçin.

Di vegerê de çavên Mîhanê li ser darên Zeytûn û Fistiqan rawestiyabûn. Li nêzî Kobanê li çiyayê Miştenûrê nêrî. Çiyayekî piçûk bû, lê bedewî dabû deştê. Êvarê jî berê xwe dan deşta Surûcê Bayekî honik ji aliyê bakur ve li wan dixist. Mêvanê şevê bûn, çûn malekê. Piştî xwarinê Çelo û xwediyê malê dest bi suhbetê kirin. Carna dengê wî bilind dibû:

-Kesên ne dostên me, divê li Kobanê nemînin.

Siwar bi gotina wî keniya, di dilê xwe de got, baş e ku ne di nava xebata gel de ye. Çelo berê xwe da Siwar:

-Hevalê Siwar, çend sal in tu nehatî vir, te çawa dît?

-Ez çi bêjim, cihê mirov lê bê dinyayê gelek biwate ye. Çiqasî mirov jê dûr bikeve jî, weke dayîka mirov e. Ew ji mirov dûr nakeve. Kurdistan tev jî welê ye, em çiqas dûr diçin dîsa lê

vedigerin.

Xwediyê malê û zarokên xwe tevan guhdarî Siwar dikirin. Wî jî xwet tiştekî bêje:

-Erê, dinya li me Kurdan bûye yek, lê Serokê me ew zincîr qetandin. Niha bi hezaran qîzên me tevlî şoreşê dibin. Kobanê îro bi şehîd Dicle tê naskirin. Hevala Mîhan, diyar e tu pir geriyayî ka ji me re hinekî behsa xebatê bike.

-Xebata me bi giştî hûn jî dibînin baş e. Lê Serokatî rewşa her insanê Kurd mereq dike. Dixwaze bi qasî dikarin tevlî xebatê bibin. Dibêje xebat ji bo welat şerefa me ye.

Êdî dema razanê bû. Keçika malê ji wan re cihên razanê amade kirin. Serê sibê zû xatir xwestin, li seyareya xwe siwar bûn çûn.

Çavên Çelo diketin ser hev, ji bo raneze xwest biaxive:

-Hevala Mîhan, bajarê Rojava yê herî mezin kîjan e?

-Yê herî mezin, Hesekê ye. Lê ne pir kevin e. Salên 1920î di serdema Fransa de ava bûye. Hin dibêjin navê wê ji hestiyê masî hatiye, hin dibêjin ji heskê. Destpêkê Kurd û Asûrî tê de pir bûn, pişt re Ereb jî lê bi cih dibin. Çandeke rengîn tê de heye. Ava Xabûr di nava wê re derbas dibe. Jê re dibêjin Çamê Ceqceqê jî. Piştî wê jî Qamişlo mezin e.

-Piştî wan Serêkaniyê tê?

-Erê Serêkaniyê tê. Li wir Kurdên Êzîdî jî hene. Çaçan jî di dema Osmaniyan de hatine wir. Eşîra Kîkan, Milan, Omerî, Xelecî, Berguhanan û weke din jî li wir hene. Eşîrên Ereban jî yên weke Edwanan, Şerabiyan, Begaran û Herban koçî wir kirine. Di milê çandiniyê de li pêş e.

Siwar dît ku Mîhan herêma xwe baş nas dike:

-Tiltemir jî bajarê Kurdan e?

-Tiltemir, heta sala 1970î jî Ereb û Kurd tê de tinebûn, hemû Asûrî bûn. Ew jî ji Hekarî, Mûsil û Dihokê çûne wir. Kurdên li wir ji Serêkaniyê û Qamişlo ne. Li derdora bajêr jî gundên Kurdan hene.

Çavên Siwar li ser Girêspî rawestiyabûn:

-Hevala Mîhan tu vir dibînî, bajarekî piçûk e. Lê di fermiyetê de navçe ye. Berê navê wê Kaniya Xezalan bû. Sed gundên Kurdan li dora wî ne. Ne ku koçber in, xwediyên vir in.

Çavên Mîhanê li kesên di nava bajêr de bûn:

-Ezê cara bê biçim Babê jî, nêzîkî ve ne wisa?

Siwar bersiva wê da:

-Bab nêzîkî Kobanê ye. Ji bo dîtina Kurdan divê tu biçî bibîninî. Biçl Cerablûs û Minbicê jî bibîne. Li wir Kurdan xwe pir parastiye.

Tirafikê seyare sekinand. Piştî ku tiştek di seyareyê de nehat dîtin, dîsa ketin ser riya xwe.

Roja dawiyê çûn Serêkaniyê. Hê dema wan hebû, hinekî li nava bajêr geriyan. Berê  xwe dan Tilhelef, çûn serê gir. Li bermayiyên dîrokî temaşe kirin. Mîhanê kulmek ax rakir, di dilê xwe de got, bi qasî ku tu nerm î, ewqas jî berxwedêrî. Ev warê qebîleyên Horiyan e. Bedewî û asta pêşketina wan nîşan dida. Salên 1600-1250 Berî Mîladê ew cih hatibûn avakirin. Siwar bi baldarî li derdora xwe dinêrî:

-Bajarê Serêkaniyê û Amûdê timî tiştên veşartî û pêşketinên demên borî nîşan didin. Navê wê hê wê demê Xweşkanî ye.

Êdî dema çûnê bû, ketin ser riya xwe. Siwar, li pişt xwe nêrî:

-Sala 640. Piştî Mîladê Serêkaniyê dikeve destê Ereban.

***

27ê Mijdarê bû. Gelek nivîsakar, gel û milîtanan ji bo axaftina salvegera damezirandina PKK'ê berê xwe dabûn Şamê. Apo xwe wê rojê ji bo axaftineke dîrokî amade kiribû. Komek milîtan li kêlekê sekinîbûn:

-Dijmin dixwest vê sala dawiyê me biqedîne. Digot, heta niha me 28 serhildan şkandine, emê ya 29an jî bişkînin. Wisa dizanî ku Kurd Kurdên berê ne. Biryara dijmin ji bo te ya mirinê be, nabe tu bêdeng bimînî.

Di axaftinê de bi giranî aram bû, lê carna hinekî bihêrs diaxivî:

-Gelek kesan keda me inkar dikir û xwe serok dihesibandin. Ezê rojekê ji wan hesab bixwazim û destê xwe bikim qirika wan.

Qederekî bi wan re axivî. Berê wî li civîna mezin bû. Li saeta xwe nêrî:

-Mêvan, dostên me yên kevin tev hatine?

-Serokê min, kesên ji derve û ji Rojava hemû hazir in.

Hinekî çû hat, di dilê xwe de got, divê ev roj bibin wesîleya hevdîtinên mezin:

-Temam, hûn hemû tevlî bibin, rojên wiha dîrokî ne, ji bo komkirina gel pir binirx in.

Bi hev re berê xwe dane cihê civînê. Li eywana malekê ji bo pîrozbayiyê amadekarî hatibû kirin. Kursî û maseyek hatibûn danîn. Du alên ERNKê bi ser mase de hatibûn berdan. Li pişta

mase jî ji heman alê yek hatibû daleqandin. Di jor de berê ronahiya lembeyekê weke tîrêjekê diket ser stêrka nava alê. Li ser mase cîhazê qeydê, şûşeyeke avê û qotiyeke desmala kaxiz hatibûn danîn.
Bilez ket hundir. Wê rojê qazaxeke xakî, di bin de gumlekekî keskê leşkerî û pantolonekî xakî li xwe kiribûn. Pora xwe jî hinekî kurt kiribû û bi şûn ve şeh kiribû. Simbêlên wî jî weke her car şehkirî bûn. Bi silavê dest bi axaftina xwe kir:

-Mirov dikare bêje şerê me yê îsal ji salên borî tevan girantir bû. Eger me li ber xwe nedabûya, ne hûn diman ne ez û ne jî Kurd. Wê ev şer bidome û dijmin were îmanê. Hem dost, hem dijmin li bendê bûn ku her tişt tine bibe, lê em sax man. Di dîroka Kurdan de saxmayîna di şer de, cara yekê ye. Faşîzma Tirk dixwaze bi destê xwe me bike binê erdê. Li ser me betoneke wisa danîbû ne mûmkin bû em serê xwe rakin. Lê me ew gora beton qelişand.

Carna di cihê xwe de wisa sekinê diaxivî, carna jê li pişta mase diçû, dihat, destên xwe dixistin berîkên xwe, li gorî axaftinê dixistin tevgerê. Hinekî sekinî, çavên xwe li eywanê gerandin:

-Hin dostên me yên destpêkê niha li vir in. Ew dizanin tişteke me tinebû, lê niha her tişt heye. Di van 16 salên li vir de me xwe xurt kir. Mirov dikare tecrûbeyeke mezin ji vê xebata xwe derîne. Heta ez heme ne mûmkin e tiştek ji destê we derkeve. Me li vir dostayî danî û em bi ser ketin. Dijmin pir bi ser me de tê û tecrûbeya wan ya hezar salî heye. Li hemberî dijmin berxwedana me ya destpêkê weke ya zarokan bû. Pir lewaz bû. Divê hûn jî li ser xwe bisekinin, da sibê poşman

nebin. Dema mehşera Kurdan çêbe, divê hûn hesab bidin. Di vê şoreşê de hesabdayîn û girtin jî heye.

Di wê navê re ji bo guhertna kasetê yek ber bi mase ve çû, lê berî ku dest bidiyê wî bixwe kaseta nû xistiyê. Wê rojê digel ku pir axivîbû jî, çawa ku nû dest pê kiribe, wisa aram bû:

-Ermenî rabûn lê di demeke kin de reviyan, Rom rabûn lê ew jî hemû reviyan. Ereban nikarî bêhna xwe bidin bistînin. Em Kurd jî ji hemûyan pirtir kiribûn xizmeta xwe. Eger me li ber xwe nedabûya emê ji wan xirabtir bibûne. Qazî Muhemed jî li ber xwe da. Lê artêşa Îranê bi ser de çû û darve kirin. Sed hezar leşkerên Berzanî hebûn, dema Îranê alîkarî ji ser birî, ji wan re got çekên xwe biavêjin, birevin. Sed hezar leşkerî nikarî rojekê li çiyayên Kurdistanê bimînin. Hûn dizanin, min bi serê xwe dest pê kir û ser bîst salan re ye dewam dike. Ne kêreke min hebû ne jî qurîşek pere.

Piştî axaftineke dirêj rûnişt pişta xwe da kursî. Di jor de jî ji kuneke piçûk ronahiyeke weke nûrhê ketibû ser kursiyê wî. Ronahiyeke balkêş bû; çawa ku jinekê fîstanekî spî li xwe kiribe û ji bo parastina wî her du destên xwe vekiribin, wisa xuya dikir.

-Dinya li ser şerê PKK'ê disekine. Emerîka her roj li ser şerê PKK'ê raporan digire. Ez nabêjim jiyana xwe inkar bikin, lê jiyaneke nû jî çêbûye, divê hûn bibînin. Yên me nikarin di riyeke rast de bimeşin. Weke moriyekê jî nikarin havînê ji bo zivistanê cihekî ji xwe re çêkin. Lê bi van kesan me ev şoreş meşand.

Careke din yên li eywanê di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Ez ji dostan pir tiştan naxwazim, duayekê jî bikin bes e. Ez dibînim roj bi roj gel germ dibe, ev tiştên bixêr in. Weke din jî di

sersala PKK'ê de tişta herî bixêr berxwedan û şerê Kurdan nesekinîn. Dibe ku kêmayiyên min jî hebin. Alîkariya min bikin, bila yek rabe, bêje ez dikarim serokatiyê bikim.

Li ser vê gotina dawiyê her kesî li yê tenişta xwe nêrî. Çawa ku bêjin ti kesî wisa di nava me de nîne.

-30-40 milyon Kurd hene û hemû ketine. Sebeba wê ya dîrokî û civakî çi ye? Çima wisa li me hat? Pirsên min yên tewra mezin ji we ev in. Ti kesî ji min re negot ji te re evqas alîkarî û bimeşe. Her kesî digot, bisekine, tu yê duh î, tu nikarî rojekê bimeşî. Yên tewra nêzîk ji min direviyan.

Dîsa rabû ser xwe, li pişta mase çû hat:

-Dil û mejiyê Kurdan çêbû, biryara Kurdan çêbû. Haziriyên me ji sala bê re mezin in. Li hundirê welat amadekariya Kongreya pêncan tê kirin. Dijmin nikare bi ser me de were. Ev cara yekê ye e wiha dibe. Mecliseke mezin jî wê bê avakirin. Riya vê meclisê ji her kesî re vekirî ye.

Carna bi ser, çav û tevgera destên xwe diaxivî, carna bi awayekî aramtir:

-Li ser vê, ez dibêjim sersala PKK'ê ya 16'an li we pîroz be. Sersala mirovatiyê jî pîroz be. Çawa me salên borî kirin salên Kurdistanê, emê yên pêşiya xwe jî bikin ya xwe. Di vê dinyê de wê cihekî me ku em serbixwe û azad bijîn çêbe. Her bijî Partiya Karkerên Kurdistanê.

Bi vê durişmê re dengê çepikan bilind bû.

Avek vexwer, berê xwe da kalekî li eywanê:

-Tu dostê me yê kevin î tu çawa yî? Ev şazdeh sal in, em hev nas dikin. Rexneyên te hebin bêje. Tu me jî baş nas dikî, serokên berê jî nas dikî.

Kalo xwest rabe ser xwe lê nehişt:

-Serokê min xebat baş e. Em serkeftina we dixwazin.

-Te em ji bîr nekirine ne? Te felsefe jî xwendiye. Ferqa me û serokên berê çi ye?

-Ez bawer diim kar baştir diçe.

Di wê navê re ala bi dîwêr ve aliyekî wê ketibû ser milê wî. Her ku diaxivî al jî pê re diçû dihat.

Yekî bitemen ji nava gel rabû ser xwe:

-Ez dixwazim fêm bikim ka PKK'ê di qada navneteweyî de çiqas xwe daye qebûlkirin?

-Em siyasî jî, leşkerî jî xurttir in. Av dikele. Di karê dîplomasiyê de jî av dikele. Berê yek dostê me li Ewropa tinebû, niha bi milyonan hene.

Vê carê jinek rabû ser xwe:

-Serokê min, jina Kurd heta kîjan astê di artêşa Kurd de cihê xwe girtiye?

Kêfa wî ji vê pirsê re hatibû:

-Em bi hişmendiyeke nû li jina Kurd dinêrin. Me rê ji keçan re vekiriye. Dema jin rabe ser xwe zilam dikare çi bike? Niha keç pir tên nava me. Ev tê wateya mirina zilamê Kurd yê kevin. Şoreşa bi Serokatiya PKK'ê dimeşe şoreşa jinan e. Ji xortan pirtir me keç dane pêş. Min li zilamê Kurd dinêrî min digot ev çi peya ye, min li jina Kurd dinêrî min digot ev çi jin e? Talan bûbûn. Dawiyê min çareser kir. Niha ref bi ref keç tên. Peyatiya berê çû, egîdiya nû çêbû. Egîdiya me bi destê keçan çêkirî ji ya peya mezintir e. Keç û jina kurd teslîm nebû, roj bi roj mezin dibe. Berê min digot Kurd mîna pîrekan e. Ji pîrekê jî xirabtir kiribûn. Rabûna jinê ji bo min rabûna gelê Kurd bû. Min digot

jin rabe wê gelê Kurd rabe. Di artêşa gel de ji sisiyan yek keç in, em rê vekin wê nîvenîv bibe.

Jinên li wir carna li zilamên li tenişta xwe dinêrî. Axaftina xwe ya li ser jinan domand:

-Ku te meseleya jinê çareser kiribe te meseleya Kurdistanê û zilam çareser kiriye. Mafê we bi qasî yê zilam e. Di kar û jiyanê de hûnê pirtir jiyana nû nas bikin û cih bigirin. Di vê şoreşê de hûn bixwe biryara xwe bidin.

Kalekî din rabû:

-Serokê min, dibêjin wê hukumeteke li derve ava bikin.

-Tişteke wisa nîne, hukumet li derveyî welat nabe. Di kongreya pêncan de wê ev mijar bê nirxandin. Emê riya meclisê vekin, wê demê wê riya hukumetê jî vebe. Hûn cih negirin hukumet jî ne rast e. Ez bawer dikim di çend salên pêşiya me de, çawa li Başûr hukumeteke federal çêbû, emê jî hukumeteke federal çêkin. Yek li vî alî, yek li wî alî emê wan bikin yek.

Her ku diçû kelecana di nava civatê de pirtir dibû.

-Wê du hukumet hebin; yek hukumeta şoreşgerî serbixwe, yek jî girêdayî. Ew dixwazin bandorê li hukumeta Başûr jî bikin. Hukumeta Başûr jî dibêje emê wan bikin binê bandora xwe. Wê ev bi têkoşînê diyar bibe.

Xortekî ciwan rabû:

-Serokê min, dibêjin partiyê biryar daye ku Kurdên li Ewropa vegerin welat. Em çiqas ji vê re amade ne?

-Em behsa vegera bi ruh, bi mejî û bi dil dikin. Halê we hemûyan reva ji welat e. Hûn bi ruhê xwe ji welat qut bûne.

Yekî din rabû ser xwe:

-Serokê min, dijmin gundên me dişewitîne, emê çawa

pêşiya vê bigirin?

-Ku hûn rabin dijmin nikare tiştekî bike. Bi gerîla nikarî gundên gel şewitandin. Ev lewazbûna dijmin e, ne xurtbûn e. Deweleteke xurt wisa nake.

Yekî din jî mafê axaftinê stand:

-Ji bo Kurdên ji Bakur koçî Başûr bûyîn hûn çi dibêjin?

-Rast e, 20 hezar hatine Başûr. Hûn jî koçber bûne hûn jî hatine vir. Piranî çûne Ewropa. Min li ser vegerê jî çend tişt gotin. Li Başûr be jî koçberî ne baş e. 16 sal in ez jî koçber im. Lê me vegera mezin çêkir. Carna koçberî mecbûrî ye. Koçberiya Hz. Muhemed jî ji neçarî bû.

Jineke din rabû ser xwe:

-Serokê min hûn hatina Cilînton ya Sûriyê çawa dinirxînin.

-Di hatina wî de fayde ji zererê pirtir bû. Yek ji sedemên hatina wî ya vir em bûn. Berî hingê Hafiz Esed li Swîsre dîtin. Jê re gotin, divê PKK ji Sûriyê derkeve. Lê di hatina xwe ya Sûriyê de behsa derketina PKKê nekir. Ez bawer dikim ji bo giraniya me baş bû. Roj bi roj wê cîhan me nas bike. Suriye niha ne li dijî Kurdan e. Dibêje çawa Filistînî li Suriyê ne, Kurdên Sûriyê jî wisa ne. Çawa li perlemana Sûriyê Filistînî nînin, Kurd jî nînin.

Li saeta xwe nêrî. Diyar bû ku dixwaze dawiyê li axaftina xwebîne:

-Ji bo Sûriyê jî Kurdistana mezin fayde ye. Tirkiye dijminekî wan yê dîrokî ye. Parçeyek erdê wan jî girtiye. Lê divê mirov baweriyê bide. Ez ji we hemûyan re serkeftinê dixwazin.

Dengê çepikan bilind bû. Piştî axaftina du saetan

amadekariya xwarinê hat kirin.

***

Dawiya meha 12an bû. Wê Kongreya 5. ya PKKê li çiyayên azad bihata lidarxistin. Apo ji bo kongreyê amadekarî dikir û bi delegeyên biçin kongreyê re nîqaş dikir. Jixwe konferansa 3. jî amadekariya vê kongreyê bû. Weke her kongreyê wê peyam û perspektîf ji vê kongreyê re jî bişandan. Diviya hem geşedanên navbera her du kongreyan binirxîne, hem ji bo çar salên bê perspektîfên siyasî û leşkerî bide. Li qata dehan piştî taştê derbasî pirtûkxaneyê bû. Lênûsa xwe vekir, rahişt pênûsa xwe û bi hestên ku berpirsiyariyeke dîrokî li ser milê wî ye dest bi nivîsê kir:

"Ji bo hevriyên tevlî pêvajoya amadekariya kongreyê û piştî wê bûyîn!

Hevriyên hêja:

Demeke dirêj e hûn amadekariya kongreya 5. dikin. Hûn pir nêzîkî armancê bûne û gav bi gav geşedanan dibînin. Tiştên bên roxandin û yên ji nû ve bên avakirin jî derketine meydanê. Xebata me ya gav bi gav pêş dikeve, niha ber bi platforma kongreya me ya fermî ve diçe. Ji bo kongreyê me *'Politik Rapor'*, '*Helwesta Rast ji Kongreyê' re û ji bo xebata kongreyê belgeya bi navê 'Kılavuz'(Rêzan)* şandine. Bê ku em bikevin binê bandora hina, heta dawiyê serbixwe û biinsiyatîf em kongreya xwe pêk bînin. Di dawiyê de wê navendek bê

hilbijartin.

Weke din hêza jinan heye. Hema hema ji sisiyan yekê hêzê ne. Divê li gorî hêza xwe ew jî cihê xwe bigirin. Eger em bala xwe bidinê, bername û rêziknameya partiya me ji bo dinyaya 1970yan hatibûn amadekirin. Ew dinya di asteke bilind de hatiye guhertin. Sosyalîzma Pêkhatî ji hev ketiye. Ji bo wê divê partiya me jî xwe nû bike. Kongreya me ya 5. kongreya desthilatdariyê ye.

Şevê nîvê xwe qulbandibû, baranê hûr-hûr lê dikir. Bayekî sar li pencereyan dixist. Apo hê dinivîsî. Westiyabû. Rabû ser xwe çû eywanê. Siwar û Kemal jî hê şiyar bûn. Ji cem wan vegeriya çû odeya xwe ya razanê. Serê xwe danî ser balîv. Weke her car xewa wî nedihat û cihê serê wî xweş nedibû. Li ser rewşên heyî dihizirî. Di nava dengê dilopên baranê de çavên wî ketin ser hev.

***

Roja din serê sibê berê xwe dabû, taxa Ruknedîn. Li maleke partiyê ya li qata sisiyan, li eywanê rûniştibû, li rojnameyan dinêrî. Piştî ku li tevan nêrî, çû ber pencereyê hinekî li derdor temaşe kir. Ruknedîn weke gundekî bû, ji her derê deng dihat. Çend kesên li jêrê bala wî kişandin. Çavên wan jî li malê bûn. Ji ber pencereyê xwe da paş. Gazî Siwar û Selah kir:

-Hûn van deran baş nas dikin?

Her duyan bi hev re bersiv da:

-Em nas dikin.

-Biçin binêrin ka çi heye çi nîne. Baweriya min pir bi van

derdoran nayê. Berî niha jî min ji we re gotibû xaniyekî din peyda bikin.

Siwar bersiv da:

-Serokê min ev ne demeke dirêj e em li vir in.

-Vir cihekî nas e, her kes hev nas dike. Kurd jî li van deran pir in, me nas dikin. Ev çend car in em tên vir. Li derdor tevgereke ne normal heye.

Di wê navê re dengê qelebalixê hat. Siwar bilez çû ber pencereyê lê zû vegeriya:

-Serokê min şerê Şamiyan e. Her ku bi hev diçin di balkonan de dengê xwe bilind dikin, lê ji malê xwe jî dernakevin.

Zêde bi serê wî neketibû, ew bixwe çû ber pencereyê li derdor temaşe kir. Deng bi ser wan deran ketibû, çend kesan her yek ji wan li milekî û bi dengê bilind bi hev re şer dikirin. Bala wî li ser wê tevgera ne xwezayî bû, ji ber wê ne rehet bû. Dîsa vegeriya cihê xwe:

-Temam biçin bizanin ka çima şer dikin.

Selah û Siwar daketin çûn ser rê. Li ber yekî ku hindik mabû qirika xwe biqetîne sekinîn:

-Xêr e cîran, ev çi gengeşe ye?

Lê çawa ku pirs ne ji wî hatibe kirin, hê qîreqîra wî bû:

-Min berdin, ezê van bikujim. Ma ne şerm e li jinên me dinêrin û berê kamerayê dane mala me.

Selah niquçand Siwar:

-Ez vir mal bi mal nas dikim, min ti Fatimên Muxribî li van derdoran nedîtine ku evqas şer ji bo wan derkeve. Alemê aqilê xwe avêtiye.

Siwar awirek jê veda, wî jî serê xwe hejand:

-Êê, ma tu vî şerî nabînî, dinya xirab bûye.

Herî dawiyê fêm kirin ku tiştek nîne. Siwar bi kurdî axivî:

-Em xwe ji vir xelas bikin, meseleya zigurdên Şamê ye. Niha li hev bixin emê jî tê de biçin.  Dev ji wî jî berde hema çi dike bila bike!

Selah dixwest tiştekî din jî fêm bike. Destê xwe da milê yê dida ber qîran:

-Ji bo çi bi kamerayan li malên we dinêrin?

Çavên zilam sor bûbûn, her ku diçû dengê xwe bilindtir dikir:

-Min bi van her du çavên xwe dîtin! Di wê pencereya li hemberî me de li qata dido û sisiyan kamera danîbûn, hundirê malên me dikişandin.

Siwar serê xwe hejand:

-Selah, xuya ye te bîriya şer kiriye. Ev li behaneyekê digere ku şer bike, te jî xwe kiriye nava lepên wî. Em biçin baştir e.

Vegeriyan çûn jorê. Apo keviyeke perdeyê rakiribû li derdoran dinêrî. Selah û Siwar ketin hundir. Bi wateya bisekinin Apo bi destê xwe îşaret kir. Tev de çûn eywanê:

-Neçin wî milî ev tevger ne normal e.

Selah bilez bersiv da:

-Serokê min tiştek nîne, hin xort bi kamerayê li hudirê malên cîranên me dinêrin. Ji ber wê ye.

Apo vê carê çû ber pencereya milê din li derdor baş temaşe kir. Selah xwe nêzîkî Siwar kir:

-Em careke din biçin binêrin ka çi heye. Serokatî hê dişopîne em jî biçin binêrin.

Destûr jê xwestin daketin jêrê. Di wê navê re polîs hatibûn, gelek kes ji wan malan derxistibûn, hinek girtibûn. Hin çek jî di malan de girtibûn. Qenasek ket ber çavê Siwar. Ji bo ku bizanin ka çi heye, berê xwe dan cihê polîsan.

Piştî demekê vegeriyan. Apo hê li eywanê bû. Bi hatina wan re pirs kir:

-We tiştek fêm kir?

Siwar bersiv da:

-Serokê min, hin kesên biçek bûn, ji bo me hatibûn. Li taxê hatibûn dîtin, lê milet wisa zaniye ku li jinan dinêrin. Piştî ku polîs tên wan digirin nû fêm dikin ku Tirk bûne. Hin Kurd jî di nava wan de hebûne. Berpirsan ji me re wisa got, gotin emê li ser vê bûyerê baş rawestin. Agahiya wan jî çênebûye. Dema wan digirin nû fêm dikin. Digotin, tevî ewqas istixbarata me xurt e, ev çawa ji ber çavên me çûye.

Apo serê xwe hejand:

-Hevalan ji vir derxin, xaniyekî din bigirin. Tirk her roj dibêjin em ha tine dikin hat tine dikin, ji ber me wiha dibêjin. Jixwe wê ji niha pêve li ser kar bin. Ti mijaran carê piçûk negirin dest...

***

Piştî şîvê bû. Apo li qata dehan li pirtûkxaneyê li pişt mase rûniştibû, dest bi nivîsa xwe kiribû. Diviya wê rojê biqedîne. Berçavka xwe ji ber çavê xwe ra kir, li saeta xwe nêrî. Rabû ser xwe  çû eywanê. Perdeya li ber pencereyê hinekî bilind kir li derdor temaşe kir. Êdî bajar sar xuya dikir û bayê zivistanê

kuçeyên bajêr bêzar nîşan didan. Leza wî di hişê wî de dest pê kiribû, êdî bi pêngavên heyî qayîl nedibû. Dîsa berê xwe da pirtûkxaneyê, pênûsa xwe kir tevgerê: “Cara yekê ye ku PKK, bi vê kongreya 5. bi hêza xwe ya li hundir û derve, gihatiye pêvajoya rizgarkirina herêman. Dîroka rast ya PKKê dîroka min ya jiyanê ye. Min dixwest dîroka partiyê bibe dîroka we jî. Ez di rewşeke wisa de bûm, min bi derziyê çal dikola. Yên bi qehremanî xwe feda dikin jî di navê de, piraniya hevalên me, weke mirîdan tevdigerin.

Dengê derî hat. Siwar qedehek çay anî hêdîka danî ber. Serê xwe bilind kir:

-Divê em êdî zêde neyên vê malê. Vir êdî ji bo me nabe. Ev demeke dirêj e em vê malê bi kar tînin. Gelek bîranînên me tê de hene.

Rabû ser xwe, hinekî meşiya:

-Hevalên me yên kevin piranî li vir em bi hev re mane. Ji hemûyan zêdetir jî di vê malê de hevalê Kemal Pîr maye.

Çû ber arşîvê:

-Raporên hevalên me yên herî kevin li vir in. Nêrîn û pêşniyarên wan, xwestekên wan yên ku ez kêlî bi kêlî dişopînim li vir in.

Rahişt destnivîseke pir delal:

-Ev rapora Mezlum e, hê nêrînên wî pêjna wî ya zanistiyê weke ruhekî bi min re ne.

Rapora Bêrîtanê derxist:

-Ev rapor bo pîvanên di navbera qerhermanî û xiyanetê de.

Li Siwar vegeriya:

-We çi kir ji bo xanî?

-Serokê min, wê sibê bikir werin lê binêrin.

Siwar bêdeng bû, ew jî vegeriya pişt mase, nivîsa xwe ji cihê hiştî domand: “Mijara herî girîng ya kongreya me ya 5. daraz e. Emê bi vê darazê bigihin encamekê. Emê kesên bi salan bi rastiyan lîstîn derînin meydanê. Çenda niyeta wî baş be jî, eger bûbe sedema vaqas tiştên ne baş, dibe ku em nekujin, lê emê wî wek sûcdarekî mezin ragihînin. Li ser vî bingehî ji we tevan re serketinê dixwazim. Hêvî dikim ku hûnê heta dawiyê xwe tevlî bikin û li ser soza xwe bisekinin. Bijî kongreya me ya 5.”

# BEŞA PÊNCEMÎN

Meha Gulana 1995. bû. Apo ji bo roportajê xwe amade kiribû; gumlekekî şînê vekirî û pantolonekî xakî li xwe kiribûn. Tizbiyên wî jî di destê wî de bûn. Li nava eywanê diçû dihat. Cihê teyrê baz yê li eywanê guhert danî navbera xwe û kursiyê ku wê rojnamevan li ser rûne. Emer, Şîlan, û Axîn ji Helebê nû hatibûn. Sê dayîkan li metbexê amadekariya firavînê dikir. Şêxo û Kemal jî alîkariya wan dikirin. Gazî Emer kir li gumlekê wî nêrî, pişt re li yê xwe nêrî. Gumlekê Emer yê keskê avê rûyê wî yê gewr vekiribû. Di dilê xwe de got, dibe ku tiştek bi ser gumlekê min de rijiyabe. Apo hinekî din nêzîk bû:

-Gumlekê te xweşik e, te îro xwe baş hazir kiriye. Divê cilên insanan jî weke hundirê wan pir pak bin. Gumlekekî wiha xweşik ji min re jî peyda bike.

Berê xwe da Şîlanê:

-Şîlan, dayîk çi dikin? We kirine metbexê?

-Serokê min, dizanin wê mêvan werin, gotin emê xwarinê çêkin.

-Îro xwarinên kurdî çêkin, bila çanda Kurdan jî bibînin.

-Temam serokê min.

Berken bû, li Emer nêrî:

-Tê bîra te, rojekê min got te neçe wê Fatma xwarinê bide me.

-Rast e, lê min fêm nekiribû ka ispaket (spagetti) çi ye. Derket meqerne, me ti kesî dengê xwe nekir.

Berê xwe da teyrê baz:

-Şîlan cihê wî çawa ye, ezê rûnim, binêrin ka çawa xuya dike. Mêvanên me yên îro ji Elmanya li ser navê televizyona “ARD” tên.

Di wê navê re dangê derî hat. Axîn çû derî vekir. Rojnamevaneke jin ket hundir. Li pey wê du kesên çenteyên kamera li milên wan derbas bûn. Pêşwaziya wan kir û ji bo rûniştinê kursiyên li hemberî xwe nîşan da. Milîtanên jin û dayîkan bala rojnamevanan dikişand. Piştî bêhnvekirin û vexwarina çayê xwestin dest bi roportaja xwe bikin.

Ji bo roportajê li eywanê kamera hat amadekirin, Apo û rojnamevana roportajê bike, ew jî li ser kursiyên xwe rûniştin. Rojnamevan yekser dest bi pirsan kir:

-Birêz Ocalan PKKê di kongreya xwe ya 5. de hin guhertin çêkirin. Ji ala xwe sembola das-çakûç derxistin. Hûnê dev ji xeta marksîst-lenînîst berdin?

Apo berken bû:

-PKK, ne bûye marksîst-nenînîst ya we fêm kirî, ne jî dev ji xeta marksîst-lenînîst berdaye. PKK tevgereke esîl ya mirovatiyê ye. Li Ewropa nêrîneke fermî heye; ji bo me dibêjin, ortodoksa hişk, marksîst-lenînîst, heta dibêjin stalînîst. Ev ne rast in. Ji bo mijara ala bi das û çakûç jî vê dibêjim: Em ne potperest in. Partiyên girêdayî Sosyalîzma Pêkhatî ev sembol bi kar dianiyan.

Rojnamevanê di ber pirsên xwe re li her tevgera wî bi baldarî dinêrî:

-PKK heta niha li hemberî fikrên cuda hişk tevdigeriya. Wê PKK dev ji doza xwe ya rêbertiyê berde, guhê xwe bide biryarên Parlementoya Kurdistanê ya li derve?

-PKK, di netewebûna hemdem ya Kurd de, di rizgariya neteweyî de û di desthilatdariya gel de bûye saziyeke dîrokî û ji zû ve cihê xwe girtiye.

-Birêz Ocalan, li Rojhilata Navî ku Tirkiye û Kurdistan jî tê de ne, wê sîstema federal bibe çareserî? Wê Tirkiye bi vê razî bibe?

-Tirkiye, dewleteke kemalîst û totalîter e. Heftê sal in hinekî ji Sosyalîzma Pêkhatî, lê bi giranî ji Mussolînî û Hîtler ilham girtiye. Avabûna wê wisa çûbûye. Ti têkiliya wê bi dewleta hemdem re nîne. Di bingehê her pirsgirêkê de ev hişmendiya dewletê heye. Heta ku sîstemeke federal neyê avakirin, bila ti kes ne li benda çareseriyê be.

Rojnamevanê vê carê xwest hêrs bike:

-Birêz serok, dibe ku Rûsya û Emerîka weke partiyên din yên Kurdan, PKKê jî ji xwe re bi kar bînin?

Rayên eniya wî hinekî qermiçîn lê ji pirsê re amade bû:

-PKK nirxekî mezin dide îradeya serbixwe. Polîtîkaya xwe jî heta niha li gorî fermanên hêzên mezin diyar nekirine.

-Birêz Ocalan, wê xeta petrolê di Başûr-Rojhilat (Bakurê Kurdistanê) re derbas bibe. Plan, proje û hevdîtin vê didin diyarkirin. Di vê mijarê de wê helwesteke we çêbe?

-Petrol û riya avê di Kurdistanê re derbas dibin. Û piraniya çavkaniyan jî li Kurdistanê ne. Bi qasî dewletên navên wan derbas dibin, li ser vê xeta rê bandor û otorîteya me jî pêş dikeve. Emê destûrê nedin ku ev xet li dijî gelê me bên bikaranîn.

Rojnamevanê vê carê xwest berê wî bide cihekî din:

-Hûn têkiliya Tirkiye-Israîl çawa dinirxînin? Weke din hûn

polîtîkaya Israîl ya derbarê Kurdan de çawa dibînin?

Apo li nîvê çavên wê nêrî:

-Di vê mijarê de cara yekê ye nêrîna xwe dibêjim. Israîl her tim Tirkiyê li Rojhilata Navî wek girava aramî û dermokrasiyê nîşan dide. Di vê mijarê de dixwaze Emerîka jî bi kar bîne. Çareseriya pirsgirêka di navbera Israîl û Ereban de ji şer baş tir e. Lê Israîl bi piştgiriya dide Tirkiyê zererêrek mezin daye gelê Kurd.

Rojnemevanê li lênûsa xwe nêrî:

-Sala 1993. PKKê diyar kir ku wê çekan dayne. Lê pişt re sih û sê kesên bêçek hatin kuştin. Digel ku hûn kuştina sîvîlan şermezar dikin, jin û zarokên bêparastin tên kuştin. Li Ewropa jî endamên PKKê gel cirm dikin.

Bi vê pirsê hinekî hêrs bûbû:

-Weke dayîka li keça xwe û qusûran digere, hûn jî wisa dikin. Ango eger qusûreke PKKê ya piçûk hebe, hûn dikin pirseke bingehî û dipirsin. Aliyê din, ne sih û sê kes, li ser gelekî teroreke mezin pêk tîne. Bi hezaran gund hatin valakirin. Bi hezaran  kuştinên kiryarên wan ne diyar hatin kirin. Malbateke tenê ya ji mala xwe, warê xwe nebûyî nemaye. Bi dehhezaran di zindanan de işkenceyê dibînin. Milyonek Kurd koçberî Elmanya jî nekirin? Ev berhemên kîjan polîtîkayê ne? Divê mirov hinekî biwijdan be. Desteka gel ya li Ewropa bexşkirin e, ne cirm e. Bi dilê xwe didin. Ev gel gelê Kurdistanê ye. Dostên me yên Elman jî hene. Em herdem dibêjin. Bila hin daxwaziyên me yên demokratîk, nasnameya me ya neteweyî qebûl bikin, emê di rojekê de dawiyê li şerê çekdarî yê parastinê yê rewa bînin. Em amade ne, dewleta tirk ya hûn destekê didinê amade ye? Vê

pirsê ji hevkara xwe dewleta tirk bikin. Eger bersiva hûn bigirin erênî be, ez amade me, ezê di rojekê de agirbestê ragihînim.

Piştî vê bersivê dawî li roportajê hat. Dema xwarinê bû, sifre hatibû amadekirin. Çavên rojnamevanan li xwarinê bûn. Çawa ku cara yekê be bibînin, wisa li kutilk, mehîr, serbizêr, danereş, girara nokan, firîk û savarê dinêrîn. Apo hem suhbet dikir, hem xwarin datanî ber mêvan û dayîkan. Bala rojnemevanê li ser tevgerên wî bû, lê xwarinên li ser sifreyê jî bala wê pir dikişandin:

-Birêz Ocalan, ev xwarinên ez li ser mase dibînim tev ji genim hatine çêkirin, ma genim ji bo we pir biqîmet e?

Apo keniya:

-Ne ji bo me tenê, ji bo her kesî biqîmet e. Civakên berê li dora genim kom bûne. Weke din ji aliyê dayîkê ve hatiye keşifkirin. Civaka me hê jî bi nan sond dixwe.

Kêfa wê jî pir ji vê bersivê re hatibû.

Piştî xwarinê mêvanên xwe birin nava bexçe. Çend gul bîn kirin. Rojnemevanê berê xwe dayê:

-Gelek reng di gulan de hene ev ji bo we tê çi wateyê?

-Ez dixwazim Kurdistan weke van gulan pirreng be.

Li ser milê xwe re li Axînê nêrî:

-Te baş tercûme kir, baş tercûme bike.

Berê xwe da cihê kevokan, hin zadik da wan. Rojnemevanê kûr kûr lê nêrî:

-Tirkiye ji bo we pir tiştên xirab dibêje, dibêje terorîst e, lê hûn wisa xuya nakin. Li derdora we tev jin û dayîk in.

-Min ji min nas bikin, ne ji dewleta Tirk. Ka kî ji me terorîst e, li ber çavan e. Weke din jin ji min bibandor dibin. Dayîkan îro

digot, tu wefadar î, tu nêzîkî ruhê mirovan î.

Piştî ku qasekî li baxçe geriyan, rojnamevanan xatirê xwe xwest, ew jî derbasî hundir bû.

***

Meha Temûza 1995an bû. Apo li dibistanê bû. Gumlekekî risasiyê tarî û pantolonekî jê vekirîtir li xwe kiribûn. Li pişt mase rûniştibû pirsa rewşa milîtanan dikir. Dema dersê bû, ji odeya rêveberiyê derket. Bayekî germ li derdor dixist. Bi gavên hêdîka ber bi deriyê dibistanê ve çû. Her kes li hundir bû, erkdar û nobedar tenê li derve bûn.

Piştî destpêkirina dersê bi deh deqîqeyî Siwar ber bi deriyê dibistanê ve hat. Qedeheke çay di dest de bû. Li ber deriyê dibistanê rûnişt. Piştî ku çaya xwe vexwar çû cem nobedarên li ser banê xanî. Bala xwe da derdora dibistanê. Tevgerek li derdor hebû. Nobedaran xwe nêzîk kir:

-Hevalê Siwar, tu jî dibînî, ev seyareyên leşkerî çawa ku li derdora me biçin bên. Hê diaxivîn seyareyek ket ser riya dibistanê. Nobedaran fişek dan ber çekên xwe. Siwar bilez daket xwarê. Di wê navê re seyare li ber deriyê dibistanê sekinî. Çend leşker jê daketin, serdevkî xwe avêtin erdê. Berê çekên wan li dibistanê bû. Siwar bilez ket hundirê dibistanê. Apo ji ketina wî yan hundir zanî tiştek heye:

-Bêje çi heye Siwar?

Reng di rûyê wî de nemabû:

-Kontra û leşkeran dibistan dorpêç kirine, dixwazin bikevin, hundir.

Gotina wî qediya-neqediya, dengê vebûna deriyê hewşa dibistanê hat.

Siwar bezî çû ber derî. Di navbera deriyê hewşê û yê dibistanê de deh metre bûn. Milîtanê derî vekirî haya wî ji leşkeran tinebû. Ew jî di şoqê de mabû. Nizaniya çi bike. Apo ji Siwar derbas bû ber di derî ve çû. Piştî derketina wî, milîtan jî li aliyê piştê çeper girtin. Du hêzên çekdar li hemberî hev sekinîbûn. Apo ket navbera her du aliyan. Çend milîtanan bi bayê bezê xwe da pêşiya wî. Bi aramî berê xwe da milîtanên li kêleka xwe:

-Biçin binêrin ev çi dixwazin.

Siwar û çar milîtan çûn pêşberî wan, Siwar xwe da pêşiyê:

-Hûn çi dixwazin?

Çavên serleşker li ser milîtanên biçek bûn, ew jî şaş mabûn:

-Em muelimê we dixwazin.

Siwar bilez bersiv da:

-Dibe, lê divê hûn bêçek werin hundir.

Serleşker serê xwe hejand:

-Em leşker in, em nikarin çekên xwe daynin.

Qasekî wisa li ber hev dan. Herî dawiyê serleşker iqna bû ku ew tenê û bêçek bikeve hundir. Jimara pir ya milîtanan bala wî kişand. Li derdora dibistanê, li peykerê Egîd û wêneyên şehîdan nêrî. Li pêşberî Apo sekinî:

-Ji me re ixbar hatiye, divê em li hundir binêrin.

Apo berê xwe da milîtanên li kêleka xwe:

-Hûn jî bi wan re biçin, bila li hundir binêrin.

Leşker li derdora dibisanê, milîtanên nobedar jî li ser xanî destên wan li ser tekik bûn. Her du alî jî li benda fermanê bûn.

Piştî nêrîna li hundir serleşker çû ser banê xanî. Çav bi milîtanên di çeperan de ket. Şaş mabû:

-Diyar e ku ev leşkerin xurt in.

Milîtanê nobedar, li serleşker temaşe kir. Bi awirên xwe helwesta xwe nîşan dida. Serleşker ji awirên wî zanî ku reşweke hesas e, ji ber wê dixwest rewşê nerm bike. Piştî ku tiştek nedîtin serleşker çû cem Apo:

-Me ixbar standibû, ji ber wê em hatin.

-Xem nake, we erka xwe pêk aniye. Lê ev bîst sal in em li vir û dewlet jî zane. Eger bixwaze tiştekî ji me re bêje, pêwîst nake bi ser dibistanên me de bigire, dikarin yekser ji me re bêjin.

Serleşker hinekî li ber xwe ketibû, ji ber wê li rûyê wî nedinêrî.

Piştî çûna leşker milîtan tev li dora Apo kom bûn. Moralê her kesî xirab bûbû. Derdê her kesî ew bû. Her yek bi awayekî di hundirê xwe de dihizirî. Wî jî di çavên wan de ev hestê wan didît û dizanî ku hemû nerehet bûne. Xwest atmosferê biguherîne:

-Werin em bi topê bilîzin.

Bi vê gotina wî hinekî rehet bûn. Berê xwe dan qada topê, dest bi lîstikê kirin. Piştî lîstikê gazî rêveberiyê kir:

-Ez diçim, bila sibê ders tinebe. Tev kom bibin li ser vê bûyera îro nîqaş bikin. Ka kê çi jê derxistiye bila bêje. Piştî wê emê encamê nîqaş bikin. Piştî çûna wî ji bo nîqaşa mijarê tev ketin hundirê dibistanê.

Li pirtûkxaneya malê rûniştibû, kûr kûr dihizirî. Qederek derbas bû, Siwar û Kemal ketin hundir:

-We çi kir, ji bûyerê we çi fêm kir?

Hê dîmenê bûyera li dibistanê li ber çavên Siwar bû:

-Serokê min, tişta me fêm kirî, bûyer plankirî bû. Gotin em bi xwe jî li ser radiwestin. Tişteke din ji me re negotin.

Rabû ser xwe:

-Fêm bû, plankirî ye. Lewre cih nas dikin û dizanin em di hundir de ne. Lê ya baş ti rewşên cuda çênebûn, divê ji niha pêve her kes şiyartir be.

Serê sibê xwe hazir kir, bi Siwar re ketin ser riya dibistanê. Li ser bûyera roja borî dihizirî; di dilê xwe de got, divê berî her tiştî em milîtanan pir perwerde bikin. Dixwazin ji her milî ve derdor li me teng bikin.

Piştî qasekî gihîştin dibistanê. Bi ketina hewşê her kes derbasî hundir bû. Ji rêveberiyê encama nîqaşê pirsî. Pişt re derbasî hundir bû. Qederekê li milîtanan nêrî:

-We bûyera doh nîqaş kiriye. Li welatê xerîbiyê wê her tim xeterên wiha derkevin pêşiya me.

Weke her car çavên xwe danîn ser hev:

-Eger rojeke ji rojan we bostek erd rizgar kir, qîmetê wê bizanin û zaroktiyê nekin.

Peyva “xerîbiyê” û “bostek erd” bala milîtanan kişandibû. Bostek erdê azad bûbû armanca her kesî. Piştî axaftineke dirêj navber hat dayîn.

***

Li Başûrê Kurdistanê ji 26ê Tebaxê ve, di navbera gerîlayên

PKKê û çekdarên PDKê de li gelek herêman şer dest pê kiribû. Ji bo rawestandina şer gelek alî û kesayet ketibûn navberê. Heyet li ser heyetê hem diçûn Başûr, hem dihatin Şamê. Apo dihizirî ka wê çawa pirsgirêk bê çaresekirin û bibe bingehê yekîtiyeke neteweyî. Ji bo peydakirina riyekê, ji her kesî pêşniyar û nêrîn digirtin.

Axaftina xwe ya bi bêsîmê nû qedandibû, li ser piyan diçû dihat. Pêvajoyê ewqas mijûl kiribû, di mejiyê xwe de gihîştibû çareseriyekê, lê wê çawa pêk bihata. Li ser qenepeyê li ber pencereyê rûnişt. Rahişt şûşeya avê vexwar. Destê xwe da eniya xwe, dixwest tişta bi salan ti kesî nekirî ew bike. Kesayeta Kurd ya di dîrokê de anî bîra xwe. Di ber xwe de got, ji şer girîngtir divê hişmendiya heyî bê guhertin. Di wê navê re Çirûsk ket hundir.

-Çirûsk, tu hatî? Ka were em çi bikin?

Her du li hemberî hev rûniştin.

-Dersa me ya îro çi bû?

- Rêbertî û dîroka wî, serokê min.

-Em roja xwe çawa binirxînin? Em nikarin hin rêbazên baştir peyda bikin?

-Di rêbertiya taktîkî de pirsgirêka pêkanîna perspektîfên Rêbertiyê heye.

-Dema behsa rêbertiya taktîkî tê kirin, mûyên serê min qij dibin. Te gotibû karîkatûr, kolozê Rêbertiyê, te çi gotibû?

-Kolozê Rêbertiyê...

Hinekî serê xwe hejand, bi baldarî li ser tesbîtên Çirûsk hizirî:

-Mentiqê potkirina Rêbertiyê heye, yan jî wê her tiştî ew

bike.

-Serokê min, teqlîd, potkirin...

-Erê, Hişmendiya "tiştekî îlahî ye, wê her tiştî ew bike" heye. Bi vê jî wisa dike ku pirs jê neyên kirin.

Çavên Çirûsk li ser rawestiyabûn:

-Serokê min, wê îro gelek rewşenbîr werin, ka şertên agirbestê çi ne dixwazin bizanin. Pêşniyara min hevdîtin li dibisatanê çêbe.

-Temam baş e, em li dibisatnê bikin û bila her kes li wir amade be. Dermanê van pirsgirêkan tevan Kongreyeke Neteweyî ye. Demeke dirêj e, her kes dibêje divê Kongreyeke Neteweyî pêk were, lê ti kes gavekê jî navêje. Lewre dizanin çareseriya wê gelek giran e. Ji me re dihêlin.

-Serokê min, şer heye û firsendên navneteweyî hene. Di sîstema navneteweyî de tê gotin, bibin yek, emê we qebûl bikin. Ev ji bo Kurdan girîng e.

-Niha dinya jî wisa bawer dike ku şer di navbera PKK-PDKê de ye. Gelek rêxistin jî wisa dinirxînin. Lê rewş ne wisa ye, divê werin bibînin. Şerê me û dewleta Tirk e, PDK jî bi artêşa Tirk re şerê me dike. Mafê ti kesî nîne bi rengekî din nîşan bide. Niha dixwazin bi dewleta Tirk bişêwirin wisa meclisekê çêkin. Meclisa bi şêwra bi dewleta Tirk ji şêwra bi me re ne biqîmetir e.

Dengê telefonê hat. Çirûsk rakir:

-Serokê min, Agir e.

Telefon ji destê wî girt, lê qut bûbû. Deng careke din hat:

-Silav û rêz serokê min.

-Silav û rêz, ji bo şertên agirbestê çi dibêjin?

-Serokê min, ji bo derxistina daxuyaniyeke hevbeş em bi wan re rûniştin. PDK dibêje divê em biçin cem serokatiya we, paşê imze bikin.

Serê xwe hejand, li derdora xwe nêrî:

-Fêm dibe. Eger hêza wan ji bo agirbsetê heye, şertên me diyar in. Eger nekin, dibe ku vê zivistanê her tiştî wenda bikin. Em bi sebreke mezin ji wan re dibêjin, eger pêwîstiyên berpirsiyariyê pêk bînin, wê ji bo wan baş be.

-Serokê min, çawa we gotî, me ji wan re got, ne em tine dibin, ne armanceke me ya tinekirina we heye. Em dixwazin li Kurdistanê hêza xwe ji bo yekîtiya neteweyî û xizmeta gel bi kar bînin. Em jî vî şerî naxwazin. Ji bo ku careke din şer nebe, pêwîstiya me bi Kongreyeke Neteweyî heye. Hebûna me li Başûr ji bo xurtkirina destkeftiyan e. Me bi kurtayî ev ji wan re got.

-Hin kes dixwazin navcîtiyê bikin. Ihtimal heye agirbest çêbe, lê dewleta Tirk dixwaze pêşiyê bigire.

Telefon danî, berê xwe vegerand ser Çirûsk:

-Em biçin dibistanê.

Di wê navê re dengê derî hat.

-Serokê min, ez bawer dikim mêvanên me behsa wan kirî hatin.

Bi vekirina derî re ew jî rabû ser xwe mêvan pêşwazî kirin. Piştî ku mêvanan bihna xwe vekir û hinekî suhbet kirn, tev de daketin jêrê. Milîtan tev di hundirê dibistanê de kom bûbûn. Ew jî bilez ketin hundir. Ji bo hevdîtinê her tişt hatibû amadekirin. Hevdîtineke girîng bû. Kurdên her çar parçeyan li benda daxuyaniyekê bûn. Piştî ku careke din bixêrhatin da mêvanan,

derbasî mijarê bû:

-Berî her tiştî divê bênîqaş hişmendiya yekîtiyê bê qebûlkirin. “Li gorî min, li gorî te” yekîtî nabe. Divê yekîtiyeke li gorî me tevan be. Ez bi awayekî eşkere dibêjim; yên bi awayekî herî dijwar şerê min dikin jî, cihê wan di vê yekîtiyê de heye. Bila qanûnên giştî yên yekîtiyê bên qebûlkirin, pêwîstiyên wan pêk bînin, bila her tiştî ji me re bêjin, heta dikarin şerê me jî bikin.

Yên di heyetê de bi hejandina serê xwe gotinên wî erê dikirin:

-Nêzî 40 milyonî Kurd hene. Eger em îradeya van 40 milyonan bidin destê çend rêxistinan, heta bidin destê çend kesên rêxistin bi xwe ve girê dayîn, wê bibe bêrêziya li hemberî îradeya neteweyî. Kesê ji yekîtiya neteweyî bireve, yan têkiliya wî bi netewetiyê re nîne, yan ji bo berjewediya dijmin, yan jî ji bo berjewendiya xwe ya şexsî dixebite.

Heyeta hatî gotinên wî yek bi yek di hişê xwe de qeyd dikirin. Li bendê bûn ku bi mizgîniyeke xêrê ji cem biçin. Wî jî bi rojan li ser şer û çareseriyê rawestiyabû. Niha dema daxwiyaniyeke dîrokî bû:

-Ji valayiya civaka Kurdistanê dijmin sûdê digire. Hebûna me li wir ji bo xirabkirina lîstikên dijmin e. Ji bo wê ne agirbest tenê, em dixwazin di nava me de itîfaq jî çêbe. Bila ew li Bakur piştgiriya me bikin, emê jî li Başûr piştgiriya wan bikin. Pîvan ev e. Eger durist bin wê pêk were.

Hem rojeke dîrokî bû, hem axaftineke girîng dihat kirin. Wêne li ser wêneyan dihatin kişandin:

-Divê kongreyeke ne di binê bandore ti kesî de bê komkirin, bila her kes bikare tê de fikrê xwe bêje. Berî her kesî em bi dil û

can ji bo vê hene. Em amade ne hêza xwe tevê seferber bikin. Kongre wê bibe platformeke nîqaşê. Fêmnekirin û watenedayîna Kongreya Neteweyî xefleteke mezin e, mafê ti kesî nîne red bike. Kurdistan bûye hezar parçe, yekîtî pir kêm pêş ketiye. Ji bo wê her xebata ji bo yekîtiyê biqîmet e. Yekîtiyeke wiha berfireh wê her kesî xurt bike.

Ji heyetê hina jê not digirtin:

-Divê têkiliya di navbera parçeyan de, wek destwerdana li hundir neyê fêmkirin. Mînak, em dixwazin gelek pêşmerge werin cem me, emê bi hatina wan kêfxweş bibin. Hebûna me ya li wir ne ji bo destwerdana nava wan e, ji bo alîkariyê ye. Em ji bo xurtkirina xwestekên demokratîk yên neteweyî li wir in.

Piştî axaftin û suhbeteke dirêj, sifreya xwarinê hat danîn. Kesên hatîn cara yekê bû ku guhdarî daxuyaniyeke di wê astê de dikirin. Hem kêfxweş bûbûn, hem dixwestin pirtir pê re bimînin, da fikrê wî yê ji bo yektiyê bigirin.

***

Bi ser daxuyaniya agirbestê re rojek derbas bûbû. Agirbestê deng vedabû. Hê jî gelek rewşenbîr û siyasetvan ji bo hevdîtinê dihatin dibistanê. Bager û Çirûsk li qada dibistanê (herdu heval 95'an li Zapê Biryargeha navendî bun) hêdî hêdî dimeşiyan. Bager li ser salên li zindanê û xwegihandina kêliya tê de dihizirî. Dixwest mesafeya di wê navê re ketî navbera wî û rêxistinê bizane û çareser bike. Di dilê xwe de dubare digot, pêwîstî bi pêngaveke piratîkî û hizrî heye. Her ku gavek diavêt, di xeyalê xwe de diçû salên borî. Hişê Çirûsk jî bi fikir û felsefeya Apo re

mijûl bû. Di dilê xwe de got, Serokatî di kesayeta xwe de gihatiye asteke pir bilind, lê emê çawa pênase bikin? Dema dersê bû, çavên wan li hatina wî bûn. Bager di ser milê xwe re lê vegeriya:

-Serokatiyê di daxuyaniya doh de dîsa pêngaveke ku mirov texmîn neke kir. Digel ku PDK'ê, di aparasyona Çelikê de alîkariya Tirkan kir, Serokatiyê ev gav avêt. Lê eger ew şer nebûya wê pirtir bi ser me de bihatan. Ev agirbest jî bû wesîleya pêşketina yektîya Kurdan.

Çirûsk jî xwest nêrîna xwe bêje:

-Eger me biryarên kongreya pêncan bilez pêk bianiyan, emê bigihatan leza hizirîna Serokatiyê ya ji paşrojê re. Lê bi qasî dihat xwestin guhertin çênebû. Lewre her ku çû ji bo pêngavên azadiya Kurdistanê PDK bû asteng xeter.

Bager berken bû:

-Ji ber lihevketina me û PDKê, YNK'ê kêf kir, meydan ji wan re ma. Lê imzekirina daxuyaniyê gelek baş bû.

Bager weke her car dîsa bêdeng bû, bala wî çû ser tevgera Apo ya xebatê:

-Bi qasî Kurdistanê, Serokatî bi pirsgirêkên Rojhilta Navî re jî mijûl e. Divê em jî xwe bigihînin leza meşa wî.

Çirûsk serê xwe dihejand:

-Tu rast dibêjî, lê asta Serokatiyê xwe gihandiyê ji texmînên me wêvetir e.

Di wê navê re Apo ket hewşê. Bi dîtina wî re bilez û bikelecan ber ve çûn. Piştî silavê bi hev re ber di qadê ve meşiyan. Car bi car li wan dinêrî. Çavên xwe li ser Bager rawestandin:

-Tu ber bi qadên şer ve diçî, tu xwe çawa dinirxînî?

-Ez seresere mam, serokê min.

-Dema tu xebata min û ya xwe didî ber hev, tu ferqeke çawa dibînî?

-Ferqeke pir mezin heye, serokê min.

-Em di xebata artîstiyeke mezin de lîstin, tu çawa mayî?

Vê pirsê wisa kir ku salên xwe yên borî hemûyan bîne ber çavên xwe:

-Ez di nava rewşeke nediyar de mam.

Çend kêliyan her sê bêdeng man. Çirûsk dixwest bêdengiyê bi nêrînên xwe bişkine:

-Serokê min, di vê mijarê de rêbazeke Hz. Îsa ya balkîş heye. Dibêje, eger hûn dixwazin min bişopînin, xwe inkar bikin.

Ev fikir ji Apo re balkêş hatibû:

-Rast e.

Çirûsk dixwest nêrîna xwe ya di vê mijarê de baştir bide diyarkirin:

-Ango dibêje, xwe biguherînin.

-Bêguman, gotineke mezin e.

-Serokê min, pêwîstiya me jî bi tişteke wisa heye.

-Rast e, xwe inkar bikî!

Çirûsk hinekî sekinî, pişt re bi dengekî melûl bersiv da:

-Li cem me inkarkirina xwe nîne.

-Ez xwe inkar dikim. Ma hûn nabînin, ez çawa inkar li ser inkarê disepînim? Ango ez behsa inkara ezeziyê dikim.

-Serokê min, ji bo mirovê Kurdistanê bi taybetî pêwîst e.

-Ji sedî sed inkar pêwîst e. Lewre ew taybetiyên mêtîngeriyê ne, yên xiyanetê ne. Lê digel inkarê, divê berê xwe bide hêvî,

başî û bedewiyê. Ku Ewropî ji we re dibêjin “sereş” mafdar in. Gotina Tirkan jî jixwe “kiro” ye. Heta dikare siwar dibe, pişt re dibêje “kiro” û pehînekê lê dide. Nêrîna li me wisa ye. Yan “kiro”, yan “sereş” weke din tiştek layîq nayê dîtin.

Li saeta xwe nêrî:

-Dema dersê ye, hûn biçin dibistanê ezê jî biçim mêvanan bibînim. Paşê em plana xwe çêkin.

Ji wan dûr ket çû odeya mêvanan, wan jî berê xwe da deriyê dibistanê.

Piştî du saetan wî jî berê xwe da dibistanê. Li ber derî hinekî guhdarî dersê kir. Piştî qasekî ber bi odeya birîndaran ve çû. Nobedar hinekî li dûr sekinîbû. Li derî xist ket hûndir:

-Nobedaran ez nedîtim û hûn jî bi min nehesiyan. Ji ber wê hûn şehîd dikevin û birîndar dibin?

Yên li hundir bikelecan lê dinêriyan. Yên birînên wan hinekî baş rabûbûn ser xwe. Yek bi yek li wan nêrî:

-Heval hemû rûnin.

Berê xwe da serê rêzê:

-Aram, tu çi pirtûkê dixwînî?

-Serokê min, ez hunerê şer dixwînim.

Li yê li tenşita xwe yê ji lingê xwe birîndar nêrî:

-Tu kîjan pirtûkê dixwînî?

-Serokê min, ez romana Dayîkê dixwînim.

Bi rêzê ve çû:

-Tu heval?

-Serokê min ez polîtîk rapora kongreya yekê dixwînim.

Li pêşberî wan hinekî çû hat:

-Hûn dixwînin, lê çi jê fêm dikin? Dema hûn dixwînin, divê

hişê we li ser tişteke din nebe. Divê aqilê we pak be, da hûn herf bi herf jê fêm bikin. Dîrokê bixwinin. Ku hûn dîrokê bizanin hûnê roja em tê de jî fêm bikin. Lê eger hûn dîrokê nizanibin, hûnê îro jî fêm nekin, sibê jî fêm nekin. We ji bo şoreşê bedel daye. We xwîn rijandiye. Ji bo ku hûn bikarin bedelê we dayî bikin bingehê fêmkirinê, divê hûn li vê qadê vê rastiyê binirxînin.

Yek bi yek dem û cihê lê birîndar bûyîn, ji wan pirsî.

Di wê navê re navbera nîvro hat dayîn. Bi birîndaran re xwarin xwar.

Piştî xwarinê berî ku derbasî hundir bibe, gazî Bager kir:

-Em îro li ser çi rawestin çi nîqaş bikin?

-Serokê min, pêwîstî bi pênasekirina kesayetê heye.

Di wê navê re Çirûsk jî hat cam wan. Bi hev re ketin hundir. Bager û Çirûsk çûn li rêza pêşiyê rûniştin. Apo, piştî ku li pişta mase hinekî sekinî, awirên çavên xwe dan ser Bager û Çirûsk. Bi awirên çavan re rabûn ser xwe:

-Bager, xala herî zêde tu jê hêrs dibî çi ye? Tişta tu heyfa xwe lê tînî, yan jî firsenda ji destê te derketî çi ye?

Dema Bager li dibistanê radibû ser xwe dîroka derbas kirî tev dianî ber çavên xwe:

-Dema herî girîng 1985 bû, serokê min.

-Baş e, qet demên tu bêjî “Wey, ev firsend ji destê min derket” çêbûne?

- Pir in serokê min.

-Kêliya herî zêde heyfa te lê tê bêje.

-Serokê min 1985. Berî wê jî 1983.

Apo di rûyê wî de ew giranî didît:

-Bi rastî heyfa te lê tê? Tu his dikî ku tu xwe efû nakî?

-Hinekî dudilîtî hebû. Ango ji bo pêkanîna armancên mezin, hedefên mezin em ne amade bûn.

-Tu şoreşgrer î, çima tu ji sîstemê qut nebûyî?

-Serokê min, ji bo qutbûnê pêwîstî bi armancên mezin heye.

-Te aramancên mezin peyda nekirin, yan jî mezin nekirin?

Berê xwe vegerand ser milîtanên li dibistanê:

-Hûn hevalê me Çirûsk nas dikin, hevalê me yê herî kevin yê ji herêma Dêrsimê ye. Gelê me yê Dêrsimê pir hestiyar e. Bêguman hestiyarî, eger li ser bingehê rastiyê be biwate û pîroz e. Em jî bi vê wateyê hestiyar in. Di mijara Dr. Baran û mijara Dêrsimê de tu çi dibêjî Çirûsk?

-Serokê min li Kurdistanê Sêdar, Çanda Leşkerî û Erkên me yên Tolhildana Şoreşger", nirxandineke berfireh û bicewher bû. Eger baş bihata nirxandin, wê rewşa Dêrsimê niha cuda bûya.

-Bager, tu çi dibêjî?

-Serokê min, li gorî agahiya me girtî, Selim Çûrûkkaya, berî şeş mehan çawa ku ev bûyer bibe, daxuyaniyek da.

-Weke çi?

-Wê demê me tiştekе wiha bihîstibû: Digot, partiyê Dr. Baran kuşt, wê ez jî bikuştam. Ji ber wê reviyam. Weke din gotibû, partî li dijî Zaza ye, ji partiyê tên avêtin.

Apo hinekî hizirî:

-Ew mijara Zazatiyê li Swêdê bû. Papukçu hebû. Xwest netewetiyeke taybet ya Zaza pêş bixe. Em têkiliya wî ya bi dewleta Tirk re baş zanin. Çirûsk, tu dikarî çi bêjî? Emê çawa ji navê derkevin?

-Serokê min, di serî de şoreşgerî şaş tê fêmkirin, dema nayê

rastkirin, encameke pir xirab derdikeve. Lê PKK dikare di her demê de rêbazeke nû biafirîne, şexis jî dikarin.

Dersê heta êvarê dewam kir. Piştî dersê her kes derket derve. Bager berê xwe da nîzamiyê. Berî ku derkeve, li ber derî Siwar rastî wî hat:

-Hevalê Bager, ava vexwarinê li dibistanê nemaye. Hevalê Memed ji derve tîne. Lê hin hevalên ne şiyar, diçin destê xwe dikinê qirêj dikin. Ew naxwaze ji we re bêje. Van rojan ji sibê heta êvarê avê tînin, yek diçe destê xwe dikiyê qirêj dike.

Çend gav avêtin rastî Memed hat. Gazî kirê:

-Hevalê Memed, ez û tu li vir fermandar in. Tu çi bêjî emê bikin, çi bibe ji min re bêje.

Bala Memed li ser bû, ku bi kurdî pê re diaxive. Vê dilê wî rehet kiribû. Moralê wî piştî gotina Bager xweştir bûbû. Di dilê xwe de got, Hevalê Bager bi edalet e.

-Siwar hin tişt ji min re gotin, tu xema nexwe emê li ser wan hevalan rawestin. Ev bêxemî ne ji bo te tenê ye, dibistaneke li vir e û tev wê avê vedixwin.

-Hevalê Bager, carna hevalê Rizgar tiştên ji bo xwe dixwaze, ez qebûl nakim. Bê şiyarkirin wê baş be.

-Em wan dizanin, ez bawer dikim yê avê jî qirêj dike ew e. Rast e kêfî ye û emê li ser vê taybetmendiya wî bisekinin.

-Ji dema ez hatîm vir ve, min fêm kiriye ku divê her tişt komînal be, heta ji min tê ez li gorî wê tevdigerim.

Piştî qederekî suhbet kirin Bager ji wir dûr ket çû dibistanê. Di dilê xwe de got, ev kesayet pir kêfî ye, divê em li vir vê taybetmendiyê mehkum bikin. Nexwe wê li her derê wê zererê bide jiyanê.

***

Roj bilind bûbû lê ji aliyê Qasyon ve bayekî pir sar li qata dehan dixist. Milîtanan hundirê malê tev dabû ber xwe paqij dikirin. Eywan tenê mabû. Herî dawî teyrê baz li cihê wî danîn. Rûken, Dîcle, Rozerîn û Şervînê ji bo çûna welat çenteyên xwe amade dikirin. Ji bo nivîsa bîranînê lênûsên xwe jî dabûn hevalên xwe yên li malê bimînin. Bala Şervînê li ser Rûkenê bû:

-Hevala Rûken, te gelek tişt kirine çenteyê xwe, hêstirek nikare rake, tuyê li çiyê çawa bimeşî?

Wê jî hê hin tişt dixistinê:

-Heval, li wir her tişt lazim e.

-Hevala Rûken, li wir îradeyeke xurt lazim e, ne ev tiştên tu dadigirî.

Rûken hinekî sekinî:

-Temam, ezê binêrim ka çi zêde ye.

Careke din tiştên di çenteyê xwe de vala kirin, hin ta û derzî derxistin:

-Ez bawer dikim ev ne lazim in.

Şervîn keniya:

-Ez jî bawer dikim ew tenê lazim in. Lez bike wê Serokatî bê, divê em amade bin. Ji bo ku emê biçin hevalên xwe yên li çiyê bibînin, pir bikêf im, lê dûrketina ji Serok jî pir zehmet e.

Bi hev re çûn eywanê. Her kes rûniştibû li ser artêşbûna jinê nîqaş dikirin. Wê jî dixwest tecrûbeya xwe bi wan re par ve bike:

-Hişmendiya ku “Jin nikare şer bike.” ya li Zelê derketî, di binê siha zilam de derketibû. Ji ber wê serokatiyê ew qebûl nekir. Sala 1993'yan bi navê Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê (TAJK) kongre pêk hatibû, lê nehatibû qebûlkirin. Ji wê demê ve Serokatî li hemberî vê hişmendiyê, artêşa jinê dide pêş. Ew weke me nêz nabe, em bertekê nîşan didin, lê ew li ser pêşvebirin û avakirinê disekine. Li Botanê inadê em girtibûn, me digot emê yekîneyên xweser çêkin û çêbûn jî. Me her tiştê xwe bi xwe dikir.

Ew demek bû Dîcle di nava xebatê de bû, nû hatibû malê. Ji ber wê bikelecan bû:

-Hevalno, jixwe xweseriya me çêbûye, lê nizanim ka li welat çawa ye. Hevalên ji welat tên dibêjin, hêza me ya giştî hê xweseriya jinê qebûl nake. Lê di baweriya min de ev hişmendî li her derê heye.

Saet ber bi heft û nîvê ve diçû, êdî dema rabûnê bû. Her kesî dest bi bernameya xwe ya rojê kir. Di wê navê re Kemal ket hudir. Ji ber gulên li ber singa wî rûyê wî xuya nedikir. Piştî silavê gul danîn ser mase, bedlê di nava qilif de jî danî ser qenepe.

Şervînê berê xwe dayê:

-Hevalê Kemal, ev bedlê cilan yê kê ye?

-Cilên Serokatiyê ne.

Tevan li Kemal nêrî:

-Hevalê Kemal, ka veke em binêrin çawa ye?

Kemal hinekî hizirî: “Ez nikarim xwe ji wan xelas bikim, divê nîşanî wan bikim.” Destê xwe avêt zîncîrê vekir. Bedlekî reşê pir bedew bû. Hem lê dinêriyan, hem destên wan li ser bûn.

Piştî agirbestê hê cilên fermî lê nedîtibûn. Her yekê tiştek digot. Ji wê kelecanê haya wan jê tinebû ku ew jî ketiye hundir. Li pêşberî wan sekinî:

-Mereheba ji we re, hûn wisa li dora çi kom bûne?

Çavên wî jî bi bedil ketin:

-Kemal, cilên te ji min re anîn ev in? Te li gorî hevdîtinan anîne, ne?

-Rast e serokê min.

Rahiştiyê li ber xwe girt:

-Kê ev cilên fireh ji min re anîne?

Careke din da ber bejna xwe. Çavên wî ketin ser desteya gulan:

-We pereyên me hemû dane cil û çîçekan. Hûn dizanin em cilên biha li xwe nakin, belav nakin, em bi qasî pêdiviyê li xwe dikin û xweşik li xwe dikin.

Cil danîn, li ser qenepe rûnişt:

-Hevalên biçin welat bila bên emê biçin dibistanê. Ji bo kongreya jinê emê bi hevalan re biaxivin. Şoreşa min heman demê şoreşa armancê ye. Bi jinê re jî ne koletî azadî, ne sikbûn bedewî, ne ya şaş ya rast, hem şoreşa pêkanîna van e, hem şoreşa parvekirinê ye. Jina dinyaya wê tineyî, rastiyeke wê tineyî, girêdayî, ya lava dike, yan jî ya hêza wê ya dewlemendkirina jiyanê tineyî, ji bo min piçûkxistina jiyanê ye, işkence ye.

Piştî qasekî derbasî pirtûkxaneyê bû. Di wê navê re Xweşnav û Selah jî hatin, li eywanê rûniştin. Piştî xwendina notên jê re hatîn, derket çû eywanê.

-Pirtûk û roportajên em amade dikin, girîng in, ji bo dema

pêş in. Selah tu çi dibêjî?

-Serokê min, wê bandorê li Rojhilata Navî tevê bikin. Kovara we gotî jî wê di mehên pêşiya me de amade bibe. Pêşniyara me heftane be. Çawa we gotî wê li Misir, Libya, Lubnan û Suriyê derkeve.

-Divê li gorî siyaseta herêmê û li ser asta Rojhilata Navî û Cîhanê be. Hin rûpel jî bila ji bo Kurdan bin. Divê qalîteya wê jî pir baş be..

-Serokê min, li ser navê wê jî me nîqaş kir. Pêşniyara me navê wê Elewc. be.

-Tê çi wateyê?.

-Serokê min, bi kurdî tê wateya asta herî bilind.

-Temam, baş e.

Berê xwe da Xweşnav:

-Tu çi dibêjî, fikrê me di nava xwendevanan de çawa tê dîtin?

-Serokê min hûn pir bi cesaret û vekirî diaxivin. Fikrê we ewqas li pêş e, mirov jê ditirse. Bi tayabetî di mijara jin û malbatê de.

-Rast e, ez bi xwe jî her roj di kesayeta xwe de şoreşekê dikim, lewre fikrên min vekirî û eşkere ne.

Rabû ser xwe, çû ber pencereyê, hinekî li Şamê temaşe kir. Pişt re çû qazaxê xwe li xwe kir,  parkeyê xwe jî bi ser de wergirt. Tev de derketin berê xwe dan dibistanê. Amadekariya kongreyê qediyabû, her kes li hundir li benda wî bû. Li ber derî peya bû û bilez berê xwe da deriyê dibistanê. Bi ketina hundir re her kes rabû ser xwe. Derbasî pişta mase bû, çend kêliyan li delegeyan temaşe kir. Her kes bikelecan û rûgeş bû. Ew jî pir

rûgeş bû, bi kelecaneke mezin dest bi axaftinê kir:

-Di demekê de ku Yekîtiya Jinên Azad ya Kurdistanê ber bi kongreya xwe ya neteweyî ya yekê ve diçe, xebata me kirî, xwedî girîngiyeke mezin e. Ez bawer dikim, gelek konferansên jinê jî çêdibin. Kongreya we ya di asta neteweyî de jî wê rê ji geşedanan re veke.

Hinekî pêş ve çû li rêza jinan temaşe kir. Di dilê xwe de got, emê bi van civakê biguherînin. Dîsa vegeriya cihê xwe:

-Serhildana destpêkê li hemberî malbatê ye. Encama wê pir girîng e. Bifikirin hûn jin dixwazin di asteke pir jor de tevlî şoreşê bibin. Gelo bingehê vê çawa hatiye danîn? Em dixwazin ji têkiliyeke pir lewitî, pir ketî, xwe bigihînin têkiliyeke pir pîroz, pir paqij.

Bi gotina xwe re çavên xwe girtin, dixwest mijarê kûrtir bike:

-Mijara jinê çawa ku tê texmînkirin ne mijareke taybet û şexsî ye. Hema hema tevayiya girêkên kor û pirsgirêkan bi vê mijarê ve girêdayî ne. Em îro bi we re civîneke asta azadiya wê pêşketî çêdikin. Dibe ku ji bo hina pir ne pêwîst be jî. Lê ji bo min binirx e. Lewre tê de hinekî asta azadiyê heye. Ez qîmetekî pir mezin didim hestên keçên ciwan. Divê helwesteke we ya exlaqî hebe, exlaqê we yê azadiyê hebe, pîvanên we hebin. Şoreşa rêbertiyê, heman demê şoreşa eşqê ye. Şoreşa jinê, mijara sedsala 21. ye.

Piştî axaftinê yek bi yek jinên derbasî welat bibin, derketin xwe dan naskirin û soza xwe dan. Bi dawîkirina her sozê re li çepikan dixist. Çarçoveya kongreyê derketibû û perspektîfên pêwîst hatibûn dayîn.

Di beşa 4'an de mijar û dîrok pirr ji hev qut bune

## BEŞA ŞEŞEMÎN

Çarê Nîsanê bû, milîtanên jin li dibistanê kom bûbûn. Pir bikelecan rûniştibûn. Çavên hemûyan li dîwanê bû. Kongreya YAJKê di nava şert û mercên zor û zehmet de bi dawî bûbû. Wan jî kêlî bi kêlî mereq dikir. Dibistan bêdeng bû. Xort hin li qadê dimeşiyan, hina jî binê daran dixepart. Lê pir mereq dikirin ka jinan çi biryar girtine. Şîlan di komsisyonê de bû. Çavên hemûyan lê bû. Rûyê wan geş bûbû. Bi uslûbekî xweş û zelal dest bi axaftinê kir:

-Hevalno, Konrgeya YAJKê ya 1. di navbera 8-18ê Adarê de bi tevlîbûna 350 delegeyî li çiyayên azad pêk hat. YJWK, ku Rêxistina jinê ya destpêkê ye, sala 1987an hatibû avakirin. Bi vê kongreyê, wê tevgera jinê bikeve pêvajoyeke nû. Hin biryarên hatîn girtin ev in.

Li yên rûniştî dinêrî, di çavên wan de hestên bendewariya bi salan didîtin:

-Di asta rêveberiyê de cara yekê navendek tê hilbijartin.

-Wê artêşa jinê ya xweser li her derê bê birêxistinkirin.

-Wê tevayiya xebata jinê bi navê YAJKê bibe navend û bi Serok ve girêdayî be.

Bi xwendina vê xalê re tev rabûn ser xwe li çepikan xistin. Hestên wan yên kêfxweşiya bi van biriyaran gelek bilind bûbû. Li lênûsa xwe dinêrî, dixwest biryarên herî girîng ji wan re bêje:

-Ji bo jinê pîvanên red-qebûlê.

Hinekî sekinî, li çavên jinên li hemberî xwe, yên bixwestek

li benda gotinên wê nêrî. Dîsa dewam kir:

-Pîvanên YAJKê jî ev in: YAJK tê wateya girêdana bi welatparêziyê ve. Ango girêdana bi welat ve. Li hemberî tevayiya tiştên ne pak, amûrê bedewiyê ye. Amûrê heskirina rast e.

Hê gotina wê ya dawiyê neqediyayî careke din dengê çepikan bilind bû. Pişt re jî hev himbêz kirin û li hev piroz kirin. Şîlanê dengê xwe bilind kir:

-Hevalno hê min hedefên wê ji we re negotine.

Di nava çepikan de dîsa rûniştin.

-Hedefên YAJKê jî ev in:

-Derxistina hêza jinê ya birêxistinkirî.

-Di warê bedenî, ruhî û fikrî de pêşxistina bi perwerdeyê.

-Têkoşîna li hemberî paşverûtiyê û guhertina civakê.

-Kişandina mêr ber bi pîvanên jiyana azad ve.

-Pêşxistina zanista zayenda jinê û heskirinê.

Piştî xwendina danezana hatî navber hat dayîn. Çawa ku roj û dem hemû ketibin çerxeke nû, di rûyê wan de wisa xuya dikir. Bi vekirina derî re milîtanên xort li dora wan kom bûn. Hina di dilê xwe de digot, gelo dibe ku li dijî me biryarin girtibin. Lê nîqaşên li ser kongreyê dest pê kiribûn; ji hev re hem digotin, hem kom bi kom dimeşiyan. Dengê wan li dora dibistanê belav bûbû. Bihar û Şîlan li hewşê dimeşiyan. Bihar lê vegeriya:

-Ev xeyalê hevala Bêrîtan bû. Baweriya wê pir bi van rojan dihat.

-Rast e, xeyalên hemû hevalên me yên şehîd ev roj bûn. Dibêjin, taybetiyên mirovan yên bingehî di heftsaliya wan de diyar dibin, kesayeta wan, taybetiyên wan tev kêm-zêde di van

salan de xwe didin der. Wan tekoşîn ji bo van rojan kir.

Bê ku ferq bikin, Apo jî ket tenişta wan. Hem kêfxweş bûn, hem ketin kelecanê. Destê xwe hêdîka li milê Biharê da:

-Tu rêveberiya qada Şamê be, bila xortek jî alîkarê te be. Emê cara yekê hevaleke jin daynin ser vê qadê. Emê vî şêwazî pêş bixin. Her hefte tuyê bêyî cem min. Tu dizanî Winston Churchill yê Ingilîz ji bo Şamê çi gotiye, gotiye yê bixwaze fêrî siyasetê bibe bila biçe Şamê.

Deng ji her duyan jî derneket. Axaftina xwe domand:

-Ez timî dibêjim ev şoreş şoreşa jinê ye. Lê hûn dibêjin, serokê me çi xweş diaxive. Ez dîrokê vedibêjim, lê hûn ji min fêm nakin!

Şaxekî darê yê hişk bûyî jê vekir:

-Wê ev şoreş dirêj bibe. Dibe ku xort nemînin jî, lê wê jin bimînin. Dema ez dibêjim ev şoreşa jinê ye, wateya wê ya dîrokî heye. Jin durist in, welatparêz in û bi nirxan ve girêdayî ne. Ev tê wateya xwepêşxistin û pêşvebirina şoreşê.

-Tu çi dibêjî Bihar, ji bo karkirina bi hev re tu amade yî?

-Ez amade me serokê min.

Ji wir dûr ket, çû oda xwe. Di pencereyê re li coşa li ser rûyê milîtanên jin temaşe dikir. Kêfa wî ji kêfxweşiya wan re gelek hatibû. Di dilê xwe de got, Ji bo ku em mafê jinê, bihara wan vegerînin, çi pêwîst be emê bikin…

***

Çirûsk li Mêrga Mîran li cem komek qasid rûniştibû. Hem nîqaş dikirin, hem plansaziya derbaskirina şervanan dikirin. Piştî

civînê her kes çû ser karê xwe. Wî û Haşim navên yên biçin cem Apo amade kirin. Çirûsk di lênûsa xwe de navên wan girtin:

-Hûnê sibê derkevin, li gorî wê haya we ji we hebe û ji ti kesî re jî behsa çûna xwe nekin.

-Temam heval. Jixwe haya ti kesî ji me nîne. Weke şevşevokê em jî bi roj radizin bi şev şiyar in. Derbaskirina koman gelek zêde bûye.

Çirûsk dest avêt lênûsa xwe, dest bi nivîsê kir. Haşim di dilê xwe de got, rêbaza herî baş nivîs e, lê divê neyê girtin jî:

-Hevalê Çirûsk hûn çi dinivîsin?

-Ez timî bernameya xwe ya roja din amade dikim.

Haşim di dilê xwe de got, hevalê destpêkê ye, li cem Serokatiyê pir maye jê fêr bûye. Çirûsk li Saeta xwe nêrî:

-Saet diçe yazdehan, lê divê em biçin Til Cemanê hevalên ji cem Serokatiyê hatîn emê wan bibînin.

-Jixwe dema derketina me ye jî.

-Temam, xebat xweş.

Çirûsk derket, Haşim jî xwe amade kir ku komê derbas bike.

Serê sibê zû Ebû Ehmed xwe gihand Mêrga Mîran. Haşim vegeriyabû, cilên xwe yên bûyîn herî diguhertin. Ebû Ehmed xemgîn xuya dikir:

-Hevalê Çirûsk piştî ji vir çûyî hatiye girtin, em tiştekî jî jê nizanin.

Rengê Haşim jî guherî:

-Ev ne baş bû, divê em xwe bigihînin Serokatiyê.

Ew û koma ku wê biçe Şamê gihîştin hev, berê xwe dan Şamê.

Piştî nîvro bû. Apo li eywanê rûniştibû, car bi car li saeta xwe dinêrî: “Ev çima derneg man.” Di wê navê re dengê derî hat. Çirûsk ket hundir:

-Tu bi xêr hatî, hûn çawa hatin girtin?

-Serokê min, li herêma Dêrikê li ser riya Til Cemanê em girtin. Piştî lêpirsîna li Rimêlanê em anîn vir.

-Ya girîng tiştek bi we nehatiye, pirsa çi ji we kirin?

-Serokê min, pirsa avakerên PKKê, çek û jimara hêzên me dikirin. Hin wêne nîşanî me kirin. Yên dostan jî di nava wan de hebûn. Pirsa wan ji me kirin. Ji min re gotin, tu Elewî yî, min got erê ez Kurdê Elewî me. Yê dipirsî ew bixwe jî Elewî bû. Pirsa cihê we ji me kirin. Gotin serokê me Hafiz Esed alîkariya we dike, yan na, min got na, em alîkariyê ji gelê xwe digirin.

Dixwest bizane ka ji bo çi ew pirs kirine:

-Pirsên wan xerîb in. Gelo dixwazin peyamê bidin me? Welatparêzên we rêkirîn hê me nedîtine, em li benda berdana we bûn. Tu dikarî biçî cem hevalên dibistanê, mereq dikin.

Çirûsk bilez derket berê xwe da dibistanê. Dengê telefonê hat. Destiyê wê rakir. Li aliyê din Kemal jî rakiribû. Telefon danî, çû milê din:

-Kemal, ew kî bû?

-Serokê min nizanim, deng tinebû.

Keniya. Careke din dengê telefonê hat. Telefon rakir, yê li aliyê din nas kir. Piştî telefonê çû eywanê. Hê rûneniştî, Dayê Nûfa, dayîka Haşim û çend kesên din ketin hundir. Ber bi wan ve çû bixêrhatin da wan. Yek bi yek Apo himbêz kirin, pişt re li eywanê rûnştin. Ew jî li hemberî wan rûnişt, pirsa wan kir:

-Dayîka Haşim, tu çawa yî, rewşa malbatê çawa ye?

-Serokê min, mala min cihê hevalê Egîd e. Zarokê min jî baş in.

-Ji pazdehê Tebaxê ve me hev nedîtiye?

-Serokê min, wê demê ji nehê êvarê heta duduyê şevê tu ji me re axivî. Te her tiştê xwe daye şoreşê. Ez dixwazim kurê xwe yê din jî bidim te. Ev jî xelata min ya nû ye.

Çawa ku hestiyar bûbe, rengekî wisa li ser rûyê wî xuya kir:

-Dayê, te berê jî zarokekî xwe daye. Min pir dixwest te bibînim lê rewş ne baş bû. Serê malê yek tevlî bibe bes e.

-Ez tişta herî binirx layîqî te dibînim, ew jî zarokên min in.

-Min heta niha nedîtiye kesek zaroka xwe bi destê xwe bide şoreşê. Ev di nava şoreşa me de çêbûye. Eger her dayîk weke te bûya, niha Kurdistan ji zû ve rizgar bûbû.

Gazî Kemal kir. Siwar û Kemal bi hev re hatin:

-Yadê û Dayê Nûfa bibin Ruknedîn bila ji gel re civînan çêkin. Bila bibin Mînak.

Dayê Nûfa pir kêfxweş bûbû:

-Serokê min, me dixwest îsal berî Newrozê bên, lê nebû nesîb.

Jina li kêleka Dayê Nûfa bala wî kişand:

-Tu diya Delîlî ne? Herî dawî me li akademiyê hev dîtibû. Hevala Bêrîvan (Binefş Agal) tu şandibûyî.

-Serokê min, hevaleke xweşik, jêhatî û siyasî bû. Ez bi wê bi dijmin û koletiyê hesiyam. Li herêma me pir tê heskirin. Min ji we re raporek şandibû. Ez dixwazim perwerdeyekê bibînim.

-Min rapora te xwend, te gotiye ji nan û avê pirtir pêwîstiya me bi perwredeyê heye. Temam em qebûl dikin. Çend rojan li

vir be. Emê dersa dîroka jinê bidin. Min soz daye jinan, heta dawiya jiyana xwe ezê ji bo azadiya wan bixebitim. Emê li ser mêrtiya mêr jî rawestin.

Bi gotina xwe re serê xwe hejand:

-Ev mêrtiya Kurd ya bûyî belaya serê me jî, di rûyê jintiya we ya kole de ye. Hûn jintiyeke ewqas bêhêz, teslîmbûyî, bêçare, lewaz, bibertek û fetisî pêşkêşî wan dikin. Ev bi serê xwe têra tinekirina wî dike. Jina kesayeta wê tineyî ji bo min ti wateya wê nîne.

Hinekî li jinên li hemberî xwe nêrî:

-Em dikarin bêjin Kurdistana azad û jina azad weke goşt û hestî bi hev ve girêdayî ne. Divê em ji bîr nekin ku, pirsa “Divê em çawa bijîn?” ji bo me pirsgirêkeke jiyanî ye. Min ji destpêka dîroka partiyê ve xwest wateyekê bidim mijara jinê.

Piştî qasekî ji cem wan rabû li odeya din bi hin mêvanên din re rûnişt. Mêvan qasid bûn, karê wan ne yê lezê bû. Piştî ku silav da wan careke din vegeriya cem dayîkan. Suhbeta bi wan re neqedandibû. Piştî axaftina du saetan, xwest guhdarî wan bike:

-Min gotinên xwe qedandin, niha dixwazim guhdarî we bikim. Fedî nekin, ez kurê we me.

Yekî navserê xwe devê xwe bir ber guhê Siwar:

-Weleh ev serok ne weke me ye, ne mirovekî normal e.

Pistepista wan bala Apo kişand:

-Çi pirsên te hene?

Ji şerma dengê xwe nekir, Siwar bersiv da:

-Serokê min dibêje Serokatî ne weke me ye.

Keniya, mêvan jî pê re keniyan.

-Ez cin im! Ez jî weke we me, lê min xwend, dîroka xwe nas kir û mejiyê xwe bi kar anî. Ez erkê xwe yê dîrokî pêk tînim.

Ber bi aliyê jinan ve nêrî:

-Berî we bi rojekê, çend dayîk hatibûn vir. Wan jî dixwest perwerdeyekê bibînin. Me jî pêşniyara wan qebûl kir.

Kêfa jinên rûniştî gelek hatibû.

Suhbet qediyabû, êdî dema şîvê bû. Tev bi hev re rabûn, sifreya xwarinê li hewşê hatibû danîn. Piştî xwarinê rahişt sêniya xwe bir li metbexê şûşt. Yên din jî weke wî kirin.

Li ber zarokekî şeş salî sekinî maç kir:

-Navê te çi ye?

Zarok bi awayekî leşkerî sekinî:

-Navê min Hogir e.

-Te xwe kiriye leşker, tu min nas dikî?

-Erê tu Apo yî. Ez jî Apocî me!

-Wê demê ka em careke din hev maç bikin.

Destê wî girt berê xwe da mêvanan:

-Ez ji bo van zarokan dixebitim. Ev mala zarokên Kurdistanê ye.

Piştî ku hinekî pê re şa bû, gazî Siwar kir:

-Riya mêvanan dûr e, hin fêkî amade bikin da bi xwe re bibin. Mêvan jî bila tev rabin, emê wêneyên xwe bikişînin.

Piştî kişandina wêneyan derbasî cem qasidan bû; Haşim, Ebû Ehmed û Qadir bûn.

-Haşim rewş çawa ye?

Haşim xwest rabe ser xwe biaxive.

-Rûne heval, bêje çi heye?

-Serokê min, em civînên xwe yên qasidan çêdikin.

Rêveberiya giştî jî tevlî dibe. Dema rewşeke cuda hebe, em xeberê didin hevalê Çirûsk. Weke we gotî em keşfa sînor dikin. Piştî wê em hevalan derbas dikin.

-Baş e, lê ji bo kemînan gelek şiyar bin. Weke din çi heye?

-Serokê min, tişteke din nîne.

-Ha, Ebû Ehmed tu çawa yî?

Wisa fêm kir ku pirsa nasîna wî ya partiyê dike:

-Serokê min, dema derbeya 1980î ez çûm Tirkiyê. Wê demê min partî nas kir.

-Te bi xwe dît, dijmin çawa weke hovan êrîş dikir. Av radize, lê dijmin ranaze. Êê, ji wê demê ve tu me nas dikî ne?

-Serokê min, ji min re behsa we kirin, min wê demê got, ev tevgereke nû ye. Berê min pir tevgerên din jî nas dikirin, lê şêwazê we cuda bû. Sala 1990î ez hatim akademiyê. Newroz bû. Me hevalê Agir, Bager û Çirûsk jî dîtin. Ez dixwazim derbasî qadên çiya bibim. (Bager û Çirusk heta 94'an li Almanya girtî ne. Çawa sala 90'î wan dîtiye)

Keniya:

-Êê, ez jî dixwazim derbasî welat bibim, hûn li Kurdistanê ne, ez li xerîbiyê me. Temenê te çiqas e?

-Serokê min, ez sala 1940î hatime dinê.

-Ebû Ehmed, li welat xeter heye, şer gur dibe. Karê hûn li vir dikin gelek girîng e. Hûn bi hezaran hevalan derbasî welat dikin, ev jî kar e. Hevalê Haşim ji sala 1990î ve, vî karî dike, salên jidayîkbûna wî 1968 e. Tecrûbeya te ya jiyanê jê pirtir e. Bi hev re alîkar bin. Ez van hevalan amade dikim, didim we da hûn wan saxlem derbasî çiya bikin. Niha karê xwe bidomîne.

-Serokê min, tu çi bêjî wê weke te be.

-Ha, Qadir kerem bike, li Efrînê rewş çawa ye?

-Serokê min, heta ji me tê em seyareyan bi kar naynin. Em koman ji Helebê heta Efrînê di aliyê çiyayê Leylûn re bi meşê dibin.

-Kurzêlê li biniya çiyê ye, ne?

-Rast e serokê min, welatparêz in.

-Her malekê hûn çiqas heval dibin cem wan?

-Serokê min, pazdeh kes jî dikarin li malekê bimînin. Hevalên li Reco û Bilbilê jî me hemû derbas kirin. Em pirî caran hevalan di riya hesin re jî dibin.

-Ya girîng heval bigihin Pazarcikê.

-Rast e serokê min, em ji hevalan re dibêjin dema hûn ji hev qut bûn xwe bigihînin welatparêzên wir wê we bigihînin hevalan. Jixwe hema bigihin Çiyayê Gewr bes e. Riya wî hinekî nexweş e, lê saxlem e.

-Berfê Çiyayê Gewr pir girtiye?

-Rast e, timî li serê wî berf dimîne. Ji aliyê me ve weke dîwarekî mezin xuya dike.

Serê xwe hejand:

-Daristanên wir pir gurr in, mirov dikare bi salan li wir bimîne. Berê jî me ji we re gotibû, bila heval bi giranî biçin Engîzekê. We civîna xwe bi qasidên Çiyayê Gewr re çêkir? Civînên xwe bi hev re çêkin. Hevalan li ser sînor nehêlin. Wan zû derbas bikin.

Qadir hinekî sekinî:

-Serokê min, me aliyê avê hemû kontrol kir, em heta ber Ava Reş çûn. Lê niha rê nade. Ji ber wê ev demek e me civînên xwe çênekirine.

-Berê, min ji bo koma Terzî ev gotibû, çima ewqas li wir man derbas nebûn. Dema rewş dest nede, divê hûn ti kesî derbas nekin. Ji Şamê bi tirênê biçin. Berî niha di aliyê Babê re hûn bi seyareyê çûbûn. Me ew heval jî rexne kirin. Deşta wir dirêj e, jê re gelek meş pêwîst e. Ev demek e tu bi xwe jî hatibûyî girtin. Têkiliya we bi hevalên me yên di zindanên vir de heye?

-Serokê min, serdan qedexe ye. Lê me riyek dîtiye. Hin malbatên Berazî li Hemayê ne, me bi riya wan name û pere rêkirin, gihîştine wan.

-Ji bo xwegihandina wan, çi pêwîst be, bikin. Bila têkilî qut nebin.

-Serokê min, pêşniyara min jî ez derbasî qadên şer bibim.

-Dema koma Guneybatê amade bû, tu dikarî bi wan re derbas bibî.

Pehniya Qadir ji kêfa nedigihat erdê.

-Ebû Ehmed, Dêrik mifteya Botan û Behdînan e.

-Serokê min, ez dixwazim helbestekê ji we re bêjim:

-Kerem bike bêje.

-Dêrik ji te re keleh û çeper e. Xwedê tu anî ji me re rêber e. Dengê te li dinyayê da seranser e. Gelê me bang dike, bixwîn bi can her daîm bi te re. Ax ji derdê rûreş û xwelîsera. Derdê xayîn û ketxwera. Her tiştê xwe difiroşin bi pera. Xwe dikin kole ji dijminê xwe re.

Apo û yên din li çepikan xistin. Berê xwe vegerand ser Haşim:

-Tu xortekî durist î, divê haya te pir ji te hebe. Ji vî karî re şiyarî pêwîst e. Hevalan biparêzin û di serî de xwe. Xortên weke te ji bo me pêwîst in. Ev şoreş li ser milê kesên durist dimeşe.

Bê hesab tevlî dibin, lê xwe naparêzin. Tu ji Pilêsiyî yî, sînor baş nas dikî. Bi Çemê Dîcle re bûyî yek. Xwestek û pêşniyarên te hene?

Haşim di dilê xwe de got, berî ku mirov bêje tu dibêjî, berî ku mirov bifikire tu difikirî:

-Serokê min, tiştekî ku mirov bixwaze nîne. Hûn her tiştî dibêjin. Derfet hebin em çend hevalên qasid bên perwerdeyê wê baş be.

-Temam, vê carê biçe, cara bê were demekê li vir bimîne. Çend kesên pêwîstiya wan bi perwerdeyê heyî jî bi xwe re bîne.

***

Kemal û Xortekî kinê zeîf, rûgewr û devilken li qada dibistanê bûn. Çavên wî li ser tevgerên milîtanan bûn, ew bi kû ve diçûn, weke gulberojkê çavên wî jî bi wir ve diçûn. Vê rewşa wî bala Kemal kişand, di dilê xwe de gerand ku bêje, hingî tu li dora xwe dizîvirî ez gêj bûm, lê ji ber ku dizanî demeke dirêj e milîtan nedîtine, ji kêfa li wan dinêre. Xortê devliken jî di dilê xwe de got, berê me digot Abdulah abê, lê niha her kes dibêje serokê min. Berê xwe da Kemal:

-Emê kengê Serokatiyê bibînin?

-Serokatî li vir e, emê çend kêliyên din bibînin.

Xortê devliken, serê xwe hejand, kêfa wî pir dihat:

-Temam, lê ez pir bikelecan im.

Kêfa Kemal ji uslûbê wî re dihat:

-Navê te Amed e, ne?

-Belê, bawer dikim yê te jî Kemal e.

Berê xwe ber bi milîtanan ve vegerand:

-Heylo, dibistana me çi mezin e! Milîtan pir bûne. Ev sîstema biserûber Serokatiyê daniye. Ev artêş e heval, çiqas hevalên jin tevlî bûne! Keda me beyhode neçûye. Hevalê Kemal, ez bimirim jî êdî ne xema min e!

Kemal bi baldarî lê dinêrî:

-Rast e, lê gotina mirinê nebêje.

Amed li aliyekî jî guhdarî suhbeta milîtanan dikir:

-Serokatiyê xebat pir pêş xistiye!

Erkdar gazî Kemal kir. Piştî çend kêliyan gazî Amed kir, ber bi hewşa Apo û mêvan lê ve çûn:

-Hevalê Amed, lezê bike Serokatiyê civîn qedandiye gazî me dike.

Apo bi mêvanan re wêne dikişandin. Bi dîtina Apo re rojên herî dawiyê dîtî hatin bîrê. Çavên Apo ketin ser. Bi kêfxweşî gazî kirê:

-Tu bi xêr hatî!

Amed ber ve çû û hev himbêz kirin. Çend deqîqeyan wisa li hemberî hev sekinîn. Destê xwe danî ser milê wî, berê xwe da mêvanan:

-Ev hevalê min yê destpêkê ye. Şazdeh sal in li girtîgehê bû. Nû hatiye berdan. Binêrin ez tenê nehiştime, hatiye alîkariya min. Sê meh in ji girtîgehê hatiye berdan. Di van sê mehan de xwe gihand min. Neçûye cem malbata xwe, hatiye vir.

Piştî vê gotinê keniya, careke din himbêz kir, destê wî girt ber bi mase ve bir. Li cem xwe da rûniştandin:

-Êê Amed, herî dawî me li kû hev dîtibû?

Rojên ji hev veqetiyayîn, kêlî bi kêlî li bîra Amed bûn:

-Li Siwêregê bû Serokê min. Em bi hev re ji civînê derketin, emê biçûna cihekî din. Em bi hev re di rê de dimeşiyan. Ew hevdîtina me bû ya dawiyê.

Wî jî ew roj anîn ber çavên xwe:

-Ha, ha, me wê demê biryara şerê Siwêregê girtibû. Ev dewleta Tirkan her tiştî diavêje ser min. Dibêje te dest bi şer kiriye! Amed ka bêje, ma min rojekê ji rojan ji we re fermanek şandiye, min gotiye filan tiştî bikin.

Amed berê xwe da mêvanan:

-Na seorkê min, te ti ferman nedane.

-Hûn dikin, lê her tiştî dixin stûyê min.

-Serokê min, em şoreşger bûn, diviya em li dijî xiyanetê têbikoşin.

Destê xwe danî ser milê wî, berê xwe da mêvanan:

-Ev ciwan bûn, şoreşger bûn. Insiyatîfa wan hebû. Kurd bûn, li hemberî zilmê serî hildan. Dewlet min sûcdar dike.

Kêfa mêvanan jî ji suhbatê re pir hatibû. Hinekî sekinî baş lê nêrî:

-Li vir perwerdeya partiyê heye, divê tu jî xwe pêş bixî. Hevalên di zindanan de demeke dirêj ji partiyê qut dibin.

Her ku milîtanên li zindanê dihatin, Kemal diket bîra wî:

-Divê hûn xwe jî partiyê jî pêş bixin. We berxwedaneke mezin kiriye, mezinbûn layîqî we ye.  Ez jî dixwazim bibim Apociyekî baş, ez jî wisa xwe pêş dixim.

Berê xwe da milîtanan, pişt re li mêvanan nêrî:

-We hemûyan Esat Oktay bihîstiye, yê işkence li hevalên me dikir. Rûyê dewleta Tirik yê xuyayî bû. Lê ji destê me xelas nebû. Hevalê Kemal Pîr jî gotibû, ew biçe asîmanan jî wê bê

kuştin.

Piştî çûna mêvanan suhbeta xwe domandin. Amed dîmenê Gulana 1977an yê Apo di sefera Kurdistanê de li Dîlokê civîn çêkirî, anî ber çavên xwe.

Ew jî bi dîtina wî pir kêfxweş bûbû:

-Amed, ew civîna 1977'an tê bîra te? Piştî wê jî li Rihayê li mala welatparêzekî me hev dît.

Amed mabû şaş, kêliya li ser dihizirî, Apo jê dipirsî:

-Rast e serokê min. Wê demê xwîşka wî nû çêbûbû, diya wî ji me re got, navekê lê bikin.

Keniya, serê xwe hejand:

-Erê, lê me jî navekî xweş jê re peyda nekir. Piştî du mehan ez careke din vegeriyam wê malê. Min pirsa navê wê kir. Gotin Melsa ye. Min pirsa wateya wê kir, we got, ji sernavê, Marks, Engels, Lenîn, Stalîn û Apo hatiye girtin. Min ji xwe re got çawa ev nav ditine û xuliqandine.

-Serokê min, dîmenê hejandina we ya landika wê, li ber çavên min mabû. Li zindanê timî di hişê min de bû.

Careke din zindan hatibû bîra wî. Ji ber wê rengê wî hinekî guherî. Lê lê nêrî:

-Tu sala 1979an li Hilwanê hatî girtin, emê jî derbasî vî milî bibûna.

Ew dem bûbû weke ewrekî reş, ji ser serê wî nediçû...

***

Apo li pirtûkxaneya xwe li pişt mase rûniştibû, prespetîka konferansa 4. dinivîsî. Destekî xwe di nava pora xwe re dibir

dianî, bi destê din pênûs girtibû, li ser rûpela spî diçû dihat. Serê xwe bilind kir, di dilê xwe de got, divê ev pirsgirêk çareser bibin. Li saeta xwe nêrî, heştê sibê bû. Pênûs danî ser lênûsê, rabû ser xwe ber bi eywanê ve çû. Agir li wir rûniştibû. Komek rapor li ber bûn. Bi xetên xweşik, weke endzyarekî not digirtin. Bi bihîstina dengê derî re, lênûsa xwe danî ser mase rabû ser xwe. Pênûsa xwe kir berîka gumlekê xwe. Ji dengê piyan dizanî ku Apo ye. Çavên wî bi raporên li ser mase ketin. Li kêleka Agir sekinî:

-Hazirî çawa diçin? We encamên konferasên qadan xwendin?

-Rast e serokê min. Rapor bi dawî bûn. Encamên xebatê jî me hemû derxistin. Em pirsgirêkên li qadan tesbît dikin. Me ji hevalên li nava xebata gel re jî gotiye amede bin. Hazirî hemû temam in. Niha dersa rastiya têkoşîna Serokatiyê heye.

-Em hinekî bisekinin, wê hin heval werin.

Li ser kursiyên li hemeberî hev rûniştin. Yên li malê jî tev li dora wan kom bûn. Yek bi yek li tevan nêrî:

-Tu behsa dersa têkoşîna Serokatiyê dikî, lê yên me dibêjin, emê bimirin, emê xwe bikujin. Min wate neda vî şerî. Şerê desthilatdariyê ye, yê çi ye? Heyf e, çima hûn hişê xwe nadin ser tiştên bedew? Agir tu çi dibêjî? Tu xwediyê tecrûbeya salan î.

-Serokê min, ez ji vê re nabêjim şerê desthilatdariyê. Li gorî min şerê di navbera desthilatdarbûn û destilatdarnebûnê de ye.

-Heta du dibêjî şerê desthilatdarnebûnê ye?

-Rast e serokê min.

-Aliyekî wê jî te bi ser ve kir.

-Serokê min, tişta derdikeve ev e; dibêjin emê çawa

nikaribin bibin desthilatdar, yan jî emê çawa derfetên desthilatdariyê yên derketîn ji hev belav bikin.

Apo serê xwe hejand:

-Xaleke din ya li min xerîb tê, hêzên derveyî me dest bi fêmkirinê kirine, yên di nava me de xwe nêzîkî fêmkirinê nakin.

-Jixwe nakokiya me jî di vê xalê de derdikeve meydanê. Dost û dijmin dixwazin Rêbertiyê fêm bikin, yên dibêjin em bi Rêbertiyê ve girêdayî ne, em di emrê wî de ne, fêmkirin li aliyekî, hewl didin xebata Rêbertiyê bêbandor bikin.

Dengê derî hat. Şîlan û Biharê silav dan ketin eywanê. Li kêleka Agir sekînin.

Apo li wêneyê Mezlum yê bi singa eywanê ve daleqandî dinêrî, guhên wî jî li ser  dengê kewa li hewşê bûn. Çavên xwe li ser wêneyê Heqî rawestandin. Çavê Şîlanê li ser pora wî bû, dixwest bizane ka ji dema Akademiya Mahsum Korkmaz ve çi guherîn pê re çêbûye. Pora wî ji aliyê pêş ve sivik bûbû. Spîbûna ceynikên wî ya ber bi jor ve ket ber çavên wê. Apo hinekî li wan temaşe kir:

-Em ber bi meha Gulanê ve diçin. Meha şehîdan û cejna karkeran e. Navê me jî Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Dengê li cîhanê vedayî, li ser Sosyalîzmê ye. Di jiyana partiya me de, ev, rojên xweisbatkirinê ne. Avabûn û şerê vê partiyê ji bo insanê Kurd cejin e.

Çawa ku bi wan re biaxive, berê xwe da rêza wêneyên şehîdan:

-Şehîd xwediyên PKK'ê ne. Ji qadên şer û zindanê insanên mezin derketin. Ew mezinbûn, ya partiyê ye. Min jî xwe ji nû ve afirand. Divê mirov xwe ji gemara hezarê salan, ji zarokatiya ti

xêr tê de tineyî û ji kesayeta nikare tiştekî bike rizgar bike. Divê hûn jî xwe jê rizgar bikin. Zû bifikirin û biryarê bidin. Me xwe ji tinebûnê afirand. Hûn xwendevan in, ji bo pêşengiyê xwe amede bikin.

Berê xwe da Agir:

-Emê niha bi hev re biçin dibistanê, wê kom biçin welat. Weke din tiştek heye?

-Na serokê min, heval li dibistana din jî li ser raporan nîqaş dikin.

Tev bi hev re derketin li seyareyê siwar bûn. Kûr kûr dihizirî, di dilê xwe de got, divê milîtan bixwe li ser pirsgirêkên heyî rawestin û çareser bikin. Divê ev konferans tiştên kêm mayîn temam bike. Di şer û jiyanê de divê gavên nû bên avêtin.

Nêzî dibistanê bûn. Pencereya seyareyê vekiribû, zeviya genim ya li kêleka dibistanê temaşe dikir. Li kulîlkên xerdelê yên zerê zêrîn temaşe kir. Ji keviya rê bêhna hendekoya di nava nefelê de û kulîlkên din dihatiyê. Xecxecoka li teniştên rê sor dikir. Xweziya xwe bi meşa di nava wan re anî. Bêhneke kûr ji kulîlkên derdorê kişand hundirê xwe. Dengê çivîkan weke senfoniyekê ji xwezayê bilind dibû. Berê xwe vegerand ser Agir:

-Hûn dibînin ev xweza çiqas xweş e, lê nikarim bi dilê xwe lê bigerim. Ji bo min qedexe ye.

Yên di seyareyê de tev bi gotina wî xemgîn bûbûn. Seyare gihîşt ber deriyê dibistanê. Bi vekirina derî re, peya bûn, bilez ketin hewşê. Yekser berê xwe da cihê kevokan. Sîpan di nava wan de bû. Ji tevgera nobedaran fêm kiribû ku wê Apo bê. Çawa dît, ber ve çû, silav da. Apo rahişt sêniya zadik di nava kevokan de sekinî. Çar kevokan danî ser destê wî. Mase û kursiyek li

pêşiya cihê wan li binê dara mêwê hatibûn danîn. Çû li ser kursî rûnişt. Kevok hin di hêlînên xwe de bûn, hin li derdora wî diçêriyan. Çavên wî li ser wan rawestiyabûn. Ji aramiya wî kevok bêtirs li derdor diçûn dihatin. Piştî ku qasekî li wan temaşe kir, berê xwe da hêlînên wan. Kevokeke spî girt danî ser kefa destê xwe. Li bedewî û xalên diketin gerdena wê nêrî. Di dilê xwe de got, bi qasî bedewiya te aştî û jiyan xweş e. Kevok bilind kir bir ber rûyê xwe. Li aliyekî jî şeqeşeqa kamerayan bû wêne dihatin kişandin. Piştî qasekî kevok firand, berê xwe da dibistanê. Bi ketina hundir re milîtan hemû rabûn ser piyan:

-Kerem bikin rûnin.

Çend kêliyan li pişt mase çû hat:

Piştî axaftina saetekê li ser kesayetê, ji bo sozdayînê çar xort û çar jin derketin pêş. Ji wan xwest xwe bidin naskirin. Bi baldarî guhdarî kurtejiyana wan kir:

-We çiqas ji perwerdeyê fêm kir? Hûn ji bo çûna welat amade ne? We Serokatî nas kir, hûn ji bo me çi dibêjin? Gelek ji we dibêjin, şeş-heft salan me li Botan, Dêrsim, Serhed û Mêrdînê gerîlatî kiriye. Divê her yek ji we bibe generalek. Xwe nexapînin, lez nekin û xwe biparêzin! Ya herî girîng divê hûn zûbizû şehîd nekevin.

Destên tevan yên çepê li ser al, pirtûk û çekê li ser mase bûn, destê din jî li ser dilê wan bû. Ew jî bi qasî wan bikelecan bû. Çawa ku wê ew jî bi wan re biçe welat, di nava wan de li alê dinêrî. Deng bilind bû: “Heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê, ezê bi partiyê re bimînim, li ser vî bingehî, di serî de ji Serokatiya partiyê, partiyê, şehîdên şoreşê, berxwedêrên zindan û çiyayan, gelê Kurdistanê û hevalên hazir re, soz didim, soz didim, soz

didim.”

Her kes rabû ser piyan li çepikan xistin. Dengê wî jî bi yê wan re bilind dibû, “Serkeftin, serkeftin!”

Piştî sozdayînê li qadê govend hat gerandin, ew jî derket qata duduyan, bi Agir re di pencereyê re li şahiyê temaşe kirin. Kevokên ser dibistanê re difiriyan li ber çavên wî ketin. Dîlok jî li ser kevokê bû: “Delal kevokek belek e, serê çengê wê xelek e, delal kevokek heşîn e, serê çengê wê nexşîn e, delal kevok sor e, serê çengê wê bimor e...” Hina digot, hina li wan vedigerand. Apo berken bû:

-Wê rojekê govenda azadiyê li Kurdistanê bê gerandin.

Digel ku ti carî Agir nediket govenêd, lê kêfa wî ji dîmenê govendê re hatibû:

-Serokê min, ew roj nêzîk e.

Piştî govendê ew jî çûn eywanê. Apo lê vegeriya:

-Karên xwe yên vir biqedînin, em bi hev re biçin dibistana din.

-Temam serokê min. Emê ji bo derbaskirina hevalan plansaziyê çêkin.

Piştî derketina Agir, Sîpan ket hundir. Apo gazî kirê:

-Rûne, rewşa te çawa ye?

-Baş im, serokê min.

Di wê navê re dengê telefonê hat. Apo dengê wê vekir:

-Mezlum çi heye, çi nîne? Rewşa hevalên li Cizîrê çawa ye? Îsal dexil çawa ye? Wê alîkarî baş be?

-Serokê min, heval hemû jî baş in. Dexil jî gelek baş e. Hevalên hatîn me tev derbasî welat kirin. Birîndar jî me rêkirin cem we. Gel dixwaze we bibîne. Hin Suriyaniyên Midyadê

hatine cem me. Digotin, em ji bo alîkariyê amade ne, lê em ditirsin dewlet êrîşî gundên me bike.

Fermana Ermeniyan hat bîra wî:

-Ji berpirsiyarê Mêrdînê re bêje, bila biçin gundên Kurdan. Bila gundên Suriyaniyan biparêzin. Weke din çi heye?

-Serokê min, wê hin malbat ji vir biçin zindanên Tirkiyê cem zarokên xwe. Gotineke we ji bo wan heye?

-Zindan jî çeperên me yên têkoşînê ne, bila rêbaza Mezlum û Xeyriyan bişopînin.

Bi mendîla kaxiz xwêdana li ser eniya xwe paqi kir. Di wê navê re Agir dîsa ket hundir, Amed jî li pey bû. Hinekî axivîn. Pişt re berê xwe da tevan:

-Dora me hatiye tengkirin. Ka çawa em ji Lubnanê derxistin, dixwazin me ji vir jî derxin. Ji ber ku dizanin, ev der biryargeh e û ez li vir gerîla hazir dikim rêdikim, êrîşî min dikin. Dixwazin perwerdeya me ya li vir jî bisekinînin.

Li Agir nêrî:

-Tu biçe dibistana din, piştî sporê emê jî werin.

Piştî çûna wî ji Amed tekmîla Bakur girt. Pişt re pala xwe da kursî:

-Amed, ka wê tv veke!

Li derdora xwe nêrî, kir nekir nizaniya veke.

-Tu nizanî vekî, ma li zindanê tinebû?

-Hebû serokê min, lê berpirsiyar vedike û digire.

Keniya, hinekî lê nêrî:

-Haylo! Ev 16  sal in, hê tu nizanî tv vekî!?

Ew jî bi xwe keniya. Apo tv vekir, li kanalan geriya. Herî dawiyê li ser lîstika tenîsê hişt. Li saeta xwe nêrî:

-Sîpan, dema sporê ye. Em derkevin bi topê bilîzin.

Kêfa Sîpan ji topê re pir dihat, rûyê wî geş bû.

-Tu û Amed taxima xwe derxin.

Her du bilez derketin, wî jî cilên xwe yên sporê li xwe kirin daket qadê. Taxim hatibûn amadekirin. Lîstikê dest pê kir. Sîpan hewl dida topa di nava piyên wî de derxe. Çenda hin bi wê helwesta wî nerehet dibûn, lê Apo li gorî qanûnên topê dilîst. Encam ne bi dilê wî bû. Li saeta xwe nêrî, çend deqîqe mabûn. Berê xwe da Amed:

-Kî golê biavêje, dibe deh aliyê din sifir e.

Amed dizaniya ku binkeftinê qebûl nake:

-Temam serokê min, em dewam bikin.

Taxima Amed golek avêt. Taxima wî bin ketibû. Careke din li saeta xwe nêrî:

-Vê carê jî kî golê biavêje, pêncî sifir e.

Kêfa taxima din xweş bû, li dora Amed kom bûn. Amed ji nava wan derket:

-Serokê min ez dibêjim bes e, jixwe em deh in û hûn sifir in.

Apo bi qemçika wî girt:

-Çawa hûn nalîzin, kî golê biavêje ew pêncî yê din sifr e.

Kêfa Amed ji wê tevgera wî re pir hatibû. Rojên berê dihatin bîra wî:

-Temam serokê min, em bilîzin.

Piştî çend kêliyan top avêt qeleyê. Dengê çepikan bilind bû. Keniya û bi bazdan ji wir dûr ket. Ew tevger jî li xweşê her kesî hatibû. Sîpan li Amed nêrî:

-Te Serokatî dît, çawa gol avêt û çû?

-Mixabin hevalê Sîpan, em sifir in.

Dengê erkdarê rojê bilind bû:

-Hevalno, bila her qawîş tekmîla xwe bigire.

Piştî tekmîlê Sîpan xwe dabû aliyekî, rûyê wî ne xweş bû. Bê ku haya wî jê  hebe, Siwar li tenişta wî sekinîbû, lê temaşe dikir:

-Çi bûye hevalê Sîpan? Weke diya min gotî, barê giran ketiye ser milan?

-Ji ber ku min xwestiye topê ji Serok bistînim hevalan ez rexne kirim.

-Te çi bersiv da wan?

-Hemû fermandar in, ma ez bi wan dikarim. Min weke şervanekî jî nabînin. Gotin divê careke din tu wisa nekî. Halbiku kêfa Serok ji wê tevgera min re dihat.

Dengê wî weke yê belengazan derketibû.

Siwar li lêvên wî yên xwar temaşe kir:

-Teng nefikire. Te ji her kesî pirtir Serokatî dîtiye. Timî ji ciwanan re dibêje, zaroktiya xwe wenda nekin. Ji zarokatiya we pir hes dike. Dema rexne hatin, tuyê li ser bifikirî; eger rast bin li ser bisekine, eger ne rast bin bi nîqaşê derbas bike.

Sîpan jî ji ser ya xwe nedihat xwarê:

-Serok got min, taxima te amade ye, min jî bi dengê bilind got rast e...

***

Serê sibê bû, li dibistanê her kesî cihê xwe girtibû, li benda komisyona dersê bûn. Lê nizaniyan ka wê kî dersê bide. Apo û Agir li hewşa dibistanê diçûn dihatin. Apo lê vegeriya:

-Berî çend rojan nivîsek li ber çavê min ket. Nivîskarekî me dibêje, PKK împeretoriya derfetan e, kesê bixwaze dikare heta bixwaze bixwe, naqede.

-Min jî xwend serokê min. Jixwe ji ber ku baweriya me bi vê tê, em wisa didin naskirin. Her kes PKKê wisa nas dike û her kes dixwaze jê bixwe.

Apo serê xwe hejand:

-Ma dewleteke weke Yekîtiya Sovyetan çawa roxiya? Împeretorî tev, heta Roma jî wisa ji hev ketin. Ya me ne împeretorî ye jî, tiştekе weke şatoya ji kaxizan e. Serê te jî spî bûye, diyar e ku tu jî zorê dikişînî, em çi bikin?

Dema Apo pirs dikir, Agir li ser pirsan pir difikirî û dixwest bizane ka bersiveke çawa bide:

-Piştî ku devjêberdan nabe, divê em rêbazê biguherînin.

-Ciwan xwe nagirin tên, lê tu dibînî, her roj dikevin.

-Kesê were şer neçar e li ber xwe bide.

-Lê zû dimirin.

-Mirina hêsan ji ber vê ye serokê min. Em ji bo şer tên, lê divê em destpêkê şer di hundirê xwe de qezenc bikin.

Hêrsa wî di rûyê wî de xuya dikir:

-Qet naxwazin fêm bikin û bihizirin.

Agir jî rewşa milîtanan û tiştên di pratîkê de dîtîn dianîn ber çavên xwe:

-Dibêje, hatim gihatim Partiyê, her tiştê min temam e, xwediyê her tiştî me. Dixwaze wisa bibe otorîte, wisa bibe xwediyê nirxan.

-Rast e, dixwaze li encama wan xwedî derkeve. Encam çi ne, otorîte ye, rûmet e, qîmet e, xwesepandin e, fermandariya

erzan e. Eger hûn bêjin çov lazim e, ew jî rêbazek e, lê ne rêbaza me ye. Çov ji bo artêşa koleyan dibe.

-Hinekî xwesteka me ew e. Rêbazeke ku Rêbertî jî naxwaze, rêbezeke tersê hişmendiya wî ye. Ji ber wê dijmin her tim gazî dike, dibêje, ma di PKKê de ji Apo pêve ti kes nîne.

Li saeta xwe nêrî. Berê xwe dan dibistanê.

Piştî çend kêliyan dengê “Şiyar bin” bilind bû.” Bi hev re ketin hundir. Ew derbasî pişta meseyê dersê bû, Agir jî çû li rêza pêşî rûnişt.

Berê xwe da nava dibistanê:

-Agir, em îro li ser çi biaxivin.

Agir rabû ser xwe:

-Serokê min, di plansziya komisyonê de dersa kesayetê hebû.

-Temam, wê demê em dest pê bikin. Ev kesayeta evqas bi kêmayî wê çawa şer bike? Divê hûn ji xwe bipirsin, bêjin li hemberî dijmin çi kêmayî di kesayeta min de hene? Ez ne ji mirina we razî me, ne ji şerê we. Ez kêlî bi kêlî ji xwe dipirsim, pey re jî meşa xwe xurt dikim. Dibêjin, em fêrî koletiyê bûbûn, emê li gorî xwe bijiyan, tu hatî te xirab kir. Emê jî vê bi te bikin.

Berê xwe vegerand ser Agir, pişt re berxê xwe da nava dibistanê:

-Hevalê me Agir, diviya weke guran tevbigere. Rêzdariya me ji sebir û tehemula wî re heye, lê nikarî rastiyê bibîne û biguherîne.

Agir çawa ku li ber xwe ketibe, rengê wî hinekî guherî:

-Serokê min, ya rast em di nava zengîniya Rêbertiyê de xizantiya xwe nabînin. Em dibêjin qey em jî zengîn in. Pirsgirêk

di vir de derdikevin.

-Ji bo te weke din dikarim çi bêjim? Dibe ku tu bi serê xwe her tim mirovekî baş bin, durist bî, lê eger li derdora we bi nirxan evqas tê lîstin, evqas kesên di qeyranê de hebin, bizane ku tu li gorî erkên xwe tevnegeriyayî.

-Serokê min, hewldana min ya şexsî heye.

-Hewldana şexsî pir e, lê ne birêxistinkirî ye. Tu bi awayekî taktîkî û stratejîk naxebitî. Kêmayiya girîng di mijara rêbertiyê de ye.

-Rast e serokê min.

-Eger tu hêza xwe, cesaret û fedakariya xwe biplan bikî, hunerê rêbertî û pêşbîniyê birêxistin bikî, dibe ku tu ji min pirtir serkeftî bî.

-Ez di wê ferqê de me, serokê min.

-Baş e, derbarê rêbaza şerê hevalan de tu çi dibêjî? Di vê mijarê de tu şahidê herî zindî yî.

-Serokê min, taybetiyên me ji dijmin girtîn mohra xwe li rêbaza me didin. Belku em bi gotin dibêjin rêbaza PDK-YNKê, belku em li dij derdikevin, lê rêbaza me ji rêbaza wan neboriye -Heta ji ya wan paşketîtir e.

Agir dixwest bi awayekî kûr xwe bigire dest:

-Em hinekî ji wan cudatir in; dibe ku em nikaribin xwe bifiroşin derve, em xwe difiroşin Rêbertiyê.

-Rast e, tesbîteke mûkemmel e. Çawa we ev tesbît kir?

-Serokê min, jixwe tiştа em di nava partiyê de dikin, bazirganî ye. Ango hem bazirganî ye, hem dizî ye.

Apo bi tevgerên xwe jî gotinên wî erê dikirin, dixwest li dibistanê de ev mînak û kûrbûn ji her kesî re bibin mijarên

lêhûrbûnê:

-Ev jî rast e. Te bal kişand ser xaleke pir girîng. Bêguman Rêbertî jî rê nade bazirganî û diziyê.

-Yên li derveyî me jî, dijmin jî, hêzên weke PDK-YNKê jî vê dibînin. Ji ber wê gazî me dikin.

-Dibêjin, ew tiştekî nade we, em dikarin bidin, emê hinekî jiyana şexsî bidin, emê jiyana hinekî li gorî kêfa te bidin. Yên me jî dibêjin, wî ji bo welat her tişt ji me stand.

Birhên xwe di nava hev re derbas kirin:

-Welatekî neyî. Ji bo gelekî neyî! Bêwijdanî di vir de ye.

-Rast e serokê min.

-Ango dijmin dibêje, hûn ne yên wî ne, hûn yên min in. We riyeke şaş neqandiye, jixwe hûn bi ser nakevin, dawiya we felaket e, jiyan li cem min e. Ango van bangewaziyan ji bo vê dikin. Eger bala te bikişîne, yên me jî pir guhê xwe didin van bangewaziyan.

-Serokê min, ji ber ku guhê xwe didinê, PDK, yan jî Dewleta Tirk yekîneyên taybet ava dike.

-Zemîn pêşkêş dike, xwarinên taybet amade dike.

-Rast e serokê min.

-Evqas stûxwarî heye, evqas kesayeta çewt heye.

Xwêdanê bi ser eniya Agir re avêtibû, lê bala wî li ser gotinan bû:

-Serokê min, hinekî ew derdikeve. Ango ji her nirxê neteweyî û insanetî hatiye qutkirin, ji her tiştî hatiye bêparkirin. Di vê wateyê de terbiye kiriye, kiriye yê xwe. Ji bo ku xwe ji vê rizgar neke têkoşîneke mezin dike. Ji ber wê nikare xwe ji dijmin rizgar bike.

-Di nava me de dibe kontrayê objektîf.

-Serokê min, bi min kontrayek evqas zererê nade me.

-Ez niha çi bikim? Dev ji şer berdim, yan we serbest bikim, yan jî emê rêbazeke çawa bibînin?

Gotina em dev ji şer berdin, wê çawa be, di mejiyê Agir de diçû û dihat:

-Li gorî min em nikarin dev ji şer berdin. Divê em şer bi rengekî cuda pêş bixin.

Hinekî meşiya, çend kêliyan li derdora xwe nêrî:

-Em derfetên jiyandinê herdem zindî digirin, lê ev nayê wateya ku xeter piçûk e. Eger ez berdim, di nava bîst û çar saetan de dikarin dawiyê bînin.

-Serokê min, xeter mezin e. Lê yên me dibêjin tiştek nabe. Xetera mezin di vir de ye. Dibêjin PKK mezin e, wê Rêbertî her tiştê bike.

Çawa ku bêje emê ji nava vî karî çawa derkevin, her du çengên xwe vekirin:

-Mezin e, weke Xwedê ye, wê her tiştî bike. Wisa difikirin ne?

Agir di hundirê xwe de li ser wê hişmendiyê dihizirî:

-Dibêjin her tişt hatiye bidestxistin, tişta dikeve ser me jî xwarin e.

***

Dawiya meha Nîsanê bû. Apo li eywana qata dehan bi milîtanên jin re suhbet dikir. Tekmîla lêhûrbûna wan digirt. Tev bi awayekî leşkerî sekinîbûn. Li rewşa wan nêrî:

-Di demên dawî de me ev got; şerê em li hemberî we dikin, belku ji sedî notê zemanê me dibe. Şerê em li hemberî dijmin dikin, dibe ku ji sedî ji dehan kêmtir be.

Dema li wan dinêrî, çavên xwe direvandin, li jorê dinêrîn. Vê rewşê bala wî dikişand, di dilê xwe de got, gelo çima ne biste ne? Divê weke insanên azad tevbigerin. Li wan nêrî:

-Hûn min nas nakin, çima hûn ne biste ne? Ez hevalê we me, lê hûn bi qalibên hişk nêzîkî min dibin. Min wek hevalekî xwe, ne wek zilamekî bibînin.

Hinekî çû hat:

-Hûn çi dixwînin? Hûn guhdarî bernameyên tv dikin yan na? Divê hûn guhdarî bikin. Ka kî ji we çi pirtûkê dixwîne bila cewherê wê bêje.

Her kesî tişta xwendî got. Li ber ya herî ciwan û nû hatî sekinî. Berî hingê jî li Helebê dîtibû:

-Axîn, tu kengê fêr bûyî wiha weke leşkeran tevdigerî?

-Serokê min, ez ji hevalan fêr bûme.

Ber bi balkonê ve çû. Axînê li Şîlanê temaşe kir, hinekî berken bû. Çawa ku vegeriya, wê xwe bi ser hev ve da. Bi wê tevgera wê keniya:

-Êê, ka bêje, tu niha me çawa dibînî?

-Danûstandinên Serokatiyê nerm in, dixwaze her tiştî bi me bide fêmkirin û bi me re nîqaş bike.

-Heval çawa nêzîkî hev dibin?

Bêdeng ma, Şîlanê bikelecan bersiv da:

-Serokê min, di danûstaninên hevalan de pirsgirêk nînin. Lê carna di aliyê uslûb de pirsgirêk derdikevin.

Apo sekinî, hinekî hizirî:

-Divê hûn wisa nekin, PKK bi insanan dibe PKK. Hev neêşînin. Sivik nêzîk nebin. Şêwazê rêvebertiyê fêr bibin. Di xebatê de, li vir, kî we muxateb negire rexne bikin. Ez bim jî min rexne bikin. Lê bi uslûbê PKK'ê.

Dengê derî hat. Agir û Kemal ketin hundir.

-Hûn bi xêr hatine, li dibistanê çi heye?

-Serokê min, hevalan raporên qadan amede kirine. Yên hazir min tev xwendin.

-Min jî des bi perspektîfa konferasê kiriye. Ezê piştî nîvro biqedînim.

Agir tekmîla dibistanê da. Li gorî tekmîlê, di rûyê Apo de carna hêrsê xuya dikir, carna xemgîniyê:

-Tu ewqas sal di nava partiyê de yî, çima weke van hevalan pirsgirêkên te bi jinan re nînin? Heta niha tu çawa meşiyayî?

Salên destpêkê hatin bîra Agir:

-Serokê min, tê bîra min; li parqeke Enqere em rûniştibûn, min got werin em li van keçikên xweşik binêrin. Te got, divê mirovê şoreşger weke firîşteyan be. Ji hingê ve min dersa xwe girtiye. Ango gotinek jî bes e ku mirov ji bo xwe bike mînak.

Apo berken bû:

-Êê, tê bîra min.

Serê xwe hejand hinekî çû hat. Weke şerîta fîlmekî rojên wê demê tev di ber çavên wî re derbas bûn. Ber bi keçikan ve meşiya:

-Wê rojê we digot, Agir bi uslûbekî hişk nêzîkî me bûye. Va li vir e, hûn dikarin rexne bikin. Ev dem dema avakirina îradeya jinê ye, divê di her warî de xwedîîrade be.

Derbasî pirtûkxaneyê bû. Agir jî li cem milîtanên jin rûnişt:

-Hevalno, dema rexne rast bin ez qebûl dikim. Lê ez şaşîtiyan qet qebûl nakim û ev jî rêbazeke PKKê ye.

Piştî çend kêliyan Apo dîsa hat eywanê. Rûnişt tv vekir. Di wê navê re jî çay hat. Ew û Agir tenê li wir mabûn. Apo gazî wan kir.

-Werin em bi hev re çayê vexwin.

Heta qasekî suhbet kirin. Dîsa derbasî pirtûxaneyê bû. Li pişt mase rûnişt dest bi xwendina raporên konferansên li eyaletên Kurdistanê û yên li qadên derveyî Kurdistanê kir. Piştî ku ya dawiyê xwend û kir zerfê, dest bi temamkirina perspektîfên konferansê kir: "Ez bawer dikim di vê pêvajoya blokên nû de, wê PKK bi zanebûneke mezin, geşedanên bibin rast binirxîne û cihê xwe têkûz bike. Divê gelê me yê Başûr jî ber bi sîstemeke federal ve biçe. Li Tirkiyê jî, yan şoreş, yan Sosyalîzim, yan wê demokrasî pêk were, yan jî wê her kes tehemûla civaka faşîzmê kirî meymûn bike."

Pencere vekirî bû, çû girt dîsa li cihê xwe rûnişt. "Rêbaza şerekî taybet li hemberî me tê meşandin..."

Piştî qasekî pênûs danî, rabû ser xwe berê xwe da metbexê. Qedehek av vexwar vegeriya. Ji cihê mayî dest bi nivîsa xwe kir: "Li Kurdistanê hêzeke mezin ku dibêje, ez PKKyî me, heye. Lê ka endamtiya PKKê çi ye, erkên wan çi ne, nizanin. Kurdîtiya bê PKKê ne mûmkin e. Bê PKKê demokrasî, siyaset, ne li Kurdistanê tenê, li Tirkiyê jî, li welatên cîran jî ne mûmkin e. Saeta em wê wenda bikin, wê her tişt wenda bibe."

Pênûsa wî baş nedinivîsî, yeke din ji berkêşkê derxist: "Çima van salên dawî rolê min wiha zêde bû? Dost-dijmin çima evqas behsa rolê min dikin? Çima vê pirsê dikin? "Çima partî

nikare bimeşe, piştî te wê çi bi partiyê were, piştî we wê çi bi gel were?” Ev tê wateya ku Rêbertî xwe mezin dike, lê milîtan jî, gel jî erka xwe pêk naynin.

Biryarên kongre û konferansên berê anîn bîra xwe: “Li aliyê din, îdeolojî û polîtîka çiqas pêş bikevin, leşkerî jî wê ewqas pêş bikeve. Leşkeriya ji kûrbûna polîtîk dûr ne rast e. Ev xwexapandin e. Ji ber wê li hemberî kêmayiyên berê erkê dikeve ser milê we erkê partîbûnê ye.”

Mijara herî zêde li ser radiwestiya mijara jinê bû: “Em dixwazin artêşbûna jinê jî bi awayekî biwate pêş bixin. Em rewşa heyî kêm dibînin. Gelek hevriyên bikarin fermandariyê bikin hene.

Şevê reşayiya xwe û bedewiya asîmanan nîşan dabû. Piştî nivîs xelas kir rabû ser xwe çû balkonê hinekî li asîmanan nêrî. Qederekî çavên xwe girtin. Dema dijî di her warî de anî ber çavên xwe. Careke din çavên xwe li ser stêrkên li asîmanan rawestandin û kûr û hûr hizirî. Di dilê xwe de got, bi qasî zelaliya asîman divê jiyaneke me jî ya wiha hebe. Zelal pak û azad be. Ev ji bo şehîdên me diyariya herî mezin e. Ji bo em layîqî dayîkan jî bibin ev ji me tê xwestin. Hinekî wisa ma. Berê xwe da odeya xwe. Berî ku bikeve hundir li eywanê nêrî, xwest bizane ka nobedar şiyar in ya na. Siwar li wir rûniştibû, bi dîtina wî re rabû ser xwe:

-Tişek pêwîst e serokê min.

-Na heval, şev baş ji bo te…

***

1ê Gulana 1996an bû. Wê rojê li dibistanê Konferansa Neteweyî ya PKKê ya 4an hatibû destpêkirin. Li derdora dibistanê, nobedar belav bûbûn. Memed û çend kes li nizamiyê bûn. Li wan derdoran dinêrîn. Li dibistanê her kesî xwe li gorî wê amade kiribû. Dema pêngaveke nû bû. Delege tev li hundir rûniştibûn. Erkdar û xwarinpêj li derva bûn. Deng ji wan derdoran nedihat. Dinya wê rojê pir xweş bûbû. Gul, dar û giyayên di hewşa dibistanê de hev temam kiribû ji bedewiyê.

Dosyayek di destê Agir de bû, bi gavên hêdîka ber bi dibistanê ve diçû. Pora xwe di milekî de şeh kiribû. Gumlekekî zeytê vekirî, pantolonekî risasiyê tarî lê bûn. Cilên wî li bejna wî ya dirêj pir hatibûn. Ceynikên wî yên spî baş xuya dikirin. Bilez ket hundir, çû li pişt mase sekinî. Bi dîwarê piştê ve wêneyên şehîdên destpêkê hatibûn rêzkirin. Her sê al jî di bin wan re hatibûn daleqandin. Li ser mase ala ERNKê hatibû danîn. Dibistan mişt bûbû. Bi rêzgirtina ji bo şehîdên şoreşê konferans vekir:

-1ê Gulana 1990î me dîsa konferansek li dar xistibû. Me ji wê re digot, “Konferansa Gerîla” Dîsa li vê dibistanê, sala 1994an, “Konferansa Neteweyî ya 3.” hatibû lidarxistin. Ew konferans ji Kongerya 5. re bûbû bingeh. Niha jî em konferansa xwe ya 4. li dar dixin. Wê konferansa me deh rojan dewam bike. Lê berî destpêkirinê emê perspektîfên Rêbertiyê yên pêşkêşî konferansê kirîn bixwînin.

Bi axaftina wî re milîtanek ber bi cihê dîwanê ve meşiya. Perspektîf ji 76 rûpelan hatibûn amadekirin. Navekî wê yê din jî “Polîtîk Rapor” bû. Perspektîfan bi *“Ji bo milîtan û xebatkarên partî, artêş û eniyê!”* dest pê kiribû. Pişt re xal bi xal wiha

hatibûn rêzkirin: "*Xebat, civînên berfireh û amadekariya ji serê zivistanê ve bi navê PKKê hatîn kirin, em gihandine lidarxistina konferansê. Kongre û konferansên bi navê partiya me tên lidarxistin, ne kongre û konferansên wisa klasîk in. Em her tim di nava pêvajoya kongeryê de ne. Her roja me kongreyek e. Sala 1981ê jî me konferanek li dar xistibû. Bi awayekî sembolîk be jî di wê konferansê de biryara vegera welat hatibû dayîn. Em îro ketine pêvajoyeke wisa ku çareseriya pirsgirêkê xwe disepîne. Sosyalîzma Pêkhatî roxiya. Sîstema kapîtalîst-emperyalîst, her çenda bi navê Sîstema Nû ya Cîhanê dest bi pêvajoyekê kiribe jî, bi pirsgirêkên nû re rûbirû maye û nikare ji navê derkeve. Ev jî diyar dike ku wê blokên nû derkevin...*"

Saet dehê êvarê bû, bi qedandina xwendina perspektîfan re mirên bi dibistanê ket. Milîtan hemû rabûn ser xwe li çepikan xistin. Çepikan çar deqîqeyan dewam kir. Piştî çepikan her kes li cihê xwe rûnişt. Rûyê Agir pir geş bû:

-Bi perspektîfên Serokatiyê, me dest bi konferasa xwe kir. Berî ku em rûniştina xwe ya îro biqedînin emê dîwanê derxin. Belê kerem bikin pêşniyarên xwe bikin.

Piştî girtina pêşniyaran yek bi yek xistin dengdanê. Li rex Agir, milîtaneke jin û yek mêr hatibûn hilbijartin. Her sê endamên dîwanê li pişt mase cihê xwe girtin. Piştî şêwreke çend kêliyan Agir rabû ser xwe:

-Hevalno, emê saetên xwe yên konferasê jî diyar bikin.

Piştî qebûlkirina bernameya rojên konferansê, rûniştina rojê qediya. Bi gotina şevbaş re, dengê milîtanan bilind bû. Kom bi kom ber bi cihê razanê ve çûn. Hina jê pelên perspektîfên di destê xwe de diqulibandin. Şevên dibistanê jî weke nava rojê şên

bûn.

Agir berî ku raze Tv. vekir, xwest li sernûçeyan guhdarî bike. Dîmenên pîrozbayiya 1'ê Gulanê, didan. Di pîrozbayiya li stenbolê de çar kes hatibûn kuştin. Dîmenên cejnên borî hatin ber çavên wî...

***

Şeşê gulanê serê sibê bû. Kemal seyare diajot. Şîlan li pêş rûniştibû, Biharê jî li ser kursiyê paş li derdor temaşe dikir. Piştî qasekî gihîştin Mercê. Li hawîrdorê felekeyê perdeyên reş hatibûn daleqandin. Perdeyan bala Şîlanê kişandibû:

-Îro li vir û Lubnanê cejna şehîdan e. Ji ber wê ev perde hatine daleqandin, ji vir re dibêjin Qada Şehîdan.

Biharê serê xwe hejand:

-Bûyer dema Cemal Paşayê Osmanî bûye, ne wisa? Ereb jê re dibêjin seffah, ango xwînxwar.

-Erê, 1916'an, 22 rewşenbîrên Ereb li vir hatine darvekirin. Berî wê êrîşî Misrê kiribû, lê bin ketibû. Li Lubanê jî Birca Beyrûdê cihê darvekrinê ye. Hûn vê stûnê dibînin?

Teva berê xwe da stûnê. Mizgefta li serê wê bala tevan dikişand. Li dinyayê mizgefta herî piçûk bû.

-Jê re dibêjin, stûna telgrafê. Sala 1907'an waliyê Osmaniyan Huseyin Nazim Paşa li ber Sarayeke ya Stenbolê çêkiriye. Endezyarekî Îtalî yê bi navê Babîlo Rosînî çêkiriye.

Kemal, serê stûnê mereq dikir. Seyare sekinand, li bedewiya felekeya li dora wê temaşe kir:

-Sed sal ser re derbas bûne, lê hê weke xwe ye.

Çavên Şîlanê li ser kevokên li derdora wê rawestiyabûn:

-Hevalno, em biçin dereng e.

Şîlanê dixwest agahiyên derbarê bircê de tevan ji wan re bêje:

-Wê demê Suriy navenda ramanê neteweya Ereban bû. Bi teyabetî dema inqilab li Sultan Ebdulhemîd tê kirin, Mehmedê pêncan dibe sultan. Sala 1908'an Ittîhad-Tereqî tê ser hukum. Wê demê Cemal Paşa waliyê Şamê ye. Ereb dibînin ku Ittîhad-Tereqî siyaseta tirkbûnê pêş dixe. Ango dixwazin her kesî bikin Tirk. Ji bo cudabûna ji Osmaniyan, Ereb jî ji bo pêşxistina erebbûnê, li Şamê dest bi rêxistineke nû dikin. Lê Osmanî 1916. weke îro tevan tesfiye dikin.

Biharê jî xwest derbarê rojê de hin agahî bide:

-Îro roja darvekirina Deniz Gezmiş e jî. Ji bo gelê Ereb û Tirk şeşê Gulanê girîng e. Di şerê cîhanê yê yekê de, Osmanî dişkin, lê Ittîhad-Tereqî dimîne. Heman hişmendî 1971ê pêşengên çepgirên Tirkan Deniz Gezmiş û hevalên wî darve dike. Hişmendiya hevalê Haki Karer şehîd dixe û hevalên me li zindanan bi awayekî hovane işkence dikin, heman hişmendî ye. Ew hişmendî li Tirkiyê niha jî li ser kar e.

Şîlanê li derdora xwe dinêriya:

-Êê, li ser van erdan jî hindik xwîn nehatiye rijandin. Salên 1970-1980'î fikrê ku Suriye serbixwe be derdikeve. Çawa ku Zenûbya jî dibêje, bila têkiliya me bi Roma re hebe, lê bila hinekî serbixwe bin jî. Çi desthilatdarên hatîn serê Suriyê ji Mûawiye û kurê wî Yezîd kêmtir nekirne.

Tevan dixwest agahiyên li ser Suriyê ji wan re bêje. Wê jî bikelecan digot:

-Di dema Osmaniyan de navenda netewperestiya Ereb ne Misir e, Suriye ye. Yên pêşengiya vê hişmendiyê kirîn Seed Huserî, Mîşel Efleq, -bi eslê xwe Yahûdî ye- Zekî Irsusî, -Ji Antakya ye-Selaheddîn Beytar in, -Sunnî ye û bazirgan e-. Siyaseta Ittîhad-Tereqî li ser navê Tirkan kirî, ev jî dixwazin heman hişmendiyê li ser navê Ereban bikin. Netewperestiya Enwer Paşayê Osmanî kirî, Cemal Ebdunnasir, Zekî Mîşêl û Selaheddîn Beytar jî dixwazin li welatên Ereban bikin. Li gorî wan

ji Okyanûsa Etles heta Kendava Erebî, welatê Ereban e û divê her kesê li ser vê erdnîgariyê bibe Ereb.

Hin nakokî di serê Kemal de çêbûbûn:

-Baş e, ev hişmendiya Baasê kengê derdikeve?

Hizba Baas, sala 1947an, 7'ê Nîsanê li qehwexaneya Havana tê avakirin. Li ser çîna navî siyasetê dike û di nava artêş û bûrokrasiyê de cihê xwe xurt dike. Lê li gundan jî dest bi rêxistinê dikin. Sala 1963yan bi pêşengiya Hafiz Esed inqilab tê kirin. Ev inqilab hinekî dişibihe inqilaba 27'ê Gulana 1960î ya li Tirkiyê. Ango hinekî çep û demokrat in. Baas jî qaşo teqlîda wan û şoreşa Fransa dike. Lê bi rengê wan yê herî xirab dike. Weke Mosolînî, Hîtler û Franko, Mîşel jî dibêje divê hişmendiya Baasê “El Islam wel Uroba” be. Ango senteza Islam û Erebîtî be.

Ji ber ku di suhbetê de germ bûbûn, ferq nekirin ku gihîştine dibistanê. Milîtan hê li derve bûn. Hewşa dibistanê bi gul, kulîlkên qesarê xemilîbû. Keskayî û pelên daran hewşa dibistanê pir xweş kiribûn. Dengê çivîkan û yê mîlîtanan bi hev re bilind dibûn. Bayekî germ ji aliyê bajêr ve li wan dixist. Konferans ber

bi dawiyê ve diçû. Dema amadekirina palansaziya xebata du salan bû. Kom bi kom li ser plansaziyê nîqaş dikirin. Diviya her kom pûşnûmeya xwe pêşkêşî dîwanê bike. Germayiya rojê û ya nîqaşê tevlîhev bûbûn.

Navbera çayê hatibû dayîn. Şîlan û sê milîtanên jin li nava bexçe çay vedixwarin. Şîlanê li derdora xwe dinêrî. Çavên xwe li ser milîtanên li hewşê rawestandibûn. Kombûna milîtanan, suhbetên wan, meş û kenê wan dîmenekî xweşik li ber çavên wê çêkiribûn. Jimara jinan zêde bûbû; hin bi hev re diaxivîn, hin jê bi giştî re dimeşiyan. Carna jê dengê kenê wan dihatiyê. Ew deng di dilê wê de weke dengê stranekê lê xweş dihat. Rojên wê yên gerîlatiyê hatin bîrê, di dilê xwe de got, min ewqas heval li akademiyê dîtine, niha jî li vir. Berê xwe da Biharê:

-Hevala Bihar, xebata li Şamê çawa diçe?

-Baş e. Berî ku Serokatî ji bo konferansê gazî me bike, me ji bo hijdehê Gulanê amadekariya civînên mezin dikir. Hevalên li mala Serokatiyê çawa ne?

-Lêhûrbûna wan baş e. Ji bo xebatê xwe amade dikin. Hin heval ji bo civînên gel çûbûn Efrîn, Cizîr û Kobanê. Bandora gel li ser wan pir çûbûbû.

Berê xwe da her duyên din. Yek ji wan gewr û porsor, ya din esmer û bejinzirav bû. Destê xwe danî ser milê ya porsor:

-Hevala Aryen, mala hûn lê heval çawa ne, baş in?

Aryen hêdîka diaxivî, dixwest axaftina wê kin û cewher be:

-Serokatiyê got, li ser xebata xwe bihizirin, tevlî konferasê bibin. Ji bo xebata jinê ya li her qadê nîqaş bikin û pirtûka jin û malbatê dubare bixwînin. Carna em pirtûkê bi hev re dixwînin. Carna jê em diçin cem hevalan li ser xebat û asta tekoşînê û

rêxistina jinê nîqaş dikin.

Ya esmer û porkin -navê wê Jîn bû- li benda pirsan nema, wê jî dixwest rewşa li dibistanê binirxîne:

-Cara yekê ye hatime cihekî evqas fermandarên şer lê. Min jimareke wiha mezin bi hev re nedîtine. Li Dêrsimê em bi jimarên piçûk tevdigeriyan.

Şîlan ket navbera axaftinê:

-Hedef pêşketina têkoşînê ye. Ya min fêm kirî, Serokatî dixwaze bi vê konferasê li vir xeta rêxistinê bi ser bixe, da li welat serdest bibe. Ji ber wê got, em bibin PKK'yî û şer qezenc bikin. Li hemberî xetimîna şer xebateke mezin tê kirin. Di şer de bala me nakişîne. Konferans li ser van mijaran û gerîlatiya li gorî demê radiweste. Em jî ji qadên şer hatine divê em binirxînin.

Di wê navê re endamên dîwanê di ber wan re borîn. Endama jin li cem wan sekinî. Jineke bejinkin lê jixwebawer bû. Çavên xwe yên qehweyî li ser wan rawestandin:

-Hevalno, hûn li ser çi diaxivin?

Her çaran lê temaşe kir. Milîtaneke kevin bû, ji bo rêzgirtinê xwestin ew biaxive. Wê jî texsîr nekir:

-Serokatiyê perspektîf dane. Nîqaş ji me re hiştine ku em her tiştî nîqaş bikin. Îro heta plansaziya qadan neqede em navberê nadinê. Jixwe du roj mane.

Pora xwe ya kina xelek car bi car paş ve dida. Tev de dest bi meşê kirin.

Nobedaran pir bi baldarî li derdora xwe dinêrî, parastina konferansê li ser milê wan bû. Siwar jî li cem Memed sekinîbû.

Wî jî bi çavên xwe yên weke dûrbînê li derdor dinêrî. Hinekî pêş ve çû, li deriyê mala li kêlekê temaşe kir. Berken bû:

-Hevalê Memed, tiştek hebe cîran ji we re dibêjin?

-Heval, ev mala li pişt me jina malê, weke moriyan çi hebe digihîne me.

Hê çavê Siwar li ser mala li kêleka rastê rawestiyabûn:

-Her ku ez ber deriyê ciranên me re diborim, ez dibêjim qey du dibistanên me hene. Bi her awayî weke hev in.

Hineke din pêş ve çû. Kamyoneke mezin li ber deriyê ciranê wan sekinîbû. Di hundirê xwe de got, min heta niha ev kamyon li van deran nedîtiye. Deng ji dibistanê bilind bû, navber hatibû dayîn. Apo û Agir bi hev re dimeşiyan. Yekser berê xwe da wan. Apo li saeta xwe temaşe kir:

-Saet şeş e, emê derkevin, hûnê êvarê plansaziyê nîqaş bikin ne?

-Rast e serokê min, emê rûniştinê dirêj bikin.

-Temam ez û Siwar emê derkevin.

Hinekî çû li binê dara hêjîrê sekinî, li kerikên wê temaşe kir. Ji wir jî çû cem kevokan. Hin zadik kir sêniyekê. Sê kevok tenê li wir bûn, ew jî firiyan çûn. Li hêlînên wan nêrî. Di hêlînan de jî tinebûn. Li banî temaşe kir. Kevok bûbûn pariyek nan. Her siyên firiyayîn li ser dîwarê dibistanê danîbûn. Di dilê xwe de got, gelo çima evqas dûr çûne? Zadik bir nêzî wan kir, lê nexwarin. Li wan derdoran nêrî, gazî nobedaran kir:

-Kevok ne li vir in. Yan we xwarin daye wan ji ber wê nayên naxwin?

-Serokê min, me xwarin nedaye wan, gava din li wir bûn. Lê îro dûr difirin.

Serê xwe bilind kir, li nava daran temaşe kir. Tişek nedît. Gula spî ya li pêşiya xwe hinekî bîn kir, berê xwe da seyareyê. Berî ku deriyê wê veke, careke din li cihê kevokan nêrî. Ji her siyên li ser dîwar yek tenê mabû, bi nerîna wî re ew jî firiya. Serê xwe hejand:

-Ev bi kû ve çûne, ti carî wiha nekirine!

Deriyê seyareyê vekir li ser kursiyê paş rûnişt. Xwer ketibû nava tiliyên piyên wî:

-Siwar, bila heval careke din henê çêkin, ezê li piyên xwe bidim. Dîsa xwer ketiyê.

-Temam serokê min.

Seyare bi rê ket, xwe tewand pêlav ji piyê xwe yê rastê derxist nava tiliyên xwe xwerand. Seyare ji xaniyê cîranan derbas bû. Sê kes li keviya rê bêr di destê wan de bûn dixebitîn. Çavên Siwar bi wan ket, lê bê ku li wan zêde binêre derbas bû. Piştî seyare ji wir dûr ket, her sê kes çûn cem kamyonê. Yekî xwe nêzîkî yên din kir:

-Ji vir derket?

-Na, ti kes di seyareyê de tinebû, seyare vala çû. Her tiştê em lê difikirin baş derbas dibe.

-Seyareya lacîwert derket?

-Hê li hundir e.

-Yên din hemûyan cihê xwe girtine, bila hereket çênebe. Divê em li ber çavan xuya nekin.

-Temam, em karker in, em dikarin li van derdoran xwe mijûl bikin. Her tişt di binê kontrola me de ye. Ji Serêkaniyê heta vir ti kêmayî derneketine. Wê dernekevin jî.

-Temam, vê carê ti kêmayî qebûl nabin. Vê carê wê li gorî

me bibe. Divê mêşek jî ji van deran nefilite. Bila çavên we li ser ronahiya kesk bin.

Ji hev belav bûn. Yekî li nêzî kamyonê xwe dirêj kir. Berê xwe dabû asîmanan, ketibû nava xeyalan. Ji kelecanê dengê kutekuta dilê wî bû. Her duyên din jî li nêzî wî di nava genim de xwe dirêj kirin. Dilê wan rehet bû, cihê wan jî nerm bû. Li benda tariya asîmanan bûn.

Li dibistanê beroşên tirşik û birincê hatibûn rêzikirin. Li ser mase rê nemabû, li erdê jî  sifreyeke dirêj hatibû raxistin. Sêniyên tijî belav dibûn. Destek kevçik di destê Şîlan de bû. Berî ku bigihîje mase, kevçik ji dest ketin belav bûn. Çingeçing bi wan ket. Ji şerma li kevçikan nenêrî. Di wê navê re dengê helîkopterê hat, li ser wan re derbas bû, gelekan lê temaşe dikir. Biharê xwe nêz kir kevçik kom kirin:

-Ev ji kelecanê bû?

Şîlanê hê nizaniya ka çawa kevçik ji dest ketine:

-Ez ti caran zûbizû tiştan ji destê xwe naxim, nizanim îro çawa çêbû.

Bi hev re çûn metbexê şûştin anîn. Her kes li benda kevçikan bû.

Piştî şîvê qedehên çayê hatin. Di ber çayê re jî li ser konferansê diaht axaftin. Gurzek pêşnûme di destê Agir de bû li wan dinêrî, ya ku wê bixwîne kir pêşiyê. Li saeta xwe nêrî, berê xwe da erkdarê rojê:

-Bila heval derbasî hundir bibin. Divê îro em plansaziya qadan biqedînin.

Erkdar bi erêkirinê re li fîrikê xist. Piştî ku her kes ket hundir, dîwan jî çû ciyê xwe. Agir di dîwanê de bû, pêşnûmeyên

di destê xwe de danîn ser mase, dest bi xwendinê kirin. Piştî xwendinê nîqaşê dest pê kir.

Nobedaran li derdor dinêrî. Her der aram bû. Asîman safî bûbûn. Êdî reş ketibû erdê. Dengê çirçirkan ji wan derdoran bilind dibû. Bihna axê û genim ketibû nava hev, bi ser wan deran ketibû. Bayekî nerm û narîn li darên di hewşê de dixist. Erkdaran nû xwarina xwe dixwar. Carna yek diçû nêzî dibistanê dibû da bizane ka kî diaxive.

Li derdor şevşevokên şevê çavên xwe vekiribûn. Her sê kesên di nava zeviyê de xwe baş veşartibûn. Yê nêzîkî seyareyê çavên wî li ronahiya kesk bûn. Her duyên din jî xwe nêzîkî dibistanê kiribûn. Yekî ji wan xwe li erdê dirêj kiribû li ser zikê xwe ber bi aliyê dîwar ve diçû. Her ku nêzîk dibû, nefesa wî tengtir dibû. Lê kêliyekî jî nedisekinî, dixwest dengê hundir bibihîze. Dîwar ketibû navbera wî û deng. Yê din ji wir dûr ketibû, li aliyê nîzamiyê dinêrî.

Apo li qata duduyan bi telefonê diaxivî, tekmîlên qadan digirtin. Yên li malê bêdeng lê guhdarî dikirin. Telefon danî. Piştî çend kêliyan careke din dengê telefonê hat. Berî ku rake, li saeta xwe nêrî, neh kêm çariyek bû. Telefon rakir, dîsa ji qadan hatibû. Dengê wê vekir. “Operasyoneke mezin li ser sînorê Zagrosê dest pê kiriye.” Di dilê xwe de got, Zekî Zap xistiye binê venêrîna xwe. Hedefa wan tinekirin e. Telefon ji nişka ve qut bû. Wê rojê ew çend car bûn qut dibû. Telefon danî guhdarî nûçeyan kir. Biken li yên hundir nêrî:

-Va nûçeyên Ingilîzan dibêjin, Apo mir. Hûn min dibînin. Ez sax im.

Careke din telefonê lê xist. Çû rakir. Aliyê din agahiyên derbarê operasyonê de didan.

Li dibistanê plansaziyên qadan dihatin xwendin û nîqaş dihatin kirin. Dem derbas dibû, erkdarê rojê li ber deriyê dibistanê sekinîbû, serê çend kêliyan li saeta xwe dinêrî. Xwarinpêjan jî qedehên çayê rakirin, agirê binê çaydanan jî vemirandin. Saet li derdora neh û nîvê bû. Navbera dawiyê hat dayîn. Nîvê milîtanan derketibûn, nîvê din hê di hundir de li ser piyan nîqaş dikirin. Yên derdiketin ber bi çeydanên çayê ve diçûn. Dengê erkdar bilind bû:

-Hevalno, derng bû. Me her tişt rakir!

Kêfa Agir ji disiplîna jiyanê re dihat, ev anons li xweşiya wî çûbû. Delegeyên konferansê ji ciyê çayê belav bûn. Lê hê li ser plansaziyan diaxivîn. Agir li notên di deftera xwe de dinêrî. Amed xwe nêzîk kir. Ew jî pê re hêdîka dimeşiya. Agir li nîvê qadê sekinî, baştir li notên xwe temaşe kir. Li derdora wan milîtan kom bi kom hem dimeşiyan, hem nîqaş dikirin. Agir jî Agir bû, ti kes bê kar nedihişt. Deftera xwe girt, li Amed temaşe kir:

-Ez li asîmanan li te digeriyam, min tu li erdê dîtî. Te rapora zindanê xelas kir?

Amed li Agir biste bû, dixwest timî li kêleka wî be:

-Minê îro serê sibê bida te, lê em ketin hundir.

Agir li rapora di destê xwe de careke din nêrî. Ji adetên wî bû, dîroka nivîsa raporan di hişê xwe de qeyd dikir. Quliband aliyê piştê, li dîroka wê baş nêrî. Amed jî çavên wî li erkdarê rojê bûn, dema guhertina nobedaran bû. Di dilê xwe de got,

Xwedê bike ne ez nobedar bim. Erkdar di ber re borî. Piştî çûna wî nefesek kişand hundirê xwe. Du milîtanên din hatin derxistin, çavên wî her li nobedaran bûn. Hê neguhertibûn.

Şîlan, Bihar û Aryen jî bi hev re dimeşiyan. Bihar li Şîlanê vegeriya:

-Ka em biçin destşoyê didanên xwe bişûn. Paşê em biçin qawîşê. Niha tekmîlên rojê digirin, jixwe em li derve tevlî bûne.

Şîlan hê li ser rapora Zagrosê dihizirî. Her sê bi hev re çûn. Daketin binê pîpelkan, didanên xwe firçe kirin. Şîlanê berê xwe da Biharê:

-Çeqmek li cem te heye, ezê vê notyê bişewitînim?

-Heye, bide min ezê bişewitînim.

Çente ji milê xwe danî çeqmeq jê derxist. Pê xist da binê kaxizê. Pêt bilind bû. Ji bo ku destê wê neşewite avêt nava hûrmûrên di binê pîpelkan de. Bi avêtinê re dengê teqîneke mezin hat. Êdî xwe nedîtin, deriyê destşoyê li wan hat girtin. Li derve agir bi ser dibistanê ketibû. Di korîdora dibistanê de Jîn di nava toz û dûmanê de mabû. Weke ji dinyayekê biçe dinyaya din, çavên xwe vekirin. Xwe hinekî livand, fêm kir ku sax e. Hinekî xwe qeliqand, pê hesiya ku li ser hin tiştên nerm dirêjkirî ye. Çavên xwe ji toz û dûmanê vekirin. Dixwest bizane ka herî dawiyê li kû bûye. Hat bîra wê ku destiyê deriyê rêveberiyê anîbû xwarê, weke din tiştek nizaniya. Bi rabûnê re nû zanî ku tiştên li ser wan ketî hevalên wê ne. Xwest zû ji wir dûr bikeve, lewre nizaniya ka çi qewimiye û çawa ketiye ser pişta hevalên xwe. Li derdor ti kes nedît dengek tenê dihatiyê. “Agir li kû ye, Agir li kû ye”. Dest bi bezê kir. Ji ber toza ketî çavên wê pêşiya xwe nedidît. Dengekî din hat guhên wê: “Bila her kes xwe

biavêje erdê, biçin aliyê baxçe”! Çavên xwe paqij kirin, li hemberî xwe Agir dît. Agir aram bû:

-Ji hevalan re bêjin bila aram bin, ez li vir im, tiştek bi min nehatiye.

Jîn ber bi baxçe ve beziya, hê nizaniya ka çi qewimiye, sirf zaniya ku tiştek teqiyaye. Di dilê xwe de got, gelo ku min ew derî vekir sîgorteya kehrebê teqiya, yan tûpê gazê teqiya? Çavên xwe li nava baxçe gerandin, her kesî ji hev re tiştek digot.

Amed hê li erdê dirêjkirî bû. Hê dîmenê hevguhertina nobedaran li ber çavên wî bû. Li raserî dibistanê hê pêta agir xuya dikir. Wisa dirêjkirî çavên xwe li Agir gerandin. Ne li wan deran bû. Li derdora xwe nêrî, li her cihî milîtanên dirêjkirî hebûn. Çavê wî bi yekî dimeşiya ket, ji pêlava wî nas kir ku Agir e. Gazî dikir:

-Li her milî nobedaran derxin!

Çend kes bilez di ber e derbas bûn. Yekî ji wan pêl piyê wî kir, axînek ket ser lêvên wî. Lê bilez yê pêlê kirî ji wan deran dûr ket. Yên gerîlatî kirîn tecrûbeya wan ketibû dewreyê. Her kes li cihên guncaw bi cih dikirin. Ew jî rabû ser xwe, ber bi Agir ve bilez meşiya. Agir bi sekin, aramî, tevger û helwesta xwe dîmenê feramandariya PKKê nîşan dida. Bi awayekî ku tevlîhevî çênebe û cesaretê bide derdora xwe diaxivî. Jixwe kesê dengê wî dibihîst, hem kêfxweş, hem aram dibû. Li derdora wî şeş-heft kes hebûn, xistibûn nava xelekê.

-Hevalno, aram bin! Ev êrîşa Tirkan e. Jixwe, li welat jî operasyon hene. Dibe ku têkiliya wê bi xiyaneta hundir re jî hebe. (Di nava wê hengâmê de ev gotin cihê xwe nagirin)

Ew çend kêlî ji her kesî re weke demeke dirêj dihatin. Piştî

ku her kes bi cih bû û aramî çêbû, Agir li derdora xwe temaşe kir. Çawa ku ne bihar, zivistan be, pelek bi daran ve nemabû, gelek ji wan jî şaxên wan şkestibûn. Dibistan û derdora wê her tişt hatibû guhertin. Mirov nizanî ku dibistana berî bi çend deqîqeyan e. Li hin deveran dîwar hilweşiyabûn, li hin deveran jî banê xanî ketibû. Mirov digot qey cam li pencerayan nedane. Ji ber parçeyên caman gelek milîtan birîndar bûbûn.

Çavên Amed li wan derdoran bû, di dilê xwe de got, ev çi tofan bû. Yekî destê xwe li milê wî da:

-Heval, ma tu deng nabihîzî, biçe nava daran!

Ew jî bilez meşiya çû binê daran. Gelek kes li wir bûn. Derbarê teqînê de her kesî tiştek digot. Hina digot, tûpê metbexê teqiyaye, hina digot, kehrebe ye. Amed, li Agir guhdarî kiribû, ew şîrove bi serê wî neketibûn, dîsa berê xwe da cem Agir. Di dilê xwe de got, baş bû tiştek bi hevalê Agir nehatiye. Dengê Agir yê biheybet dîsa bilind bû:

-Hevalno, ez li vir im. Ez baş im, bila heval ranebin ser xwe!

Yê berî hingê destê xwe li milê Amed dayî li ber sekinî:

-Heval, ez diçim têm hê tu li vir î, biçe nava baxçe!

Şîlan, Aryen û Bihar, hê li destşoyê bûn, ji destpêka teqînê ve bi derî ve mijûl bûn da vekin. Şîlan sekinî, li wan nêrî:

-Ew kaxiza me şewitandî, bû belaya serê me! Alavên leşkerî li van deran pir in, agir bi wan ketiye. Yên din hê deriyê xulûxwarî dikişandin. Taliyê hat vekirin, lê ew jî ji hal ketibûn. Bi hestên ku ew bûne sedema bûyerê bi awayekî şermoke hêdîka derketin derve. Toz-moz nemabû. Şîlanê çavên xwe mis dan, lê dîsa tiştek nedît:

-Heval, ev bîna barûdê ye!?

Hê li derdora xwe dinêrîn, dengek hat wan: "Bila her kes biçe aliyê piştê." Ew jî bilez ber bi  wî milî ve çûn.

Apo li mala xwe dirêj kiribû, bi bihîstina dengê bilind re bilez rabû ser xwe:

-Kehrebeyê qut bikin! Dakevin qata jêrê, xwe li erdê dirêj bikin!

Siwar ber bi cihê sîgorteyê ve bezî. Tevan bilez xwe berda xwarê:

-Serokê min, ez nizanim ev çi bû, lê Şam hemû hejiya.

Apo di hundirê xwe de zelal bû:

-Ev êrîşeke mezin e.

Li eywana qata jêrê xwe dirêj kirin. Piştî çend kêliyan rabû rûniş:

-Siwar biçe dibistanê, binêre ka çi bûye.

Siwar bilez derket, ber bi aliyê Şeba ve çû. Çawa ku erd hejiyabe, li ser riya dibistanê her der xirab bûbû. Ji tirsa ku tiştek bi yên li dibistanê hatiye, di nava xwêdanê de mabû. Dîmenên xirab dihatin ber çavên wî. Dixwest xwe zû bigihîne dibistanê, lê riya xirabe derfet nedida. Serê xwe dihejand û pê li gazê dikir. Di nava wê kêferatê de gihat nêzîkî dibistanê. Seyareyên leşkerî jî yek dihat, yek diçû. Seyareya xwe li tenişta rê sekinand, bibez xwe gihand cihê teqînê. Teqîn li ber deriyê cîranê dibistanê çêbûbû. Hê dengê qîr û hawarê ji wir dihat. Ji ber teqînê, bi qasî pazdeh metreyan çalek çêbûbû. Hêzên dewletê ji her du aliyan ve dest bi girtina rê kirin û her kes ji wan deran dûr xistin. Siwar dixwest xwe nêzîktir bike. Kûrbûn û mezinbûna çalê xistibû

tirseke mezin: “Weleh niha tiştek li dibistanê nemaye”. Hinekî ji wir dûr ket, ji aliyê piştê ve xwe nêzîkî dibistanê kir. Piştî ku dît ji ber hêzên dewletê nikare bikeve hundirê dibistanê, bilez vegeriya berê xwe da malê.

Apo û yên din hê li eywanê bûn. Difikirî ka çi bi dibistanê hatiye. Berê xwe da Şêxo:

-Di binê çadira keçan de cebxane hebû, eger teqiyabin niha 90 keçikên me çûne! 90 jin çûn!

Rabû ser xwe çend gav avêtin, dîsa rûnişt:

-Gelo çi bi wan hatiye, şehîd hene, nînin?

Serê xwe dihejand û fikarên pir mezin pê re çûbûbûn. Dîsa rabû ser xwe çû hat. Di wê navê re Siwar ket hundir.

-Siwar, dibistan bû ne? Tişek bi keçikan hatiye?

-Serokê min, ne dibistan bû, lê hedef ew bûye. Kamyoneke mezin li ber deriyê baxçeyê cîranê me teqandine.

-Tiştek bûye?

-Serokê min, tiştek bi dibistanê nehatiye. Lê miriyên cîranên me hene. Dengê qîreqîra wan dihat. Hêzên deweletê nedihiştin ti kes nêzîkî wir bibe. Di aliyê piştê re min hinekî xwe nêzîk kir. Dengê leşkeran dihat ji hev re digotin, di kamyona teqiyayî de, tonek teqemenî hebûye, hina jê digot, pêncî ton in. Kî dihat wir digot me teqîneke wiha nedîtiye. Digotin, mirî û bîrndar jî hene.

Bê ku tiştekî bêje, diçû dihat. Di hundirê xwe de got, demeke nû dest pê kir.

Ji ber ku her der hatibû girtin, yên li dibistanê nikariyan xwe bigihînin malê, agahiyan bidin.

Milîtan kom bi kom li nava baxçe belav bûbûn. Gelek kes bi camên şkestî birîndar bûbûn, lê birînên wan sivik bûn. Ji mala

li tenişta wan dengê lorîkên jinan dihat. Ji ber wê kalîn û nalînê ti kes nediaxivî, xemgîniyeke mezin xwe berdabû nava dilê wan jî. Şevek ne ya Şamê bû, ya qiyametê bû. Heta berê sibê hê dengê şînê ji malê dihat. Ew jî nerazabûn. Her yekî tiştek ji yên din re digot:

-Baş bû ku Serokatî ne li vir bû.

Lê dengê lorîkan pir bandor li wan dikir. Bi mirina cîranên xwe pir êşiyabûn. Milîtanên jin xwe li ber lorîkan nedigirtin, rondik ji çavên wan jî dihatin. Di dilê xwe de digotin, li ber deriyê me neteqiya evqas bandor li me kir, Xwedê zane ka niha çi bi wan hatiye. Her kes di cihê xwe de li benda derketina rojê bû.

Selah li Ruknedîn bû, bi teqînê re şiyar bûbû li balkonê li derdor dinêrî. Dûman bi ser Şamê ketibû. Malên partiyê, Apo, dibistan her tişt dihat bîrê lê dikir-nedikir ji nava hev dernedixist. Li jêrê jî dengê qelebalixê dihat. Çavê wî bi çend welatparêzan ket. Bilez daket cem wan. Rewşa wan bala wî kişand, her kes bi cilên şevê ve kitibû ser riyan:

-Hûn çi dikin li vir?

Hin dayîk jî pîxwas di kuçeyan de sekinîbûn. Dayê Nûfa jî pîxwas di nava wan de bû. Rûyê wê weke zerdeliyê zer bûbû, bi tepan li çokên xwe dixist:

-Ez dibêjim ev dibistana me bû, emê bi serokê xwe ve biçin!

Selah bêdeng bû, di dilê xwe de got, Xwedê bisitirîne, gelek heval ji çiya jî hatine!

Çend kesên din bi hev re diaxîn:

-Ev li hemberî Serokatiya me ye. Emê biçin dibistanê.

Selah xwest wan bisekinîne, lê ew bixwe jî ketibû fikaran, bi wan re ket serê rê. Gihîştin ser riya giştî, lê diviya bêxeber jî neçin:

-Em biçin malekê, ezê bi telefonê ji hevalan bipirsim.

Lê ma qîma kê dihat. Lê dîsa xwest wan bide sekinandin:

-Em biçin, ezê telefonê vekim. Soz, eger tiştek hebe emê hemû dakevin ser riyan. Lê Xwedê neke.

Çûn ber deriyê mala welatparêzekî li ser devê riya wan. Piştî çen deqîqeyan Selah derket:

-Tiştek nîne. Ez axivîm, hevalan got tiştek nebûye.

Lê dîsa ti kesî xwe ji cihê xwe nedilivand. Dayê Nûfa dengê xwe bilind kir:

-Em venagerin malê. Te jî dît, Şam hejiyaye. Emê li vir bin heta agahiyekê ji Serok bixwe bigirin.

Hineke din xwe nêzî Selah kir, li nava çavên wî nêrî:

-Hûn nizanin ka Serok ji bo gelan çi ye, lê em baş dizanin...

***

Heftê Gulanê bû, ji kelecan û fikaran şeveke bêdawî bi ser milîtanan re derbas bûbû. Çawa ku wê nebe sibe, wisa bûbû. Lê qanûnûn xwazayê nedihatin guhertin, rojê serê xwe hildabû. Her ku ronahiyê dida der, baştir derdora xwe didîtin. Darên spîndar yên li derdora dibistanê gelek ji wan şkestibûn. Piştî şeveke reş û bêş rojeke bêdeng dest pê kirbû. Bayê li darên mayîn li ser piyan dixist. Hêzên dewletê gav bi gav her der kontrol dikirin. Derdora dibistanê jî girtibûn. Hin ji wan jî ketibûn hundir li derdor dinêrîn. Ew bixwe jî şaş mabûn. Teqîneke wisa ji bo wan

xerîb bû.  Milîtanan jî li derdor dinêrî. Felekê di tariya şevê de qad kiribû çembera xwe. Hê jî derdor dişewîtî. Milîtanan bi derfetên xwe yên kêm vedimirandin. Mala teqîn li pêşiyê çêbûyî, parçeyên cenazeyên xwe kom dikirin. Gelek kes bi hawara wan ve hatibûn. Dengê şîna şevê sekinîbû. Jixwe hêz bi ti kesî re nemabû ku bide ber qîran.

Agir bi Apo re bi telefonê diaxivî, tişta dizanî jê re radigihand. Piştî telefonê derket derve.  Milîtan hemû li dorê kom bûn, li benda axaftina wî bûn. Serê xwe hinekî hejand:

-Ev plan ne ya Tirkan tenê ye. Bûyereke navnevteweyî xuya dike. Bawer kiribûn ku Serok li vir e û plana wan bi ser ketiye.

Hinekî meşiya dîsa sekinî:

-Zanine ku êvarê Serok li vir e. Dibe ku seyareyên me ji hev bin, nizanîbin ka Serokatî ji vir derketiye yan na. Ev teqîn ji nişka ve çênebûye, ji zû ve amadekariya wê hatiye kirin. Planeke berfireh e.

Berê xwe da rêveberiya dibistanê:

-Bila heval hemû dest bi komkirina vir bikin. Em di nava têkoşîneke giran de ne, divê em her tim ji rewşên wiha re amade bin. Lê divê em bibin xwediyê sekneke hêjayî berxwedana şehîdên xwe.

Ji destpêka avabûna tevgerê heta wê rojê, gelek rojên zor û zehmet dîtibûn û dizanî ku wê ev jî derbas bibe. Çû hundirê dibistanê, wêneyên şehîdan yên li erdê kom kirin. Dengê çend milîtanên li pişta dîwêr dihatiyê: "Ev der çû, Serokatî êdî nayê vir”.

Şîlan û Jîn li cem hev bûn. Jîn di cihê xwe de nedisekinî. Hem tevdigeriya, hem şîroveyên xwe dikirin. Bikelecan diaxivî.

Ji pirsan jî pir hes dikir. Biharê desmaleke piçûk li eniya xwe girê dabû. Çawa ku karkera salan be, bêrek di destê wê de bû ber bi wan ve dihat:

-Hevala Şîlan, jixwe emê vir berdin, êdî Serokatî nayê vir, çima em paqij dikin?

Her sê bi hev re hem diaxivîn, hem kar dikirin. Piştî derdora xwe paqij kirin, ketin pirtûkxaneyê. Her pirtûkek li deverekê bû. Bayê li rûpelên wan dixist. Jînê bêhneke kûr kişand:

-Doh ez li vir bûm!

Ser destê rastê zîvirî, destê xwe da deriyê xuloxwarî:

-Doh min destê xwe avêt destiyê vî derî. Bi destavêtinê re êdî min xwe nedît. Ez firiyabûm.

Li korîdorê temaşe kirin. Dîmenên Apo, meşa wî ya li wir, xatirxwestina milîtanên biçin qadên şer, suhbet û dahûrînên wî bi milîtanan re dianîn ber çavên xwe.

Karê wan qediyabû, ber bi çadira xwe ve çûn. Bi navê çadirê tiştek nemabû, yê şewîtî şewîtîbû, yê mayî jî hemû çiriyabû. Hêza bombeyê bi qasî dengvedana xwe ya li Şamê, her tiştê dibistanê anîbû xwarê.

Agir li ber deriyê dibistanê sekinîbû, li serê wê yê firiyayî û dîwarê roxiyayî dinêrî. Milîtanan jî ji aliyekî ve tişt kom dikirin, ji aliyekî ve şîrove dikirin.

Roj bi paqijkirina derdor derbas bû. Saet ber bi dema teqîna şeva borî ve diçû. Wê saetê teqîn pirtir diket bîra wan. Xemgîniya li ser rûyê wan hê wenda nebûbû. Bawer dikirin piştî wê saetê êdî Apo nayê. Yên li hundir jî bêdengiyê dora wan pêçabû, şîrove û kelecan bi dawî bûbûn. Mirov digot qey ew der bûye kavil. Her kes li ser kêliya teqînê difikirî.

Riya dihat dibistanê tev xirab bûbû, ji ber wê Apo bi piyan ber bi dibistanê ve dihat. Hem li derdor dinêrî, hem dimeşiya. Kêliyên teqîn çêbûyî, ew jî di wan kêliyan de gihat dibistanê. Haya Agir ji hatine wî hebû, li ber derî sekinîbû. Bikelecan hev himbêz kirin.

-Ji we re derabsbûyî be.

Çend caran li ser hev dubare kir.

Di wê bêdengiyê de dengê wî gihîştibû her kesî û ji kelecana teqînê pirtir kelecan çêkiribû. Hatina wî di saeta teqînê de ji bo her kesî balkêş bû. Berî hingê milîtan bi hatina wî dihesiyan, lê vê carê qet pê nehesiyabûn, bawer jî nedikirin ku heman saetê were. Kelecaneke mezin ketibû nava milîtanan, kî rasta kê dihat, digot, Serokatî hat, Serokatî hat! Hemû yek bi yek himbêz kirin û di nîvê wan de sekinî:

-Ez vê serkeftinê li we û gelê Kurd piroz dikim. Îsal istixbaratên li dijî me li ser kar bûn. Timî li pey me bûn. Dixwestin her tiştê li dibistanê bizanin.

Agir ket navberê:

-Serokê min, Israîl gelek cîhazên denggirtinê avêtibûn van nêzîkan. Berpirsên dewletê dîtibûn, ji me re jî digotin.

Ji şeva borî ve li ser berferehiya planê û êrîşa pêk hatî dihizirî. Di hişê xwe de hemû yek bi yek li ser wan hûr bûbû:

-Bêguman têkiliya vê planê bi berxwedana PKKê û pêşketina wê ya leşkerî ve jî heye. Piştî ku dibînin pêşiya geşedanan vekirî ye, plan jî dibe navneteweyî û teknîka pêşketî jî bi kar tînin. Em dikarin nirxandineke wisa bikin.

Piştî ku qasekî suhbet kirin, ji bo razanê her kes çû cihê xwe. Apo jî wê şevê li wir ma.

Serê sibê, berî her kesî rabûbû, li derdor temaşe dikir. Piştî taştê ew û Agir li qadê hinekî meşiyan, li parçeyê mezin yê li nîvê qadê ketî temaşe kirin. Milîtan hemû li binê daran rûniştibûn li benda axaftin û nêrînên wî bûn. Piştî qasekî derbasî cihê dersê bûn. Milîtan tev di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Ji ber vê bombekirina mezin, hem dibêjim derbasbûyî be, hem we pîroz dikim. Bombekirina vê qadê ku wek Biryargeha Serokatiyê ya Giştî tê nirxandin, baş tê fêmkirin ku planeke Fermandariya Giştî ye. Her ku em agahiyan û geşedanên nû tînin cem hev, em baştir fêm dikin ku li hemberî me planeke berfereh heye.

Dixwest xeter û mezinbûna planê bi wan bide fêmkirin. Piştî dîtina cihê bûyerê jî êdî ketibû wê zanebûnê ku êrîş mezin û berfereh bûye:

-Bêguman ev ne plana dawî ye. Wê hewl bidin bi planên nû vê binketina xwe telafî bikin û dest bi pêngvên nû bikin. Jixwe em ne biyaniyên van in.

Xeterên derbas kirîn tev dianîn ber çavên xwe:

-Ji destpêka dîroka PKKê heta roja me ya îro, em bi planên berfereh yên tesfiyeyê re hatine hemberî hev. Bêguman ev plana dawî xwediya taybetiyên nû ye. Hem ji aliyê berferehiya wê, hem ji aliyê hêzên tevlî bûyîn ve, di asteke pir pêşketî de ye. Heman demê li hemberî sîstema me ya itîfaqan jî hatiye kirin.

Hinekî pêş ve çû, li rûyê milîtanan nêrî, li derdor nêrî. Çawa ku tişek nebûbe û cihê lê mayîn wê bihêztir bidomînin, diaxivî:

-Fermandariya Giştî ya Tirk planên berê bi hêza xwe dikirin û di hedefa wan de PKK û bi taybetî Serokatiya wê hebû. Lê ev plana dawî bi amadekariyeke berfereh ya itîfaqa navneteweyî

hatiye kirin û di hedefa wê de ne Serokatiya Giştî ya PKKê tenê heye, di hedefê de sîstema itîfaqê ya pêş xistî jî heye. Nûbûn di vir de ye. Weke din di teknîka bi kar anî de harbûneke sînornenas heye.

Pêşketinên kêlî bi kêlî her tim dişopandin û bi taybetî yên wan rojan hemû di hişê xwe de wate li wan bar kiribû:

-Berî çend rojan di çapemeniya Emerîka de wiha dihat gotin: "Li başûrê Lubnanê agirbest bêwate ye, bela û xeter li Şamê ne. Divê Şam hedef be." Piştî wê ev teqîn çêbû. Dixwestin bi vê teqînê çi bi dest bixin? Texmîn dikim bombe herî kêm tonek heye û ev modeleke nû ye. Dibe ku bi teknîka Emerîka hatibe amadekirin. Ji bo ku derdora xwe bişewitîne tûpên gazê jî girê dane. Wê şevê axaftineke me ya bi telefonê hebû. Bawer kirine ku ew axaftin li vir bûye û em li vir in. Lê du deriyên weke hev hene. Di wir de şaşîtiyeke teknîkî dikin. Bombeyê datînin ber devê wî derî. Bandora wê pir e. Lê ji ber ku li dûr hatiye teqandin ev der hejandine, cam hatine xwarê, jora xanî hin ketiye.

Ji cihê lê sekinî hinekî paş ve çû, berê xwe da dibstanê, li cihê roxiyayî nêrî. Careke din vegeriya, axaftina xwe domand:

-Li gorî plana wan wê piraniya hêza me ya li vir tine bibûya. Li gorî çapemeniya Tirk, serfarmandarê artêşê tê Amedê. Operasyona Dêrsimê dest pê dike, li Başûr jî operasyoneke berfereh dest pê dike. Operasyona Dêrsimê, ya Başûr û teqîna li vir 6ê Gulanê dibin. 7ê Gulanê jî li seranserê welat operasyon dest pê dikin. Berî wê bi rojekê bi Barzaniyan re hevdîtinê dikin. Ev ne tesaduf e.

Di dilê xwe de got, divê mirov li gorî niyeta xwe nêzîkî ti

bûyeran nebe, êrîşa li ser me ji her milî ve pir berfereh e. Li çavên milîtanan yên dixwestin bûyera şahidî jê re kirîn fêm bikin, dinêrî:

-Eger li vir bi ser biketan, serî biçûya, tinekirina yên din hêsan bû. Pişt re wê bi 40.000 leşkerî biçûna gundê Barzan. Li wir Mesûd yan wê teslîm bibûya, yan bihata kuştin, yan jî bireviya. Li milê din Yekîtî heye. Bi Tirkiyê re hevdîtin kiriye. Bi Emerîka re têkilî heye. Eger ev der tesfiye bibe û artêşa Tirk bikeve Başûr, Mesûd bêbandor bibe, dibe ku di serokatiya Telebanî de li hev bikin. Telebanî gelek caran xwe dixapîne, di her planê de dilîze. Lê piştî ku di xeleka sereke de bi ser neketin, wê nikaribin di xelekên din de bi ser bikevin. Artêşa Tirk li vir bin ket.

Bi gotina wî ya dawiyê re kêliyên serkeftinê yên di dilê milîtanan de xwe komî ser hev kirîn, geş dibûn. Bi hev re rabûn, li çepikan xistin. Wî bi xwe jî bi wan re coşa wan parve dikir. Di dilê xwe de got, ev serkeftina rêxistinê bû.

Civîn bi dawî bûbû, Agir derketibû derve. Apo jî li qada sporê dimeşiya. Radyoya wî di destê wî de bû, li nûçeyan guhdarî dikir. Agir bilez çû cem. Hê ne axivî Apo jê pirsî:

-Hûn hatin, çi hebû?

-Serokê min, xeber şandibûn. Gotin yên ev teqîn kirîn, hin ji wan hatine girtin. Hin ji wan jî di nava hêzên dewletê de ne. Têkiliya wan bi Tirkan re heye. Li Tirkiyê plan kirine. Di aliyê sînor re derbasî vî milî bûne, heta xwe gihandine vir.

Li ser girêdana bûyerê ya bi Tirkiyê re dihizirî. Ka çawa derbas bûne û çawa kirine hemû di hişê xwe de derbas dikir:

-Helbet di vê teqînê de peyam dane wan jî.

-Serokê min ew bixwe jî şaş mabûn, digotin, istixbarata me jî gelek bihêze çawa ev bûyer çêbûye.

Apo êdî li ser çarçoveya Tirkiyê tenê nedihizirî, her ku guhdarî dikir baştir derdixist zanebûnê ka girêdana planê çiqas û bi kû ve heye. Berê xwe da Agir:

-Ev şebekeyeke mezin e, berfereh e. Ne Tirkiye tenê ye.

-Serokê min, wan jî digot, hin generalên me jî di navê de ne. Gotin emê bi berferehî li ser rawestin. Dubare ji me re gotin, evqas hakimiyeta me heye, çawa ev teqîn çêbûye. Lê digotin, saetên çûnhatina serokê we hemû kirine binê kontrolê.

Apo hinekî sekinî:

-Ihtimal e yê ev teqîn kirî, ketibe kelecanê. Zaniye tişta dike wê dinyayê bihejîne. Xwe şaş kiriye. Di vê teqînê de serkeftin ne ya Tirkan bû. Ev teqîn teqez bi navenda çeteyan ya Tirkiyê ve girêdayî ye. Baş lêkolîn bikin. Çawa û ji kû ev qas tişt derbas kirine?

Qasekî sekinî, dîsa dest bi axafinê kir:

-Dijmin artêşa xwe derxisitiye ser sînor. Rapor tên, dibêjin, Zekî li dijî partiyê teoriya sosyalbûnê pêş dixe. Dixwaze gerîla ji şer dûr bixe. Eger ev plana teqînê bi ser biketa, wê îro êrîş bikiran û wê rol bidan hin kesên dij me. Piştî çûna Tansu û Dogan Gûreş ya Ingilistanê ev teqîn çêbû. Eger plana wan bi ser biketa, wê Tansu bibûya desthilatdar. Xeberdana Mesud Yilmaz hebû, rasterast negotibû, lê fêm dibû ku haziriyeke wiha dikin. Dema digot em naxwazin ev şer kûr bibe, weke peyamekê bû.

Agir jî xwest nêrîna xwe tevlî bike:

-Serokê min, jixwe ji gotina wan “Yan wê biqedin yan wê

biqedin" diyar dibû.

Ji wir berê xwe da odeya xwe. Rûnişt li nûçeyan guhdarî kir. Jîn wê rojê xwarinpêj bû, çay jê re anî danî ser mase. Qedeha çayê rakir firek lê da:

-Were rûne. Tu destpêka salê hatî. Tu dibînî em çawa kar dikin. Divê hûn qîmetê van derfetan baş bizanin.

Li ser kursiyê li hember rûnişt. Hinekî lê temaşe kir:

-Wê şevê ez pir tirsiyam, pir tirsiyam.

Hinekî sekinî.

-Nabe, na nabe! Serok natirse. Ez pir xemgîn bûm. Ji min re gotibûn, di binê qawîşên jinan de cebilxane heye, teqiyaye. Çawa wisa gotin, min hema destê xwe danî ser çavên xwe. Min jî destpêkê wisa texmîn dikir. Min ji xwe re got, 90 jin çûn, 90 jin çûn. Hevalên derve jî hatibûn. Hûn ser sed û deh kesî re bûn. Ez pir xemgîn bûm. Paşê min bihîst ku ne wisa ye, nû dilê min rehet bû.

***

Roja pazdehê Gulanê bû, saet heftê sibê bû. Piştî teqînê bi du rojan konferansê dîsa dest pê kiribû. Lê ew roja dawiyê bû. Bê navber li ser pirsgirkên heyî û çareseriyê nîqaş dihatin kirin. Li qada dibistanê milîtan bi kêfxweşî kom bi kom bi hev re dimeşiyan û nîqaş dikirin.

Apo û Agir, li eywana qata duduyan rûniştibûn. Apo berê xwe da Agir:

-Li ser teqîna li vir çêbûyî dikarim vê bêjim; ji bo plana pêvajoya nû, Şam hedefa bingehî hatiye diyarkirin. Bê Israîlê

lêxistina li Sûriyê ne mûmkin e. Hem ji bo sedemên siyasî, hem yên teknîkî dijberiya li hemberî Suriyê, piştgiriya Emerîka neçar dike. Ji bo desteka Emerîka jî pêwîstî bi têkiliyeke wisa heye, ku ev jî bê Israîlê nabe. Ji bo êrîşa ser vir û girtina desteka Emerîka, alîkarî ji Israîlê girtin û bi Tirkiyê re peymaneke stratejîk hat morkirin.

Rabû ser xwe di pencereyê re li milîtanan temaşe kir:

-Ev teqîna mezin ji bo me bûye dersa şiyarkirinê. Vê planê, bi vê teqînê dijmin ber bi binketineke mezin ve biriye. Di nava pêta bombeya dawî de em dikarin vê polîtîkaya dijmin ya derveyî mirovayiyê bêbandor bikin. Heman demê ev hesabxwestina herî dijwar ya dîrokê ye jî.

Vegeriya tv. vekir, bi hev re li nûçeyan guhdarî kirin.

Li qadê Şîlan di nava komek milîtan de rûniştibû, li lênûsa xwe dinêrî. Milîtanên derdorê ji xwe re suhbet dikirin. Jînê berê xwe dayê:

-Hevala Şîlan, ew çi ye tu dixwînî?

Şîlanê serê xwe ji ser lênûsê rakir:

-Ez li biryarên konfersê dinêrim.

-Ka yên te girtîn ji min re bixwîne.

-Min hin girtine. Yên min girtîn ezê ji we re bixwînim:

“-Divê dawî li şerê paşverû yê li hemberî Rêbertiyê, bê anîn û xeta partiyê bê şopandin.

-Tevgera Azadiyê ya Jinan û xebata artêşbûnê bên xurtkirin. Li gorî perspektîfên Rêbertiyê pirsgirêkên rêveberiyê bên çareserkirin û bikevin rewşeke wisa ku hêzê bidin şer. Li ser vî bingehî Konferansa Jinan ya yekê bê lidarxisin.

-Li Kurdistanê, di serî de riyên sereke, ji bo ku riyên stratejîk

tev bikevin binê kontrolê,  plan bên çêkirin.”

Hê diaxivîn Apo û Agir ji aliyê din ve hatin. Bi dîtina wan re her kes ket hundir. Piştî wan ew jî ketin hundir. Rûyê wî geş bûbû. Kêfaxweşiya xelasiya konferasnê li ser rûyê wî diyar dibû. Piştî silavdayînê dest bi axaftinê kir:

-Di asta herî jor de em di nava kûrbûneke leşkerî û siyasî de ne. Di polîtîkayê de ji bo hunerê leşkerî kûrbûneke pêşketî şert e. Texmîn dikim sedema bingehî ya kêmayiyên we, asta kûrbûna we ya kêm û bêsîstemiya we ye. Kesên ne xwediyên hêza fikir, nikarin hêza çalakiyê biafirînin. Li gorî min hûn li gorî pêwîstiyên gotinên rast najîn.

Bidawîkirina konferansê, pûçkirina koploya çêbûyî, hemû ji bo wî asta gihandin û bilindbûna rêxistinê nîşan didan. Dema li milîtanan dinêrî dixwest di her liv û tevgera xwe de kêmmayîna kesayeta wan nîşan bide:

-Ezê behsa xeyalan bikim, xeyalên we yên bi awayekî maqûl pêk werin jî nînin. Qabiliyeta nirxandina yên hazir jî nîne. Çiqas bedewiyên me hene, çiqas derfetên me hene, çiqas hedefên me yên pêk werin hene, kûrbûna li ser wan nîne. Bila yek ji we rabe bêje, ez her tim li pey fethê bûm, yan jî di fikrê min de her tim belediyan vedida, min her tim dixwest serkeftinên mezin bi dest bixim.

Dixwest vê bi wan bide fêmkirin; yan divê hûn xwe çêkin, yan çareya we nîne:

-Careke din Konferansa me ya Neteweyî ya 4. silav dikim, ji bo partiya me, eniya me û artêşa me pîroz be û hêvî dikim ku bi serkeftinan tijî derbas bibe.

Piştî şîvê bû, li qadê dîlanê dest pê kirûb. Apo jî tevlî moral

bûbû. Kêfa wî pir xweş bû. Li ser pişniyaran yek derket ser dikê. Piş şerm dikir, got, dengê min ne xweş e û nizanim tiştekî jî bêjim. Apo bala xwe dabûyê, dixwest ji wir wisa danekeve. Bi dengê bilind gazî kir:

-Pêkenokekê bêje!

Yê li ser dikê, qet bawer nedikir ku daxwaziyeke wisa jê bê kirin. Lê diviya tiştekî bêje: -- -Temam serokê min.

Piştî ku hinekî fikirî, li ser dînên Amûdê pêkenokek hat bîra wî. Pêkenokeke xweş bû, Apo bi dengekî bilind keniya:

-Yeke din bêje yeke din jî!

***

20ê Gulanê bû. Saet şeşê sibê bû. Apo li bexçeyê mala li Milîhe bû. Rahişt zadikê kevokan ber bi cihê wan ve çû. Kevok li raserî malê difiriyan. Diyar bû ku ne birçî ne. Şêxo jî bêr di dest de bû, ji aliyê coya avê ve dihat. Çav bi zadikê li erdê ket:

-Şêxo, hûn zadik pir didin kevokan û ji ber mirovan direvin. Hûn êdî nedin wan, bi hêviya min ve bihêlin. Hûn weke van kevokan insanan jî ji xwe didin revandin.

-Temam serokê min.

Ber bi cihê kêrvoşkan ve çû. Li kêlekê du kewên di rikehê de didîtin.

-Yên ji Efrînê şandîn ev ew in?

-Rast e serokê min.

Rûnişt guhdarî qebeqeba wan kir. Çawa ku lal bûbin wisa xweş dixwendin. Şêxo bêra xwe danî ser milê xwe bi aliyê coyê ve çû. Piştî ku qasekî guhdarî dengê wan kir, ber bi milê Şêxo ve

çû. Cihê Şêxo li dixebitî, tavê qet nedidayê.

-Şêxo, li vir qabaqekê biçîne.

-Qabaq çi ne serokê min?

-Ez jî wisa dizanim, bi qasî zebeşan in lê spî ne.

-Serokê min tu behsa kundiran dikî.

-Ha, erê erê.

-Serokê min li vir sih e, çênabin.

-Ka dendikên wan bide min. Tu ciyê wan bikole, ezê biçînim.

Şêxo cih vedikir, wî jî dendik datanîn. Pişt re bêr ji destê Şêxo girt, wî bixwe kola. Lê di xwêdanê de ma:

-Ti kar nemaye min nekirî. Paleyî, aşêf.

Piştî ku çend bêrên din lê dan, pişta xwe rast kir. Hinekî berken bû:

-Me her kar kiriye lê êdî nikarim bikim, niha em karê mejî dikin.

Bêr da dest Şêxo, meşiyan. Çi kulîlka diket pêşiya Şêxo guh nedidayê pê lê dikir:

-Şêxo, pê li kulîkan neke, ew jî ruh in, guneh in.

Piyê xwe rakir, li ber xwe ketibû. Li eywanê taştê hatibû amadekirin. Bêra xwe danî bi hev re çûn wir. Piştî xwarinê derket jorê. Cilên xwe li xwe kirin, careke din daket jêrê:

-Siwar, ez li benda we me dereng nemînin.

Piştî nîv saetekê Siwar û mêvanê pê re li ber derî ji seyareyê peya bûn. Zilamekî girê bilind û bizendûbend bû. Temenê wî ser pêncihî ketibû. Gumlekek û pantolonekî gewr lê bûn. Solên wî jî yên sporê bûn. Kumekî reş weke yê komando bi ser guhên xwe de berdabû. Pora wî ya spî û gustîlok nîvê guhên wî girtibû.

Rûyekî gewr û fereh li ser bû. Simbêlên wî jî tinebûn. Her çenda bi ser navê şoreşgerên Tirkan hatibû û çavên wî jî hûr bûn, lê bi ser koçberên Balkanan ve diçû. Hê ji dûr ve rûyê wî dikeniya. Pir biste bû, çawa ku biçe mala xwe wisa rehet bû. Lê ji tevgerên wî diyar dibû ku pir jî bikelecan e. Ji bo himbêzkirina Apo hê ji dûr ve her du çengên xwe weke yên teyrekî vekirin û bilez ber ve çû. Apo jî bi rûyekî xweş ber ve çû. Wî jî çengên xwe vekirin û bi germî hev himbêz kirin. Wisa destên wan di nava hev de bikelecan kêfxweşî li hev dan û pirsa hev kirin. Apo li milîtanên li derdor nêrî:

-Ev şoreşgerê kevin Mahir Sayin e. Me salên heftiyan hev nas kir, hatiye serdana me.

Destê xwe danî ser milê wî, ji bo roniştinê cihê di nava baxçe de nîşan da:

-Fermo hevrê Mahir, em biçin rûnin, niha gelek tiştên tu ji me re bêjî hene. Bi rastî em bi hatina te pir kêfxweş bûn.

-Ez jî pir kêfxweş bûm. Erê demeke pir dirêj e me hev nedîtî, lê me kêlî bi kêlî hûn dişopandin. Ji bo min mereqa herî mezin dîtina we bû. Diviya berî niha werim serdana we, lê bawer dikim hûnê li min biborin.

Bi rûniştinê re çay ji wan re hat. Ji ber ku Sayin pir li tevgerên wî temaşe dikir, çaya xwe ji bîr kiribû. Her tim serê xwe dihejand. Carna jê çavên xwe li nava baxçe digerandin:

-Hûn li kêştiya Nûh siwar bûn we xwe rizgar kir, em di nava pêlên tofanê de man. Tê bîra min, wê demê hevalên me ji Mahir Çayan re gotin, ji bo demekê em derkevin derveyî welat. Mahir got, ez nahêlim bêjin reviyan.

Apo serê xwe hejand, ew dem hatin bîrê:

-Rast e wisa got. Tê bîra min jî. Wê demê ez sempatîzanekî Mahir bûm. Ez di nava tevgera şoreşger ya Tirkiyê de bûm û sempatîzanekî baş bûm.

-Tê bîra min, wê demê li hemberî darvekirinê we li zanîngehê çalakiya boykotê kiribû.

-Rast e, boykota destpêkê me kir.

-Wê demê em di zindanê de bûn.

-Ew boykoteke dîrokî bû. Min helwesta xwe bi wê boykotê nîşan da. Hevalekî we hebû, navê wî Dogan Firtina bû. Ew hevalê min yê herî baş bû, me bi hev re ew boykot pêk anî. Piştî hingê ez hatim girtin. Heftê Nîsana 1972yan ez ketim zindanê, meha Mijdarê derketim. Ji bo avakirina komê wê zivistanê ez ketim nava têkoşîneke kûr.

-Eger ez ne şaş bim, wê demê we rêveberiya AYODê dikir.

-Rast e lê berî wê sala 74-75an di binê berpirsiyariya min de me dest bi rêxistina ADYODê kir. Pişt re Senbol hat rêxistinkirin. Hewldana min ya rêbertiyê ya destpêkê poykota li zanîngehê ya li hemberî darvekirinê bû. ADYOD jî tecrûbeya min ya rêxistinê ya destpêkê bû

-Gotineke Deniz Gezmiş tê bîra min; digot, emê lingê şeytên bişkînin. Bi rastî hevalên me lingê şeytên şkandin.

Ew roj dihatin ber çavên Apo, çawa ku di nava wan kêliyan de be:

-Bi rastî ji bo azadiya gelan, di şkandina lingê şeytên de gaveke girîng avêt. Û ez piçûk nabînim, gotinên Deniz li ber darê sêdarê gotîn, (Bijî biratiya gelan, bijî biratiya Kurd û Tirkan) ji bo me her dem ferman in. Deniz mirovekî egîd bû û pir zana bû. Gotina Mahir ya gotî, derbarê pirsgirêka Kurd de,

min xwe ji kemalîzmê rizgar kiriye, gaveke pir mezin e. Îbrahîm Kaypakkaya jî ku mijara neteweyî bi wêrekî vekir, gaveke girîng e.

Sayin serê xwe hejnad û xemgîn bû:

-Lê zû çûn.

-Min li Enqere çawa helwesta xwe diyar kir? Mahir helwesta xwe diyar kir, piştî çend rojan li Kizildere şehîd bû?

-Deh rojan dewam kir.

-Deniz derket, çend rojan dewam kir?

-Wî hinekî pirtir dewam kir.

-Mehek-du meh neçûn

-Rast e.

Ew demên behsa wan dikirin, kêlî bi kêlî dianîn bîra xwe:

-Ji zanîngehê veqetiya, li Gemerekê hat girtin.

-Piştî çend rojan.

-Rast e, pir kurt e. Kaypakkaya jî wisa ye. Ew jî derket, lê pir zû hat girtin. Yên wan derfetên wan jî hebûn. Baş e, ez çawa derketim. Ez dixwazim tu li ser vê pir bisekinî. Li vir mesele ne çîrok e, rêbazeke polîtîk heye.

-Ez jî wisa dihizirim.

-Yekî Dev YOLê hebû. Henekên xwe bi me dikirin; digot, ev Apoyî ji kû derketin.

-Ez ne şaş bim, sala 1981ê gelek rêxistin li van deran bûn. Nedixwestin we bibînin. Ez şaş im gelo?

-Tu rast dibêjî. Helbiku min ji bo perwerdeya wan jî cih vekir. Xwarin, parastin ji me dîsa li xwe nedigirtin.

Sayin ew dem û xetera li Tirkiyê hemû dianîn bîra xwe:

-Berî tu derkevî derve, tehlûke pir nêzîkî te bûbû.

-Rast e. Diviya tedbîrekê bistînim. Min du tedbîr girtin; ya yekê pêşxistina gerîla li Siwêrekê. Ya duduyan min ji Mehmet Sait (Ethem Akçam) re got, biçe li ser sînor lêkolînê bike. Berî derbasbûna min bi hefteyekê bû.

Sayin not di lênûsa xwe de digirtin, derketina Apo ji bo wî tişta herî balkêş bû:

-Wê demê li vî milî ti têkilî jî nînin.

-Ji binî nînin.

-Wisa bê kes te rast lê da tu derbas bûyî?

Berken bû, rojên ser sînor dihatin ber çavên wî:

-Min navê xwe kiribû Elî. Weke ciwanekî bêtecrûbe bûm, kê ez didîtim dixwest min bixapîne. Hina digot, bazirganekî xeşîm e, pereyên wî hene, em çend çekan bidinê bixapînin. Min got yekî çepgir ji min re bînin. Yek wisa anîn.

Sayin dixwest serhatiya wî ya derbasbûnê gav bi gav bizane:

-Li kû, li Helebê?

-Na, li Qamişlo. Min jê re got, nasnameyekê ji min re peyda bike. Nasnameyeke ku min bigihîne Lubnanê. Wî jî bi riya nûnerê Yekîtiyê nasnameyek ji min re peyda kir. Sûriye nasnameyê didiyê. Bêguman nizanin ku ez ez im. Eger ez nas bikiram, ez sax nedihiştim.

-Te xwe avêtiya tehlûkeyeke mezin.

-Derketina min hem ji Enqere, hem ji Amedê, hem ji Kurdistanê salek jî lê neçû. Havîna 78an ji Enqere hatim, bihara (2'ye Tîrmehê havîn e) 79an derketim. Li derdora şeş mehan.

Piştî suhebteke dirêj, ji bo amadekariya roportajê Sayin derbasî eywanê bû, wî jî berê xwe da nava daran. Rojên li

Enqere, têkiliya bi çepên Tirkan re, zindan û darvekirina Deniz Gezmiş û hevalên wî, yek bi yek di ber çavên xwe re derbas kirin. Rihan û Şêxo ketin ber çavên wî, kulîlik diçandin. Çû cem wan, li tovê wan nêrî:

-Ezê vê kulîlka qedifê ya zer biçînim.

Wî jî ya xwe kir qotiyekê ax da dora wê. Li saeta xwe nêrî.

-Dema sporê ye. Rihan bangî hevalan bike emê bi topê bilîzin.

Ew jî çû cilên xwe yên sporê li xwe kirin, daket. Her du taxim çêkirin. Di her du taximan de jî jin hebûn. Şêxo jî qelevanê taxima wî bû. Rewşa Kemal bala wî dikişand, şerm dikir topê ji jinan bistîne. Xwe nêzîk kir:

-Tu nêzîk dibî lê tu encamê nagirî. Divê hûn li gorî qanûna wê bilîzin. Asta nelîstina we bi asta tevlîbûna we ve girêdayî ye.

Her ku top diçû taxima wî gol dixwarin. Her du destên xwe kirin teniştên xwe, li Şêxo nêrî:

-Ji bo nebe gol ez di nava xwêdanê de mame, tu jî deriyê qelayê ji wan re vedikî. Ew bûn hivdeh, em hê deh in.

Şêxo, ji hal ketibû:

-Serokê min, ez nikarim xwe bitewînim, topê bigirim.

-Tiştek nabe, emê rojeke din ji wan bibin.

Piştî şîvê ew û Sayin heta yekê şevê şiyar man. Nîqaş dikirin. Carna jê telefon dihatin bersiva wan dida.

***

Saet şeşê sibê Apo rabû cilên xwe li xwe kirin. Diyar bû ku xwe ji bo derketina derve amade dike, lê hê ti kesî nizaniya ka

riya wî ber bi kû ve ye. Piştî taştê ew û Sayin li seyareyê siwar bûn berê xwe dan dibistana Şeba. Çavên Sayin di rê de li derdoran bûn. Carna jê awirên çavên wî diketin ser Apo. Dixwest bizane ka guherîneke çawa pê re çûbûye. Ji ber ku li fêmkirinê digeriya, tiştek lê xerîb nedihat. Lê bi dîtina Apo gelek bikelecan bûbû. Tevî ku ew çend roj bûn li cem jî, lê çawa ku kêliya destpêkê hev bibînin, jê re wisa dihat. Behsa dema ciwantiya xwe dikirin. Geh li ser siyasetê diaxivîn, geh suhbet dikirin, dikeniyan. Gihîştin ber deriyê dibistanê ketin hewşê. Sayin li her dera dibistanê temaşe dikir. Çadireke di hewşê de hatî vedan li ber çavên wî ket. Apo lê vegeriya:

-Ew qawîşa milîtanan e. Milîtan li kû be milîtan e. Ji zorê tiştên mezin çêdikin.

Ber bi odeya mêvanan ve çûn. Siwar û Rihan jî ketin pey wan. Derbasî hundir bûn. Ji bo ku bixin piyên xwe, Rihanê bilez rahişt du dest şimik. Hê ew li korîdorê bû, Apo gihîşt wir. Şimik ji dest girtin; yên xwe kirin piyên xwe, yên mêvan jî jê re birin. Mêvan jî weke wî rehet bû, bi xwe çû pêşiyê ji dest girtin. Ew û mêvanê xwe li kêleka hev rûniştin. Li Rihan û Siwar meyze kir:

-Emê dirêj biaxivin, bila heval tev amade bin, em tên.

Siwar û Rîhan derketin. Dibistan hatibû paqijkirin, lê hê milîtan neketibûn hundir. Li qadê kom bi kom, dimeşiyan. Erkdarê rojê li nêzî odeya Apo sekinîbû, li benda agahiyê bû ku derbasî hundir bibin. Bi hatina Siwar û Rihanê re, her kesî zanî ku ders heye. Di wê navê re Apo û mêvanê xwe ber bi dibistanê ve hatin. Li tenişta hev dimşiyan. Apo behsa nîzama dibistanê jê re dikir. Piştî ku hinekî li nava baxçe geriyan berê xwe dan deriyê dibistanê. Milîtan tev amade bûn. Piştî silavdayînê Apo

mêvan da naskirin:

-Mêvanê me, hevriyê me Mahir Sayin e. Şoreşgerekî kevin e. Ji Enqere ve em hev nas dikin. Salên tevgerên şoreşgeran bûn. Bi hatina wî em pir kêfxweş bûn. Ew jî dixwaze me bi gelê Tirk bide naskirin. Wê pirsên wî ji me hebin, wê pirsên me jî jê hebin.

Mahir Sayin berken bû:

-Rast e em hevriyên hev yên kevin in, lê dîsa em dixwazin we nas bikin. Apo kî ye?

Ji bo tomarkirina deng, du cîhaz li ser mase hatibûn danîn.

-Ev pirs pir tê kirin. Ez kî me, ez çi me? Ez nabim qiral. Qiraltî li aliyekî, gelo, ez dixwazim bibim çi? Ti kes li ser vê disekine? Jixwe ti kes Kurdan nake qiral. Hêza Kurdan ya qiraltiyê nîne. Lewre ew hêz jê hatiye standin.

Sayin pirsên xwe pir bikelecan jê dipirsîn:

-Em li ser bisekinin, ev xaleke girîng e?

-Divê hûn vê jî lêkolîn bikin. Tişta balkêş, ti kes naxwaze min nas bike. Çi kesê tê cem min ka xwe dixapîne, yan min dixapîne ne diyar e.

-Lê niha li Tirkiyê çepgir tev ne weke hev in?

-Divê çepgir xwe di ber çavan re derbas bikin. Şaşiyên wan hene, krîza rêbertiyê kûr bûye. Şaşiyên wan di warê rêxistin, çalakî û îdeolojîk de ne. Heta di asta jiyanê de ne. Çiqas xwe ji sîstemê qut kirin? Li gorî Sosyalîzmê çiqas xwe perwerde kirin?

Hinekî li Sayin nêrî. Çawa ku pirs jê hatibe kirin. Lê Apo axaftina xwe domand:

-Ev şerê tê kirin ne şerê rizgariya Kurdan tenê ye. Roja Kurd rizgar bibin, wê Tirk jî rizgar bibin. Şerê rizgariya

neteweyî yê Kurdan, şerê rizgariya neteweyî yê Tirkan e.

-Bi we çepgirên Tirkan dikarin çi bikin?

-Dikarin bibin alîkar. Derkevin Derya Reş, derkevin Torosan. Li şûna hûn biçin Zapata biçin Zapê. Desthilatdar polîtîkayê dikin. Bi rengê şerê taybet dikin. Felaket di vir de ye.

-Ji ber wê xebata ji bo aştiyê jî zor e. Ez bawer dikim hûn jî vê qebûl dikin?

-Şer aştiyê geş dike, pêşiya wê vedike. Lê aştiyeke çawa? Şer neçar dike ku aştiyeke adil, ji wekhevî û azadiya gelan re vekirî, pêk were. Ser bîst milyonî re Kurd hene, piştgiriya wan li parçeyên din heye. Tev dibêjin aştî. Li gorî anketan, li Tirkiyê ser pêncihî re alîgirên aştiyê ne. Daxwaziya aştiyê her ku diçe xurttir dibe. Ti kes nikare pêşiyê bigire. Lê ji tirsa dewletê, ti kes xwe nade ber rêbertiya wê.

-Şer û aştî bi hev ve hatine girêdan?

-Rast e. Weke goşt û hestî bi hev ve girêdayî ne. Eger komanda aştiyê di destê me de be, wê ev pirsgirêk bi giranî çareser bibe. Derkevin, bêjin em aştiyê dixwazin.

Sayin xwest behsa zor û zehmetiyan bike:

-Yên dibêjin hene. Em dibêjin şer li hemberî me dozê vedikin, em dibêjin aştî dîsa dozê vedikin.

Ji vê pirsê rengê rûyê Apo hinekî guherî:

-Divê ewqas jî cesareta we hebe. Ji bo aştiyê eger pêwîst be, serên xwe bixin binê çengên xwe. Lê qet nebe hinge şer ne bixeter e. Heta bila ti têkiliya we bi PKKê re tinebe. Heta bêjin em li dijî şerê dewletê ne jî û li dijî şerê PKKê ne jî. Bi taybetî divê ev daxwazî ji rojavayê Tirkiyê were. Divê ji gelê Tirkiyê were. Divê durişma aştiyê di destê siyasetvanên gel de weke

çekekê be.

Sayin bi wateya erê serê xwe hejand:

-Hêzên aştiyê dixwazin, divê tev di binê sêwanekê de bigihin hev?

-Rast e rêxistineke sêwanî. Bi sedean rêxistin dikarin di binê wê de kom bibin. Li hemberî şerê taybet ev pêwîst e. Gel vê dixwaze. Aştî di hemen demê de şerê nan e, azadî ye, xurtbûna polîtîk e û peydakirina Kar e! Bidestxistina nirxên manewî û çandî ye! Heta aştî ji bo bazirganan bazar e. Bazara Kurdistanê ye.

Di vê mijarê de çawa ku hin gumanên Sayin hebin:

-Eger sêwaneke wisa çêbe hûnê di kû dera wê de cihê xwe bigirin?

-Yek ji endamên vê rêxistina sêwanî jî bila ez bim. Bila ji sed kesî yek jê ez bim. Wê not û neh kes bikarin bi kesekî kar bidin kirin. Ez amade me li gorî fermanên vê rêxistinê tevbigerim.

Rûyê Sayin hinekî geş bûbû:

-Ango hûn ji gelek rengên itîfaqan re amade ne. Em wisa fêm bikin?

-Bêguman, ez dibêjim bila tev hebin. Pêwîstiya mentiqê vî karî divê wisa be.

-Tu dibêjî teng difikirin?

-Ez jî berê teng difikirîm. Lê tecrûbeyê nîşanî min da. Berê bi serê min nediket ku ez fereh bifikirim. Lê ji Emerîka bigire heta bi serfarmandariyê ku pêwîst be, ez dikarim bi hemûyan re bikevim têkiliyê. Heta bi MÎTê re. Lê nayên xwezî bihatan!

Milîtanên li wir çawa ku di meclisekê de bin, bi wan re

suhbet bê kirin wisa bûbûn. Dem derbas dibû, lê pê nedihesiyan. Sayin dixwest pirsên ji bo paşroja wî bike.

-Xetayê te wê neyê efûkirin. Xetayê tu bikî wê bi hezaran, bi dehhezaran bedelê wê bidin.

Qermîçek ketin eniya Apo:

-Ez li vir te rexne dikirm, ev nirxandineke feodalî ye. Ez jî insan im, ne mûmkin e ku xetayên min yên neyên efûkirin hebin.

Sayin fêm kir ku şaş pirsiye:

-Min ne ji bo xwe got. Di çavê insanan de, tu nûnertiya bi dehhezaran dikî. Her xetayê tu bikî wê bikeve binê mîkroskopê. Lê dixwazim pirseke din bikim. Li milekî hûn girîngiyê didin pêşketina demokrasiyê, li milê din tu rêberê tevgerekê bî jî, girêdana bi kesekî ve ne xeter e? Ku wiha dewam bike, wê îradeya hevbeş çawa derkeve? Tuyê jî çawa nebî weke Mao, Stalin, Kim Il Sung? Yan jî tiştek bi we were wê çawa be?

Apo çend kêliyan hizirî. Wî bi xwe jî bi hezarê caran heman pir ji xwe kiribû:

-Ji bo ku çareyek ji vê trajediyê re bê dîtin, lêgerîn heye. Ev girêdan lazim e, lê dema wextê wê were divê biroxe. Ez bawer dikim min pêşiya xeterê girtiye. Ez bi xwe ve girê didim, girê didim, girê didim. Dibêje, baş e ma em hîç in, em ne tiştek in, wê tişteke me tinebe? Ez jî dibêjim, bila hebe, lê divê pêşî bê girêdan. Pêwîst e despêkê bên xurtkirin. Piştî hingê bila îradeya şexsî derkeve. Abdullah Ocalan ne ew tenê ye, yekkesbûn li ti deveran ne mûmkin e.

Heta êvarê roportajê dwam kir. Navber hatibû dayîn. Sayîn ketibû nava qada dibistanê, bi milîtanan re suhbet dikir. Carna di

dilê xwe de xweziya xwe dianî ku wan dianî. Lê hê jî pirsa “Apo kî ye” ji xwe dikir.

***

Bêrek di destê Apo de bû li nava baxçe qirşikên nava coya avê derdixistin. Di ber re jî li herikîna avê temaşe dikir. Bêr di tenişta coyê de çikand, berê xwe da darên qeysî û xoxan. Li bedewiya wan nêrî. Ji wir ber bi hewzê avê ve meşiya. Li ber sekinî, li neynika ser avê temaşe kir. Asîmanê şîn tê de xuya dikir. Li ser kursiyê li pişta mase rûnişt. Li ser mase pênûs, lênûs û komek rapor hebûn. Raporek vekir dest bi xwendina wê kir. Şêxo jî avdan dikir, xwêdan bi ser eniya wî ketibû. Bêra xwe danî, bilez çû metbexê û du qedeh çay anîn. Yek danî ser mase, ya din jî di destê xwe de girt:

-Serokê min, pêwîstiyeke we ya din heye?

-Rûne em bi hev re vexwin.

Kêfa wî hatibû, ew jî rûnişt. Piştî xwendina raporê serê xwe rakir:

-Rexneyên hevalan li ser te hene.

Şêxo di cihê xwe de cemidî. Diyar bû ku kêfa wî ji rexneyan re nayê. Di dilê xwe de got, gelo min çi kiriye? Bi dengekî lerzonek bersiv da:

-Serokê min, rexneyên hevalan çi bin ezê li ser bisekinim.

-Dibêjin, dost bin, Berzanî bin diçe her malê.

-Rast e serokê min. Ez diçim. Cîranên me ne, xizmên me ne.

Apo lê temaşe kir, keniya:

-Xebera te ye, biçe cem dostên xwe. Biçin cem yên cuda difikirin, fikrê me ji wan re bêjin.  Cihê tu biçiyê bêje wan bila xiyanetê nekin bes e, tiştek ji destê wan neyê bila dua bikin.

Piçekî ruh pê de hatibû. Apo rabû ser xwe tîşortê xwe danî xwe avêt hewzê avê. Bala Şêxo li ser melevaniya wî bû, weke masiyekî xwe di binê avê re dikir, di aliyê din re derdiket. Piştî ji melevaniyê têr bû, derket tîşortê xwe li xwe kir:

-Hê heval nehatine?

-Na serokê min hê nehatine.

-Hûnê îro çi xwarinê çêkin?

-Serokê min, hevalan digot emê masiyan çêkin.

-Hevalên me ciwan in, nizanin xwarinên kurdî çêkin, nizanin xwarinên dayîka min çêkin. Bila dayîkek bê çêke.

-Serokê min xwarinên kurdî pir in, bila çi çêke?

-Mehîr, serûpî, savar, eprax, kutilk, ez ji xwarinên kurdî hes dikim.

-Temam serokê min.

Kemal û Bihar di seyareyê de bûn diçûn malê. Pistepista Biharê bala Kemal dikişand. Di neynikê re lê nêrî:

-Hevala Bihar tu jî weke pîrika min ji xwe re diaxivî, yan tu bi cinên xwe re diaxivî?

-Erê, yê tekmîlê dide ne tu yî, ji ber wê tu rehet î.

-Berî hefteyekê tu li cem Serokatiyê bûyî, qey di xebatê de pirsgirêk derketine?

Bihar di hundirê xwe de ji gotina wî aciz bûbû, lê bêdeng ma. Ji xwe re got, heta kengê wê xort wiha nêzîkî me bibin. Ma hê baweriya wan bi me nayê? Di wê navê re seyare ket hewşê.

Kemal bersiva xwe hiştibû wê kêliyê:

-Êê, rêveberiya qadeke weke Şamê ne hêsan e.

Bihêrs bersiva wî da:

-Hêsan be, ne hêsan be, bihêle ez wê bêjim!

Apo di pencereyê re li wan dinêrî. Ji tevgerên Biharê fêm kir ku di navbera wan de nîqaşeke ne xweş derbas dibe. Daket ber bi hewşê ve çû. Li rûyê wan yê tirş temaşe kir:

-Kemal tê bîra te, berî demekê em bi hev re li Helebê çûn malekê. Gelek qîmet dan me. Nizaniyan ka me daynin kû. Hûn qîmetê me jî nizanin yê hev jî nizanin.

Her du jî li ber xwe ketibûn, lê dengê xwe nekirin. Destê xwe danî ser milê Kemal ber bi nava hewşê ve çûn:

-Bernameya we ya îro çi ye?

-Serokê min, ji bo çareserkirina wî xaniyê berpirsê dewletê kirî pirsgirêk, emê bi Axê re biçin.

Li nava çavê wî nêrî:

-Nîqaşa di navbera we de çawa derket?

Kemal ne li benda wê pirsê bû, ziravê wî qetiya:

-Serokê min, hevalên jin pir hesas in. Mirov nikare pirsekê ji wan bike. Min got berpirsiyariya qadekê ne hêsan e, ji wê hêrs bû, got, hêsan be, ne hêsan be, bihêle ez wê bêjim!

-Tu hê nikarî du hevalan îdare bikî. Ez evqas insan îdare dikim. Divê tu wisa nêzîk nebî. Weke kesek azad nêz bibe û nîqaş bike. Bixwîne, xwe amade bike. Dev ji uslûb û kesayeta kevin berdin. Bersiva te jî rast daye, ew di binê venêrîna min de kar dikin, hûn jî wisa ne. Eger zor be wê ji min re bêjin.

Ber bi Biharê ve çû.

-Bihar tu û hevalên jin yên li vir bi Kemal re nîqaş bikin.

Berê jî min ji we re gotibû, heskirina min pêkanîna min e. Pîvanên min ne şexsî ne. Divê heskirina min jî ne şexsî û hestiyarî be. Ez bi we re jiyaneke nû plan dikim, divê hûn jî li gorî wê xwe perwerde bikin. Ji uslûb heta estetîkê, ji xîtabê heta zanebûnê, divê weke insanên azad hûn bi hev re nîqaş bikin û nêrînên hev bigirin.

Hinekî pêş ve çû:

-Were em rûnin. Tu fêrî wan deran bûyî?

Li ser kursiyên li nava daran rûniştin. Li aliyê din, du kîs di destê Şêxo de bûn, li cem Kemal sekinî. Kemal kûr kûr difikirî. Şêxo li rûyê wî nêrî:

-Heywax, heywax, hevalê Kemal, mirov dibêje qey keriyên pezê te wenda bûne.

-Min îro kêmayiyeke mezin kir.

-Tiştek nabe, kêmayî nebin pêşketin jî çênabe.

Apo hê agahî ji Biharê digirtin:

-Ev demek e tu derbasî xebatê bûyî, çawa diçe, heval çawa nêzîk dibin?

-Serokê min, eşkere tiştekî nabêjin, lê bi nêzîkbûna xwe didin diyarkirin. Destpêkê gotin pişta xwe bide me, emê kar bimeşînin.

Bi wê gotina wê keniya:

-Te ji wan re bigota, jixwe ev pênc hezar sal in, em pişta xwe didin we.

-Serokê min, agahiyên xebatê hemûyan nadin min. Ez berpirsiyar im, lê dema tiştekî dikin nabêjin. Bi tevgerên xwe dibêjin xwe bispêre me.

Serê xwe hejand:

-Tuyê jî bi pratîka xwe bêjî, me pênc hezar salan pişta xwe da we, piştî niha hûnê pişta xwe bidin me. Tuyê xebata xwe bidî meşandin, tuyê gilî û gazindan nekî. Ji dema tu çûyî ve tu weke gulekê vebûyî. Ez dixwazim jineke pirsgirêkan çareser bike bixuliqînim.

Dema xwarinê bû, bi hev re çûn eywanê. Piştî xwarinê gazî Kemal kir:

-Biçe Emer û wan dostên me bîne vir.

Kemal derket, wî jî rahişt qedeheke çayê li ber tv. rûnişt. Piştî nûçeyan derbasî pirtûkxaneyê bû. Piştî saetekê Şêxo li derî xist ket hundir:

-Serokê min, Kemal û mêvan hatin.

Kemal û Emer li eywanê bi hev re diaxivîn, lê çavên Emer li derî bûn. Bihar û du mêvanên din jî li aliyekî rûniştibûn. Yek bitemen bû; bedlekî qehweyî û gumlekekî spî lê bûn, yê ciwan jî bejneke zirav, rûyekî gewr û poreke reş li ser bûn. Pentolonekî şîn û gumlekekî şînê vekirî lê bûn. Rengê rewşenbîran dabû xwe. Çend gotinên kurdî yên dizanîn ji Biharê re digotin. Bihar ji cihê xwe rabû çû cem Kemal, devê xwe bir ber guhê wî:

-Mêvan hinekî kurdî fêm dikin, lê baş nizanin. Yê gumlekşîn bawer dikim navê wî Erefat e, lê navê yê din nizanim.

Deng çûbû Emer:

-Hevala Bihar yê bibedil her kes jê re dibêje Axa.

Biharê berê xwe da aliyê din. Destê xwe danî ser devê xwe, berken bû. Her sê çûn li kêleka wan rûniştin. Axa qereweta xwe hinekî rast kir. Bê ku bide ferqkirin, hundirê malê tev di ber çavê xwe re derbas dikir. Li ala PKK'ê ya bi dîwêr ve dinêrî. Çend

tayên pora xwe bi milekî ve biribûn:

-Hevalê Emer, çima al hat guhertin? Ma dibe al bê guhertin? Al gelek girîng in!

Emer li alê nêrî. Rojên destpêkê anîn bîra xwe. Di hundirê xwe de got, tu nizanî ev al çawa û bi çi awayî gihîştiye vê pêvajoyê:

-Al sembola Bolşevîkan bû. Meşele ne sembola karkeran tenê ye. Agir ronahî ye, ronahî jî ya her kesî ye.

Bi ketina Apo ya hundir re, Emer rabû ber ve çû, hev himbêz kirin. Pişt re bi rûyekî geş bixêrhatin da mêvanên xwe yên din. Çend kêliyan wisa li ser piyan kêfxweşî li hev dan.

Erefat kêfxweşiya xwe bi tevgerên xwe dida diyarkirin. Çavên wî yên kêfxwşiyê jî li ser Apo bûn:

-Ji bo me şerefeke mezin e, em we bibînin û bi we re rûnin.

Apo bi jêr û jorê ve serê xwe hajand:

-Me civînek li mala we çêkir. Rewşa bavê te çawa ye, baş e?

-Bavê min baş e, dibêje, min gelek kes peyda kirine Serok wan bibîne.

-Silavê min jî lê bike, teqez ezê werim wan bibînim. Baweriya min bi welatparêziya Kurdên Şamê tê. Rewşenbîrên wan jî gelek in. Dewlet jî weke Kurdên li bajarên din, bi ser wan de naçe.

Axa jî dixwest biaxive, qirika xwe paqij kir:

-Em Kurdên Şamê cara yekê bi PKK'ê re ketin nava têkiliyên germ. Berî niha partiyên kurdî li vir gelek bûn, lê danêstandina me zêde bi hev re tinebû. Derveyî çend malbatên tên naskirin nediçûn cem ti kesî.

Kurdên dema Selahedînê Eyûbî hatin bîra Apo:

-Li dinyayê peytexta yekê ya ji her milî ve mirov lê kom dibûn, Şam e. Ev der navenda Emewiyan bû, ji vir dinya kirin binê destê xwe.

Kêfa Axa ji axaftina li ser Şamê re dihat. Gotinên Apo bala wî dikişandin:

- Gelê Şamê destpêkê li aliyê çiya dima. Fransa destpêka sedsala bîstan Sûriye parçe kir. Bi pêşengiya Nasiriyan tevgera li hemberî Fransa ji çiyayên Lazqiyê dest pê kir.

Vê carê Emer ket navberê:

-Destpêkê xwestin yekîtiya Sûriye û Misrê bê çêkirin. Sala 1961ê bi tevgera Baasê yekîtî hat avakirin. Wê demê Hafiz Esed di hêzên parastinê de cih digirt, birayê wî Rifet Esed berpirsê hêza istixbaratê bû.

Piştî axaftina Emer man li benda Apo:

-Di aliyê şaristaniyê de bi rengînbûna gelan hatiye naskirin. Gelek împeretorî lê ava bûne. Di serdema navî de Împeretoriya Roma û Bizansî lê serdest in. Piştî fetha Şamê dibe navenda şaristaniya dewleta Emewiyan û wek welatê herî mezin yê Islamê xwe radigihîne. Heta Piştî Mîladê sedsala 11'an, parçeyek ji Împeretoriya Selcoqî bû. Ber bi dema Ebasiyan ve heta dema Osmaniyan û şerê cîhanê yê yekê, gelek mîrtî û dewletok lê hebûn.

Berê xwe da Erefat:

-Pişt re çi dibe?

-Piştî şerê cîhanê sala 1920an dikeve destê Fransa û sala 1946'an jî serxwebûna xwe radigihîne.

Di wê navê re qehwe hat ser mase. Yek bi yek fincana qehweyê danî ber mêvanên xwe:

-Divê hûn Kurdên Şamê tevan bikin dost û di navbera me û Ereban de bibin pir. Di navbera me û rêbertiya dewletê de jî. Ev rol dikeve ser milê we. Danûstandinên we bi gelê vir re xurt in.

Erefat ket navberê:

-Serokê min, digel ku bi sedê salan e em ji welat dûr ketine, gelek Kurdên Şamê dixwazin tevlî civîn û şahiyên we bibin. Her malbat bi herêma jê hatî û êla xwe tê naskirin. Yên hûn nedîtîn dixwazin we bibînin. Moralê hûn didin me gelek binirx e. Ji bo me şansekî mezin ku me hûn dîtine.

Bi baldarî guhdarî dikir:

-Ya girîng hestên we yên welatparêziyê ne. Ji bo Kurdistanê em dikarin ji vir xwe bigihînin her dera cîhanê.

Berê xwe vegerand ser Emer:

-Cara yekê dema ez hatîm Şamê, em bi sê dostên Filistînî re rûniştin. Navê min Elî bû. Em li ser derengmayîna rizgariya Filistînê bi wan re gelek axivîn. Tişteke me tinebû. Alîkariya me kirin, xaniyek dan me.

Her ku behsa dema destpêka hatinê dikir, Ethem diket bîra Emer:

-Serokê min, hevalê Ethem heval dianîn cem min.

-Emer baş dizane, em ji Kobanê dihatin. Du mehan em li Kobanê mabûn. Li Helebê jî em man. Tê bîra te ne Emer?

-Serokê min, min hevalê Ethem li Surucê dîtibû. Wê demê ji min re got, Partiya Karkerên Kurdistanê ava bûye.

Hê mijara alê di quncika dilê Axa de mabû:

-We ala xwe guhertiye. Min ji hevalan re jî got, al girîng in, divê neyên guhertin.

Apo li ala li hember temaşe kir:

-Hûn çima evqas girîngiyê didin meseleya sembolan? Li ser alê zêde nîqaş dikin, em dikarin biguherînin, nexşeya Kurdistanê jî wisa ye. Mijara me ya nîqaşê ne ew e ku em bêjin, ev gundê me ye, ev gundê Ereban e. Ev ji bo me ne girîng in. Ev sembol in, ji bo me ya girîng cewher e.

Di wê navê re berê wî ket ser Kemal:

-We çi kir, erkdarên dewletê çima ew xanî kirin pirsgirêk?

-Serokê min, em û Axa bi hev re çûn, gotin ew cih ne guncaw e. Di nava hefteyekê de emê yekî din hazir bikin.

Piştî suhbeteke dirêj, Axa û Erefat derketin, Emer li wir ma. Apo xwest li ser Kurdên Rojava pê re biaxive:

-Em dixwazin ji bo Kurdên vir jî rêxistineke siyasî ava bikin. Ji bo Rojava rêxistineke wisa pêwîst e. Em bi partiyên vir re jî rûniştin. Axa jî dixwaze kar bike:

-Serokê min, Axa kesekî dewlemed e. Bi çavê axatiyê li xwe dinêre, lê tevlî xebata me jî dibe.

-Wê bikare karekî wisa bike?

-Serokê min, ez nabêjim xirab e, lê dewlemend li gorî berjewendiyên xwe tevdigerin. Lê dikare bi me re bimeşe.

-Xwe pir nêzîkî me dike, dibêje ez dixwazim kar bikim.

-Serokê min, dikare li Şamê tiştna bike, lê ji bo Rojava tevê nikare.

-Te ev rast got, ev fikrekî baş e. Gelo xwe zêde mezin dike?

-Serokê min, weke din ji ber xwe tiştan dertîne. Wisa dizane ku gel ji bo wî li dorê kom dibe.

-Emê bi hev re civînekê çêkin. Bila dostên me yên kevin amade bibin. Emê nêrînên wan jî bigirin.

Bi ser vê suhbetê re du roj derbas bûbûn. Li ofîsa Axa nêzî

çil kesî rûniştibûn. Apo li ser partiya Rojava nêrînên wan digirtin:

-Em dixwazin di çarçoveya qanûnî de, ji bo mafên Kurdên Rojava partiyeke siyasî ava bikin. Partiya bê avakirin, divê ne weke partiyên li Rojava be. Berî her tişîtî divê xwe bispêre gel. Em dixwazin her tişt bi nêrîna gel çêbe. Mafê xwe bixwazin. Em dizanin dewlet van qebûl nake, lê emê bikin. Weke din hûn rêbaza xebata me dizanin. Partiya bê avakirin, eger nekeve xizmeta gel, wê demê biryar ya we ye, hûn dizanin çi bikin. Gelê me ti carî xiyanetê qebûl nake. Piştî îro emê tev bikevin nava xebatekek wisa. Hedefa me ku gelê me yê Rojava bikare bi awayekî baş xwe temsîl bike û mafê wan yê rêxistinê hebe...

***

Apo li qada dibistanê li benda Kemal bû. Sayin jî bi milîtanên kevin re ketibû suhbetê. Komek milîtan li dorê kom bûbû. Kêfa wî ji dîmenê li dibistanê re pir hatibû: "Ez jî bi hesreta rojeke wiha bûm; bikevim nava jin û mêrên şoreşger û li ser şoreşê em biaxivin." Dema diaxivî çawa ku di destpêka ciwantiya xwe de be, ewqas ji diyaloga bi milîtan re zewq digirt. Xweziya xwe bi wan dianî. Carna ji wan re digot, me derfetên heyîn bi kar neanîn, qet nebe hûn xwe sist nekin.

Kemal bilez ket qadê. Apo ji leza wî fêm kir ku tiştek heye:

-Ha, telefon heye, li welat çi hebû?

-Serokê min, ji welat heval dixwazin bi we re biaxivin. Tekmîla dayîn, me nivîskî danî pirtûkxaneyê.

Hinekî sekinî:

-Serokê min, telefoneke din jî hebû, lê ji bîra min çû.

-Ji Ewropa, yan ji Sûriyê bû?

-Serokê min, hat bîra min ji Libiya bû.

Xwe hêrs kir:

-Ez pirtûkan di mejiyê xwe de amade dikim, hûn telefonekê ji bîr dikin.

Notya berê amade kirî dayê, çû cem mêvan. Li hewşa dibistanê torek avêtin, pişt re ketin hundir. Ji cihê mayîn wê roportajê dest pê bikira. Her tişt amade bû û milîtan jî tev li cihên xwe rûniştibûn. Sayin pirsên xwe di ber çavên xwe re derbas dikirin:

-Dixwazim pirseke wiha jî bikim. Wextekî ji bo kuştina we ajan şandibûn vir. Pir nêzîkî we bûbûn?

-Nêzîk bûbûn. Min texmîn dikir ku dewletê li girtîgehê hin kirine ajan, bawer dikirin ku wê li derve jî bi ser bikevin. Şener jî yek ji wan bû. Ji Şener re wiha gotibûn: “Tuyê biçî xwe pir baş bixî çavên Apo û rolê kesê duyemîn bilîzî.” Şener ev pir baş dikir. Ez eşkere bêjim. Min ji bo Kemal got, ev biqabiliyet e, wê pêş bikeve, yek jê min ji bo Şener got, eger ev çawa xuya dike wisa be, wê hin tiştên serkeftî bike.

-Baweriya te pê hatibû?

-Rast e, bawerî dabû min. Min salekê li cem xwe hişt. Xwe wisa dida xuyakirin ku qabiliyeta wî pir heye. Lê her ku diçû fikarên min jî çêdibûn.

-Eger ne şaş bim, hewldaneke wan çêbû.

-Ne yek tenê, gelek hewldanên wan çêbûn.

-Ango ji bo kuştina we hatibûn?

-Wê demê gotineke Ozal hebû: “Em gazî Apo bikin bila

were.” Şener sê caran xwest tiştna bêje. Min jê re got, netirse bêje. Ez texmîn dikim tişta bigota lihevkirina bi Ozal re bû. Wê demê plana valakirina zindanan hebû.

-Ango wê ev pêşniyar bikira? “Were em biçin Enqere.”

-“Em di hundir de li heva hatine, PKK dikare serbest siyasetê bike.”

-Ango xwe bêçek bikin werin. Şertê wan ev bû?

-Ev siyaseta Ozal bû. Dogu Perinçek jî wê demê hatibû, digot, em PKKê bikin rêxistineke qanûnî.

-Perinçek jî bi wî erkî hatibû cem we?

-Erkê wî qanûnîkirina PKKê bû. Ev li gorî meyla Ozal bû jî.

-Dixwestin we bikujin, yan rêxistinê bixin binê kontrola xwe?

-Jixwe rêxistin xistibûn destê xwe. Piştî bidestxistina rêxistinê, mirin, yan jî mana min ji bo wan ewqas ne girîng bû.

-Qabiliyeta Şener wisa hebû?

-Rêbaza Şener ya bidestxistna rêxistinê pir girîng e. Weke cinan bû. Di serî de jin, ji sedî notê kampê bi xwe ve girê dabû. Gotibû, ez xelîfeyê Mezlum im.

-Ewqas bi ser ketibû?

-Kamp girê dabû. Ji bo têkiliya Kurdên Başûr çû. Li wir jî wisa bi ser ketibû. Lê muhtacê tiştekî bû. Diviya hêza xwe ji min bigire. Hê ez ji bo wî pir lazim bûm.

-Pişt re çi dike?

-Pişt re dora kongreya 4an e. Divê kongreyê jî bixe destê xwe.

-Di wir de jî bi ser dikeve?

-Hema hema bi dest xistibû. Ez bi talîmatan tevlî bûm. Min

gotibû bila haya we ji Şener û malbata wî hebe.

-Baş e çawa derket meydanê?

-Jinek bi riya qasidekî peyamekê jê re dişîne. Dema qasid di avê re derbas dibe ew not dikeve. Hevalên me dibînin. Not ji min re anîn. Tê de dinivîsî, “Ajanên Apo min dişopînin, min ji vir derîne.” Wê demê her tişt diyar bû.

-Wê jinikê ji kû peyam şandibû?

-Ji vir şandibû. Pişt re ma hin agahiyên din jî girtin. Kuştina min jî di nava planê de hebû. Jinik dibêje, ez bi demanceyê, yan bi jehrê bikujim? Di kongreyê de ev tev derdikevin meydanê. Di wê pêvajoyê de ew not dikeve dest.

-Kîjan dîrokê ev dibe?

-Serê sala 90î. Em neçar bûn tedbîrê bigirin. Rêxistin ji wê belayê rizgar bû.

-Wisa xuya dike tişta dixwazin di kongreyê de bi dest naxin.

-Jixwe hat girtin. Derket holê ku rêxistineke bidizî ye. Piştî hingê reviya. Çû cem PDKê.

***

Li ser xwesteka Mêvanê xwe, roja din ji bo serdanê çûn dibisatana kurdî. Li wir jî Sayin bi merasimekê hat pêşwazîkirin. Pêşwaziya bi merasim pir bandor lê kiribû. Destpêkê hinekî li derdora dibistanê geriyan. Çav bi milîtanên birîndar ket, nexwest bê suhbet ji wan bibore. Yek bi yek pirsa rewşa wan û şerê tevlî bûyîn ji wan dikir.

Apo jî radyoya wî di dest de bû, guhdarî nûçeyan dikir. Nobedar li dora dibistanê belav bûbûn. Sîpan jî li nêzî odeya lê

dima sekinîbû, bala wî li tevgerên Apo bû. Carna jê li pencereya odeyê dinêrî. Bala xwe da mêvan. Rojên li akademiyê mayî anîn bîra xwe. Di dilê xwe de got, li wir jî mêvanên Serok kêm nedibûn. Ji bo ku li ber çavê Apo bikeve ber bi pêş ve diçû. Nava xwe kişand: "Ax, ax, ez hinekî din jî mezin bibim, ezê biçim welat." Careke din li pencereya odeyê meyze kir. Li pisîka xwe ya ji derve bi dizî anî, nêrî. Apo ber ve diçû. Ji xwe re got, Xwedê bike Serok neyê pisîka min nebîne. Lê tişta jê ditirsiya wê bihata serê wî. Apo derê odeyê vekir ket hundir. Yên di odeyê de bilez li dorê kom bûn. Ji nişka ve pisîk ket nava wan. Kutekut bi ser dilê Sîpan ket. Ji tevan pisîk çû xwe bi lingê Apo xwerand. Kêfa wî pir jê re hat. Rahiştiyê pişta wê ferikand. Kêfa wê jî ji antêna radyoyê re hatibû pepilê xwe diavêtiyê. Fêm kir ku Sîpan aniye:

-Sîpan tu baş xwedî dikî?

-Rast e serokê min.

Hineke din kêfa xwe jê re anî, derket. Çawa ku nû dîtibin, vê carê hemû li pisîkê kom bûn. Hê çend kêlî derbas nebûyîn Siwar ket hundir:

-Sîpan Serokatî dibêje bila psîkê bîne cem kevokan.

Sîpan wisa fêm kir ku wê pisîkê derînin. Pisîka xwe ya sor û spî da ber singa xwe bilez derket.

Li cem kevokan bîdoneke şîn li cem Apo bû. Sîpan fêm kir ku mişk ketiye huudirê wê.

-Sîpan, pisîka xwe bîne bixe hundirê vê bîdonê.

Sîpan dixebitî ji dûvê wê ve bixe hundir. Qixevix pê ketibû, dikirin nedikirin nediket hundir.

-Sîpan, wisa nabe. Pisîk wisa mişk nabîne, serê wê bike

bîdon.

Piştî ku wisa kirin û çav bi mişk ket, bikel xwe avêtiyê. Bi qirika wî girt derxist derve. Danî erdê, bi pepilê xwe pê lîst. Carna jê mişk xwe vedişart, Apo nîşanî piskîkê dikir. Sîpan dikeniya, filîmê Tom û Cerî hat ber çavên wî. Kêfa Apo jî ji kêfxweşiya Sîpan re hatibû:

-Tu dibînî Sîpan, pisîk mişkê li ber xwe nagire. Hevalên me jî dijminê li ber çavên xwe nagirin.

Sîpan xwest alîkariya pisîkê bike, mişk bikuje. Apo nehişt:

-Wisa neke. Dengeya xwezayê xirab neke, wan neguherîne, lê fêm bike.

Piştî ku pisîk têr pê lîst da ber didanên xwe yên tûj.

-Binêre, dijmin jî hevalên me wiha digire, işkence dike, paşê şehîd dixe.

Li saeta xwe nêrî. Sayin jî ber wan ve dihat. Êdî dema çûnê bû, bi hev re ketin dibistanê. Weke her roj dîsa ew û mêvanê xwe li hemberî hev rûniştin. Sayin derê cîhazê xwe vekir:

-Dixwazim pirseke wiha bikim. Gelo tiştеke wiha nîne; neteweya Tirk dixwaze Kurdan biperçiqîne, lê neteweyên serî li vê rêbazê didin, ew bixwe tên perçiqandin?

-Bêguman. Dewleta Tirk bi vê rejimê gelê xwe perîşan kir. Sirf ji bo yekbûna neteweya Tirk, bi siyaseta li ser Kurdan, wisa li Tirkan kirine ku neyên naskirin.

-Pirsgirêka Kurd pirsgirêkeke ewqas giran e.

-Pirsgirêka Kurd di rastiyê de pirsgirêka herî giran, herî kûr ya Rojhilata Navî ye. Di heman demê de çareseriya li Kurdistanê çareseriya li Rojhilata Navî ya herî zengîn e.

-Ez dixwazim vegerim ser têkiliya Tirk û Kurdan ya

destpêkê. Di dema Bîzansiyan de, Tirkan alîkariya gelên bindest kiriye?

-Bêguman, lewre ji destê Bîsansiyan pir kişandine. Ew hezar sal in Bîsansî împeretoriyeke nîvkoledar, nîvfeodal e. Begên Tirkan dibin xwîneke nû.

-Em hinekî behsa Mustafa Kemal bikin. Bi qasî dizanim dibêje, emê xelîfe, yan jî sultan rizgar bikin?

-Bêguman behsa rizgariya wan dike. Bi wê derdikeve ser rê. Weke din ti armancên wî nînin. Lê piştî ku dibîne ev ne mûmkin e, riya xwe diguherîne. Netewetiya Tirk jî li cem nîne. Berî 1920an, li ser netewetiya Tirk yek nivîsa wî nîne. Li ser civakîbûnê qet nîne.

-Piştî 1925-26an tê bîra wan?

-Nutuq heye. Nutuq ne tiştek e, xwe naspêre îdeolojiyekê. Wan salan dîrokê dixwîne û tiştên beredayî dibêje. Dibêje, dîrok tev ji Anadolu derketiye, ew jî ji Tirkan derketiye.

-Pişt re behsa şoreşan dike. Şoreşa şewqeyê, şoreşa pantolon...

-Şoreşa Şewqeyê, şoreşa pantolon, şoreşa ereqê, şoreşa serxweşiyê... Her roj şoreşekê dike. Têkiliya van bi şoreşê re nîne. Tiştên mirov kenê xwe pê bike, ji wan re gotine şoreş. Rejima wan bixwe dijminê şoreşê ye.

-Mijareke din. Destpêkê dema hûn hatîn vir, rêxistinên Kurdan yên din jî hebûn?

-Pir bihêz bûn.

-Min pirsa wan ji hevalên we kir

-Yek tenê jî nîne. Rêxistin jî nema. Halbiku ji me bihêztir bûn. Xwediyên her têkiliyê bûn, ya min cihê razana min tinebû.

-Ez vê pirsê jî bikim. Hûn otorîte, girêdan û heskirinê çawa ji hev cuda dikin?

-Stalîn jî di navê de, kesayetên polîtîk yên bibandor yên dinyayê tevê hezar lewaziyên wan hene. Hemûyan bi otorîteyê dinuxumînin. Heta xedar dibin. Diviya sosyalîstek ne wisa be. Ez ji girêdan û heskirina bi otorîteyê nefret dikim. Girêdan jî ne ku min bike pot. Cihê binketin û zor lê hebe heskirin namîne. Binketin dijminê heskirinê ye.

-Ma jixwe têgeha heskirinê nayê wateya ku xwe ji van tevan paqij kiribe?

-Bêguman. Li gorî min heskirin, li cihê serdestî, zordestî, mêtîngerî û bêedaletî tinebe, weke çîçekekê ye.

-Pirseke wiha jî tê kirin; gelo li hemberî Tirkiyê kî PKKê bi kar tîne?

-Erê. Gelo benê wan di destê kê de ye? Ez bêjim; eger parçebûnek çêbe, wê di rûyê kesên nasnameyên gelan qebûl nakin de çêbe. Iraq ber bi federasyonê ve diçe. Ji ber wê siyaseta xwe dispêre inkara Kurdan qediyaye.

-Axaftina we ya Tirkî pir baş e?

-Rast e. Kadroyên me Kurdên heyî jî dikin Tirk. Kurdên Tirkî nizanin jî di nava PKKê de xwe fêr dikin. Kurdên Başûr jî nîvbinîv Tirkî dizanin.

-Ez li vir rasta tiştekî balkêş hatim. Min ferq nekir ku ne ji Tirkiyê ne?

-Kurdên Başûr yên tevlî şerê li Bakur bûyîn tev fêrî Tirkî bûne. Kurdên Rojhilat jî zimanê Farisî û Azerî dizanin. Ev ne tişteke wisa ye ku mirov bi tevayî neyînî binirxîne.

-Tam tersê wê, Kurd dibin pira navbera gelan?

-Divê em vê wek qezencekê binirxînin. Ez şoreşa Kurd bi zimanê Tirkî dikim. Bi riya Erebî emê Ereban ber bi demokrasiyê ve bibin. Bi Farisî emê Îraneke mezin pêş bixin. Bi zimanê Azerî emê ber bi Tirkê li Asya Navî ve gavan biavêjin.

-Ji bo sînoran tu çi dibêjî?

-Piştî me derxist holê ku ti wateya sînoran nîne, xem nake bila xetek hebe. Dibêjin, ev bi serxwebûnê re nabe nakokî. Na, nabe nakokî.

-Li ser tikiliya we ya bi Sûriyê re hûn çi dibêjin? Dibêjin, Sûriye PKKê bi kar tîne?

Bi vê pirsê re berken bû, di hundirê xwe de got, hêza wan nîne ku min bikar bînin:

-Bi gelek dewletan re jixwe yekser, yan jî ne yekser ez di nava têkiliyan de me. Xwezî bixebitiyan ku min bi kar bînin. Lê nakin. Lewre vê dizanin. Apo ango azadiya Kurdistanê, ango federasyon.

-Ji bo reqabeta di Sosyalîzmê de hûn çi dibêjin?

-Baweriya min bi vê tê; divê reqabet, azadiya fikir û rêxistinê ji ya kapîtalîzmê xurttir be. Ji ber wê dibêjim, israra di Sosyalîzmê de israra di mirovbûnê de ye.

-Pirseke min li ser Yekîtiya Sovyetan, Çîn û welatên Rojava heye?

-Ez ne heskiriyekî Emerîka me. Li hemberî sîstema wê têkoşînê jî dikim, lê dixwazim behsa vî aliyê wê bikim. Sîstema lipaşketî, miliyetgeriya teng ya Çîn û Rûsya bû. Ya li pêş nêrîna Emerîka ya fereh bû. Di demokrasiyê de jî di hin aliyan de Emerîka li pêşiya wan bû. Ji ber wê Emerîka li ser piyan ma, xurt bû. Eger tu mirovan bênefes bihêlî wê wisa bibe.

-Hûn dixwazin bi Tirkiyê re têkiliyê daynin?

-Digel her tiştî em li têkiliyan digerin. Lê ew dibêjin, teqez divê hûn tine bibin. Teqez divê hûn teslîm bibin. Niha ez dewletekê jî ava bikim. Ez ji te xurttir bim û bikarim te tine jî bikim, ezê bêjim, were em li hev bikin. Lê wê bêje na. Vê carê wê ew bixwaze tine bibe.

-Fikrê Hîtler e. Wî jî heman tişt digot. Digot, ev qada jiyanê ya me ye. Dema dît Rûs ji wan xurttir derketin, xwe kuşt.

-Fikrê xwespartina tinebûnê ye: “Yan ezê te tine bikim, yan tuyê min tine bikî.” Rêbaza faşîzmê ye. Hevriyê me Mahir, hûn dibînin em ji bo we Tirkan xirab nafirkirin.

-Bi rastî fikrên xweş in. Baş e, li ser otorîteya partiyê hûn çi dibêjin? Kontrola gel ne şert e?

-Kontrola gel xebata herî bingehî ye. Ev bi hêza gel dibe. Tuyê gel mezin bikî, partiyê piçûk bikî. Wê gel xwe ser partiyê re bibîne. Li Rûsya ev nebû, partî her tişt bû, gel ne tiştek bû.

-Ango partî amûrekî di xizmeta gel de ye?

-Rast e. Divê em bi çavekî demî li dewlet û partiyê binêrin.

Navber dabûn roprtajê, li hewşê digeriyan. Memed ji wir ve dihat, Apo gazî kirê:

-Pêwîstiyeke we heye, raporeke te ya din ji min re hat. Tu dixwazî biçî welat. Li vir tu min dibînî, em bi hev re xebatê dikin. Ev xebateke mezin e. Li gorî wê nêz bibe. Zarokên te tevlî dibin, ev tiştekî mezin e.

Piştî çûna Memed, Sayin serê xwe hejand:

-Ez hê dihizirim, hûn bi gelê xwe ve pir girêdayî ne.

-Yê serokekî dike serok girêdana wî ya bi gel ve ye.

***

Apo mêvanê xwe biribû qata dehan, wê rojê li wir bûn. Li derve li derdora avayiyê pelên daran rengereng bûbûn. Meha Gulanê bedewiya erd û asîmanan xweş li hev anîbû. Ewrên li dora rojê weke gemiyên ji bayê diçûn, dihatin. Wê rojê bayekî xweş dihat. Pencereya eywanê vekirî bû, hûrikên tozê diketin hundir. Sayin li balkonê li derdor dinêrî. Hinekî ma derbasî eywanê bû. Li her tevgera milîtanên jin temaşe dikir. Pirsên xwe jî hazir kiribûn. Carna di dilê xwe de digot, jixwe tişta tê dîtin bersiva pirsên mirov dide. Bi milîtanên jin re dest suhbetê kir. Apo hê li pirtûkxaneyê rapor dixwendin. Piştî qasekî ew jî hat li cem wan rûnişt. Yek bi yek pirsa pirtûkên dixwînin kir. Herî dawî berê xwe da ya porkin û bejinzirav:

-Divê tu xîtaba xwe gelek xurt bikî û bikarî xîtabê civakî bikî.

Ji wir rabû ber bi bi aliyê metbexê ve çû. Bi hûrgulî li pergala malê temaşe kir. Yek bi yek li hudirê odeyan nêrî. Li pirtûkên li ser mase temaşe kir. Bangî Şîlanê kir. Ew demek bû ji qadên şer hatibû, li ser xebata dibistanan disekinî. Jineke kina esmer bû. Çavên wê qehweyî pora wê jî di navbera qehweyî û kej de bû. Keziyên wê honandî bûn. Jineke jixwebawer û aram bû. Çawa ku bi salan rêbertiya civakê kiribe, wisa bi rehetî diaxivî.

-Şîlan, ez dibînim hin cihên belav di malê de hene. Jineke bi serê xwe be jî divê jiyana wê biserûber be û avajiya mirov bi jiyana wê were. Divê hûn rengê xwe bidin jiyanê. Jiyaneke ne ziwa. Weke şitla rihanê divê hûn şîn bibin.

Yên din jî tevan lê guhdarî dikir:

-Hûn weke kulîlkên naylon in û ziwa mane. Divê îradeya we di destê we de be û hev his bikin.

Berê xwe da Sayin:

-Tu min dibînî, ez bi van re di nava têkoşînê de me.

-Di nava pirsên min de jî ev mijar cihekî girîng digire. Her kes vê pirsê dike, li ser navê raya giştî ez jî dixwazim bikim. Dibêjin çima di nava PKKê de jin û mêr nazewicin. Baş e tu diwazî rahib û rahîbeyan çêkî?

-Na. Ne rahib û rahîbe, ne jî weke jin û mêrên niha.

-Di nava têkiliyên leşkerî de zewac, avakirina malê tiştên wisa ne mûmkin in. Ez vê qebûl dikim. Li serê wan çiyayan, zewac zehmet e, lê weke din çima nabe?

-Dema Napolyon di nava cihan de ferman didan, Josephine jî di berê wî de bû. Eger em vê di nava partiya xwe de bikin, wê artêş biroxe. Napolyon Ewropa, Asya Afrîka fetih kirin, li cem me wê di rojekê de her tişt belav bibe.

-Bi dehê salan e jin û mêr bi hev re li serê çiyan in. Têkiliyên xwe vedişêrin, yan bi awayekî platonîk e? Yan dibêjin, li vir nabe, direvin diçin?

-Mijarên wisa di spartgehan de çêbûn, idam çêbûn, qehremanî çêbûn, her tişt heye.

-Baş e, ev ne mûmkin e? Bê ku bireve, bê ku malê dayne, li ser karê xwe ji hev hes bikin. Têkiliyeke wisa ne mûmkin e?

Apo berê xwe da milîtanên jin yên li cem wan rûniştî:

-Ez ji keçan re jî ji xortan re jî dibêjim: Eger ez di çarçoveyeke rast de têkiliya we bibînim ji her kesî pirtir ezê li çepikan bixim. Ez ji merkeza me re vê dibêjim; hevalno, ez

pêwîstiya we ya bi hev baş dizanim. Etruş heye. Biçin li wir cihekî ji xwe re bigirin, ezê bibim alîkar. Îro cenazeyê birêz Zeki Mûren dispêrin axê. Ez li ser kesayeta vî mirovî sekinîm. Hinekî li gorî teoriya min e. Li hemberî civaka klasîk û hişmendiya mirmalbatê şoreş kir. Huner jî baş çêdike. Li hemberî hişmendiya mêrê Tirk xwe pir nêzîkî jinê kir. Zekî bûyerke civakî û siyasî ye.

Sayin dixwest bi awayekî vekirî pirsa xwe dubare bike:

-Ezê dîsa bipirsim. Hûn li dijî zewacê ne?

-Çi pêşkêşiya di mala taybet de, çi pêşkêşiya di mala giştî de be, di navbera wan de zêde ferq nîne. Li mala taybet her roj xwe pêşkêşî yekî dike, li mala giştî xwe pêşkêşî deh kesî dike.

-We gotineke wiha got, “Kuştina Mêr.” Ez difikirm navê pirtûkê jî bikim ew.

Apo hinekî sekinî, rûyê wî xweş bû:

-Navekî pir xweş e.

-Ez dibêjim em dikarin bûyera şoreşê tevê li dora vê gotinê formûle bikin.

-Ya rast prensîba Sosyalîzmê ya bingehî kuştina desthilatdariyê ye. Kuştina desthilatdariya yekalî û bêedaletiyê ye. Kuştina bêtehemuliyê ye. Heta kuştina faşîzmê û dîktatoriyê ye.

-Li welatên Rojava, dema dibin çil salî, hema hema tev hev berdidin?

-Ev pirsgirêkeke pir giran e. Dema pêş wê girantir jî bibe. Li Rûsya jî niha xirabûneke mezin heye. Wisa xuya dike ev pirsgirêk hatiye nixumandin. Çawa ku mirovê sosyalîst çênebûye, ji wê pirtir jina sosyalîst jî çênebûye. Navê jinê heye,

lê ew bixwe nîne.

Roportaj bi dawî bûbû. Hê li cem hev rûniştibûn, suhbet dikirin. Kêfa Sayin gelek xweş bûbû.

Tv. vekirin, li dîmenê merasima Zekî Mûren temaşe kirin...

***

Meha Hezîranê bû. Heyva berketê bû. Germeke pir dijwar hebû. Pêlên germê bi ser erdê diketin. Apo li eywanê rûniştibû. Ji germa rabû ser xwe, hinekî meşiya. Teqereqa firaxan ji metebexê hat. Ber bi wir ve çû. Firax ji destê Axînê ketibûn. Li ber derî lê dinêrî, li erdê rûniştibû, bilez kom dikirin, datanîn ser mase. Çawa çav pê ket di cihê xwe de sekinî, hinekî şerm kir.

-Wisa stûyê xwe xwar neke û weke belengazan nesekine.

-Temam serokê min.

-Tuyê îro çi çêkî?

-Serokê min, ezê tirşikê çêkim.

-Binêre, di serî de tuyê pîvazan biqelînî, rûn evqas bes e. Savarekê jî çêke. Tu dikarî, seleteyekê jî çêkî. Goşt çêneke. Ya herî girîng jî hay ji paqijiyê hebe.

Çû ber dolabê, aveke sar vexwar. Rahişt leymûnekê kir qet, xwar. Berê xwe da pirtûkxaneyê. Ji refan pirtûkek derxist, lê ji germa piştî qasekî danî ser mase. Li saeta xwe nêrî, dema çûna dibistanê bû. Ew û Kemal derketin. Piştî çar saetan vegeriyan malê. Şîlan, ew demek bû piştî vegera ji welat, hatibû qatê dehan û pir bikelecan bû. Bi dengê derî re rabû ser xwe derî vekir:

-Tu bi xêr hatî serokê min.

-Spas, tu çawa yî, tu hatî vir ne, baş e emê bi hev re bin û

dirêj nîqaş bikin. Agir hatiye?

-Na serokê min, hê nehatiye.

Derbasî odeya xwe bû, goreyên xwe ji piyên xwe derxistin. Çavên wî ji bêxewiyê sor û melûl bûbûn. Bi zorê bihna xwe dikişand. Rabû ser xwe li ber neynikê sekinî. Çawa ku barê dinyayê tev li ser milê wî be, xwe wisa di binê berpirsiyariyeke giran de hest dikir. Di dilê xwe de got, rojê bi hezaran kes tevlî têkoşînê dibin, divê em dest bi çerxeke nû bikin. Qasekî li wêneyên bi dîwarê odeyê ve temaşe kir. Mendîla xwe derxist, xwêdana xwe paqij kir. Çû hemamê piyên xwe dan ber avê. Piştî ku hinekî xwe honik kir, derbasî eywanê bû. Di wê navê re Agir ket hûndir. Silav da li ser kursiyê li hember rûnişt:

-Agir, niha em li çiyayekî Kurdistanê bûna...

-Serokê min, hin çiya hene ew jî germ in.

-Ya girîng mirov li cihekî bilind bûya, li welatê xwe bûya. Wê dîsa ji vir xweştir bûya. Niha dema paleyiyê ye, min jî li gund di van deman de paleyî dikir. Pala xwe da kursî, hinekî sekinî:

-We çi kir, ders gihîşt kû?

-Serokê min, emê îşev li ser kongreya pêncan rawestin, sibê jî li ser hişmendiya li hemberî pêngavên rêxistinê yên di kongreyê de derketîn.

-Heval çawa nêzîk dibin?

-Serokê min, ji dîroka PKKê pir hes dikin, lê nizanin weke gumlekekî ji agir e.

-Min çend caran ji te pirsiye tu çiqas PKKê nas dikî, te gotiye pir hindik. Ango nizanin PKK deryayeke ji bedewî, hevaltî û fedekariya milîtanên me yên destpêkê ye.

Televizyonê nûçe didan, lê deng hatibû kêmkirin. Li ser ekranan dîmenê Mesut Yilmaz xuya kir:

-Min doh di rojnameyê de xwend. Mesut Yilmaz dibêje, Apo li pêşiya reformên Kurd asteng e, divê ev asteng rabe.

-Serokê min dijmin jî kêmayiyên di nava me de dizane. Dibêje, ev kar karê Rêbertiyê ye. Eger ev Rêbertî ji holê bê rakirin, yên din hêsan in. Hesabê xwe tevî li gorî wê dikin.

-Rast e, ji bilî min dijmin şans nade ti kesî ji we.

-Serokê min, nedayîna şans li aliyekî, li pêşiya xwe me asteng jî nabîne.

-Rast e. Nabêje, wê fermandarek derkeve li hemberî me li ber xwe bide. Heta naxwaze hebûna we jî hesab bike.

-Hesab bike jî astengeke wisa girîng nabînin.

-Bawer dikin ku wê bi hêsanî biperçiqînin.

-Jixwe tişta hêzê dide dijmin jî ev e. Sedema ku evqas bi ser Rêbertiyê de tên ev e.

Rabû ser xwe ber bi pencereyê ve çû. Bi rabûna wî re Agir jî rabû ser xwe.

-Yê dest bi vê xebatê kirî ez bûm, yê temam bike jî ez im.

Li wêneyê Xeyrî û Kemal yên bi dêwar ve nêrî:

-Wan ez kêliyekê jî bernedam.

Dema diaxivî, ji bilî dengê wî Agir guhên xwe ji her tiştî re digirtin. Berê xwe ji ser wêneyan bir ser Agir, çawa ku bêje divê hûn jî weke wan bin:

-Gewdeyê rêxistinê mezin bûye, lê serê wê piçûk maye. Ti kes ji we tiştekî nake, ez û gel emê vê şoreşê bi rê ve bibin.

Li gula li kêleka xwe nêrî, destê xwe bi ser ve bir anî. Mendîleke kaxiz derxist, pelçimên wê paqij kirin:

-Herî zêde heval li ser çi nîqaş dikin, di dersa dîroka partiyê de?

-Serokê min, gelek ji wan guhdarî dikin dixwazin fêm bikin.

-Hedefa me ji kongreyê pêşketina tektîkê bû. Meyê ev pêngav li Başûrê Kurdistanê pêş bixista. Wê dijmin bihata ser riya çareseriyê. Ji bo rêvebirina pêngavê pêwîstî bi hişmendiyeke nû heye. Em ji salên 1990î ve li hemberî nexweşiya desthilatiya zû têdikoşîn. Otorîteya demokratîk ji bo me êdî şert e.

-Serokê min, desthilatiya pêş dikeve, xwe dispêre Sosyalîzma Pêkhatî.

-Ev hemû ji kesayeta Kurd ya ji aliyê dijmin ve hatî perçiqandin tê. Derfetên partiyê ji bo şexsê xwe bi kar tînin. Li Zapê ev pêş ketiye. Derketina ji rê heye.

Di wê navê re Şîlan ket hudir, notên di destê xwe de dan destê wî.

-Werin, tev werin rûnin, em nîqaş dikin. Ev pirsgirêkên me hemûyan in.

Yên li wir tev hatin. Çavên xwe li Axîn gerandin:

-Gazî Axîn jî bikin, bila ji metbexê derkeve. Ev pênc hezar sal in jin di metbexê de ye, divê niha li her qadê be.

Bi dengê wî re Axîn bilez hat rûnişt.

-Ev dîroka me ye, divê her kes xwe tê de bibîne. Ev ne partiya min e. Her yek ji we parçeyek ji rêxisitnê ye. Ji kêmayiyan netirsin, ji dubarekirina wan bitirsin. Me xwest di kongreya pêncan de vê mijarê pêş bixin. Eger rexne û rexnedan pêş biketan, wê taktîkên şer jî pêş biketan. Hin fermandarên bêwijdan hebûn. Ewqas tiştên xirab kiribûn, biryara idamê ji

wan re hatibû xwestin, lê me qebûl nekir. Yek jê birayê min Ferhad bû. Bi xeta rêxistinê lîstibû. Xeteke lîberal pêş xistibû û kadroyên xwe jî hazir kiribûn. Bi Başûr re têkiliyên wî hebûn. Li dijî Serokatiyê sekinîbû. Xiyanet kiribû û teslîmî Îranê bûbû.

Çavên xwe vegerandin ser Agir:

-Di kongreya pêncan de, yên cezayê idamê heq kirîn, li dijî Serokatiyê itîfaq kirin. Cezayê idamê girtin, lê me qebûl nekir. Hişmendiya Serokatiyê ya avakirin û pêşvebirinê ye, ne ya tinekirinê ye.

Dema nûçeyan bû, bi radyoyê ve mijûl bû, lê xişexiş dikir:

-Axîn ka vê antênê bi cihekî bilind ve bike.

Axîn derket ser qenepe antên bi jorê ve bilind kir. Dengê radyoyê êdî xweş dihat. Lê nêrî ka antên bi kû ve kiriye:

-Bisekine li wir be, wisa bisekine.

Berê yên li eywanê li Axînê bû. Destê wê li hewa mabû, antên di dest de, her lingekî wê jî li aliyekî bû. Apo hinekî lê nêrî:

-Wisa xuya dike ku heykel wiha hatine çêkirin, heykelên jinan wiha tên çêkirin. Her tevgereke insan bi serê xwe hunerek e. Temam bi perdeyê ve bike were xwarê.

Dema şîvê bû, tev bi hev re çûn ser sifreyê. Sêniyek mast danî ber xwe, qetek nan pê xwar. Piştî şîvê Agir û Kemal derketin çûn dibistanê, ew jî çû pirtûxaneyê. Hişê Agir hê li ser gotinên wî bûn. Li qada dibistanê hinekî meşiya, li milîtanan dinêrî. Di dilê xwe de got, PKK bi jimar pir mezin bûye, lê her kesî xwe negihandiye hişmendiya wê. Yê ev ferq kirî Serokatî ye û yê ji bo çareseriyê dixebite jî dîsa ew e.

Piştî çend deqîqeyî her kes ket dibistanê. Agir dixwest dema

xwe baş binirxîne, ew jî bilez derbasî cihê komisyona dersê bû. Çavên xwe li nava dibistanê gerandin:

-Hevalno, cihê em lê mayîn, emê ji wir bidomînin.

Bi rûyekî xweş û sekneke jixwebawer berê xwe da milîtanan. Sekna wî, xîtaba wî û tevgerên wî bandoreke mezin li milîtanan dikir. Tim dixwest pîvan û ruhê PKKê yên destpêkê di jiyana xwe de pêk bîne û zindî bihêle. Her kesî lênûs û pênûsa xwe derxistibûn. Bi tevger û dengê xwe jî girîngiya pêvajoyê bi her kesî dida hestkirin:

-Serokatiyê, dixwest di xeta Partiyê de otorîteya demokratîk serdest bike. Jixwe hedefa avakirina Konseya Serokatiyê jî ev bû. Ev ji bo tinekirina nexweşiya desthilatiyê bû. Lewre ji ber vê nexweşiya desthilatiya zû û kesayeta xwe ava nekirî, êrîşên dijmin pir dibin. Du hişmendî pêş diketin; çetetî û memûrtî. Ya memûrtiyê, çi bibe dengê xwe nake, çetetî jî jê faydê dibîne û xwe bihêz dike. Ji bo pêşîgirtina van divê biryargeha navendî pêş bikeve.

Destek bilind bû:

-Hin biryarên kongreyê yên girîng bên gotin wê baş be?

Di hişê xwe de not digirtin. Ti pirs ji bîr nedikirin û bersivên berfireh didan:

-Kongreya 5. ya PKKê di navbera 8-27ê meha Çileya 1995an de li çiyayên azad yên Kurdistanê pêk hat. Ji Kurdistanê û derveyî Kurdistanê, ji tevayiya qadên têkoşînê 317 delege tevlî kongreyê bûn. Ezê ji we re çend biryarên girîng bêjim.

-Kongre hişmendiya ne li gorî pîvanên Rêbertiya Partiyê red dike.

-Kesê rêbaza axatî, despotî, zordestî, -ku çavkaniya wan

nîv-feodal, nîv-burjuwa ye- bi ser partiya me de disepîne mehkûm dike.

-Wê di binê çavdêriya Serokê Giştî yê Partiyê de, komîteyeke bihêz ya navenda partiyê 29 esîl, 11, bedîl ji 40 kesî bê hilbijartin.

-Divê di binê çavdêriya Serokatiya Giştî ya Partiyê û Komîteya Navendî de, Konseya Serokatiyê û bûroyên pê ve girêdayî, bên birêxistinkirin.

-Divê artêşa jinê ku şaxekî artêşa neteweyî ye, bê rûniştandin û firehkirin.

-Bi tevlîbûna ji her çar parçeyên Kurdistanê û derveyî Kurdistanê Kongreya Neteweyî bê komkirin.

Piştî van biryaran dersê dewam kir…

***

Sihê Heziranê bû. Apo li eywanê rûniştibû. Li saeta xwe nêrî, çavên xwe li radyoyê gerandin. Radyo ne li cihê xwe yê her roj bû. Rabû ser xwe, li wan derdoran nêrî. Li quncika eywanê bû. BBC vekir. Nûçeyan nû dest pê kirbû: “Milîtaneke PKKê li Dêrsimê di nava leşkerên artêşa Tirk de, çalakiya xwekujiyê pêk anî. Li gorî agahiyên destpêkê, gelek leşker hatin kuştin, gelek jî birîndar bûn.” Kelecaneke mezin pê re çêbûbû, radyo bilind kir, da ber guhê xwe. Dengê wê jî hineke din bilind kir. Heta dawiya nûçeyan, ji cihê xwe nelivî. Nûçe qediya-neqediya bilez tv. vekir. Qenal-qenal geriya, herî dawî li ser qenalekê sekinand. Piştî dayîna nûçeyê axaftina çalakvanê hat dayîn. Bi bihîstina dengê wê re, ket dinyayeke din. Dengê wê tenê dibihîst. Hest,

raman dîtin û bihîstinên wî ji cihê lê qut bûbûn. Xîtaba wê, xwe digihand mejiyê nava hestiyên wî. Çawa ku rêberek be, bi zanistî û zimanekî zelal diaxivî. Gotinên wê ji serdema tê de derxistibûn, xistibûn serdemeke nû. Ji çaxekî, ketibû çaxekî din. Dengê wê bûbû kêştiya birina fikrên wî yên çaxê nû. Di fikrê wî de bahozeke dijwar dest pê kiribû. Bi dîtina wêneyê wê re, di hişê wî de rûpeleke nû dihat qulibandin. Di hişê xwe de hê dihizirî ka wê ji çalakvan û çalakiya wê re pênaseyeke çawa bike. Nûçe bi dawî bûbûn, hê çavên wî li ser ekranan bûn.

Çû ber pencereyê. Çavên xwe girtin, ket nava deryaya xeyalan. Dengê wê û dengê dîrokê yê veşartî xwe li dîwarê mejiyê wî dixistin. Xwest gotin û peyama dayî fêm bike. Lê hê di binê bandora volkan û hejandina hizran de bû. Uslûbê wê di mejiyê wî de tomar bûbû. Di dilê xwe de got, gelo dibe ku ew dengê jina Kurd ya em lê digerin, ev deng be? Di dilê xwe de ev pirs dubare ji xwe kir. Xwest hinekî bimeşe, lê çawa ku nikaribe li ser piyan bisekine wisa his dikir. Rûnişt ser kursiyê xwe. Gotinên wê hê yek bi yek di guhên wî de olan didan. Çawa ku sihir lê hatibe kirin asta zanebûn û têgihîştina wê wisa lê kiribûn. Dîsa rabû ser xwe li wêneyê Haki, Kemal, Ronahî... nêrî. Wêneyê wê yê dîtî di reşikên çavên wî yên hundir de diçû-dihat. Ji xwe re got, gelo kêliya dîrokê ya ji nişka ve xwe bi bûyerên nû dubare dike, ev e? Şerîta axaftina wê di hişê xwe de anî serî. Ji xwe re got, ev ruh ruhê PKKê ye. Xwest navekî li vê bûyerê bike. Xîtab û gotinên wê xwe di ruhê wî de bi cih kiribûn. Hê gotinên li ser bêje nedîtibûn, lê bedewî û zanebûna wê baş dîtibûn.

Şîlan û yên din tev li eywanê li ser piyan sekinîbûn. Deng ji

ti kesî dernediket, bi baldarî li liv û tevgerên wî dinêrîn. Ew jî ketibûn kelecaneke pir mezin, lê nedixwestin bi tevgereke xwe ya piçûk jî hişê wî belav bikin.

Çavên xwe vekirin li wan nêrî. Hemû li benda axaftina wî bûn, lê dengê xwe nekir. Çawa ku bêje, tiştekî vê kêliyê bêjim nîne, çû odeya xwe, xwe dirêj kir. Ji gotinên çalakvanê yên tijî wate re heyran mabû. Çavên xwe danîn ser hev. Wêneyê wê weke çirûskekê tariya fikrê wî ronî dikir. Awirên çavên wî yên kûr, li ser çirûska diçirisî rawestiyabûn. Dîmenê çalakiyê anî ber çavên xwe. Lodek ji xeman ket dilê wî: "Gelo ezê vê hevriyê çawa bidim nasîn! Di nava deryaya peyvên xwe de, li peyva herî xweş û rast digeriya. Rabû ser xwe çû eywanê tv. vekir. Hê nûçeya çalakiyê û dîmenê wê didan. Xwezayîbûna rûyê wê, di çavên xwe de tomar dikir. Nûçe bi dawî bû, lê hê li tv. dinêrî. Şîlan ber ve çû:

-Serokê min, hevalên biryargehê dixwazin bi we re biaxivin.

Berê wî lê bû, lê fikrê wî ne li wir bû:

-Bêje wan ezê sibê bi wan re biaxivim.

Hêdî hêdî gotin diniqutîn dilê wî, lê hê kêm didîtin. Her ku di nûçeyan de gotina "xwekujî" derbas dibû, serê xwe bihêrs dihejand: "Na ev ne xwekujî ye." Çavên xwe danîn ser hev, careke din xwe berda deryaya fikir û ramanan. Dîroka Dêrsmê ya komkujî, koçberî û darvekirinê, hemû anîn ber çavên xwe. Di dilê xwe de got, ev tolhildaneke mezin e. Êdî peyvên riya xwe dîtîn, dihatin ser lêvên wî. Lê li yên herî xweş û layîq degeriya. Dîsa çû odeya xwe. Saet derbas dibûn, lê ne kêliya dengê çalakvanê kirî ji ber çavên wî diçû, ne jî wêneyê wê. Li wêneyên şehîdan yên li her çar dîwarên odeyê nêrî: "Yên min li ser piyan

dihêlin hûn in!”

Geh diçû destpêka dîrokê, geh vedigeriya kêliya dengvedana çalakiyê. Çalakiyê di dil û mejiyê wî de teqînek çêkiribû. Hê ji şoqa wê şiyar nebûbû. Çalakî li Dêrsimê pêk hatibû, lê diviya li Şamê encamê bide.

Li ser devê riyeke nediyar sekinîbû. Li kêleka xwe nêrî. Jineke porxelek, rûgewr û çavbelek ber ve dihat, ket tenişta wî û meşiyan. Çavên xwe kûr kirin lê temaşe kir, lê dikir nedikir nizanî li kû dîtiye. Di dilê xwe de got, ev rû ji min re xerîb nayê, lê baş dernaxim. Gelo çima li vir e, wê bi kû ve biçe? Jina bedew hin tişt gotin. Hê dihzirî ka li kû dîtiye, lê deng nas kir. Berê xwe da rûyê wê yê biken:

-Me berê li kû hev dîtiye?

Jina porxelek pir rehet bû, çawa ku bi salan hev nas bikin, lê dinêrî:

-Navê min Zeyneb e. Ez ji destpêka têkoşînê ve we nas dikim. Min hûn di sefera Kurdistanê de dîtibûn. Hûn jî min nas dikin. We banga tevlîbûna têkoşînê kir, ez jî li ser fermana we hatim. Li hemberî rejima dewleta Tirk ya faşîst û koletiya jinê, ezê bi we re tevlî têkoşînê bibim. Baweriya min bi hêza te ya hevrêtiyê heye. Hem guhdarî dikir, hem li dêmên wê yên bedew dinêrî, lê hê baş nas nekiribû. Navê wê anî bîra xwe. Di wê navê re ji aliyê bakur ve bahozeke dijwar li wan xist. Berê xwe da bahoza reş û tarî, pişt re lê vegeriya. Pora wê ya xelek, li ber bayê ketibû, rûyê wê ketibû binê pêlên pora wê. Jina ciwan têgihîşt ku nayê bîra wî ka li kû hev dîtine:

-Hûn hatibûn Dêrsimê. We civînek ji jinan re, yek jî ji giştî re çêkir.

Lê dikir nedikir nedihat bîra wî, vê carê sefera xwe ya kirî anî ber çavên xwe:

-Di sefera Kurdistanê de me gelek kes didîtin, lê teqez tu wê demê piçûk bûyî? Jibîrnekirina te ya ji wê demê ve binirx û pîroz e. Te baş em şopandine. Nav ji bîra min naçin, bi dostên xwe yên destpêkê re timî têkiliya min heye. Ez ti kesî ji bîr nakim.

Çawa ku tiştek hatibe bîrê, destê xwe danî ser eniya xwe:

-Ha ha, min tu nas kirî, Zeyneb, erê tu hatî bîra min. Axaftina te tev li bîra min e. Li hemberî wê çalakiya te ya dîrokî, hem dewleta Tirk, hem Emerîka pir tirsiyabûn, ketibûn şoqê. Min jî dixwest te bibînim. Tu çawa hatî vir?

-Ez li benda vê rojê bûm. Ji roja min hûn dîtîn ve min dixwest di vê rê de bi we re bimeşim. Min ev roj gelek xeyal dikir. Lê bedewiya vê hevdîtina me ji bedewiya min xeyal dikir xweşiktir e.          Apo berê xwe da rê, lê taviya baranê ya reş û tarî tenê dît. Di dilê xwe de got, ev behsa bedewiyê dike, lê zivistan e, ti der xuya nakin. Her ku ba dijwar dibû, baranê jî ewqas bi dijwarî li ser û çavên wî dixist. Li çemê li pêşiya rê nêrî, pêlên wê her tişt li ber xwe dibirin. Careke din li Zeyneb vegeriya:

-Va ez jî dibînim, lê çawa ku tu dibêjî ne bihar e. Rê jî pir dirêj e, ma tu nabînî?

-Ez dibînim. Jixwe ji ber dirêjiyê ez jê hes dikim. Weke riya seferên we ye. Em çiqas bilez bimeşin, wê ewqas kin bibe, eger em bifirin, wê kurttir bibe.

Ev gotin bihîstibû:

-Mezlum jî ji min re wisa gotibû, ma te Mezlum dîtibû?

-Na min nedîtibû, ji ber wê min dixwest em li bajarê wî hev bibînin. Tu vir nas nakî?

Apo hinekî li derdora xwe nêrî:

-Em li Meydana Palavra ne. Ev der Dêrsim e, min jî bîriya van deran kiribû.

Taviya baranê xweştir lê kir, derdor jî tarîtir bûbû. Li derdora xwe nêrî, lê ti kes nedît. Birûskekê li dara li tenişta wan xist. Ji ber şîrqêniya wê ji xew veceniqî:

Li saeta xwe nêrî, çarê sibê bû. Rabû ser xwe li ber pencereyê guhdarî bêdengiya bajêrê Şamê kir. Destê xwe da stûyê xwe, êşeke giran ketibûyê. Xewna xwe anî bîra xwe. Stûyê xwe çep û rast hinekî quripand, berê xwe da eywanê. Şîlan û Bihar rûniştibûn:

-Bihar tu hatî?

-Serokê min, ji êvarê ve hatime.

-Keçikeke me çalakî kiriye, we jî şopand ne?

-Rast e serokê min, her kesî bihîstiye. Nûçeya çalakiya wê li ser hev didin.

-Çalakiyeke hêjayî têkoşîna gelê Kurd kiriye.

Qedehek av ji metbexê girt vexwar, derbasî pirtûkxaneyê bû...

***

Bûbû nîvro. Hê li pirtûkxaneyê dinivîsî. Hiş, raman û hestên wî li ser pênasekirina Zeyneb bûn. Pênûs bûbû tercûmanê hizrên wî yên lêgerîna kesayeta jê re bûyî rênîşana jiyanê. Pênûs jî bi qasî hizrên wî bilez bû, kêliyekê jî nedisekinî, heta dixwest berî

gotina wî tercûme bike. Çawa ku wê ji karwanê zeman bimîne, wisa lez dikir. Rabû ser xwe çû ber dolaba tijî raporên milîtanan. Ji xwe re got, divê em berê kêştiya têkoşînê biguherînin, Zeyneb ji me re bû çavkaniya ilhama jiyaneke nû. Ji milekî ve kêfxweş bûbû ku Zeyneb xwe gihandiye kakilê cewherê lê digeriya. Li bendê bû ku ev cewher salên borî derkeve. Ew bixwe li derdora xwe li wî cewherî digeriya, lê jina fedakar ji dûr ve bersiv dabûyê. Bersiva ji gerîla dixwest wê dabûyê. Êdî dema meşa ber bi pêngaveke nû ve bû. Berçavka xwe danî, çû ber destşoyê avek li ser çavên xwe kir. Dîsa vegeriya pirtûkxaneyê. Li pişt mase rûnişt, li ser xewna xwe hizirî. Rojên çûyî Dêrsimê û civîna yekê ya ji jinan re çêkirî anî ber çavên xwe.

Heta nîvro wisa bêdeng li pirtûxaneyê nivîsî. Di wê navê re Şîlan ket hundir. Zerfeke zer di destê wê de bû. Çawa ku tişteke pîroz be, wisa girtibû. Bi rêzdarî raber kir. Ji girtina wê ya zerfê fêm kiribû ku titşeke girîng e.

-Serokê min, ev nameya hevala Zîlan e.

Hê gotin di devê wê de, bikelecan û rêzdariyeke mezin rabû ser xwe. Çawa ku pirtûkek ji pirtûkên pîroz be, wisa girt û hinekî jî xwe tewand. Ji vê tevger û helwesta wî hişê Şîlanê jî tevlîhev bûbû. Çawa ku di perestgehekê de be, wisa li wê jî hatibû.

-Tiştek pêwîst e serokê min?

-Na, tu dikarî biçî.

Emanetê pîroz hê di destê wî de bû lê dinêrî, lê li ber çavên wî bûbû weke neynikekê. Dîmenê di xew de dîtî li ser xuya dikir û gotinên wê jî di guhên wî de deng vedidan. Li wêneyê Bêrîtanê yê bi dîwêr ve nêrî: “Di her pêvajoya giran de hûn

helwesta min nîşan didin. Geh li nameya Zîlanê, geh li wêneyê Bêrîtanê dinêrî. Çawa ku her du li wir bin, ew jî di huzura wan de sekinîbe, çavên xwe danîn ser hev. Xwe di navbera du parêzvanên durist, du baskên azadiyê, du xwedawendên bedewî û jiyanê de didît. Barê wî girantir bûbû, lê xwe weke teyrekî bi du baskan didît. Ji milekî ve xemgîn bûbû, ji milekî ve hêzeke nû girtibû. Diviya bi wê hêzê ber bi pêngavên nû ve biçe. Berî her tiştî xwe deyndarê wan didît. Di şexsê wan de pêvajoya şoreşa Kurdistanê ronîtir bûbû. Çû pişt mase rûnişt. Bi kelecaneke mezin derê zerfê vekir. Nameya pîroz vekir dest bi xwendinê kir: *“Ez sala 1972’yan li navenda bajarê Meletî ji dayîk bûme. Navê min Zeyneb Kinaci ye. Ez bi eslê xwe ji gundê Elmalî yê girêdayî Meletî me. Navê eşîra me Mamûrekî ye. Min li Zanîngeha Înonû beşa rehberî û şêwirmendiya derûnî ya Meletî xwend. Berî tevlîbûna nava refên tevgera neteweyî, ez li nexweşxaneya Meletî teknîsyena rontgenê bûm.”*

Çawa ku fermannameyek be wisa dixwend. Li aliyekî jî kêfa wî dihat ku li Kurdistanê rola xwe ya rêbertiyê lîstiye. Her ku paragrafek dixwend, hestên cuda pê re çêdibûn. Li gorî nameyê êdî Apo ne şexsek, ruhekî di nava çembera bêdawîbûnê de bû. Di nameyê de bi awayekî eşkere xuya dikir ku Apo sazî û hişmendiyek e, êrîş jî li ser vê saziyê ye. Di dilê xwe de got, tu jî xwedawenda vê saziyê yî. Nameyê pir bandor lê kiribû, nedixwest biqede. Carna di dilê xwe de dixwend, carna bideng. Carna jû hevok dubare dixwendin. Her ku dixwend, baştir têdigihîşt ku ber bi serdemeke nû ve diçe. Di nameyê de hişmendiya pêwîstiya guherîn û veguherînê didît. Name bilind kir: “Zîlan di asta manîfestoyekê de ye.”

Xwêdanê bi ser eniya wî re avêtibû. Nameyê hestê wî yê destpêka têkoşînê anîbû bîrê -ku bi gotina peyva Kurdistanê re ketibû tayê.- Piştî xwendina nameyê rabû ser xwe. Di hundirê xwe de bi xwe re ketibû nava guftûgoyeke bêdawî. Di hişê xwe de li têgeha herî binirx digeriya. Di dilê xwe de got, niha min hêz girt; te ferman da, neferên fermana te jî em in. Di xeyalê xwe de çûbû serdema parestgehan. Vê carê bideng axivî: "Zeyneb, qiblegeh e, perestgeha pîroz e, xwedawend e! Divê em jê re biçin secdeyê."

Her ku diçû di hizrê xwe de kûrtir dibû û bixwe jî ji wan hizrên xwe matmayî mabû. Rahişt nameyê, çû eywanê. Milîtan tev li ser piyan bûn. Ew du roj bûn, çawa ku di xelwetê de be. Yek bi yek li rûyê wan temaşe kir. Ji zemanê dûr vedigeriya yê nêz. Çawa ku çûbe miracê jê vegeriyabe, di raman û hestên xwe de wisa aram bûbû. Her kêliya rêwîtiya jê vegeriyayî, bedelê serdemekê bû. Li nîvê eywanê sekinî. Rûyê milîtanan jî hatibû guhertin. Di ruh, mejiyê xwe de rûpeleke nû vekiribû. Diviya fermana Zîlanê pêk bîne û her kesî tevlî pêngaveke nû bike. Li Şîlanê nêrî:

-Hevalên Cizîrê dest bi konferansa xwe kirin?

-Serokê min, ev du roj in dest pê kirine, şêst hevalên jin tevlî bûne. Konferans li Amûdê çêdibe. Dixwestin bi we re biaxivin.

-Tamam. Niha li wan bigere, em konferasa wan silav bikin.

Şîlan li cihê konferansê geriya. Apo rahişt telefonê dest bi axaftinê kir:

-Di serî de we bi heskirineke mezin silav dikim! Di van rojên girîng de we dest bi konferansê kiriye. Di serî de li qada

ma, li her qadê, jin xebata xwe ya xweser dimeşînin. Ez dixwazim hûn konferansa xwe bi perspektîfa hevrê Zîlan biqedînin. Çalakiya wê hevriyê çalakiyeke mezin e. Li gorî ruhê wê tevbigerin.

Her kesî bi baldariyeke mezin guhdarî dikir:

-Ev ne xwekujî ye, çalakiyeke dîrokî û birêxistinkirî ye. Çalakiyeke mînak e. Ne çalakiyeke wisa ye ku her kes bikare bike. Pir bikalîte û biplan e. Ev fermanek e, remzek e. Di heman demê de ji bo me bangawaziyek e.

Ji aliyê din yê telefonê dengê durişim û çepikan dihat bihîstin. Piştî çepikan axaftina xwe domand:

-Hevrê Zîlan dibêje, *"Idîa min ya jiyanê pir mezin e. Ez dixwazim bibim xwediya jiyaneke watedar û çalakiyeke mezin. Ji ber ku ji jiyanê pir hes dikim, dixwazim vê çalakiyê pêk bînim.*" Pîvana me ev e. Li ser idîaya wê hûn jî bibin xwediyên idîayên mezin!

Telefon danî. Çawa ku nefesa wî çikiyabe ketibû rewşeke wisa. Li ser hevoka wê hinekî hizirî. Di gotinên wê de ruh û felsefeya PKKê didîtin. Gotina Kemal Pir ya "Bi qasî ku em di riya wê de bimirin, em ji jiyanê hes dikin." anî bîra xwe. Berê xwe vegerand ser milîtanên li eywanê:

-Ev çalakî ji gerîla re dibêje li Kurdistan û Dêrsimê çalakî wiha dibin. Di peyamên wê de xalên balkêş hene. Têgihîştina xeta PKKê ya bîrdozî û polîtîk heye. Eger em bibin bombeyên rêxistinî, bîrdozî, siyasî û moralê, emê bibin layîqê wê.

Hinekî çû hat:

-Bi rojan li Dêrsimê dimîne, xwe diparêze, gav bi gav çavdêriyê li dijmin dike. Li wê qadê dijmin nahêle çivîk bifirin,

lê heta nava dijmin diçe û çalakiyê pêk tîne.

Di hişê xwe de hevokên wê tev ji ber kiribûn.

-Di nava we de eger yên neketîn şoqê hebin, nîşan dide ku eleqeya wan bi mirovayiyê re nîne. Yê li hemberî mezinayiyeke wiha nehejiyabe, heta nava mixê xwe nelerizîbe û wate nedabûyê, dive ji PKKyîtî, welatparêzî, milîtantî heta mirovatiya wî guman were kirin.

Çawa ku ketibe tayeke sar, xwe wisa his dikir. Berê xwe da pirtûkxaneyê. Rûnişt careke din name xwend. Piştî xwendinê pênûs û lênûs derxistin, dest bi nivîsê kir.

Roj derbas bûbû, derengê şevê bû, lê xewa wî nedihat. Derket balkonê, li asîmanan nêrî. Stêra karwankuj ket ber çavê wî. Wê bedewî û rengîniya stêran nedihiştin çavên xwe ji ser wan bibe. Hem temaşe dikir, hem kûr kûr dihizirî. Stêrek gurijî. Nedixwest ji wir veqete lê nameyê dîsa kişand hundir. Serê xwe danî ser balgî, lê hê hişê wî li ser nameyê bû. Çend caran xwe vî mil wî mil quliband heta ku bi xew ve çû.

Sibê zû şiyar bû. Li ser cihê xwe rûnişt, ji xwe re got, min sozeke mezin daye, divê soza xwe pêk bînim.

Ji bo şopandina ragihandinê, berê xwe da pirtûkxaneyê. Piştî karê xwe yê li wir çû odeya xwe. Gumlekê xwe yê risasî û pantolonê bi heman rengî li xwe kirin, berê xwe da dibistanê. Di hewşê de hinekî meşiya. Li ser xwe re li mişmişên zer bûyîn nêrî. Di wê navê re pisîkê xwe ji ser dîwêr avêt ser milê wî. Lê nêrî kêfa xwe jê re anî. Milîtan derbasî hundir dibûn. Berî ku bikeve hundir, li ber derî hinekî sekinî: “Rojeva me Zîlan e, divê em vî ruhî bi her kesî bidin fêmkirin.”

Gavên xwe ber bi hundir ve avêtin. Yekser derbasî pişta mase

bû. Ji rêza pêşî heta ya dawiyê çavên xwe li ser milîtanan gerandin. Yek bi yek li çavên wan nêrî. Bi awirên xwe bi wan dida fêmkirin ku êdî ti kes nikare weke berê bimîne. Çend kêliyan çavên xwe danîn ser hev. Her du destên xwe bi şûn ve danîbûn ser hev. Çawa ku ne li dibistanê be, xîtabê serdemeke nû bike sekinîbû. Name jî di destê wî de bû:

-Zêdekirina li name û axaftinên hevrê Zîlan yên di asta manîfestoyekê de, ne ji hedê me ye. Lê peyamên dayîn, berpirsiyariyeke mezin didin ser milê min. Çalakiya wê ji peyamên ronak dagirtî ye.

Her ku çend hevok digotin, paragrafek ji nameyê dixwend û şîrove dikir:

-Zîlan ji dîrokê xulaseyeke tekûz çêdike. Mirovê xwe nespêre bingehê dîrokê bêkok e. Ev hevriya mezin xwe digihîne binyata dîrokê. Di wê ferqê de ye, di wê zanebûnê de ye û di wê berpisiyariyê de ye. Ev çalakî ne ya sala 1996’an tenê ye, çalakiya herî mezin, herî pîroz û encamgir ya dîroka PKK’ê, heta ya şerê me yê rizgariya neteweyî ye. Pêkanîna vê çalakiyê li Dêrsimê girîng e. Di heman demê de vejîna Dêrsimê ye jî. Wiha dibêje: *“Xwefedakirin ne bes e. Xwezî ji canê me wirvetir tiştekî ku em bidin hebûya. Ji ber ku ji jiyanê û ji mirovan pir hes dikim, dixwazim vê çalakiyê pêk bînim.*”

Dengekî ji ser banê dibistanê hatî axaftina wî qut kir. Dengekî pir nizim, yan jî tevgereke pir piçûk jî bandor li sîstema hizirîna wî dikir. Axaftina xwe bi xwendina nameyê domand:

-“*Ji ber ku te her derfet ji me re afirandiye, em canê xwe jî bidin ne bes e.”* Di dîrokê de qiblegeh, perestgehên pîroz û di hundirê wan de xwedawend hene. Bawermendên wan jî xwe

dispêrin wan perestgehan û doza lêborînê dikin. Ev hevrê jî hevriyeke wisa ye. Çawa ku hûn di perestgehekê de bin, hûnê di hizûra wan de xwe bitewînin û doza lêborînê bikin. Ji wan hêzê bigirin û xwe paqij bikin.

Ji serî heta binî name xwend û şîrove kir. Bi demê nedihesiya ka çawa derbas dibe. Piştî axaftinê kêm be jî hinekî rehet bûbû. Lê riyeke nû ketibû pêşberî wî, dixwest wê li dibistanê weke ruhekî bi wan bide fêmkirin.

Êvar bû. Li eywana malê rûniştibû, li benda çayê bû. Tepsiya çayê di destê Şîlanê de bû ji metbexê derdiket. Gazî Biharê û yên din jî kir, da tev de çayê vexwin. Weke her car tev li dorê kom bûn, lê hê di binê bandora çalakiya dîrokî û nameya Zîlanê de bû. Her ku diçû, xelweta ruhê wî ferehtir dibû. Rojê têra tesbît û gihîştina hişmediya wî nedikir. Di hundirê xwe de hê dihizirî, fikir li ser fikir dihatinê. Di dilê xwe de got, riyeke ronîtir li pêşberî me vebû. Lê divê em milîtanên heyî hemûyan bigihînin wê astê. Çavên Biharê li ser bûn, guherîna di demeke ewqas kin de pê re çêbûyî, bala wê dikişand.

Wî jî geh li wan dinêrî, geh çavên xwe dibirin banî dîsa dianîn jêrê. Çawa ku bixwaze mesafeya di navbera zemanê borî û zemanê tê de rake. Li wir bû lê hişê wî bi leza demê re ketibû ser rê. Li yên li derdora xwe nêrî. Dixwest ji fikirîna rojane ber bi pêşbîniya demê ve biçin. Di dilê xwe de got, Zîlan dîroka geşedanên li Kurdistanê çêbûyîn û encama keda min dinirxîne. Min çavkaniya hevgirtin, evîn û yekîtiyê dibîne. Têgihîştiye ku ez profîla mirovê nû çêdikim. Divê milîtanên din jî bigihîjin vê têgihîştinê. Rabû ser xwe hinekî meşiya:

-Min îro li dibistanê ji bo hevrê Zîlan nirxandinek kir,

nirxandineke gelek kûr bû. Ez bixwe jî hê di binê bandora wê nirxandinê de me. Teqez divê hûn guhdarî bikin. Eger ew dikare çalakiyeke wiha bike, hûn jî dikarin di mejiyê xwe de teqînekê çêkin. Ji bo azadiya we ev pêwîst e.

Bi qasî ji Zîlanê fêm kirî dixwest yên din jî bigihin wê têgihîştinê:

-Ev çalakî jî diyar dike ku hêza jinê heye di dilê xwe de kesayetê û di mejiyê xwe de teqînên bêsînor çêke. Ji bo mezinbûna we pêwîstiya we bi têgihîştina çalakiyên wiha heye.

Geh Zîlan dianî ber çavên xwe, geh li wan dinêrî:

-Bibin Zîlana dijî! Zîlan dubare nabe, yek e. Ez bawer dikim; eger Zilan bijiya wê di siyaset, jiyan û rêxistinê de teqînên mezin çêkirbûna. Ew bûye hêz. Binêrin, zewiciye, lê tecrûbeya xwe gihandiye hêzeke mezin.

Hêrsa wî li hemberî kesayeta jinê ya kevin bû, lê dixwest Zîlana di cewherê wan de veşartî bi wan bide nasîn û ew jî bikevin ferqa wê:

-Piratîk û kesayeta xwe mezin bikin. Binêrin Zîlan fermandara şer e. Ez leşkerê wê me. Ez ji Bêrîtan û Zîlanê gihîştim gelek encaman. Zîlan du salan tenê li nava gerîla mabû, salekê jî li Edenê xebata eniyê kiribû. Şoreşên cîhanê yên din û şoreşa Kurdistanê tîne hemberî hev. Taktîkên şênberiya şoreşa Kurdistanê dibîne.

Çaya wî sar bûbû, hê venexwaribû. Çavên xwe danîbûn ser hev. Çawa ku ji serdemekê re biaxive bi hezaran mirov lê guhdarî bike wisa diaxivî:

-Bi awayekî ku ez bixwe jî nikarim ewqas li hev bînim, şoreşa Kurdistanê şîrove dike.

Piştî vê nirxandnê dîsa derbasî pirtûkxaneyê bû. Jinên li eywanê jî nameya Zîlanê dubare dest bi xwendina nameyê kirin. Şîlan kûr çûbû û li ser gotina bibin Zîlana dijî dihizirî. Berê xwe da Biharê:

-Serokatî dibêje, eger Zîlan bijiya wê dîsa teqînên mezin di hişê xwe de çêkiran. Ango ji bo me dibêje di hişê xwe de teqînê çêkin. Rêxistinbûnê, jiyanê ava bikin. Min fêm kir ku Serokatî dibêje jin dikare weke wê di ruhê xwe de teqînê çêke.

Biharê jî bi dengê nizim bersiva wê da:

-Serokatî di binê efsûna wê de maye. Dibêje ew rênîşana min e. Gelo wê tevger bikeve pêvajoyeke nû. Lê bi qasî min fêm kirî wê tevgera jinê pir pêş bikeve. Lewre kesayetên weke Zîlanê ji bo azadiya jinê gavên tewra mezin avêtin…

***

Destpêka payîzê bû. Ji ber bayê, serê darên spîndar li hev diketin û xezêmên daran li ber bayê diketin. Ne weke bayê xêrê bû. Çawa ku dibêjin, bayê biharê mirov ciwan dike, yê payîzê mirov pîr dike. Dema komkirina zeytûnan bû. Şêxo bi biskilêtê ji Firûnê dihat. Nanê germ û sêniyek hûmis kiribûn selika pêşiyê. Her ku bayê lê dixist, bêhna wê dihatiyê. Li nêzî malê çavê wî bi seyareyeke biyanî ya li ber derî ket. Riya xwe guhert. Bilez piskilêt ajot. Li pey xwe nêrî ku seyare ketiye pey. Hê bileztir ajot. Xwe xist nava daristanên Xotayê. Di rêçikan re diçû. Li pişt xwe nêrî ku seyare xuya nake. Berê xwe ji wir zivirand, li pêşberî xwe nêrî: “Wey, ka riya malê li kû ma?” Xwe li nava dehl û aviyên Xota xistibû. Piştî sê saetan vegeriya malê. Delingên

wî tev bûbûn kuncirik. Derî vekir. Siwar li hewşê sekinîbû:

-Hevalê Şêxo, tu li kû bûyî?

-Heval, qet behs neke; min li ber derî seyareyeke biyanî dît, min got ezê rê pê bidim şaşkirin. Min wisa kir jî.

-Te baş kiriye, hê jî li van derdoran e?

-Ew bixwe li van derdoran nemaye, lê ez jî wenda bûbûm.

Siwar keniya:

-Serokatiyê pirsa te kir, me got çûye nan, lê dibe çûbe serekê li malê jî bide. Lê Serok got bê min naçe cihekî, lê bigerin. Ez nû vegeriyam, Kemal hê li te digere.

Dengê xwe nekir. Kêfa wî ji gotina Apo re hatibû. Siwar nan ji dest wî girt bir. Li kuncirik û heriya bi delingên xwe ve nêrî:

-Her ez qirêj bûme, hema ez cihê kevokan jî çêkim.

Her ku tiştek datanî ser hev, bayê lê dixist xirab dikir.

Milîtanên li malê, pirtûk dixwendin. Apo û Agir ji hevdîtinê hatibûn, li eywanê rûniştibûn. Gelek difikirîn. Wan rojan hevdîtin li ser hev çêdibûn. Lê vê carê rengê Apo ne xweş bû.

Li metbexê Kemal, li cem Şîlanê sekinîbû:

-Îro piştî hevdîtinê Serokatî û hevalê Agir gelek difikirin.

-Gelo tişek cuda heye?

-Em nizanin, lê rengê Serokatiyê guheriye. Dema em çûyîn Helebê jî, ji hevalan re digot, ez biçim çiyê çawa ye.

Çavên Şîlanê fereh bûn:

-Wê Serokatî çawa biçe çiyê?

-Serokatî baştir dizane ka wê çi bike.

-Erê, rast e wê Serokatî çareser bike. Çend caran ji me re got hûn tiştekî nakin.

Di wê navê re Axîn hat cem wan:

-Heval, dengê we bilind e.

Şîlanê lê nêrî serê xwe hejand:

-Tu li ber derî bûyî lewma dengê me hatiye te.

Apo û Agir hê jî bêdeng bûn, kûr kûr difikirîn. Apo rojên destpêkê yên avabûna dibistanan anîn bîra xwe:

-Piştî derketina ji Akademiya Masum Korkmaz, me kar mezintir kir. Me li vir bi navê hevalên birîndar dibistana destpêkê vekir. Dewletê jî ji bo berjewendiyên xwe qebûl kir. Me hin hevalên saxlem jî kirin nava wan. Lê pir bi ser me de hatin. Me hevalên saxlem geh derdixistin, geh careke din dibirin.

Agir ew roj weke filmekî dianîn ber çavên xwe:

-Wê demê Xedam got we, te bê me ev xebat hemû kir.

-Gelo pêşniyara wan ku em biçin derve hin roptajan çêkin, da Tirk bi ser wan de neyên, baş dibe yan na? Ez niha biçim Cûdî wê çi bibe? Ezê tabûrekê çêkim bi wan re tevbigerim.

Di mejiyê xwe de dibir dianîn, dizanî nabe, lê kêfa wî ji çûna Cûdî re pir dihat. Agir mabû şaş:

-Serokê min pir zor e, wê dewleta Tirk êrîş bike, ji bo tinekirina Serokatiyê wê hêza xwe tevê bixin tevgerê.

Ew bixwe jî di binê heybeta vê axaftina xwe de mabû. Lê di serê xwe de her tişt dihonand:

-Rast e, wê heval jî bikevin xeterê. Çi hêza wan hebe, wê hemûyê bikin tevgerê.

Agir di dilê xwe de got, niyeta Srokatiyê heye biçe çiyê. Zimanê dilê wî jê re gotina “Nabe” dubare dikir.

Apo rabû ser xwe:

-Biçe dibistanê, hevalan bibîne. Amadekariya dewreya nû bikin. Divê em vê dema xwe baş bi kar bînin û kêliyekê jî nesekinin.

Piştî derketina Agir, ew jî derbasî pirtûkxaneyê bû. Êdî ji bo pêvajoyeke nû dihizirî. Di hişê wî de newayeke bifikar deng vedida. Hevdîtina dawiyê nerehetiyeke mezin pê re çêkiribû. Çawa ku ji nava ewrên li ser serê wî kom bûyîn, birûskek vede, gotina "Ji vir derkeve!" di guhên wî de deng vedida, kêliyekê jî ji bîrê nediçû. Êdî di hişê wî de fikrê derketinê pêl dida. Di dilê xwe de got, derketina ber bi kû ve? Yek bi yek li ser riyên heyîn û cihên biçiyê dihizirî. Lê hê ji bo riyekê jî biryar nedabû.

Şîlan û Siwar li eywanê rûniştibûn. Şîlanê destê xwe hêdîka li milê wî xist:

-Gelo çi heye? Serokatî pir difikire.

-Îro gelek kes dîtine, dibe ku ji wê be.

Lê çûna çiyê li ber guhê wê ketibû. Rabû çû odeya xwe. Apo ji ser kursî rabû çû ber pencereyê û li derve temaşe kir. Çawa ku dema firîn û barkirinê be, wisa di hişê xwe plan dikir. Pencere hinekî vekir. Bayekî xweş li rûyê wî xist. Di dilê xwe de got, divê bi qasî leza te em lez bikin. Dem êdî têra min nake...

***

Sibê zû bû, Apo û Agir li eywana dibistanê rûniştibûn. Apo li nûçeyan guhdarî dikir. Nûçeya dawiyê bala wî kişand: "Ji bo girtina Tevgera Aştiya Demokratîk, li Dadgeha Destûrnameyê doz hat vekirin. Çavên Agir li ser bûn. Carna jê berê xwe dida tv. Apo rabû ser xwe, tv girt. Çû ber pencereyê li milîtanan nêrî:

-Yên me dişopînin, tu jî yek ji wan î.

Agir kûr dihizirî, lê zû bersiv da:

-Rast e serokê min.

Hinekî pêş ve çû nêzî wî bû:

-Rastî li holê ye, serkeftin li holê ye, lê hevalên me xwe nêzîkî vê nakin, li gorî te çima?

-Serokê min, em xwe ayidê xwe nabînin, em xwe ayidê Rêbertiyê nabînin. Ya rast em xwe ayidê dijmin dibînin.

Berê xwe ber bi milîtanan ve kir, serê xwe hejand. Di hundirê xwe de heyfa xwe dianî:

-Dibêjin, ka dijmin ji bo me çi jiyan layîq dîtiye, em li gorî wê bin.

Agir bi ezmûna xwe ya bi milîtanan re diaxivî:

-Dibêjin, em wiha hatine dinyayê, wiha mezin bûne û emê wiha bimirin.

-Ev bêşansiyeke mezin e. Em di baweriya bi qedera kor de israr dikin, ne wisa?

-Rast e serokê min.

-Ez çi bikim, dev ji we bardim?

Vegeriya li cihê xwe rûnişt. Çavên wî kûr de çûbûn:

-We çi kir? Weke me gotî we kir?

-Rast e serokê min, me dest bi platforman kir. Me hişmendiya Serokatiyê ya nêzî insan û guhertinê dibe, baş nîqaş kir.

-Ev guhertin û pîvanên rêxistinê ne. Em riyeke tenê li pêşberî isanan dihêlin, ew jî xweguhertin e. Ne tinekirina insan, avakirin û guhertin şert in.

-Serokê min divê em hê pirtir li ser rawestin.

-Helbet divê em baş li ser rawestin. Ev pêngavên dîrokî ne.

Dinya insanan bi cezayê mirinê ceza dike, lê em insanan diguherînin. Di platformên me de divê ev hişmendî bê fêmkirin.

Di wê navê re rêveberiya dibistanê jî ket hundir. Berê xwe da wan:

-Amed, divê tu odeyekê vala bikî û Zekî û yên din jî bikiyê. Eger li hev bikin bibin komîte, wê yektîya me ya neteweyî jî pêk bê. Nanokiyên wan nakokiyên neteweya me ne. Kengê milîtan û gel Zekî efû bikin ezê jî hingê efû bikim. Lîstina bi nirxên şoreşê ne hedê ti kesî ye.

Agir ket navberê:

-Serokê min, me gelek caran agahî digirtin ku têkiliya wî bi deweletê re heye.

-Rast e, ku dijmin her tim derdixist pêş, ne jixwe bû. Mezin kirin, her çalakiya dikir dibû qehreman. Divê em vê kesayetê bi her kesî bidim naskirin.

-Serokê min, yên li cem jî bêdeng mane.

Ya gelek caran ew hêrs dikir jî bêdengiya kadroyan bû, ji ber wê pir hêrs bû:

-Berî her tiştî divê kadro bi pîvan be, durist be, ne durû be. Divê cewher û şekil ji hev ne cuda bin.

Rêveberiya dibistanê tekmîl da, derketin. Apo berê xwe da Agir:

-Hûnê biçin dibistanê, ezê jî tekmîlên welat bigirim.

Agir derket çû dibistanê. Berî ku bikeve hundir, gazî erkdarê rojê kir:

-We nobedar şiyar kirin.

-Me hemû şiyar kirin.

Lênûsa xwe vekir li notên xwe nêrî. Destxeteke pir xweşik

bû. Lênûsa xwe girt derbasî hundir bû. Dixwest şîroveya Apo ya li ser dîrokê baş bide fêmkirin:

-Emê îro li ser helwesta Serokatiyê ya têkildarî ceza rawestin. Ji bo guhertin û veguhetinê Serokatî hişmendiya kevin mehkum dike. Kesayetê li kû wenda kiribe, dîtina wê jî wê li wir be...

Navbera nîvro hatibû dayîn. Lênûsa Agir di binê çengê wî de bû, bi gavên bilez berê xwe dabû eywanê. Piştî çend kêliyan Apo jî ket hundir. Derbarê platforman de Agir agahî danê. Wî jî xwest platforman binirxîne:

-Eger me destpêkê erk ji destê Zekî bigirta nedibû. Me xwest her kes bizane kesayeta wî çawa ku tê gotin ne efsane ye. Ji bo ku her kes jiyan û kesayeta wî nas bike me şand Dêrsimê. Diviya gelê me jî nas bike. Tevgerên wî tev li gorî dijmin bûn. Eger heman kiryarên xwe bidomîne, hûn dikarin di kongreyê de derbarê wî de biryarê bigirin.

Di wê navê re telefon hat, Apo rabû çû. Piştî qederkî hat li cem Agir sekinî. Dixwest hêviyên xwe yên derbarê wî de jî jê re bêje:

-Tu jî yek ji hevalên me yê herî kevin î. Pêwîst bû tu erkên xwe di her qadê de pêk bînî.

-Rast e serokê min! Em zemanekî evqas dirêj di nava partiyê de diminin, lê em ne dev ji partiyê berdidin, ne pêwîstiyên wê pêk tînin. Fêmkirina wê zor e.

-Ango, te baş fêm nekir.

-Ji bo fêmkirinê dixebitim. Dibe ku min bi giştî hin xalên wê fêm kiribin, lê nikarim bêjim, min bi têrayî û bi kûrayî fêm kiriye.

-Li hemberî van tiştên dibin, tu xwe çawa dibînî?

-Serokê min, ez xwe li derveyî wan nabînim.

-Temam, tu xwe li derve nabînî, lê cihê te li kû ye, te çiqas fêm kiriye? Tuyê bikarî li ber xwe bidî?

-Serokê min, ji berxwedanê pêve tiştekî ku bikim nîne.

-Gelo yek bixwaze te binivîse, wê te çawa binivîse?

-Eger me nikarîbe hevrêtiyê bikin, em li erkên xwe xwedî derneketibin, me ev bar bi hev re hilnegirtibe, wê demê em ketine rewşeke li dijî vê.

-Tu hinekî tûj diaxivî. Ewqas bi nirxan lîstin, çima hirsa desthilatdariyê bi te re jî çênebû?

-Serokê min, ev rewşeke bi kesayetê ve girêdayî ye.

-Tu nikarî wê hêzê nîşan bidî, plana wê çêkî, tedbîra wê bistînî û rêxistina wê ava bikî. Tu Agirekî niyeta wî baş dimînî.

-Serokê min, hê dema em li Ayranci, Rêbertiyê got, divê şoreşgerên Kurdistanê weke melaîketan bin. Min ji wê rojê ve terbiyeya xwe girtiye.

-Yan jî weke ewliyayan. Te xwestiye bi vê ve girêdayî bimînî.

-Ji bo ku pê ve mam girêdayî, neketim davikên piştî hingê.

-Ez dimînim şaş, tu çawa wiha weke mûminekî mayî?

-Eger ne ji wan şiyariyên Rêbertiyê bûya, dibe ku ez jî biketama.

-Halê hazir di vê mijarê de yê herî mûmin tu yî. Hevalên me yên din, maşale hirsa wan ya jin-mêrtiyê, ya desthilatdariyê pir pêş ketiye.

Hinekî sekinî li rûyê wî nêrî:

-Lê te bi yek rengî têkoşîn kir. Çivîkek bi saçmeyekê tenê

nakeve. Nêçîrvan herî kêm sih lib saçme dixin fişekekê. Wê demê ihtimala ketina civîkê ji sedî sed e. Lê tu yekê tenê diavêjî.

-Rast e serokê min.

Dewre bi dawî bûbû, wê Agir jî biçûya çiyê. Ew û Apo di qadê de dimeşiyan. Koma milîtanan ya berê wan jî li çiya li dora wan bû. Apo li Agir temaşe kir:

-Divê hûn xwe ji bo hêzeke bedîl amade bikin.

-Ne hêzeke bedîl, divê em xwe ji bo hêzeke bingehî amade bikin.

-Em bi hêza bedîl jî razî ne. Pêşniyareke te ji bo te heye?

-Na serokê min, ez ne ayidê xwe me heta ku pêşniyareke min ji bo min hebe. Ka partî ji bo min çi mûnasib bibîne, ji bo wê amade me.

-Di wir de gumanên me nînin, lê dibêjim ne partî tenê, mafê te jî heye.

-Texmîn nakim mafê min hebe. Me hê di PKKê de mafê şexsî heq nekiriye. Em bi heqê partiyê jiyan û bi heqê partiyê gihîştin roja îro.

Êdî dema birêketina wî bû, tev de ber bi deriyê reş ve diçûn. Apo li ber derî sekinî; yên ku wê biçûna yek bi yek xatir jê xwestin. Destê Amed kir nava destên xwe:

-Tu diçî çiyayên azad, qimetê her kêliya azad bizane. Li xwe jî miqate be û zû şehîd nekeve. Divê hûn gelek tiştan bikin. Divê hûn deynê Kemal Pîr bidin.

Amed hestiyar bûbû. Apo ew himbêz kir. Piştî wî berê xwe da Agir:

-Divê hûn li ser tesfiyeya li Zapê derketî bisekinin û

belavbûna çêbûyî komî ser hev bikin. Pêvajoyeke dijwar li benda me ye. Li vir we bi xwe jî dît, em di nava agir de dijîn. Divê hûn serokatiya taktîkî di kesayeta xwe de bi ser bixin. Ev erkên dîrokî ne. Baweriya min heye hûn pêk bînin.

Destê wî girt, kir nava destên xwe. Agir lê dinêrî, çawa ku bêje tiştên te gotîn emê pêk bînin. -Divê hûn wendayiyan nedin. Em li vir gelek tiştan dibêjin, hevalên me pêk naynin.

Agir bi hejandina serê xwe gotinên wî erê dikirin û hê destê wan di nava destê hev de bûn. Bi hev re ber bi seyareyê ve meşiyan. Li ber derî hev himbêz kirin. Piştî siwarbûna Agir Apo her du destên xwe bilind kirin. Heta seyare ji wir dûr ket hê destên wî li hewa bûn. Serê xwe hejand berê xwe da dibistanê. Nefeseke kûr kişand. Ew li wir mabû, lê dilê wî bi wan re çûbû qada çiyayên azad.

# BEŞA HEFTEMÎN

Serê salê bû. Apo û Kemal li ber deriyê mala Helebê bûn. Piştî ku çend caran lê derî xistin venebû, Kemal ser dîwêr re xwe avêt vekir. Milîtanên jin, hundir dişûştin, wisa şilûpil neçar man Apo pêşwazî bikin. Silav da wan, berê xwe da hundirê malê:

-We mala me xirab kiriye, her der qirêj e. Ya girîng hûn destpêkê derdora xwe pak bikin, paşê hundir.

Siwar li derdoran nêrî:

-Heval xwarinekê çêkin, Serokatiyê hê xwarin nexwariye.

Li hev nêrîn, Necah, ku ew demek bû hatibû malê berê xwe dayê:

-Hevalê Siwar tişteke me nîne.

Siwar bilez berê xwe da sûkê. Di wê navê re Mezlum hat derbasî cem Apo bû. Rûnişt derbarê xebatê de agahî danê. Piştî saetekê çûn eywanê. Heta hingê xwarin jî hatibû amadekirin. Tev de li ser sifreyê rûniştin. Apo sê parçe penîr, şeş lib zeytûn, bacaneke biraştî û qetek nan danîn ber xwe:

-Mezlum ka wê şûşeya avê bide min.

Du şûşeyên avê li milê din yê mase bûn, yek vekirî, yek girtî bû:

-Ya vekirî bide min. Ji şevê din ve êşek ketiye nava min.

Destê wî li ser nava wî bû. Çend deqîqeyan wisa ma. Piştî

taştê xwar sêniya xwe rakir çû metbexê. Wê rojê Nûcan û Necah xwarinpêj bûn. Bala xwe baş da wan deran. Li cihê firaxan yê zer bûyî nêrî:

-Nûcan, em cihê firaxan çawa pak bikin?

-Serokê min, em biguherînin.

Lê guhertin bi serê wî neketibû:

-Heval divê em pak bikin.

Ji wir derket çû eywanê. Piştî deh deqîqean dîsa çû metbexê. Her der hatibû paqijkirin.

-Karê we xelas bûbe em biçin eywanê, dema xwe li metbexê derbas nekin. We karê pêwîst kiriye. Nîvro hûn dikarin xwarineke Rihayê çêkin.

Di wê navê re Alan jî hatibû lembeyên eywanê diguhertin. Bêhna şewatê bi ser malê ket. Agir bi jeneratorê ketibû, lembe jî tev şewitîbûn. Fikar bi wan re çêbûn. Apo fêm kiribû ku ji ber elektrîkê ye:

-Em derkevin derve, lê xwas neçin, şimikan bikin piyên xwe.

Li derve çav bi Alan ket, serê xwe kiribû ber xwe:

-Alan, te mala me xirab kir. Te tiştên me tev şewitandin. Ma aqilê te ne li wir bû? Şiyar bin, bila hişê we li ser karê we be.

Dîsa çû hundir, gazî Mezlum kir:

-Hûn di nava derfetên herî baş de dijîn, li zarokên alemê jî wiha dikin. Hûn tiştên malê xirab dibin, xwarina wan kêm dikin, ev çi ye hûn dikin?

Mezlum pir li ber xwe ketibû, şiyariya Apo ya ji bo pêdiviyên milîtanan bala wî kişandibû. Qederekî li ser nirxan û nirxdayîna milîtanan pê re axivî.

Dema nûçeyan bû, rûnişt guhdarî kir. Piştî nûçeyan dîsa gazî Mezlum kir:

-Ka were te li Cizîrê çi cihên dîrokî dîtin?

-Serokê min, kelehên mezin li wir nînin, hemû deşt e. Girekî mezin û dîrokî heye, tev bi kevirên reş hatiye çêkirin. Jê re dibêjin Girê Lîlon. Lê ketina wir qedexe ye. Li Serêkaniyê jî li Til-Helef heykelekî ji zêr dîtine.

-Hûn çi ji dîrokê fêm dikin, ew girên wir tev dîrokî ne. Lê bala we jî nakişînin.

Berê xwe vegerand ser yên din:

-Li vir dostên em nas dikin hene, em dikarin îro civînekê bi wan re çêkin. Sersala e stiranbêj jî werin baş e. Nêrîna we çi ye?

-Serokê min, dibe ku gel bêje çima Serokatî bi wan re rûniştiye. Lewre rexneyên gel li wan hene.

-Divê em wan ji wê rewşê derxin. Bila di xizmeta gel de bin, hunermendên gelê xwe bin. Bila rexneyên xwe di civînê de bidin.

Ji bo amadekariya civînê Mezlum û Kemal derketin

Roja din piştî civînê, Mezlum li eywanê derbarê civînê de agahî didan:

-Serok li ser jin û malbatê axivî. Gel rexneyên xwe li hundemandan kirin, wan jî rexne qebûl kirin. Lê behsa zehmetiyên xwe yên madî kirin. Serok ji Elî Tico re got, min berê guhdarî stranên te dikir. Em dixwazin ji niha pêve hûn hunerê xwe bixin xizmeta gelê xwe.

Dixwest mijarên girîng yên civînê bineqîne, ji wan re bêje:

-Malbatên Serokatiyê nas dikin hatibûn, pir jî zarok hatibûn. Serokatiyê bi zarokan re xwarin xwar. Çawa ew jî zarokek be di

nava wan de, wisa tevdigeriya.

Dema şîvê bû, Apo ji odeya jor daket, çû ser sifreyê. Li hemberî Mezlum rûnişt:

-Mezlum, civîna doh baş bû ne? Te ji hevalan re got?

-Rast e serokê min, gelek xweş bû. Min xal bi xal tev ji hevalan re got.

Piştî xwrinê derbasî eywanê bûn. Apo rûniştibû, Mezlum jî li hemberî wî li ser piyan sekinîbû.

-Êê, Mezlum, te soza xwe jî da. Ev demeke dirêj e em bi hev re. Tu diçî çiyayên azad. Divê tu pir baş xwe biparêzî. Dibe ku em careke din li van deran hev nebînin. Destpêka tu hatî vir, min ji te re got, ev odeya pirtûkan e, ev jî cihê rûniştinê ye û bixwînin. Çanda cîhanê nas bike, xwe pêş bixe. Divê tu hay ji xwe hebî. Şiyar be zû şehîd nekevin. Her ku yek ji we şehîd dibe, parçeyek ji canê min pê re diçe.

Hinekî sekinî, gazî Kemal kir:

-Mezlum û hevalên din bibe Qamilşo vegere.

Êdî dema xatirxwestinê bû. Yên wê biçin tev li eywanê bûn, Apo bi wan re diaxivî. Piştî suhbeteke dirêj, bi wan re heta ber seyareyê çû. Berî ku seyare bi rê bike, di pencereyê re bi destê Mezlum girt:

-Te soz daye, li soza xwe xwedî derkeve. Emê vê carê li welat hev bibînin.

Bi tevgera seyareyê re, her du destên xwe ji wan re bilind kirin. Destên wî wisa man li hewa heta seyare ji wir dûr ket.

***

6ê meha yekê bû. Seyareya Ebû Ehmed û Haşim tê de, li kolanên Qamilo, ji ber barana zêde û koncalên tijî av, hêdî hêdî dimeşiya. Ebû Ehmed seyare diajot. Haşim di hişê xwe de hesabê pêwîstiyên koman dikir:

-Me şêst çente anîne, kom jî şêst kes in. Di vê baranê de ez bawer nakim, leşker derkeve teftêşê. Ebû Ehmed te çi kir?

-Kamyon jî wê êvarê li cem komê be.

Nêzîkî Dêrikê bûbûn. Haşim hê di nava hesabê xwe de bû:

-Divê em îro zû biçin ser avê û komê tevê derxin. Em ji Dêrikê hevalan bigirin, biçin Mêrga Mîran.

-Hevalê Haşim, ma em dikarin vê baranê biçin?

-Ma kengê partiyê ji ber baranê kar sekinandiye?

-Tu jî rast dibêjî, ji ber tiştekî kar nesekiniye.

Piştî ku ji Dêrikê kom rakirin, berê xwe dan Mêrga Mîran. Li nêzî Pira Şekir Xaçî seyreya  wan ket heriyê. Seyareya komê jî li dû wan rawestiya. Peya bûn li rewşa seyareya xwe temaşe kirin. Ne ya çûnê bû. Her du destên Ebû Ehmed di teniştên wî de bûn:

-Hevalê Haşim, tu bi ya min bikî em vegerin Dêrikê.

Lê hem hişê Haşim, hem çavên wî li ser seyareya di nava heriyê de bûn:

-Me ti carî karê xwe di nîvî de nehiştiye, îro jî em nahêlin. Heval pir in emê bi alîkariya wan seyareyê derxin.

Ji nava komê dengek hatiyê:

-Ma hûn dîn in, we em di Pira Şekir Xaçî re anîne? Kî dikare vê seyareyê ji vê heriyê derxe?

Mezlum jî ji seyareyê peya bû ber bi wan ve çû. Haşim nas dikir:

-Hevalê Mezlum, min nizaniya tu jî hatî.

-Em ketibûn seyareyê, hûn jî li pêşiyê bûn, ji ber wê me hev nedît.

Haşim ber bi komê ve çû:

-Hevalno, emê seyareya xwe derxin, biçin. Ti karê em nekaribin bikin nîne.

Bi gotina xwe re zendûbendên xwe ba dan, ber bi seyareyê ve çû. Yên din jî bilez li dû çûn. Piştî kêferateke mezin seyare ji heriyê derxistin. Li wê çolê, li ber wê baranê dengê çepikan bilind bû. Kêfa Haşim hatibû:

-Piştî dersa teoriyê pratîka wê  îro li vir dest pê kir!

Bi wan cilên biherî careke din berê xwe dan Mêrga Mîran. Li wir cilên xwe yên leşkerî li xwe kirin, çek û çenteyên xwe girtin. Êdî ew koma sîvîl çûbû, komek gerîla hatibû. Haşim jî destek cilên gabardîn li xwe kiribû. Kefiyeke reş-spî avêt ser milê xwe, çeka xwe avêt milê xwe. Li pêşiya komê sekinî. Çavê her kesî lê bû. Weke gerîlayekî salan xuya dikir, ewqas cilêbergên gerîla û çeka wî lê hatibûn. Çû ber pencereyê li derve nêrî. Baraneke hûr dihat. Derket derve, li mija xwe li dora Qereçoxê pêçayê temaşe kir. Çû ser banê xênî, di neqeba her du girikên li pêşiya malê re li Dêrikê nêrî. Ji bajêr heta serê Cûdî temaşe kir, lê ji mijê tiştekî xuya nedikir. Ewrên reş û tarî Cûdî di himbêza xwe de veşartibûn. Li cilên xwe yên gabardîn nêrî, ji baranê şil bûbûn. Keniya: “Cûdî ez bi van cilan ve dîtim, besî min e.” Mezlum jî hatibû li tenişta wî sekinîbû. Wî jî berê xwe da çiyayê Gabarê:

-Hevalê Haşim, emê îro ji vir xatir bixwazin.

-Hûn carekê xatir dixwazin, lê ez her tim dixwazim. Her cara xatir dixwazim, çawa ku ezê venegerim dixwazim, lê dîsa vedigerim.

Çavên her duyan li ser Cûdî rawestiyabûn:

-Hevalê Haşim, ezê wêneyên xwe li cem te bihêlim.

Haşim keniya:

-Her hevalê diçe albûma xwe dihêle. Tu dizanî odeyeke me tijî albûm bûye.

Her du bi hev re keniyan. Haşim hinekî lê temaşe kir:

-Tu dizanî, roja ez Ava Mezin nebînim, çawa ku min tişteke xwe wenda kiribe. Ez bi birin û anîna hevalan pir kêfxweş dibim.

Mezlum hestiyar bûbû. Dîmenên Apo hemû dianîn ber çavên xwe:

-Hevalê Haşim, tu dibêjî emê careke din Serokatiyê li vir bibînin?

-Her kes neçar e rojekê li welatê xwe vegere, ev der jî welatê me ye û hûnê jî vegerin.

Haşim li saeta xwe nêrî. Êdî dema çûnê bû. Daketin xwarê, çûn cem komê. Her kes amade bû. Li kamyonê siwar bûn, ber bi Ava Mezin ve ketin ser rê. Piştî qasekî peya bûn dest bi meşê kirin. Êdî seyare meyare nemabûn, meşa gerîla dest pê kiribû. Piştî meşeke dirêj li ber avê li cihekî xewle sekinîn. Her kes bêdeng bû, Haşim û qasidekî din tenê di nava tevgerê de bûn. Bilezûbez qayîk amade kirin û dest bi derbaskirinê kirin. Dilê Haşim xweş bûbû, kom tev bi saxlemî derbasî milê din yê avê bûbû. Mezlum çenteyê xwe da pişta xwe bilez çû cem:

-Hevalê Haşim, vêca dema xatirxwestinê ye.

Haşim hestiyar bûbû:

-Erê, kêliya jê hes nakim xatirxwestin e, lê divê em xatirê xwe ji hev bixwazin.

Mezlum destê xwe danî ser milê wî.

-Gotineke te, rexneyeke te li ser me heye?

-Rexneyên min nînin, lê xwestekên min yên hevaltiyê hene, ew jî xebata serkefî û fêmkirina ji Serokatiyê ye.

Bikelecan hev himbêz kirin, xatir ji hev xwestin. Piştî çûna wan, berê xwe da koma ku wê derbasî Rojava bike. Ew jî li ber avê rûniştibûn. Li ronahiya di pencereyên malên Endîwerê re diteyîsîn, temaşe kir. Dengê pêlên avê bala wî kişandin ser xwe. Ew deng bûbû parçeyek ji jiyana wî. Stirana dayîka wî ya li ber Dîcle jê re gotî hat bîrê. Dixwest bideng bêje, lê erkê wî ew derfet nedidayê. Di dilê xwe de got: “Sibhanî xweş sibhanî, raserî vî şetiyanî. Tu qirş û qelaşê vî bajarî li ber xwe tînî. Meşiyam raserî vî şetiyanî, cemîê cihê Botan li ber xwe tînî. Çiqas li şet û pêlên te dinêrim, bejna te tayek ji reyhana reş e. Ew Cizira min hebandî refê qaz û qumriyan firandî...” Kêfa wî jî ji strana dayîka wî re dihat. Berê xwe da komê. Ji bo derbaskirina komê qayîk kişand cihekî ku bikarin lê siwar bibin. Di nava bêdengiyê de ew jî bi saxlemî derbasî milê Rojava kirin. Lê diviya careke din vegere aliyê din, li wir qasidê hevalê wî û hin pêwîstî mabûn. Li qayika xwe ya ji dep û dolaban çêkirî, siwar bû, berê xwe da wî milî. Vê carê tenê derbas dibû. Hevalê wî li ber avê li benda wî bû. Piştî ku pêwîstiyên xwe bar kirin, dîsa berê xwe dan Rojava.

Pêlên avê yên bilind bala wî kişandin, her ku diçû bilindtir

dibûn, li şûna mişînê êdî dengê guregurê ji avê dihat. Çawa ku pêl bi taybetî berê xwe bidin wî, ketinbûn nava êrîşê. Lê ew jî kurê avê bû, li ber pêl û xofa wê mezin bûbû. Tirsa wî jê tinebû. Çawa ku şevê û avê li hemberî wan li hev kiribin, wisa bi ser wan de diçûn. Her ku diçû xeter pirtir dibû, pêlan li tenişta qayîkê dixist. Carna hindik dima ku wergere, lê bi hosteyiya wî careke din diket ser binê xwe. Di nava kêferateke mezin de bû, li nava qayîkê nêrî, hevalê wî ne tê de bû. Çavên xwe baş li nava wê gerandin, lê Ava Mezin ferman dabû, dabû pêşiya xwe, bi xwe re biribû. Haşim ev ferman qebûl nedikir, diviya hevalê xwe vegerîne. Bikel xwe avêt nava pêlan lê geriya. Lê avê jî qîma xwe bi yekî tenê nedianî, dixwest her duyan bibe. Rêwîtiya her du qasidan vê carê dûr bû. Haşim dengê xwe kiribû nava dengê Ava Mezin. Qesemên wê û Haşim, bi dawî bûbûn. Êdî ne wî dikarî jê veqete, ne jî wê dikarî wî li ber peravên xwe bihêle. Perava jiyan dayî, bi xwe re jiayanên din birin...

Serê sibê bû. Apo li benda xebera gihîştina komê bû. Dengê telefonê hat. Bi gotina “Kom gihîşt cihê xwe” kêfa wî xweş bû, lê bi gotina pişt re, telefon danî di cihê xwe de sekinî. Wê rojê heta êvarê li benda koma hatî ma. Derengê êvarê gihîştin cem. Ebû Ehmed li hember sekinîbû, lê nizaniya ka wê çi bêje. Bi dilekî xemgîn berê xwe dayê:

-Haşim çawa şehîd ket.

-Serokê min, ji min re got, min bibe ber avê. Min birin, lê ez pê re derbasî wî milî nebûm. Lê ya me zanî qasidê pê re ketiye avê, wî jî xwestiye xelas bike. Her du jî şehîd dikevin.

Apo pir xemgîn bûbû, kulma xwe dişidand:

-Haşim melevanî dizanî, çawa wisa bûye?

Qederekî wisa sekinî, çû hat berê xwe da koma nû hatî:

-Hevalê Haşim di navbera Rojava, Bakur û Başûr de qasidekî me yê pir hêja bû. Li her sê parçeyên Kurdistanê heval dibirin dianîn. Di rêveberiya qasidan de jî cihê xwe digirt. Ew bixwe jî Beravî bû. Di derbaskirina koman de roleke wî ya mezin hebû. Min ji nêz ve nas dikir.

Bi vê gotina xwe re hinekî sekinî, bayekî xwemgîn bi qasî wê rojê sar ket dilê wî. Lê dixwest Haşim mayînde bike û yên li wir tev bizanin ka kî ye û çiqas kar kiriye:

-Ked û xebata min ji nêz ve dişopand. Li vir rola wî li ber çavan bû. Hevalekî fedekar û durist bû. Divê em wateyê bidin keda wî û qet ji bîr nekin.

Her kes bêdeng û xemgîn bû. Her ku bêhnekê disekinî, dîmenên Haşim dihatin ber çavên wî...

***

Meha Tebaxê bû. Apo li dibistanê li ser şerê gel yê şoreşgerî diaxivî. Piştî dersê gazî kemal kir, çûn malê. Şêxo derî ji wan re vekir. Bi rûyekî geş berê xwe dayê:

-Îro mêvanekî hêja tê, haziriyan baş bikin.

Hinekî pêş ve çû lê vegeriya:

-Dostekî pir girêdayî ye. Bi dengê wî em gihîştin vir.

Derbasî pirtûkxaneyê bû. Milîtanên li malê dest bi haziriyê kirin.

Êvarê dinya tarî bûbû. Apo derket hewşê, gazî Kemal kir:

-Mêvanên me derng man.

-Serokê min ji ber trafîkê dereng mane, lê gihîştine Şamê.

Di wê navê re dengê seyareyê hat. Deriyê hewşê vebû. Aram Tigran bi bedlê xwe yê fermî ji seyareyê daket. Apo çû pêşiya wî, hev himbêz kirin. Qederekî wisa man. Çend caran çûn rûyên hev û kêfxweşî li hev dan, li rûyê wî yê guroveger û gewr nêrî:

-Herî dawiyê me hev dît, tu bi xêr hatî.

-Serokê min, tu li kû bûyayî minê xwe bigihanda te. Lê ez li benda xebera te bûm. Dîsa mêvanê xwe himbêz kir:

-Tu bi xêr hatî hevalê min yê zarokatiyê.

-Serokê min, çend stiran min ji bo we çêkirine.

Kêfa Apo pir hatibû, lê dinêrî û dikeniya:

-Dawiyê em gihîştin hev, heskirina me ya kevin, em gihandin hev.

Destekî xwe danî ser milê wî, destên wan di nava hev de çûn hundir. Milîtanên li hundir tev ji bo pêşwaziyê ketibûn rêzê. Piştî silavdayînê, li eywanê li hemberî hev rûniştin. Bi rûyekî pir geş li mêvanê xwe dinêrî:

-Ez ji hevalên me re timî dibêjim. Dema min guhdarî dengê te kir, çawa ku dengê jiyanê be gazî min bike. Gazî ruhê min dikir. Hestên min şiyar dikirin. Min bi kêfxweşî guhdarî dikir.

Aram, jî bi rêzdariyeke mezin guhdarî dikir û kêfa wî pir dihat:

-Serokê me, min gelek stiran ji bo hesreta te ya ji Kurdistanê re çêkirine.

Suhbet kirin heta dema şîvê hat. Bi hev re çûn ser sifreyê. Piştî xwarinê jî suhbeta xwe domandin. Gelek tiştên ji hev re bigotan hebûn. Apo bi heskirineke mezin lê dinêrî. Dostayiya Kurd û Ermeniyan ya hatî wendakirin anî bîra xwe:

-Dema tu bi kurdî distirînî, mirov dizane ka tu çiqas ji Kurdan hes dikî.

Aram serê xwe hejand, gotinên bav û kalên xwe yên di dema fermanê de dianîn bîra xwe:

-Serokê me, di dema fermana Ermeniyan de em reviyan çûn gundekî Serhedê. Mezinên me, ji me re digotin, Kurd û Tirkan Ermenî kuştine. Lê Kurdan em rizgar kirin. Piştî em xelas bûn, bavê me got me, divê hûn vê qenciya Kurdan ji bîr nekin. Ev wesiyeta bav û kalê me ye û emê heta mirinê bi Kurdan ve girêdayî bin.

-Min bi stirana te Kurdistan nas kir. Dengê te ew dostayiya xiyanet lê hatî kirin, anî bîra min. Wî dengî digot min, vê girêka kor veke û berê avê vegerîne ser riya wê. Zilma li ser we û li ser me heman zilm e û em birayên hev yên axê û hestan in.

Li ser dîroka Ermeniyan qederekî xweş axivî. Berê xwe careke din vegerand ser:

-Tu ji bo van xort û keçan çi dibêjî?

-Serokê me, tiştên min xwestîn te hemû kirine. Tenê dixwazim xort û keçên me li dostayiya gelên me xwedî derkevin. Westiyeta li me hatî kirin ez jî li wan dikim.

-Ez ji timî ji wan re dibêjim, li xwe, çand û hunerê xwe xwedî derkevin. Huner û leşkerî hev temam dikin. Dengbêjiyê dîroka me li ser piyan hiştiye. Her ku ez stirana Derwêş û Edûlê guhdarî dikim, bi hezaran tiştên dîroka me yên veşartî tê de dibînim. Dostayî, xiyanet, welatparêzî, hevaltî, heskirin û xweşikbûna welat tê de dibînim. Ez dibêjim li Evdalê Zeynikê guhdarî bikin, dostayiya Ermenî û Kurdan bizanin. Dostayiya xwezayê bizanin.

Aram li ber gotinên wî mest bûbû. Çawa ku helbesteke li gorî dilê wî bêje, wisa lê guhdarî dikir. Ketibû kelecanê, destê xwe da ber guhê xwe û dest bi stirana Ey dilberê kir. Çawa ku li ber çemê Feratê guhdarî bike, Apo wisa kêfxweş bûbû. Carna jê pê re digot. Piştî stiranê Aram berê xwe da çenteyê xwe:

-Serokê me, min hin xelatên piçûk ji bo we anîne.

Apo gazî Şêxo kir:

-Şêxo, ka wî çenteyî bîne Aram ji me re çi aniye!

Şêxo bi zorê çente anî danî pêşiya Aram. Çend gumelek, pêlav, pantolon, qerewat û hin diyariyên piçûk tê de bûn. Her xelatek bi taybetî hatibû pêçan. Apo li wan dinêrî û dikeniya. Piştî qebûlkirina diyariyan, cihê Aram lê bimîne şanî kirin. Di wê navê re Kemal ket hundir. Tûrikekî kevin li milê wî bû:

-Kemal, ew ji welat hatiye?

-Rast e serokê min, fistiqên erdê we ne. Mêvanan ji bo Serokatiyê anîne.

Rabû ser xwe tûrik ji destê wî girt:

-Hûn nizanin di nava van fistiqan de min çiqas kar kiriye.

Tûrik bir odeya xwe danî ber serê xwe.

Roja din serê sibê ku ji sporê hat, Aram li nava baxçe dît, gul bîn dikirin. Çû cem:

-Em bi hev re biçin dibistanê ji hevalan û gel re hefleyekê çêke. Pişt re em bi hev re biçin Helebê. Li wir jî biçe cem Ermeniyan civînan çêke. Behsa dostayiya Ermenî û Kurdan bike. Tu dikarî mitîngekê jî çêkî. Biçe gelê Rojava tevî bibîne. Bi her zimanî bistirîne. Bila her kes dengê te bibihîze.

***

Li dibistanê dawiya dewreyê bû. Hem ji bo qedandina dewreyê, hem ji bo şahiya 15ê Tebaxê her kes di nava kelecanê de bû. Milîtanên soz dayîn, ji bo çûnê xwe amade dikirin, yên din jî raporên xwe dinivîsîn. Lênûsa Şervînê jî di dest wê de bû. Sara ji aliyê din ve hat cem:

-Te rapora xwe xelas nekir?

-Xelas bû.

Hem dimeşiyan, hem suhbet dikirin. Sara dixwest tecrûbeya xwe bi wê re jî par ve bike:

-Serokatiyê hem hêza teoriyê daye me, hem ya çalakiyê. Tişta dayî me di cewherê xwe de felsefeya jiyanê ye.

Geh suhbet dikirin, geh bêdeng dibûn. Şervîn di kelecana çûna qadên şer de bû.

Apo û Xweşnav li pirtûxaneyê rûniştibûn. Wî digot, Xweşnav dinivîsî. Gotinên xwe temam kirin, rabû ser xwe:

-Wê ev kongre li Tehranê çêbe. Wê Tirk jî tevlî bibin. Divê nameya me wir bihejîne. Piştî te xelas kir bîne, carekê ji min re bixwîne.

Li saeta xwe nêrî:

-Em diçin dibistanê, çi dema te xelas kir were.

Ew, Aram û Kemal ketin ser riya dibistanê. Her kes li hundir li bendê bû. Weke her carê bi dengê "Şiyar bin" re her kes rabû ser xwe. Yekser derbasî pişta maseyê dîwanê bû. Çend kêliyan çavên xwe li ser milîtanan gerandin. Çavên xwe li ser Şervînê rawestandin:

-Were vir xwe bide naskirin.

Şervîn bilez çû li tenişta mase sekinî:

-Navê min yê nasnameyê Necah, yê tevgerê Şervîn e. Sala 1970'î li Dêrikê hatime dinê, 1990î tevlî partiyê bûm. 1992. derbasî welat bûm, 93. vegeriyam. 94. dîsa çûm. 96. dîsa vegeriyam. Deh meh in li vir im.

Apo baş nas dikir, lê dîsa li kurtenasîna wê gudarî kir. Hinekî hizirî, berê xwe dayê:

-Ev cara sisiyan e tu dixwazî biçî? Te ji vê jiyanê çi fêm kir? Bêtirs bêje.

-Serokê min, pêvajoya em hatîn vir pir bi zehmetî derbas bû. Ez ji serûbin hejiyam. Lê bi alîkariya Serokatiyê hinekî bi ser xwe ve hatim. Wê çûna min ya welat ya vê carê çêtir nêzîkî rastiyê be.

Dixwest encamên girtî tevan baş bizane:

-Te çarçoveya rastiya mirov bi awayekî piralî girt?

-Rast e serokê min

-Texmîn dikim te rêbaza rêxistinê baş fêm kir.

-Herî zêde ji aliyê rêxistinê ve rêbaza Serokatiyê.

-Texmîn dikim te cidiyeta resmiyet û rêveberiyê jî baş fêm kir. Azadiya jinê çi ye, ne çi ye û ka divê çawa li ser xwe bisekine, te ew jî bi kûrayî fêm kirine. Di mijara şoreşê de, di mijara artêşa gel de, ne wisa?

-Serokê min, hema hema di tevayiya mijarên bingehî de, ji aliyê nêzîkatiyê ve ji aliyê têkiliyan ve, di asta hişmendiyê de min ji kûrayî ve qezenc kirin.

-Te têra xwe tecrûbeya siyasî û zanebûn girtin. Eger tu durist bî, bi keda xwe, bi xebata xwe bi ser de biçî, mijara tu tê de bi ser nekevî nîne.

-Min gelek kêmayiyên xwe dîtin, serokê min.

-Zanebûna te ne kêm e. Tu li ser kîjan mijarê rawestî tuyê bikarî fêm bikî. Lê pirsgirêk rêbaza te ye. Biryara rast bide û heta dawiyê li ser biryara xwe raweste. Tu dibêjî wê vê carê bi her awayî mirovê azad bê afirandin?

-Baweriya min bi min tê serokê min.

-Bila karekî we ji aliyekî ve xebat û şer, ji aliyê din ve jî nivîs be. Jiyana azad çawa ava dibe, ev karê we ye. Rêveberî ev e, YAJK ev e. Di vir de xwe wenda nekin. Bila ti kes bi we nelîze. Hûn jî bixwe nelîzin. Ev jî girîng in ne wisa? Piştî niha tuyê xwe biparêzî, pir çalak bî û birêxistin bî. Lê ne ji bo xwe tenê, tuyê ji bo tevayiya hevalên xwe roj bi roj serkeftî bî.

-Ezê bixebitim xwe bigihînim çarçoveya Rêbertiyê danî.

-Tuyê heta dawiyê xwediya soza xwe bî û agahiyên baş rêkî. Ev cara sisiyan e tuyê biçî. Ji bîr neke kesê di cara sisiyan de bi ser nekeve êdî iflah nabe. Insan carekê dikeve, du caran dikeve, di ya sisiyan de divê rabe. Ji bo wê jî pêwîstî bi serkeftinê heye. Em vê dixwazin û li bendê ne. Soza xwe bi dawî kir, çû li cihê xwe rûnişt. Xwêdan bi ser eniya wê ketibû. Soza vê carê ji ya her carê zortir lê hatibû. Lê ewqas jî baweriya wê pê hatibû.

Dora sazdayînê hatibû ser Zekî. Bi rûyekî cidî derket pêşberî milîtanan sekinî. Li kêleka Apo çawa ku mirîdek be wisa destên xwe di ber xwe de berdabûn. Li pêşberî xwe dinêrî:

-Navê min Şemdin Sakik, navê tevgerê Zekî ye. Sala 1959. li gundê Zengok, yê ser bajarokê Kizilagaç yê Mûşê hatime dinê. Sala 1979. tevlî partiyê bûm. Heta îro min gelek erk girtine. Ev salek e li qada Serokatiya partiyê me. Ji bo çûna Deryaspî amade me, serokê min.

Apo nefeseke kûr kişand, di hundirê xwe de salên wî di

piratîkê de derbas kirîn hemû rêz kirin:

-Belê Zekî, niha tu hatî rewşeke ku hem wateyê bidî soza mezin, hem girêdaneke mezin nîşan bidî. Tu bûyî mijara diyalogên herî fereh û rexneyan, Tu careke din ber bi qada xebatê ve diçî. Ti şoreşgerên dinyayê dema derketîn ser rê hinge te ne bişans bûn.

-Serokê min, şerê li Kurdistanê dijmin kişandiye Kurdistanê. Vê jî wisa kiriye ku li eniya Tirkiyê valayî çêbe. Ev jî ji bo destpêkê awantajeke mezin e. Her çar demsalan jî gerîla dikare xwe li wir biparêze. Hedefên em bi ser de jî biçin pir in.

-Hem di warê leşkerî, hem di warê jiyanê de gelek rexne li te hatin kirin. Tuyê bi karê li wir wateyê bidî wan. Te li ser Rêbertiyê pir bi kûrayî nivîsiye. Lê mijarên tu encamê jê derxî hene. Yek jê ew e ka min çawa tu birêxistin kirî, ne wisa?

-Ne ez tenê, her kes serokê min.

-Erê, encama herî girîng divê ev be. Eger tu bala xwe bidiyê, birêxistinkirina te, bi serê xwe, serkeftineke mezin e ne wisa? Te çîroka xwe nivîsiye, kesayeteke ji aliyê civakê ve hatî herimandin heye. Kesayeteke ku ti kesî ti pîvan nîşan nekirîn, ji aliyê malbata xwe ve jî hatî piçûkxistin. Bawer dikim te hêza birêxistinkirinê fêm kir.

-Rast e serokê min, şexis bi serê xwe nikare tiştekî bike.

-Taybetiya şoreşgeriya me ya herî girîng, ne teknîk, ne jimar e, heta ne zanebûn e. Ev jî girîng in, lê ya bingehî taybetiya birêxistinkirinê ye. Taybetiya birêxistinkirina mirovan cewherê tevayiya serkeftinan e.

-Rast e serokê min.

-Derbarê jiyanê û jinê de jî tu pir hatî rexnekirin. Texmîn

nakim tu bêedebiyeke bi dizî bikî. -Na serokê min.

-Li cem me hema hema nan û av jî bi têkoşînê ve girêdayî ye, bi şer ve girêdayî ye. Bêguman ji ber ku şer şer e, em jê hes nakin, lê em jiyana xwe, her tişta xwe bi şer bi dest dixin. Ji ber ku bi zorê ji me standine, emê jî van kilîtan bi şer vekin.

-Rast e serokê min, ji ber ku jiyana ma bi şer mûmkin dibe em şer dikin.

-Rijandina dilopek xwîn jî êş e. Bi awayê felsefîk em li dij in, lê eger em zora dijmin bînin ber çavê xwe, wê her tişt bi şer çareser bibe. Li ser vî bingehî em bawer dikin tuyê bi soza xwe ve girêdayî bî.

Platforman heta derngê şevê dewam kir. Wê şevê li dibistanê ma. Roja din 15'ê Tebaxê bû. Ji gelek deveran rojnemevan hatibûn dibistanê. Cihê axaftina wî dihat hazirkirin. Sara al girtibûn ber bi cihê roprtajê ve diçû. Her sê al danîn kêleka kursiyan. Teyrê baz jî rast kir û guleke sor jî danî ser mase. Ji bo agahiyê bide çû cem Apo.

-Serokê min her tişt amade ye.

Wî jî berê xwe da Aram û bi hev re rabûn ser xwe, ber bi cihê roportajê ve çû. Silav da rojnamevan, li ser kursiyê xwe rûnişt. Milîtan jî tev rûniştibûn.

-Tirkiyê siyaseta xwe tev li ser dijberiya me ava kiriye. Ev tê wateya ku em Tirkiyê dimeşînin, evqas em bi hev ve girêdayî ne. Me dixwest vê pirsgirêkê bi siyasetê çareser bikin. Dizanin bê çareseriya meseleya Kurdistanê, yên Tirkiyê jî çareser nabin, lê çavên xwe digirin. Tirkiye ji ber îdeolojiya xwe ya şovenîst nikare gavan biavêje.

Hinekî bihêrs diaxivî:

-Şerê pazdê Tebaxê, şerê mirin û mayînê bû. Me tirsa mirinê rakir. Kî bikare çi bike divê bike. Şoreş ji bo jiyanê ye. Şoreş qeder û jiyana me ye. Bi şoreşê re jiyan dibe jiyan.

Axaftineke pir bihêz û ji peyaman dagirtî kir. Her gotina digot êdî dizanî çavê kurdan û cîhanê li ser e, encamên şer gihiştiyê, peyma sal nû da. Roporrtaj bi çepikan bi dawî bû. Rojnemevan jî bi wan re rabû ser xwe li çepikan xist, ew jî bi axaftina wî bibandor bûbû.

Dema şahiyê bû, her tişt hatibû amadekirin û gel jî hatibû. Piştî axaftina Apo ya li ser 15ê Tebaxê, Aram derket ser dikê. Li asîmanê dibistanê kêfeke mezin belav bûbû. Apo di nava gel de rûniştibû, lê guhdarî dikir. Her tim xeyalê wî dîmenî kiribû. Aram jî her ku li pêşberî xwe Apo didît, rûyê wî geştir dibû û xweştir dikir. Piştî stirana dawiyê, Apo çû ser dikê; destê xwe danî ser milê wî û bi hev re destên xwe ji gel re bilind kirin. Gel tev bi wan re rabû ser xwe û bi dengê bilind durişmên bijî Serok Apo avêtin.

## BEŞA HEŞTEMÎN

Sal weke avê diherikîn diçûn. Ji destpêka meha Adarê ve, dîsa tevgerê dest pê kiribû.

Heştê Adarê bû. Gelek milîtanên jin ji malên perwerdeyê berê xwe dabûn nava qadên gel. Hem tevlî pîrozbayiyan dibûn, hem ji jinan re civîn çêdikirin. Li qata dehan, rojê tîrêjên xwe di pencereyê re berdabûn nava eywanê. Her çar quncikên wê bi kulîlk û gulan hatibûn xemilandin. Teyrê baz li milekî sehpa hatibû danîn, li milê din wêneyê Zîlanê bû. Ew çend roj bûn Nûcan û Necah ji Helebê hatibûn qata dehan. Bihar jî ji nava xebatê hatibû. Tev di kelecana heştê Adarê de bûn. Yên nû hatîn, Sara tevger û pergala nava melê û bernameya perwerdeyê nîşanî wan dida. Heta saetên xwendinê, saetên nîqaşê û ka kîjan pirtûkan bixwînin, ew jî diyar kiribûn. Ev bernameya rojê ji bo wan weke xewn û xeyalan bû. Xewna wan pêk hatibû. Nûcan li pêşberî Sara rûniştibû, geh pirs dikirin, geh nêrînên xwe digotin. Çawa ku dayîkek zarokên xwe perwerde bike, Sara jî wisa nêzîkî wan dibû:

-Her çenda ev roj di asta navneteweyî de di salên 1970'î de hatibe pejirandin jî, bûyer û daxwaziya pîrozkirina vê rojê ya

weke rojeke hevbeş ya jinên cîhanê rastî salên 1800'î tê. 8ê Adara 1857'an li New Yorkê jin ketin grevê. Daxwaziya wan saetên wan yên kar dakevin 8an û heqdestekî weke hev ji wan re were dayîn. Lê kargeha jinan hat şewitandin û bi qasî 100 jin di encam vê bûyerê de mirin. Her çenda jinan bi grevê daxwaziya xwe dabin pejirandin jî, têkoşîna bi rêxistinî ya ji bo mafên jinê di salên 1900'î de dest pê dike.

Sara dema behsa wan salan dikir, pê re êşên jinan di her warî kişandîn, bîr dianîn. Bihar li kêlekê rûniştibû. Biharê jî dixwest li ser wê rojê gotinên wê temam bike:

-Sala 1903'an li Emerîka ji bo parastina mafên jinê yên aborî, polîtîk û kesayetî "Koalîsyona Sendîkayên Jinan" hat sazkirin. Yekşema dawî ya sala 1908'an jinên sosyalîst li New Yorkê, ji bo mafên xwe yên polîtîk, aborî û dengdanê meşek pêk anîn. Ew roj wek "Roja Jinan" tê qebûlkirin.

Necahê gul rast dikirin, lê bi baldarî guhdarî nîqaşê dikir:

-Li Emerîka lêgerîna jinan ya ji bo mafên xwe, sala 1909'an bi beşdariya 2 hezar kesî xwepêşandanek pêk hat. Piştî wê jî bi beşdariya 20-30 hezar jinên karkerên tekstîlê greveke giştî hate destpêkirin. Dixwestin şert û mercên xebata wan were başkirin û heqdestekî baş were dayîn. Tevan bi baldarî li hev guhdarî dikir. Nûcanê jî xwest li ser gotinên wê temam bike:

-Têkoşîna jinên Emerîkî, bandor li jinên Ewropa jî kiriye. Sala 1910'an li Kopenhagê Konferansa Jinên Sosyalîst ya Navneteweyî ya Diduyan hat lidarxistin. Di konfresansê de Clara Zetkin derbarê rojeke jinan ya cîhanî de ku jin bikarin tê de daxwaziyên xwe bînin ziman, pêşniyar kir û pêşniyara wê hat qebûlkirin. Piştî vê biryarê ku rojeke teqez nehat diyarkirin,

Roja Cîhanî ya Jinan 19ê Adara 1911'an li Almanya, Awustralya û Danîmarka hat pîrozkirin. Girîngiya vê rojê ew bû ku qiralê Prusya sala 1848an hin reform mohr kiribûn û di nava wan reforman de jinê bikarin mafên xwe yên dengdanê bi kar bînin. Lê ev reform pêk nehatin. Pirsgirêkên me jina tevan li kû bin yek in. Lê li kurdistanê ev hemû bi hev re pêk hatin. Ne ji bo hin maf, ji bo jiyanê tekoşîn tê kirin.

Qerenfîl di destê Necahê de bû, di ber biskên xwe re kir. Weke sêkoçiyê ket nava xelekên pora wê:

-Pîrozkirina 8 adarê weke Roja Cîhanî ya Jinan jî sala 1972yan bi rêxistineke mezin ya bi navê "Tevgera Adarê" ya li Sidneyê dest pê kir. Piştî ku Neteweyên Yekbûyî navbera salên 1975-1985'an wek "Deh Salên Jinên Neteweyên Yekbûyî" îlan kir, 16ê Kanûna 1977'an jî 8 Adarê wek "Roja Cîhanî ya Jinan" îlan kir. Di salên piştî vê de welatên endamên Neteweyên Yekbûyî 8 Adarê wek Roja Cîhanî ya Jinan pîroz kir. Ji bo qebûlkirina wê rojê çi xwepêşandan, bedel dane. Me bedelê herî giran daye. Jina Kurd ji wan derbas bû.

Sara bi baldarî li wan guhdarî dikir:

-Li Kurdistanê piştî tevlîbûna bihêz ya hevriyên me, di warê fermî de tevgera yekê ya nûjen ya jinê TAJK, sala 1987'an hat sazkirin. Ev di encama tekoşîneke pir bihêz de pêk hat. Ev tevger sala 1988'an jî xwe wek Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistan YJWK guhert. Sala 1995'an jî bi navê YAJKê xwe saz kir. Li Kurdistanê, xulaseya wan rojan tevan, berdewamiya têkoşîna jinan bi awayekî rêxistinê niha em dijîn. Me di civakê de berdêla her gotinekê daye. Gelek hevalên me, mirin didan ber çavên xwe wisa tevlî dibûn. Divê em bi êşa jinan bihesin. Weke

Serokatiyê gotî, roj hemû yên jinê ne.

Rabû ser xwe li saeta xwe nêrî:

-Hevalno, bila her kes amade be, Serokatî kengê bê em nizanin.

Çû ber dolaba cilan, rahişt gumlekê xwe yê şînê asîmanî: "Ya herî baş ez vî li xwe bikim."

Ji bo pîrozkirina cejna milîtanên jin, Apo çûbû dibistanê. Ji wir jî berê xwe dabû malê. Sara her tiştê eywanê di ber çavê xwe re derbas kir. Her tişt temam bû. Gul û guldanik li cihê xwe bûn. Wêneyê Zîlanê hinekî li ser kursî rast kir. Milîtanên jin hemûyan xwe hazir kiribû. Lê hê jî bixwe ve mijûl bûn.

Bi lêxistina derî re tev ketin rêzê. Sara derî vekir. Rûyê wî pir geş bû:

-Cejna 8'ê Adarê li we pîroz be.

Yek bi yek himbêz kirin, derbasî eywanê bû. Çavên wî li ser wêneyê Zîlanê rawestiyan. Di dilê xwe de cejna wê û ya şehîdên têkoşînê yên jin pîroz kir: "Ev leza min ji ber helwesta we ye."

Çawa ku Zîlan li wir be çû li kêlekê rûnişt. Berê xwe da milîtanan:

-Rûnin, bila her kes rûne.

Tev li dorê rûniştin. Yek bi yek li rûyê wan nêrî. Yên ji berê ve li wir, yên nû hatîn tev di ber çavên xwe re derbas kirin. Hem rewşa wan dipirsî, hem bi bersivê kesayeta wan nas dikir. Herî dawî berê xwe vegerand ser Sara:

-Di vê pêvajoya li pêşiya me de, emê konferansa jinê ya neteweyî çêkin. Ji bo wê dixwazim çend tiştan bêjim. Tu hevala me ya herî kevin î. Ji niha ve dîwan tu yî. Di konferansê de, emê li ser çend tîpên jinan rawestin. Tîpa dûrî îdeolojiya jinê, ya ji

zayenda xwe dûr ketî, ya apolîtîk û hestiyar, ya xwediya hişmendiya azadiya şexsî, ya xwediya hişmendiya azadiya redker û çors, ya xeta Zîlan û jina azad. Ya ji bo me maqûl û meqbûl, ya li ser xeta Zîlan e.

Piştî axaftineke dirêj li saeta xwe nêrî, dema tevlîbûna bernameya tv bû.

-Emê îro ji bo jinan tevlî bernameyê bibin.

Rabû çû ber telefonê. Yên li wir hemû li dorê kom bûn. Bernameyê dest pê kir:

-Birêz Ocalan, hûn behsa pêwîstiya zelalkirina bîrdoziya jinê dikin, wê ev çawa pêk were? -Îro ez li ser navê jinan diaxivim. Eger em dibêjin jiyana herî xweşik jiyana li ser xaka welat e, bîrdoziya jinê jî bê welat nabe û welat jî bê welatpêrîzî nabe. Weke din, eger jin dixwaze cihekî azad ji xwe re peyda bike, divê bi hizrê xwe û vîna xwe ya azad tevlî jiyanê bibe. Xaleke din; ji bo jiyaneke hevpar û azad, pêwîstiya wê bi rêxistinê heye. Xala çaran jî; divê jiyana xwe tevê ji rêxistin û têkoşînê ava bikin. Xaleke din ya jiyana bi jinê re jî, pêwîstiya bi xweşikbûn û estetîkê heye.

Ne jinên li wir tenê, bi milyonan guhdarî dikirin:

-Bi mûnasebeta vê rojê careke din diyar dikim ku ez di xizmeta jinên azad de me.

Piştî çend pirs û bersivan cejna jinan careke din pîroz kir, xatirê xwe ji her kesî xwest. Telefon danî, berê xwe da yên li wir:

-Ez bawer dikim bi têkoşîna jinê re, min rêz daye dayîkan tevan. Bi çalakiya xwe ya azadiyê, bûm layîqî jinan. Emê bi girêdana xwe ya bi vê rojê ve, bersiva herî mezin bidin

mirovayiyê.

Nûcan bilez çû metbexê, sêniyên şîrînayiya rojê anîn, danî ser mase. Apo li ser girîngiya têkoşîna jinê diaxivî. Tekoşîna azadiyê bi kêliyên jiyanê tevan re dikir yek. Dema nûçeyan bû, Necah rabû ser xwe tv vekir. Apo hem suhbet dikir, hem carna çavên wî diçûn ser dîmenên pîrozbayiyê. Dîmenê wan li ber çavên wî weke baxçeyeke gulan xuya dikir...

***

15ê Adarê bû. Sara li eywanê rûntiştibû. Perspektîfên Apo ji konferansê re amade kirîn, di destê wê de bûn. Pelên wê bi awayekî baldar û nazkk bi ser hev de diqulibandin. Her ku dixwend, salên destpêkê û pêvajoyên derbas kirîn, dihatin ber çavên wê. Çûbû nava serpêhatiyan. Carna serê xwe bilind dikir, li deriyê eywanê dinêrî. Milîtanên li kêlekê, bi dengekî nizim pirsa haziriyan ji hev dikirin. Di wê navê re çay hat, lê bala wê tev li ser perspektîfan bû. Yên li kêlekê qedehek jê re danîn ser mase. Çavên xwe yên hingivî ji ser perspektîfan bilind kirin:

-Destê we sax be, we qedeha min jî daniye.

Çawa ku dengek hatibiyê li dora xwe nêrî, pişt re rabû ser xwe. Destê xwe bi ser pora xwe ya sorxelek ve bir. Cilên xwe jî hinekî rast kirin. Cilên dibistanê yên leşkerî, li bejna wê ya narîn pir hatibûn. Lê ji ferehbûna gumlekê xwe nerehet bû. Dixwest her tim biserûber û lihevhatî be. Dengê vebûna derî hatiyê. Perspektîf pêçan, bilez kirin zerfê. Hê bi zerfê ve mijûl bû, Apo ket hundir. Silav da û yekser berê xwe dayê:

-Hûn ji zû ve hatine?

-Na seorkê min, çend deqîqe ne.

-We çawa kir, delege tev hatin?

-Rast e serokê min, gel jî û hunermendên mayîn jî hatin.

-Temam baş e.

Hinekî pêş ve çû, li ser kursiyê li hemberî wê rûnişt:

-Weke me plan kirî, divê di navbera 15-25ê mehê de biqede. Konferans hem wê plan û hedefên dema pêş diyar bike, hem wê ji Kongreya 6. re bibe amadekarî. Em tevgereke biharê ne, di salvegera 25. de, emê li vê qada pîroz ya Rojhilata Navî, vê konferansa xwe çêkin. Bi dibistanê re, bi giştî yên hatîn çend delege amade ne?

-250 Serokê min. Delege ji kadroyên PKKê, fermandarên ARGKê, rêveberên ERNKê, nûnerên YCK û YAJKê, ji welatparêz, hunermend û rewşenbîran pêk tên. Konferans wê bi perspekîfa Serokatiyê dest pê bike.

Apo bi hejandina serê xwe erê kir:

-Ev dibe konferasa siyemîn em li vir çêdikin. Berî 25 salan, em tevgera hisekî û çend peyvan bûn. Belku jê re nehatibûya gotin hêvî jî. Lê hiseke baş bû. Em bi vê asta xwe ya îro, bi awayekî berbiçav dibînin ku çend gotinên rast jî dibin çekên herî mezin û bandorê li mirovayiyê tevê dikin. We jî di serî de li gotinên me guhdarî kir, wê demê tiştek tinebû:

-Serokê min, ew civîna we ji me jinan re li Dêrsimê çêkirî bandoreke mezin kiribû. Gotinên we baweriyeke mezin didan me. We di perspektîfan de jî bi awayekî dîrokî vegera ber bi cewherê xwe ve destnîşan kiriye.

-Li hemberî biyanîkirinê vegera ber bi nasnameya xwe ve, ne ber bi welat tenê ve vegera ber bi dîrokê ve, ne ber bi şer tenê

ve, ber bi serkeftinê ve, ne ber bi xweisbatkirinê tenê ve, ber bi binneketinê ve em gavan diavêjin.

Li milîtanên li kêlekê rûniştîn nêrî:

-Ev meşa me ya 25 salan, meşeke biheybet û biheşmet e. Bi hêrsa xwe ve, bi kelecana xwe ve pir mezin e. Li aliyê din, bi êşa xwe, bi xemgîniya xwe mezin e. Bi bêrûmetiya hatî kirin jî pir binavûdeng e. Em dikarin van 25 salan, wek dîroka serhatiya 2500 salî jî bibînin û binirxînin.

Dest avêt zerfa perspetîf tê de, dîsa danî cihê wê:

-Jixwe, yên tên cem me, pirsa rewşa me ya di PKK û artêşê de nakin. Vê pirsê dikin: "Ev gel çima bi we ve girêdayî ye, çawa bi we ve hatiye girêdan?" Helbet ji ber ku em ewladê wî yê sadiq in û pê ve girêdayî ne, ne di gotinê di cewher de me tevayiya jiyana xwe li gorî pêwîstiyên wî birêxistin kiriye, ev gel bi me ve girêdayî ye. Çil PKK xwe bifiroşin jî, xiyanetê jî bikin, ev gel dîsa girêdayî ye. Em vê konferansê ji po partiya xwe, artêşa xwe, gel û dostên xwe şans û pîroz dibînin.

Axaftina xwe qedand, rabû ser xwe:

-Hûn îro dest pê bikin, emê jî bi hevalên çiyê re hin mijarên girîng nîqaş bikin. Li gorî hesasiyeta pêvajoyê tevbigerin.

Sara perspetîf girtin, ber bi dibistanê ve çû. Barê konferansê ketibû ser milê wê, diviya li gorî wê tevbigere. Bilez berê xwe da derî. Her kes ketibû hundir, li benda wê bû.

Apo jî çû odeya bêsîmê. Derê wê vekir, çend caran gazî kir: "Roj gazî dike." Piştî çend kêliyan Agir bersiv da:

-Serokê min, me agahî girtine, dibêjin rewş bixeter e. Dixwazin PKKê tine bikin. Planeke wan ya wisa heye.

-Dixwazin kengê dest bi vê planê bikin?

-Serokê min, yê ev agahî dayî derveyî vê tiştekî nizane. Serokê min divê hûn li cem xwe pir diqet bikin.

-Di bingeh de divê tu diqet bikî, ew der ne ewle ne. Wir bixeter e.

Bi qadên din re jî axivî, bêsîm danî. Kûr hizirî, ew du sal bûn, êdî şev û roj li pey wî bûn. Lewre dizanî êdî ketine demeke nû divê li gorî wê tevbigere...

***

20ê Meha Adarê bû. Apo bi seyareyê ber bi malê ve diçû:

-Kemal, hevalên wê biçûna malê, we birin?

-Rast e serokê min. Şeş hevalên xort, sêzdeh jî jin bûn.

-Wê demê destpêkê em biçin qata dehan.

Kemal berê seyareyê vegerand. Apo di rê de li ser hevdîtina wê bike difikirî. Wan rojan hevdîtin pir dibûn.

Koma nû çûyî mala lêhûrbûnê li bedewiya hewşê temaşe dikir. Perwerde dîtibûn, lê nû dihatin mala lêhûrbûnê. Şêxo jî hem karê xwe dikir, hem li wan temaşe dikir. Sara nû agahdar bûbû, derket bixêrhatina wan kir:

-Hevalno, kerem bikin em biçin hundir.

Berê xwe dan hundir, lê bala wan li ser tevgerên Sara bû. Sara çû odeya jorê, ew jî li eywanê rûniştin. Piştî çend kêliyan Siwar ji wan re çay anî. Tev di kelecana dîtina Apo de bûn. Di dilê xwe de digotin, gelo divê em çawa pêşwazî bikin. Piştî qasekî Sara daket li cem wan rûnişt. Dest bi suhbeteke bikelecan kirin. Piştî sê saetan Apo ket hundir. Çendî berî hingê jî li dibistanê û malên perwedeyê dîtibûn, lê dîsa yek bi yek bi germî

pêşwazî kirin:

-Em biçin hewşê ji vir baştir e.

Ew ket pêşiyê wan jî da dû. Hewş tev bi wan da gerandin. Dareke zeytûnê ya sala borî çandîn nîşanî wan kir. Kelecana destpêkê bi suhbetê re hêdî hêdî kêm dibû. Herî zêde tevgerên wî yên xwezayî kelecana wan kêm dikir. Piştî gera li hewşê li dora maseyekî rûniştin. Piştî pirsa rewşa wan dest bi axaftinê kir:

-Emê timî li van deran bin, kengê hûn bixwazin em nîqaş bikin. Bila tiştekê we ya veşartî nemîne.

Di wê navê re xwarin hat. Çavên wî li ser wan bûn:

-Kevçikê kê nîne, yê we hemûyan heye? Divê xwarin di sêniyên we de nemîne.

Piştî xwarinê careke din derbasî eywanê bûn. Yek bi yek di ber çavên xwe re derbas kirin:

-Hûn dibînin. Fermandarî ne hêsan e. Wê çawa bi şervanên xwe re mijûl bibe? Çawa wan perwerde bike, çawa wan biparêze? Şev û roj divê fermandar bifikire. Ez her tim dibêjim çima di şer de serkeftin çênabe. Qehremaniyeke mezin tê kirin, lê zû şehîd dikevin. Ji bo çûna gundan, yan tiştekê din wê çima şehîd bikevin? Hûn min dibînin, ev derfet tev ji bo we ne, ji bo perwerdeyê ne.

Piştî axaftina sê saetan, li seata xwe nêrî:

-Newroz hatiye, divê em biçin. Karê me jî pir e, dibe ku heta demekê em neyên. Newroza we jî pîroz dikim.

Bi rabûna wî re dengê çepikan bilind bû. Derket berê xwe da cihê mirîşik û kewan. Mirîşkek bûbû kurk. Qasekî lê temaşe kir. Hinekî din jî li heywanan temaşe kir, xatirê xwe ji wan

xwest.

Berêvarê re gihîştin Helebê. Wê êvarê yên pêwîst bû wan bibîne, tev dîtin. Derbarê xebata wir de agahiyên berfereh girtin. Hem ji riyeke dûr hatibûn, hem roja din Newroz bû, ji ber wê diviya dereng raneze.

Sibê zû ku çavên xwe vekirin, ji bo sporê berê xwe da hewşê. Hişê wî jî li ser Newroz û efsaneya Kawayê hesinkar bû: "Di her serdemê de Kurd ji bo jiyana nû têkoşiyane û Newroz jî di encama têkoşîna wan de derketiye." Piştî sporê destê cilên xwe yên kurdî ji berkêşka cilan derxist. Şal û şapikên xwe yên şîn li xwe kirin, şelemeya xwe li ser girê da, şara xwe li serê xwe pêça, xencereke ji zîv di ber xwe de kir, çû ber neynikê li xwe nêrî: "Ez qelew bûme, divê pirtir sporê bikim." Hinekî li xencerê nêrî, ji ber xwe derxist, danî cihê wê. Cilên wî pir lê hatibûn. Pora xwe şeh kir, simbêlên xwe rast kirin, çû eywanê. Bi rûyekî geş Newroza wan pîroz kir. Milîtanên li malê çavên wan li ser rawestiyabûn. Hem cilûbergên wî pir lê hatibûn, berî hingê bi wan cilûbergên kurdî ve nedîtibûn. Çawa ku ji zemanekî din hatibe nava wan, wisa li wan hatibû. Heybeta wî hê zêdetir bûbû. Wê rojê gelek kêfxweş bû. Çawa ku hemû cejin bikevin ser hev û bibin yek, Newroz li ber çavên milîtanan wê rojê bi dîtina wî re mestir bûbû.

Piştî taştê rabû ser xwe ber bi derî ve çû. Haya milîtanan ji plana wî ya wê rojê tinebû:

-Kemal, hûn amade ne em diçin Newrozê.

-Serokê min, em neçin baştir e, her kes îro li derve ye.

-Jixwe wê her kes li derve be, ma ne Newroz e, emê jî biçin cejna xwe.

-Serokê min, em nikarin we li wir biparêzin. Milet we nas dike.

-Xem nake ezê rûyê xwe bipêçim.

-Na serokê min nabe!

Yek ji wî yek ji wan, di dawiyê de dev ji çûnê berda. Ew û çar milîtan li malê man, yên din çûn. Li eywanê rûnişt, dest bi xwendinê kir. Dilê wî ji bo Newrozê lê dixist. Rabû çû ber pencereyê li derve nêrî.

Yên çûyîn Newrozê êvarê vegeriyan. Ji bo agahiyan ew jî li benda wan bû:

-Ha, hûn hatin, Newroz çawa bû?

Ji destpêka şahiyê heta dawiyê, çawa ku tu tayê bi derziyê ve bikî, yek bi yek jê re gotin. Ewqas xweş dikirin, çawa ku ew bi xwe li wir be. Kêfa wî pir hatibû:

-Ez weke girtiyan im, lê derfetên we yên derketinê hene. Lê dema hûn derdikevin biçin cihên dîrokî.

Karê ku pêwîst e bê kirin, wê şevê tev pêk hatin. Roja din ketin ser riya Şamê. Kemal stirana Derwêş û Edûlê danîbû ser. Gotinên Edûlê hizrê wî biribûn wê serdemê. Şerê wê demê û diwazdeh siwariyên Kurdan dianîn ber çavên xwe. Heybeta wî şerî û gotinên wê di dilê wî de cih girtibûn. Her ku gotina "delal" dihat gotin, dîmenekî nû diket ber çavên wî. Di wê navê re nêzî Humsê bûn. Daristan, şîntayî û xwezaya wê bala wî dikişandin:

-Kemal, we nehişt ez derkevim, dixwazim derkevim hinekî bimeşim.

Daket berê xwe da nava darên çam. Meşa li nava daristanê û dîmenên wê xwezaya bedew, di hundirê wî de aramî çêdikirin.

Bi şev gihîştin malê. Sara û milîtanên din ji bo şîvê li benda wan mabûn. Piştî şîvê tev li eywanê rûniştin. Geh li wan dinêrî, geh serê xwe dihejand:

-Min îro dîsa guhdarî destana Derwêşê Evdê kir. Destan şopên xurt yên çanda Kurdan nîşan dide û di koka xwe ya Zerdeştiyê de israr dike. Ez li ser gotinên Edûlê û ketina Derwêşê Evdê pir hizirîm. Divê ev çarenûs bê guhertin. Min got divê serkeftina evînê biafirînim. Serkeftina evînê, serkeftina gel e. Eger mirineke min hebe, ji mirina min, ya yekê dijmin, ya didoyan jî Beko berpirsiyar in.

Gotina wî ya dawiyê dilê hemûyan êşandibû. Dema razanê bû, sara li balkonê rûniştibû. Hem dihizirî, hem xemgîn dibû. Gotina Apo di serê wê de mabû. Rojên xwe yên borî û Bekotiya di nava pêvajoya jiyayî de dianîn bîra xwe. Rabû ser xwe çû eywanê. Apo li wir diçû dihat. Sara di dilê xwe de got, gelo kê bi qasî serokê me di riyeke wiha dijwar de bi serê xwe her tişt kiriye?

***

6'ê Gulanê salvegera teqîna 96an bû. Apo li pirtûkxaneyê rûniştibû, li ser armanc û encama wê dihizirî. Ji aliyê din ve jî pêvajoya dewleta Tirk ketiyê ji her milî ve analîz dikir. Berê herkîna hizrê xwe dabû deryaya dîrokê. Piştî qedandina nivîsa xwe rabû ser xwe çû eywanê. Milîtan tev li wir bûn. Rûpela dîroka wê rojê li benda destdayîn û qulbandineke nû bû. Di zanebûna giranî û girîngiya her gava diavêt û her kêliya tê de bû. Di nava wan hizran de diket rewşeke wisa, çawa ku di xewnekê

de be û nexwaze şiyar bibe. Lê dixwest giraniya pêvajoyê bi yên li derdora xwe jî bide fêmkirin. Berî ku dest bi axaftina xwe bike, di pencereyê re li bedewiya xwezayê, firîna kevokan û rengîniya gulan temeşe kir. Xuşîna pelên daran li melodiya xwezayê melodiyeke din zêde dikir. Berê xwe vegerand, yek bi yek li milîtanan temaşe kir. Her ku komek dihat malê, dixwest wan bi kêştiya fikir û ramanên xwe derbasî cihê bendewariyê bike:

-Berî du salan weke îro, li hemberî me planeke mezin pêk anîn, lê bi ser neketin. Plan ne di çarçoveya teqînê tenê de bû. Emerîka dixwest pêşengiya wan planan bike. Parçeyek jî ew teqîn bû. Em pişt re baş pê hesiyan ku di wê planê de Abdullah Çatli, Sedat Bucak û Şaredarê Wêranşarê Keleş Abdioglu bi hev re rol girtine. Bombeyeke hezar kîlo derbasî vir kirin û hat teqandin. Erbakan ji bo aştiyê ji me re nameyek şandibû. Me jî berisva wî dabû. Lê gelekan nedixwest çareserî pêş bikeve. Ji ber wê ew teqîn pêk anîn. Divê em bizanin ku ev ne dawiya planê ye.

Hinekî meşiya berê xwe da Sara:

-Tu şahida civîna min ya berî bîst salan î, ne wisa?

-Erê serokê min, me bi komeke piçûk dest pê kir.

-Bi qasî çaryeka we tinebûn? Ev bîst sal in, PKK li hemberî her plana dijmin têdikoşe.

Hinekî pêş ve çû, li yên dawiyê nêrî:

-Di nava bîst salan de, beşdarkirina şoreşê ya evqas jin pir girîng e, pêşketineke mezin e. Pêşiya 6'ê Gulanê ji daxuyaniyên Mesud Yilmaz me fêm kir ku li hemberî me planeke Çilerê heye. Mesut Yilmaz dixwest wê çalakiyê di dema hukumeta xwe

de bike. Ji ber wê ew daxuyanî dabû.

Hinekî li dora xwe nêrî:

-Niha li hemberî gerîla dest bi operasyonan kirine. Plan dewam dike. Par PDK'ê jî şerê me kir, lê derb xwar. Li ser me hesabên wan yên kevin hebûn. Dixwestin me tesfiye bikin, Ferhad serdest bikin, bi wî awayî PKK'ê bikin xizmeta xwe. Ew ekîba li Zapê ketî nava tesfiyekirina partiyê, ew jî di heman planê de bû. Ji bo serrastkirina wir, me hevalê Agir rêkir. Eger plana wan ya 6'ê Gulanê pêk bihata, wê li ser gerîla operasyon berfereh bikiran. Plan qedandina gerîla bû. Dema ew nebû vê carê 1997'an xwestin bi planeke din êrîşî gerîla bikin. Hêzên Başûr jî di nava wê planê de bûn. Piştî ku ew plan jî bi ser neket, berê xwe dan Emerîka. Westin li wir PKKê bi terorîstê ragihînin û ji Başûr derxin.

Li saeta xwe nêrî:

-Dema nûçeyan ne, em tev de guhdarî bikin.

Piştî nûçeyan berê xwe da Sara:

-We ji daxuyaniyên wan çi fêm kir?

-Serokê min, di rojeva wan de tinekirin heye.

-Rast e, ev hukumeta 53'yan dixwaze li hemberî me bi ser bikeve û tinekirinê bike para xwe.

Li milîtanên din temaşe kir:

-Ev demek e hûn hatine vir, emê îro bi hev re bigerin. Sara tu çi dibêjî, em biçin?

-Serokatî dizane, em amade ne.

-Wê demê, du deqîqeyan tev li vir amade bin.

Piştî çend kêliyan derketin, berê xwe dan bajarokê Sit-Zeyneb, yê navenda gundên qibleyê Şamê. Ji Şamê 10 km. dûr

bû. Hem Sunî, hem Şîa lê hebûn. Heman demê cihê ger û serdanên olî jî bû. Ji seranserê Rojhilata Navî Şîa dihatin wir. Çûn hata gihîştin Meqamê Seyîde Zeyneb. Berî ku ji seyareyê dakeve, berçavka xwe da ber çavên xwe. Milîtan jî li dora wî bûn xelek. Çavên wî li qube û minareyên bilid bûn. Ji ber şerê Kerbelayî terîqetên Batinî ew der pîroz didîtin. Berê xwe da hundirê wê. Deriyê wê bi sifir hatibû çêkirin û bi zêr jî hatibû neqişkirin. Hundirê wê jî şînê asîmanî bû. Destê xwe bi ser nivîsên wê ve bir. Hê temaşe dikir, destek ket ser milê wî. Berê xwe dayê, yê berpirsiyarê wir bû. Kalekî bi cilûbergên xwe yên olî li pişt sekinîbû, çawa ku li benda wî be, li rûyê wî dinêrî:

-Ev cihê serhildana li hemberî Yezîdê kurê Muawiye ye. Hz. Zeyneb parêzvana heqîqetê ye.

Çawa ku di wê demê de be û dîtibe, kalo wisa behsa wir dikir. Her çenda baş ji fêm nedikirin, lê dîsa serê xwe dihejandin. Apo xwest hinekî behsa wir ji milîtanan re bike:

-Zeyneb xîtaba wê xurt bûye. Dema bi Ebdulahê kurê Cafer re dizewice, dibêje, bi şertê ku di dema cîhadê de ez bi birayên xwe re derkevim, ez bi te re dizewicim. Wisa çûye Kerbelayê. Li wir serê Huseyin jê dikin, Zeynebê jî dîl digirin tînin Şamê. Li Kofayê (Kûfe) jî li hemberî Ubeydê kurê Ziyad serî hildaye. Ji be wê biryara kuştina wê dide. Yezîd jî dibêje, divê bi saxî bê girtin û bînin Şamê. Li hemberî Yezîd heqîqeta Ehlilbeyt diparêze. Ji ber wê ji qesrê derdixin dibin Xirbet Şam.

Destê xwe danî ser navên Ehlilbeyt yên bi xetên zêr hatîn nivîsîn:

-Hûn di van bajarên kevin re derbas dibin, lê li berhemên dîrokî nanêrin. Dersan ji van derên dîrokî bigirin.

Piştî qasekî siwar bûn berê xwe dan malê. Bi ketina hewşê re bêhna firîkê ket pozê wan. Çavên xwe li Şêxo gerandin. Agirekî daran pê xistibû, gurzek genim di ser agir re girtibû dikizirand. Yekser berê xwe da wir:

-Şêxo, destê te sax be, bêhna wê gelek xweş e.

Hin firîk xistin sêniyekê çû cem kevokan. Libên nerm dixwarin, yên hişt didan wan.

***

16'ê Tebaxê bû. Apo li eywanê diçû dihat. Car bi car serê xwe ditewand li notya di destê xwe de dinêrî. Dubare û bi baldarî dixwend. Geh dixwend geh li tv. temaşe dikir. Serdana serokkomarê Tirkiyê ya Israîlê bala wî kişandibû. Di serdanê de ew bûbû hedefa wan û ev ji bo wî peyameke diyar bû. Hinekî sekinî, çavên xwe girtin: “Wisa xuya ye dixwazin çembera li dora me teng bikin.” Li hemberî vê li çareseriyekê digeriya. Milîtanên li wir di ferqa nerehetiya wî de bûn, lê pê bawer bûn ku wê bikare her xetera derkeve pêşiyê bêbandor bike. Bê ku biaxive, hinekî li wan nêrî, berê xwe da pirtûkxaneyê. Rahişt berçavka xwe, li pişt mase rûnişt. Notya ji aliyê Dewleta Tirk ve hatî vekir bi dengê bilind xwend:

1- Divê PKK rewşa xwe ya siyasî di ber çavan re derbas bike.

2- Sûcên her du aliyan kirîn, divê werin dîtin.

3- Piştî agirbesta 1993'yan polîtîkaya dewletê giran bû. Ji ber wê ji bo guhertina dewletê, erkên hûn, ango mûxalefet pêk bîne hene.

4- Daxuyaniyên siyasî yên Ocalan divê di piratîkê de jî pêk werin. Em li benda vê ne.

5- Divê 1'ê Îlonê roja aştiya cîhanê agirbest were ragihandin. Eger ev pêk were emê jî rasterast bersivê bidin. Emê mekanizmayên dewletê kilît bikin û rê nedin provokasyonan.

Serê xwe rakir hinekî hizirî. Pişt re not pêça danî ser mase. Dixwest peyama hatî şandin baş fêm bike. Lewre tiştên dibûn û naveroka peyamê cuda bûn. Lê yê rewş eşkere bikira ew bû. Vê carê riyeke din ketibû pêşiyê. Rabû ser xwe çû eywanê. Gazî Kemal kir, yekser çûn dibistanê. Piştî dersê derket hewşê meşiya. Kûr kûr dihizirî. Mejiyê wî ketibû nava lêgerîneke çareseriyê. Lê li aliyekî jî diviya çembera li dora xwe rake. Di nava wan hizran de siwar bû berê xwe da malê. Çend rapor di destê, Sara de bûn, piştî ku rûnişt raber kirin.

-Serokê min, vê demê hûn zêde tevnegerin wê baş be.

Wî jî rapor ji hev cuda dikirin. Serê xwe hilda lê nêrî:

-Hûn bi perwerdeyê ve mijûl bin. Pêvajoyeke giran li pêşiya me ye. Xwe li gorî her tiştî amade bikin.

Gotinên wî bala wê kişandin. Bê ku bersivê bigire çû odeya lêhûrbûnê. Hizrê wî tev li ser pêvajoya nû bû. Hem diviya bersiva peyama jê re hatî bide. Lê bersiva bê dayîn wê ne ji bo dewleta Tirk tenê bûya. Lewre mijar êdî bûbû mijara Kurdan û cîhanê. Lê ji bo bersivê jî pêwîstî bi demê hebû. Êdî li pêşiya wî rojên awarte hebûn.

Piştî diwazdeh rojan, êvara 28'ê Tebaxê, bi awayekî yekalî li hemberî artêşa Tirk agirbest hat ragirandin. Lê weke her agirbestê, ev agirbest jî mabû bêbersiv. Operasyonên li hemberî gerîlayên Kurd, ji hêz û leza xwe tiştek kêm nekiribûn. Li ser vê

rewşê pêwîst didît ku ji raya giştî re hin mijaran rave bike. Piştî agirbestê bi du hefteyan, ji bo axaftina wî di Med Tv. de, amadekarî hatibû kirin. Hem li stûdyoya tv. gelek kes rûniştibûn, hem li eywanê milîtanên jin û mêr tev li ser piyan li benda wê kêliyê bûn. Ew bi xwe jî bêsebir bûbû. Çavên wî li ser telefonê bûn. Dengê telefonê hat, destikê wê rakir dest bi axaftinê kir:

-Me dixwest aliyê din bersivê bide, lê çavên xwe girtine, ji nedîtî ve tên. Me yekalî agirbest îlan nekir. Lê operasyonên xwe nesekinandin. Ev kesayetên çawa ne? Xuya dike ku xetimîne û naxwazin ji vê rewşê fêm bikin. Pêngava me dest pê kirî, ceribandinek e, dibe ku bi ser jî nekeve. Emê hineke din jî bisekinin. Eger  di dawiyê de hat fêmkirin ku lîstik e, emê jî bikevin tevgerê. Şer be, şer. Wê şerekî herî bixwîn, dijwar yê cîhanê be.

Piştî axafineke dirêj, telefon danî, li eywanê hinekî çû hat. Çavên milîtanan tevan lê bû, lê hê jî difikirî. Berê xwe da wan, dixwest encamên girtî bi wan jî bide fêmkirin:

-Em êdî ketine demek nû, piştî niha xwe li gorî wê amade bikin.

Di wê navê re Sara hat eywanê:

-Serokê min, hevalên li çiya dixwazin bi we re biaxivin. Pir bilez xuya dikirin.

Bilez derbasî odeya telefonê bû. Piştî çûna wî, yên li wir tev li dora Sara kom bûn.

Roja din saet çarê sibê ji xew şiyar bû, xwe amade kir. Aram li hewşê nobedar bû. Dengek hatiyê. Li dora xwe nêrî tiştek nedît. Weke bayê kelemperê li ber xwe bibe, Apo derbas bû çû da sporê bike:

-Rojbaş, spora xwe ji bîr neke ha!

Piştî sporê taştê xwar, li eywanê dest bi xwendina raporan kir. Di tv. de jî bernameyeke civakî hebû. Sara çend name û raporên din jî anîn raber kirin. Rapor girtin danîn ser mase:

-Bila hevalên jin bên em hinekî suhbet bikin. Van rojan karê me pir bû, me derfet nedîtin em bi hevalan re biaxivin.

Di nava çend kêliyan de tev li dorê kom bûn. Sara jî li ser kursiyê li hember rûnişt:

-Di kesayeta jinê de afirandin û şînkirina jiyanê pir girîng e. Ev, hem jinê, hem zilam, hem jiyanê biwate dike. Di eniya jinê de ev xal ji bo Serokatiyê bingeh e û aramiyeke mezin dide. Divê jin jî xweşiyê ji vê xalê bibîne.

Piştî hevoka xwe qedand çavên wî li ser Sara rawestiyan, dixwest ew jî nêrîna xwe bide. Wê jî xwe hazir kiribû:

-Serokê min, ez bi xwe wê xweşiyê jê digirim. Mirov pê serbilind dibe.

Ne li benda wê bersivê tenê bû:

-Behsa ramanên mezin bike, ramanên rizgarkirina jinê.

-Serokê min, di bûyerên mîtolojîk de jî reda xwedawendan heye. Lê Serokatî bixwe xwedawendan diafirîne û jiyanê bi wan dide avakirin.

-Tu bi dilekî pir paqij diaxivî.

-Serokê min ez weke xeyalperestan li mijarê nanêrim.

-Ma hûnê bikarin zilam bixin binê lêpirsînê?

-Serokê mn, bêguman divê zilamê heyî were redkirin. Eger jin dixwaze azad bibe, eger dixwaze vegere ser cewherê xwe, divê li hemberî rewşa heyî xwedîbertek be.

-Eger wisa nebe, hûn nikarin bikevine riya xwedawendan.

Pişî suhbetê çû hewşê, xwest li rewşa mirîşka kurk binêre. Çêlîkên wê dijmartin. Gazî Aram kir:

-Çêlîkeke wê kêm e. Deh çêlikên wê hebûn niha neh in. Sêzdeh jin, ewqas jî xort, kûçik û çekên we jî hene, lê çêlîk kêm dibin!

Berê xwe da nava daran lê geriya. Weke seferberiyê, yên li wir tev ketin nava tevgerê.

Piştî hinekî geriya, li wan vegeriya:

-We nikarî çêlîkeke kurkê biparêz in. Wisa bifikirin ku êrîşek li ser we çêbûye û hûn tine bûne. Bîst û çar saetan hûn nobetê digirin. Dibe ku ev heywan di binê kevirekî de be, yan marekî, yan kûçikê me xwaribe. Eger we hay ji çilîka mirîşkê tinebe, we hay ji xwe û min jî nîne.

Piştî ku hêviya xwe jê birî çû odeya xwe. Lê milîtanan jî peyama xwe girtibû, dizanîn ku bi qasî tê xwestin û hesasiyeta heyî ne şiyar in. Her yek ji wan li ser xwe dihizirî.

Du roj bi ser axaftina wî ya di Med tv. de derbas bûbûn. Ji seranserê cîhanê rojnamevan û kesên bi mijarê ve têkildar, berê xwe didan Şamê. Şev û rojên bi hevdîtin û perwerdeyê derbas dibûn. Serê sibê bû, ji bo çûna dibistanê gazî Kemal kir. Piştî derketina wan bi çend deqîqeyan, Siwar ket hewşê. Bilez berê xwe da odeya wî. Piştî ku li wir nedît, dîsa daket qata xwarê cem Sara. Kutekut bi ser dilê wî ketibû:

-Notek hatiye, divê ez bilez bigihînim Serokatiyê.

Ew jî pê re siwar bû, ketin ser riya dibistanê.

Li derve ders dida, ku çav bi Sara ket derbas dibe, sekinî:

-Hevalno, emê navberekê bidinê.

Sara nota di destê xwe de raber kir. Bilez ji destê wê girt:

-Ez jî li benda vê notê bûm.

Hêdîka vekir dest bi xwendinê kir:

-Artêşa Tirk dibêje, ji ber ku aliyên siyasî xwe di nava atmorsfera şer de his dikin, hevdîtin rawestandine.

Berken bû, di dilê xwe de got, Plana Tirkiyê ev bû:

-Dibêjin, hêza siyasî ya Tirkiyê nikare çareseriyê biafirîne, ji ber wê hevdîtin rawestandine.

-Serokê min, di vê demê de pir gefan li Sêriyê dixwin û ji bo derxistina we bi gelek hêzan re hevdîtinan dikin.

Careke din not xwend, bi hev re berê xwe dan malê. Di seyareyê de li derdoran dinêrî, di wê ferqê de bû ku êdî di her warî de tê şopandin. Bala wî tev li ser tevgerên derdor û hevdîtinan bû. Li eywanê li ber tv. rûniştibû. Nûçe li ser hevdîtina Tirkiye û Israîlê bû. Serokwezîrê Israîlê Netenyaho soz dabû Tirkiyê ku wê Sûriyê di hedefa wan de be. Bi vê peyamê re têgihîşt ku hedef ew bixwe ye. Ji milekî ve welatên Ereb, -bi taybetî Misir- ji milekî ve, Emrîka bi awayekî awarte bi ser Sûriyê de dihatin. Û bi awayekî eşkere jî Tirkiyê amadekariya êrîşê dikir. Ji ber tv. rabû hinekî meşiya. Di serî de yên bi Tirkiyê re, li ser hevdîtinên dawiyê dihizirî. Çembereke fereh li dora wî hatibû gerandin. Hem ji bo pêşîgirtina komkujiyan, hem ji bo sistkirina zora li ser Sûriyê, li riyeke çareseriyê digeriya. Di wê navê re Sara zerfek raber kir. Zerf ji destê wê girt:

-Îro hûn çûn dibistanê?

-Rast e serokê min.

Dengê derî hat. Selah ket hundir, wênekêşek jî pê re bû.

Berê xwe da Selah:

-Em biçûna stûdyoyê ne baştir bû?

-Serokê min, dinya tevlîhev bûye, Xwedê neke tiştek çêbe emê çi bikin?

Çû bedlê xwe yê di agirbesta yekê de li xwe kirî anî. Bilez li xwe kir û çend wêneyên wî hatin kişandin. Piştî wêneyan dîsa cilên xwe guhertin li eyanê rûnişt:

-Ji bo ceribandina diyalogê me careke din ji yekê Îlonê ve agirbest ragihand. Em li benda bersiveke artêşê bûn. Lê bersiveke neyînî dan. Berî du rojan jî Fermandarê Hêzên Bejayî Atîlla Ateş li ser sînor gefa êrîşê li Sûriyê xwar. Ji vê em fêm dikin ku planên nû hene. Piştî wê axaftinê artêşa wan li ser sînor ketiye tevgerê.

Destê xwe kir kulm danî ser eniya xwe, çend kêliyan hizirî:

-Wezîrê Emrîka yê parastinê Williem Kom li Behreyn got, PKK komek terorîst e, em destûrê nadin li ser erdê Tirkiyê kar û barê xwe bimeşinin. Piştî vê daxuyaniyê serokêdewletê Misrê Hûsnî Mûbarek bi Esed re rûnişt. Pişt re ew, wezîrê karê derve Amir Mûsa û çar wezîrên din çûn Tirkiyê. Dibêje divê ji bo aloziya di navbera Şam û Enqere de diyalog dest pê bike.

Hinekî sekinî, berê xwe da Sara:

-Tu çi dibêjî:

-Serokê min, hevdîtinên Mûbarek encam nedan.

-Ji ber wê rêveberiya Enqere israr kir Sûriye min teslîmî Tirkiyê bike. Niha Hafiz Esed jî ji Îranê destekê dixwaze. Ji bo ku peyama Esed bide serokkomarê Tirkiyê Suleyman Demirel, serokkomar Mûhemed Xatemî wezîrê karê derve Kemal Xerazî şand Tirkiyê.

Selah ket navberê:

-Serokê min, Xerazî ji Tirkiyê re gotiye, Esed plan dike ku bi awayekî bi dizî Ocalan ji Sûriyê derxe. Lewre eger eşkere derxe, wê bikeve tengayiyê.

Lê wî niyeta dewleta Tirk baş fêm kiribû:

-Lê Tirkiyê dîsa jî artêşa xwe amade kiriye, ji bajarê Antakya heta Şirnex û Cizîrê hêzên xwe bi cih kirine. Li rojhilatê Deriya Spî jî keştiyên şer amade ne. Fîloya şeşan ya Emrîka jî ketiye tevgerê.

-Serokê min, Husnî Mûbarek, çûbû Enqere, ji wir hatiye Şamê.

Berê xwe vegerand ser Selah:

-Tu çi dibêjî?

-Serokê min, ji bo derxistina we ji vir, Husnî Mûbarek pir bi ser Sûriyê de tê. Herî dawiyê ji me re gotin, agahî ji Esed re hatin ku wê Tirkiye êrîşî Sûriyê bike.

Rabû ser xwe. Nerehetiya li ser rûyê wî baştir xuya dikir:

-Wê demê divê em hesabê xwe baş bikin. Çiler jî digot, yan sax, yan mirî divê em Apo bînin Tirkiyê.

Berê xwe da Kemal:

-We ji Emer re got were?

-Serokê min, wê bê.

Piştî saetekê Emer ket hundir. Apo û Kemal tenê li eywanê bûn. Silav da, rûnişt. Çavên wî li ser Apo bûn. Ji tevgerên wî fêm dikir ku êdî ew jî ketiye tevgerê. Apo li Emer nêrî:

-Emer, rewş pir tevlîhev bûye. Emê komek heval rêkin ser sînor. Ji bo wan otobûsan bigire. Tu jî bi wan re biçe!

Berê we vegerand ser Kemal:

-Gelek cîhazên pêşketî derketine, tu bikarî çiqasî bistînî bistîne. Her du derbasî aliyê sînor bikin.

Bilez rabûn derketin.

***

Piştî çend rojan tiştên pêwîst Kemal û Emer standibûn, difikirîn ka wê çawa derbasî milê sînor bikin. Emer di serê xwe de plana wê çêkiribû:

-Ez dibêjim em çekan bikin seyareyê, li ser wan jî tijî pîvaz bikin.

Kemal çend kêliyan hizirî, lê tişteke din nedihat bîra wî:

-Temam, wê demê em zû bikevin tevgerê.

Çawa plan kirîn wisa kirin, ketin ser rê. Li Dirbêsiyê Mûxaberatê seyareya wan sekinand, li dora wê çûn hatin:

-We kamyonek pîvaz aniye, ma du kîs ji me re jî nakevin?

Çawa ku nû ruh bi wan de hatibe, ewqas kêfxweş bûn. Bilez çar kîs derxistin dan wan û bikêf ketin ser riya xwe.

Apo agahiya ku çek û cîhaz gihîştine cihê xwe girtibû, ji ber wê kêfa wî xweş bûbû. Li pirtûkxaneyê li ser riya derketinê difikirî. Di dilê xwe de got, divê ez biçim çiyê. Lê ketibû fikarên ku wê piştî çûna wî li Kurdistanê şer pir dijwar bibe. Lê çi dibe bila bibe, êdî ji bo çûna çiyê her tişt dihat amadekirin. Di wê navê re dengê derî hat. Sara ket hundir:

-Serokê min, nûnera me ya Yunanistanê dibêje heyeteke Yunanî dixwaze were wir. Dibêje, rayedarên di asta jor de ne û helwesta wan baş e.

Serê xwe bilind kir, hinekî jî fikirî:

-Temam bila bên, em wan bibînin.

Roja din nûner û heyet hatin. Li eywanê tev de rûniştibûn. Nûnerê dest bi wergera gotinên heyetê kir:

-Serokê min, dibêjin di dîroka me ya demdirêj de em û Kurd tim bi hev re bûne, her tim piştgiriya me kirine.

Bi wateya erê serê xwe hejand:

-Ev taybetiya gelê me yê mezlum e. Me jî ji bo doza xwe dest bi vê tekoşînê kir.

Suhbeta di navbera wan de çend saetan dewam kir. Piştî çûna wan gazî nûnerê kir:

-Tu çi dibêjî, sozan didin?

-Serokê min, ev demeke dirêj e em bi wan re didin distînin, pir jidil in. Dibêjin em dixwazin alîkariya Kurdan bikin. Rewşa we jî pir bandor li wan kiriye.

-Êê, tu bi sozên wan bawer dikî?

Nûnerê çavên xwe yên şîn biriqandin, kêfa xwe anî:

-Serokê min, yên em bi wan re didin distînin, hemû rayadar in û ji ber ku em li hemberî Tirkan têkoşênê dikin, ji me pir hes dikin!

Rabû ser xwe, hinekî çû hat. Di dilê xwe de got, ev demek e em li vir in, va li ser Sûriyê êrîş jî pir in. Gelo dibe ku ji bo doza gelê me ev bibe riyeke baş. Me timî ji tinebûnê hebûn çêkriye, divê em doza kurdî bigihînin cîhanê. Ji eywanê derbasî pirtûxaneyê bû. Vî fikrê nû berê wî ji Kurdistanê dida cîhanê. Cara yekê bû ku berê wî ji Rojhilata Navî diket cîhanê. Di wê navê re dengê derî hat. Selah bikelecan ket hundir:

-Serokê min, hin agahiyên nû hene; me hin rayadar dîtin. Ji me re behsa rewşê kirin.

-Dixwazin em biçin kû?

-Serokê min, hina ji wan digot, nabe ku serokê we biçe Ewropa. Lê ji bo cihê hûn biçinê jî ti pêşniyarên wan nînin. Weke din artêşa Tirk gelek leşker û çek anîne ser sînor. Li hemberî vê ti tevgerên Sûriyê hê jî xuya nakin.

-Nîşanên xuya dikin, dewleta Tirk bibiryar e û dema em êrîşkariya wan ya li herêmê bînin ber çavên xwe, dibe ku bikevin erdê Sûriyê.        Ji bo Sûriyê tu çi dibêjî? Tirkan cidî nagirin, ji ber wê tevgereke wan çênabe?

Selah nizaniya li ser Sûriyê çi bêje. Piştî ku bersiv negirt, axaftina xwe domand:

-Me dostayiyeke pir baş bi wan re kiriye, helbet wê bixwazin em li cem wan bin. Lewre berjewendiya wan tê de heye. Tu vê demê li vir be. Wê hevdîtin pir çêbin, divê em bilez tevbigerin. Şev û rojên me êdî wê bibin yek û emê nesekinin.

-Temam serokê min.

-Emê firsendên li pêşiya xwe binirxînin. Baweriya me bi hin welatên dostên Kurdan heye. Ji bo doza xwe divê em şansê xwe di dema wê de binirxînin.

Selah çû eywanê. Ew hê li ser sozên heyeta Yunanî dihizirî. Di dilê xwe de got, gelo çûna Yunanistanê wê baş be, yan na? Êdî hişê xwe tev li ser vê xalê kom kiribû.

***

Payîzeke sar dest pê kiribû û bêsebriyê xwe li ramanên Apo gerandibû. Dixwest di dema wê de gavan biavêje. Ji agahiyên rojane digirtin, dizanî ku istixbarat li ser kar in. Ji ber wê Sûriye jî kêlî bi kêlî tû şiyarkirin. Ew bixwe jî tê şopandin. Hafiz Esad

jî di tevgerê de bû, wî hem ji nêz ve hem bi riya nûçeyan dişopand. Li eywanê rûniştibû li ser biryara dawî difikirî. Wan rojan hem hevdîtinên bi dewletê re, hem yên bi heyetên welatên din re pir çêdibûn. Wê rojê jî bi dewletê re hevdîtinek çêbûbû. Rabû ser xwe hinekî li ber pencereyê sekinî. Bajar û her der li ber çavên wî sar xuya dikirin. Çawa ku çerxa felekê çep bigere û ew hewl bide rast bizîvirîne, li riyekê digeriya. Sara ket hundir:

-Serokê min, heyeteke din ji bo hatina vir civan dixwaze.

-Temam, dikarin sibê werin.

Roja din serê sibê heyet hatibû û hevdîtin çêbûbû. Piştî çûna wan, li eywanê diçû dihat: "Ev hêviyeke nû ye, divê em vê firsendê ji dest bernedin." Gazî Kemal kir:

-Tişteke nû heye?

-Serokê min, rayedarên dewletê îro dîsa gazî me kirin, dibêjin, li ser sînor Tirkan hêza xwe pir aniye û dest bi amadekariya şer kirine. Bi qasî me fêm kirî mîtên tirkan dixwazin bi rengekî xwe bigihînin we. Bi xwe jî bawer in ku wê li Sûriyê bidin. Berî em ji cem wan derkevin, gotin berê lûyelên tangan li ser me ne.

-Weke din çi heye?

-Serokê min, gefên li Ser Sûriyê dewam dikin. Dibêjin, emê di bakurê Sûriyê re bikevinê, di Helebê re derkevin û li Dera çayê vexwin.

Hinekî serê xwe hejand:

-Tişta balkêş tevgereke leşkerî ji Suriyê xuya nake. Çawa ku tiştek neqewimîbe. Selah, tu dibêjî wê Suriyê bersiva Tirkan bide, yan wê daxwaziyên wan pêk bîne?

-Serokê min, nakokiyên wan kûr in. Heta niha ti carî Esed

neçûye Tirkiyê.

-Temam, tu li vir be, tiştekê nû hebe xeberê bide me. Kemal, em derkevin karekî me heye.

Kemal derket seyare amade kir, bilez siwar bûn ketin ser rê. Eger tiştek biqewimiya, digel ku Heleb qada destpêkê ya şer jî bû, berê xwe dan wir. Di dilê xwe de got, çavê her kesî li ser Şamê ye û ji bo şopandina min jî tijî ajan bûne. Jixwe Israîl ji zû ve bi cîhazan min dişopîne. Di demeke wiha bixeter de, ti kes bawer nake ku ez li Helebê bim. Bi vî awayî emê bikarin berê şopandinê ji ser xwe bidin aliyekî. Piştî pênc saetan gihîştin malê. Rûniştin rûneniştin telefonê lê xist. Kemal bilez rakir:

-Serokê min Selah e, dibêje divê ez bi Serokatiyê re biaxivim.

Çû odeya telefon lê:

-Selah, çi heye?

-Serokê min, ji bûroya Xedam bi min re axivîn, gotin, divê berî gavekê em bi Serokê we re biaxivin.

-Temam, dernekeve em tên.

Dehê şevê gihîştin şamê. Selah li hundir bû:

-Selah, dixwazin ji me re çi bêjin?

-Serokê min, li gorî min ji wan fêm kirî, rewşeke bixeter heye.

-Dibe ku li Sûriyê bidin?

-Serokê min, dibe ku lê bidin. Wê Israîl jî ji bo xwe rewşê firsend bibîne, wê ew jî lê bide.

Bala wî vê carê çûbû ser helwesta Sûriyê:

-We civan ji bo kengê girtiye?

-Serokê min civan sibê saet nehan e.

Çarê serê sibê rabûbû, li eywanê diçû dihat. Piştî taştê berê

xwe dan taxa Ebû Romanê ya di nava dilê Şamê de, cihê bûroya Xedam lê. Xedam li bûroyê li benda wan bû. Piştî silavê Xedam yekser ket mijarê:

-Van rojan Tirkiye behsa derbeya leşkerî dike. Eger derbe çêbe wê bikin stûyê Sûriyê. Hûn dizanin dostên me jî zêde nînin û dewletên Erebî jî pir bi ser me de tên. Divê em pêşiya vê xeterê bigirin. Halê hazir Rûsya tenê dostê me ye û rewşa wan jî ne diyar e.

Hinekî Apo di ber çavên xwe re derbas kir, dizanî ku jê fêm kiriye. Dîsa axaftina xwe domand:

-Hevalê Apo, rewşa Tirkan ev e. Cidî ne.

Êdî her tişt ji bo Apo zelal bû:

-Ji aliyê Hatayê heta Kurdistanê Tirkan her der girtiye. Eger bên wê destpêkê bikevin Helebê. Me dostayî ji vî welatî dît, divê em nehêlin zerer bigihiyê.

Her duyan jî pir baş ji hev fêm kiribû. Xedam nedixwest gotina “Derkeve” bêje, lê wî jî fêm kiribû. Xedam li benda bersiva wî bû. Ew jî di wê ferqê de bû ku wê bersiva wî mohra xwe li dîroka her du milan bixe. Li nava çavên Xedam nêrî:

-Ezê ti caran nebim sedem ku di navbera Tirkan, Sûriye û Israîlê de şer derkeve. Ji bo çareseriya vê rewşa aloz, divê em bi hev re alîkar bin. Lê divê ez bi hevalên xwe re jî nîqaş bikim.

Civîn qediyabû; Xedam gihatibû armanca xwe, Apo jî merdiya diket ser milê wî û erkê xwe yê dîrokî pêk anîbû. Bi kesayet û derfetên xwe şoreş parastibû. Piştî hevdîtinê vegeriyan malê. Hem bi yên li wir, hem bi yên li çiyê re bi saetan mijar nîqaş kir. Digel wê aloziya mezin rewşeke awarte li ser rûyê wî xuya nedikir, dixwest çareseriyeke hevbeş û bi nêrîngirtina

hevalên xwe pêk bîne.

Bûbû şev; lê ne rojek, serdemek derbas bûbû wê serdemeke nû dest pê bikira. Ew jî serdema destpêkê ya derketinê bû. Milîtanên li wir tev civandin. Dixwest bi awayekî ilmî girîngiya mijarê bi wan bide fêmkirin û rola xwe ya dîrokî bilîze. Sekin û helwesta wî ya vê carê jî dişibihî sekna destpêka derketin û hilhatina PKK'ê. Ew roj dianîn ber çavên xwe. Lê kûrtir û mezintir li ser derketina vê carê dihizirî. Hinekî li rûyê wan nêrî pişt re çû hat. Dixwest sedem û çavkaniya aloziyê bi wan bide fêmkirin:

-Divê hûn ji her rewşê re amade bin. Em partiyeke pêvajo û pêngavan in. Wê pêşketinên nû jî çêbin. Emerîka, ji bo ku rewşa xwe ya li Rojhilata Navî xurttir bike serî li planên nû dide. Yek ji stûnên vê planê ya herî girîng, itîfaqa xurt û hevkariya leşkerî ya di navbera Tirkiye û Israîlê de ye. Piştî roxîna Yekîtiya Sovyetan, Emerîka ji bo ku li hemberî Rûsya û Ewropa rewşa xwe xurt bike, piştgiriya Tirkiyê dike. Hem di vê mijarê de, hem di mijara petrol û gaza li Derya Xezerê û Asyaya Navî de, berjewendiyên Emerîka û Tirkiyê hev digirin. Lê ji bo ewleyiya van riyan, PKKê ji bo xwe pirsgirêkeke girîng dibînin. Lê ji Emerîka zêdetir, Tirkiye ji bo xwe pirsgirk dibîne. Emerîka biryara  roxandina rejima Seddam da. Parçeyek ji vê planê jî li hevanîna Barzanî û Telebanî û danîna zemînê herêmeke federal li Başûrê Kurdistanê ye.

Hinekî li derdora xwe nêrî:

-Lê pirsgirîkeke vê planê heye, hevalbenda Emerîka Tirkiye vê qebûl nake. Başûreke nîv serbixwe û hebûna hêza PKKê li wir ji bo dewleta Tirk ne rewşeke wisa ye ku bê qebûlkirin. Ji bo

ku vê hevalbenda xwe bêdeng bike, divê garantiyekê bidiyê heta ku plana ji bo Başûrê Kurdistanê qebûl bike. Li gorî wan, projeya herî saxlem, ku baregehên PKKê yên êerwerdeyê û navenda rêveberiyê yên li Sûriyê ji holê bên rakirin. Wê vê jî wiha bike: Wê Tirkiye gefa qutkirina avê li Sûriyê bixwe, Sûriye jî neçar bimîne PKKê ji welatê xwe derxe.

Di aliyê hizir de milîtan ketibûn rewşeke awarte. Çawa ku dinya kerr bûbe, dengê wî tenê dihat wan. Wî jî pêvajo ji destpêkê heta kêliya dawiyê yek bi yek ji wan re şîrove kir. Lê hê gotina dawiyê nehatibû gotin. Li benda civîna roja din bû. Wê şevê dîroka PKKê, ka alozî çawa derketine û çawa çareser bûne gav bi gav tev anîn ber çavên xwe. Ji bo paşroja li bendê ye, hizirî, ji bo wê heta berê sibê şiyar ma. Di dilê xwe de qedera Kurdan ketibû kefa destê wî. Saetek nebûbû çavên wî ketîn ser hev, rabû ser xwe ji bo hevdîtina rojê xwe amade kir. Careke din ketin ser riya bûroya Xedam. Piştî silavê li hemberî Xedam rûnişt. Li ser rûyê Xedam nerehetî diyar bû. Dixwest zû dest bi civînê bike. Bi hevokên tijî guman, tirs û fikar diaxi:

-Hûn dibînin, her ku diçe rewş xirabtir dibe. Tiştekî em bi hev re bikin wê hebe. Divê ev alozî çareser bibe.

Gotinên xwe bi awayekî nerm gotibûn, lê Apo fêm kiribû ku tiştekî êdî bikin nemaye. Diviya vê rewşê hêsan bike û riya herkîna jiyanê bide:

-Ez dikarim biçim nava gerîla, nava hevalên xwe, yan jî biçim cem dostên xwe. Heta niha ez mêvanê serok Hafiz Esed bûm. Ez dixwazim bizanim ka ew çi dibêje, da em jî li gorî wê tevbigerin.           -Heval Apo, êvarê civîneke me ya din heye. Ezê ji te re xeberê bînim.

Xatirê xwe xwestin derketin. Di rê de li ser rewşê dihizirî, lê di hişê xwe de gihatibû wê qenaetê ku divê li benda ti kesî nemîne û bixwe gavan biavêje. Lê dîsa ji xwe re digot, dibe ku nêrîneke dostan jî ya ji bo me baş hebe. Roja wî tev bi van fikran derbas bû. Roja din dîsa çûn cem Xedam. Bi rûniştinê re Xedam dest bi axaftinê kir:

-Serokê me Esed xeber şandiye, dibêje ji bo me ya herî girîng ewlekariya Ocalan ya şexsî ye. Eger tu bikarî derkevî û em bi hev re vî agirî vemirînin wê baş be. Lê eger tu nikaribî, emê serî li hin rêbazên din bidin.

Ji axivtina wî fêm kiribû ku li benda wî ne ew çareser bike. Gotina vemirandina agir bala wî kişandibû, dizanî ku pêwîstî bi helwesteke hêjayî dostayiyê heye:

-Eger hûn wisa difikirin, ezê jî nehêlim em bibin sebebê şerekî di navbera Sûriyê û Tirkiyê de.

Çawa ku Xedam li benda vê gotinê be, rûyê wî vebû. Careke din xatir xwestin, derketin. Êdî gihîştibû encamê ku divê derkeve û ti kes nikare tiştekî din bike. Di nava wan hizran de, gihîştin malê. Ji bo dana agahiyên dawiyê bi telefonê bi berpirsên partiyê re axivî.

-Hûn dizanin ew karê berê em li ser axivîn, ket rojevê. Divê niha ez derbasî Kurdistanê bibim.

Ew bi xwe bi vê gotina xwe re ketibû kelecanê. Çavên xwe danîn ser hev. Çawa ku bikeve xelweta xweşî û şahiya dîtina welat, ji nava wan fikar, tirs, hizir û helwestên dijwar derket. Nefeseke kûr kişand hundirê xwe. Dilê wî ketibû ser riya Kurdistanê, lê hişê wî di nava şiyarî û xetera cihê lê de bû. Dil, weke teyrekî baskên xwe bi gotinê re vekiribûn. Çavên xwe

vekirin. Ji aliyê din ti nêrînên cuda nehatin. Telefon danî, dest bi haziriya xwe kir.

***

Hem yên Sûriyê, hem yên li Kurdistanê bi awayekî pir bi dizî, ketin nava tevgerê. Êdî kêliya riya dûr hatibû û rêwîtiyeke nediyar li benda wî bû. Di çûna Kurdistanê de, hem xalên erênî didîtin, hem reşwa piştî derbasbûnê û şerê ku wê dijwartir bibe. Derengê şevê bû, hê li ser çûna Kurdistanê difikirî. Wê berê xwe dabûya cihê bi salan di xeyalê xwe de diçûyê. Rewşa Başûrê Kurdistanê û şerê di navbera YNK-PDK'ê de anîn ber çavên xwe. Di wê navê re dengê telefonê hat. Bilez çû telefon rakir:

-Belê bêjin, çi heye?

Deng milê din bi zorê dihat fêmkirin:

-Serokê min, li ser hatina we ya vir, em di nava xwe de gelek axivîn. Em gihîştin vê encamê: Firakên me hene. Eger haya dijmin ji hatina Serokatî ya Kurdıstanê çêbe, wê her tiştî bike. Dibe ku çekên nukleer jî bi kar bîne.

Telefon danî, destê xwe da ber erzeniya xwe. Bersiva ji Kurdistanê girtî fikar pê re çêkiribûn. Diviya li riyên cuda bigere. Herî dawiyê li ser pêşniyara Yunanan ya kirî koşeyekî hişê xwe hizirî. Dest avêt telefonê. Nûnera partiyê ya li Yunanistan nêrîna xwe ya berê dubare kir:

-Serokê min, li vir derfetên pir baş hene. Eger Serokatî bê vir wê baş be.

Wê şevê heta berê sibê bi telefonê axivî. Li derfeteke bi qasî serê derziyê digeriya, wan jî derfetên weke deryayekê pêşkêş dikirin. Piştî axaftina bi saetan telefon danî pişta xwe da kursiyê

li ser rûniştî. Êdî berê rê ji Kurdistanê hatibû guhertin. Digel çûna Yunanistanê çûna Rûsya jî diket hişê wî. Vê carê bi wir re ket têkiliyê. Ji bo axaftina pê re milîtanên li wir, wê Kurdekî karmaned û welatiyekî Rûsya yê berê erkdar rêkian Şamê.

Piştî du rojna yên diviya bên hatin. Li maleke Şamê li hev rûniştin. Destpêkê xwest fikrê wan bigire. Kurdê ji Rûsya hatî bi bawerî diaxivî, lê xweşkirina wî têra rakirina fikarên Apo nedikir. Du rojan bi her duyan re li ser mijarê axivî, lê çûna wir di dilê wî de cih nedigirt. Herî dawiyê baş dît ku berê xwe bide cihê pêşketina felsefeyê welatê Sokrat. Gotinên nûnerê dihatin bîra wî. Jixwe nûnera partiyê ya li wir jî, gotibû me erêkirina serokwezîr girtiye û gelek perlementeran jî bi awayekî fermî dawetî Yunanistanê kirbûn. Ji pirtûkxaneyê derket, çû eywanê. Gazî Selah û Kemal kir:

-Civaneke din ji Xedam bigirin.

Bi telefonê civan girtin. Çawa ku ew jî li benda wan be. Bê ku dem derbas bibe, Ew û Selah careke din wê şevê çûn bûroya wî. Vê carê Apo dest bi axaftinê kir:

-Divê hûn spasiya me ji serok Esed re bêjin.

Hê ew diaxivîn, birayê Esed Cemîl Esed ket hundir. Elewiyekî ji nifşê taliyê bû ku ji dostayî û hevrêtiyê hes dikir. Silav da Apo, rûnişt. Hinekî xwe nêzîkî wî kir:

-Berdevkên me jî di navê de, bila baweriya te bi ti kesî neyê. Ezê bi Esed re biaxivim, bila biryara derketinê bisekinîne.

Apo bi rûyekî geş berê xwe dayê.

-Em spasiya we dikin. Di vê rewşa heyî de me jî dixwest riyeke din bibînin. Lê diyar e ku riya herî baş derketin e.

Cemil, xemgîn xuya dikir, lê baş nêrî:

-Tu dizanî, lê bila berê te nekeve cihên dûr. Dostên me hene wê alîkariya we bikin.

Dubare spasiya wî kir, berê xwe da Xedam:

-Emê derkevin, wê Selah jî bi me re bê.

Xedam bi dilxweşî erê kir. Êdî tişteke ku li ser biaxivin nemabû. Rabû ser xwe. Destpêkê xatir ji Xedam xwest. Pişt re berê xwe da Cemîl. Bi xemgînî xatir ji hev xwestin.

Li malê Axa li benda wî bû. Bi riya têkiliyên xwe yên taybet agahî girtibû ku tiştek heye. Bi ketina hundir re û ji tevgerên wî fêm kir ku wê rêwîtî dest pê bike. Apo li çavên wî nêrî:

-Axa, ez û Selah emê derkevin, ez bawer dikim tu ji mijarê agahdar bûyî.

Rengê Axa guherî.

-Serokê min, ez jî dixwazim bi we re werim.

Êdî dema hizirîn û nîqaşê nemabû. Wê bi serê xwe biketa ser riyeke dûr û ne diyar. Bûbû derengê şevê. Yên din jî ti kes ranezbû. Sara li eywanê rûniştbû, li benda gotineke wî bû. Ji odeya xwe derket hat cem wan:

-Kemal, ku dinya ronahî bû, bikeve tevgerê. Tiştên me yên girîng tevan ji malan derxin. Sara, tu jî li dibistanan be, li benda xebera me be. Şev derng e jî lê em biçin dibistanê bên.

Bilez derketin, berê xwe dan dibistanê. Bost bi bost li derdora dibistanê nêrî. Têkoşîna li wir li hemberî kesayetê û avakirina model û jiyaneke nû ji bo Kurdan anîn bîra xwe. Carna jê gotina dayîka wî; “tu bi hevalên xwe pir ewle yî, lê tuyê tenê bimînî” dihat bîrê. Çû li ber wêneyên şehîdan sekinî, li wan temaşe kir. Di dilê xwe de got, ez bi we re derketim, min dest bi dozê kir, niha jî ezê ji bo we dozê mezintir bikim. Ezê doza Kurdistanê

ber bi cîhanê ve bibim. Li maseyê bi hezaran milîtanan li derdorê sond xwarîn, nêrî. Destê xwe danî ser keviya ala ERNKê. Li pêşiya wê alê di agirbesta yekê de deng li cîhanê kiribû, vê carê jî wê doza wî gelî ber bi cîhanê ve bibira. Seferên dîrokî yek bi yek anîn bîra xwe. Dizanî bê sefer û bê lêgerîn wê doza Kurdan çareser nebe. Xemgîn xuya dikir, rojên derketina ji Rihayê ber bi Bîqayê ve anîn bîra xwe. Derketin ji bo wî zor bû, lê mijara evîna welatekî li pêşiyê bû. Li wêneyê Zîlanê nêrî, roja şehîdbûna wê anî bîra xwe. Wê rojê hevdîtina wî bi jinên cîhanê re bû. Pêvajoya ronahiyê bû ji bo wî. Çawa ku wêneyên şehîdan zindî bûbin û pê re bikevin tevgerê li wan dinêrî. Çavên xwe danîn ser hev, ruhê xwe ber bi yê wan ve bir. Xatir ji bîranîna dibistanê û kesên dîtîn xwest. Ji dibistanê derket, çû qada sporê. Milîtan tev bi sekeneke leşkerî rawestiyabûn. Çavên tevan lê bû. Kêliya milîtan ji wir rêdiketin berê xwe didan Kurdistanê di şexsê wan de didît. Li pêşberî wan sekinî:

-Emê demekê hev nebînin. Barê we giran e, tişta ji we dixwazim gelek mezin e. Dema ji Urfayê derketîm, min li pişt xwe nêrî, min dît axa Kurdistanê Urfa hemû rabûye serhildanê. Wê kêliyê di binê lingê min de erd hejiya. Pir zehmet bû ji bo min. Vê demê min pir xewn didîtin, di tevan de min li hemberî dijmin şer dikir. Divê hûn ji bo pratîkeke xurt xwe amade bikin. Qîmetê her gaveke xwe ya li ser axa Kurdstanê bizanin. Ji bo ku rojekê li wê axê vegerim, ez bi salan li vir mam. Lê pir rehet hûn dikarin biçin, bibînin. Ez jî niha pir nêzîk dibim, her gava ji bo azadiya gelê xwe diavêjim, pirtir nêzîkî axa Kurdistanê dibim.

Hineke din xwe nêzîkî wan kir:

-Jiyan, perwerde û hevaltiya xwe biparêzin.

Fêm kiribûn ku wê derkeve, lê ka rêwîtî ber bi kû ve ye, ji bo wan ne diyar bû. Ji cem wan çû cihê kevokan. Çawa ku stiraneke xemgîniyê bêjin dengê qumequma wan dihat, wî jî guhdarî dikir. Destê xwe kir hêlînekê yek derxist, lê nêrî. Dîsa danî cihê wê ji wir dûr ket.

Wê şevê bi qasî sê saetan raza. Sibê zû rabû. Pirzikek di lêva wî de derketibû, çû li ber neynikê merhem lê da. Pişt re çû berkêşka cilên xwe kişand. Gumlekekî şînê asîmanî û bi xetên spî li xwe kir. Bi milîtana re taştê xwar, pişt re derket hewşê:

-Heval tev werin em bi hev re bimeşin.

Di nava çend kêliyan de tev li cem kom bûn, dest bi meşê kirin. Lê tev li benda gotinekê bûn:

-Min dixwest biçim welat, lê wê dijmin komkujiyan bike.

Hinekî meşiya, dîsa li wan vegeriya:

-Arşîva min tevê kom bikin, ji vir derxin. Barê we giran e. Barê şoreşê rakin.

Destê xwe vekir, kevirekî reşê piçûk derxist:

-Ev kevirê sûra Amadê ye, dayîkekê ji min re anîbû. Diyariyeke pir biqimet e.

Hinekî li kevir nêrî, yên li derdorê jî xemgîn bûbûn:

-Hêviya me ew e ku em tev biçin Sûrê, tekoşîn û şoreşa xwe li wir bikin.

Kevir dîsa kir berîka xwe. Berê xwe da cihê kevokan, li hemûyan nêrî. Xatirê xwe ji her tiştê di hewşê de xwest. Li ber kulîlkeke xemrî sekinî:

-Kemal, were wêneyê me li ber vê çîçeka bi rengê jinê bikişîne. Wê wêneyê me yê dîrokî be, divê neşewite. Eger bişewite, tu li kû bî ezê bi pêsîra te bigirim.

Yek bi yek bi wan re wêne kişandin. Pişt re li pêşberî wan sekinî:

-Hûn dilopa dawiyê ya keda min in.

Êdî dema xatirxwestinê bû. Her çiqas behsa rêwîtiya xwe ya ne diyar dikir jî, her kesî di dilê xwe de digot, wê dîsa vegere.

Wê şevê dewranê çîrokên xwe tev dianîn bîra wî. Şeveke zor derbas kiribû. Yên din jî li eywnê li bendê bûn. Piştî ku xwe amade kir çû cem wan. Gazî Kemal kir:

-Kemal, hinek dema me heye, em dikarin biçin xatirê xwe ji hevalan bixwazin. Selah, emê zû vegerin!

Biken ji hundir derket berê xwe da mala Xota. Şêxo di hewşê de avdan dikir. Di nava çend kêliyan de yên li wir tev komk bûn, xatirê xwe ji wan xwest. Li Şêxo vegeriya:

-Min tovek avêtiye erdê, li tovê min xwedî derkevin.

Serê Şêxo tevlîhev bûbû:

-Serokê min, ma vê carê hûnê pir dereng bimînin?

-Ne diyar e, lê silavên min li malê û zarokan bike, bizane ku ji bo wan derdikevim.

Xatirê xwe ji wî jî xwest. Berî ku derkevin, ji seyareyê daket gazî Şêxo kir:

-Şêxo, çend roj bûn, ez ne li vir bûm, dara zeytûnê baş av bide û li kevokan jî miqate be.

Ev xatirxwestina taliyê bû, ku li wir guhdarî stirana Aram Tigran kiribû û bi hev re gotibûn. Heta seyare bi rê ket jî, destê wî û milîtanan li hewa bûn. Berê wan li malên din yên perwerdeyê bû. Her cihê xatir jê dixwest, digot ji bo demekê em xatirê xwe dixwazin.

Piştî xatirxwestinê vegeriyan malê. Selah û Nûnerê jî xwe

amade kiribûn, li benda wan bûn. Tev de siwar bûn berê xwe dan bûroya siyasî. Li derdoran dinêrî, bîst salên li wir derbas kirîn, dianîn bîra xwe. Berê xwe da herduyan:

-Dibe ku ev derketin ji xêra me re be û emê doza kurdî bigihînin cîhanê.

Li ber deriyê bûroyê Xedam li benda wan bû. Silav dan, ketin hundir. Êdî wê Apo gotinên dawiyê ji Xedam re bigotan:

-Înşale em di doza xwe de bi ser bikevin. Emê dîsa bên Sûriyê û ev der jî welatê me ye.

Rûyê wî geş, yê Xedam resmî û bifikar bû. Xatirxwestina vê carê wê bibûya ya dawiyê. Piştî derketinê çavên xwe li Kemal gerandin:

-Te seyare guhert?

-Rast e serokê min, dema hûn di hevdîtinê de min guhert.

Bi siwariya seyareyê re, dengê telefonê hat:

-Kemal, ew kî ye?

-Mezlum e, serokê min, dixwze bi we re biaxive.

-Serokê min silav û rêz.

-Rewş çawa ye, Mezlum?

-Serokêm min, li her derê dijmin derketiye ser sînor. Dema hûn bi deryayan re diaxivîn, me guhdarî we dikir.

Seryare ketibû ser rê, ji bo wî êdî deqîqe gelek bûn. Xwest bilez bersiva Mezlum bide:

-Em niha li ser rê ne, karê me gotî we pêk anî?

-Erê serokê min, pêk hat.

-Baş e niha bi xatirê te.

Piştî qasekî gihîştin balafirgehê. Balafir li benada wan bû. Yên li derdorê tevan lê temaşe dikir. Polîsan jî nas kiribû.

Milîtanên li wir mayîn ketin bîra wî. Vê nerehetî pê re çêdikir. Silav da yên li derdora xwe, ber bi pêlekanên balafirê ve çû. Her ku piyekî xwe datanî ser pêlekanekê çawa ku her tişta li pey xwe hiştî li bendê be, piyê xwe wisa diavêt. Li ser pêlekana dawiyê bi şûn xwe ve nêrî. Çawa ku her kes li wir be destê xwe bilind kir, silav da. Gel dihat ber çavên wî, dengê tilîlî û durişmên şoreşê dihatin guhên wî...

Apo kî ye
Apo gel e ne kesek e
Apo roj e ne rewşek e
Ew derya ye ne çemek e
Ew dîrok e ne demek e
Apo jîn e ne gavek e
Apo ceng e ne dewrek e
Ew milet e ne malek e
Kaniya zêr e ne zêrek e
Apo vîn e wekhev dike
Serxwebûn e rê vedike
Dermanê Kurdan li nik e
Apo hêviyan şîn dike
Apo ev e xweş nas bike
Ew pir e me derbas dike
Dijmin tazî û pêxwas dike
Dîroka gelan rast dike
Dîroka gel sererast dikea
Apo ev e xweş nas bike.